

K.T
ZANÎNGEHA WAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

HÊMANÊN FOLKLORÎK DI ROMANA HEWARÎ YA HECİYÊ CINDÎ DE

TEZA LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

Reşide DEĞÎRMÎ

ŞÊWIRMEND

Dr. Nesim SÖNMEZ

WAN-2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

HECİYÊ CİNDÎ'NİN HEWARÎ ROMANINDAKİ FOLKLORİK UNSURLAR

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
Reşide DEĞİRMİ

DANIŞMAN
Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ




VAN-2019



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Reşide DEĞİRMİ'nin “**Heciyê Cindî'nin Hewarî Romanındaki Folklorik Unsurlar**” adlı bu çalışma, 03/07/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman)	: Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ	İmza: 
ÜYE	: Dr. Öğr. Üyesi Mahmut DÜNDAR	İmza: 
ÜYE	: Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK	İmza: 
ÜYE	:	İmza:
ÜYE	:	İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

Prof. Dr. Murat DEMİREL
Enstitü Müdürü


Teza Lîsansa Bilnd

Reşide DEĞİRMİ

**ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

Tîrmeh, 2019

HÊMANÊN FOLKLORÎK DI ROMANA HEWARÎ YA HECİYÊ CINDÎ DE

KURTE

Di vê xebatê de li ser hêmanên folklorîk di romana *Hewarî* ya Heciyê Cindî de lêkolîn hatine kirin. Heciyê Cindî, gelekî ked daye folklorê kurdî û di vî warî de gelek berhem afirandine. Di her cureya wêjeyî de berhemên wî hene. Bi navê *Hewarî* yek roman nivîsandîye. Nivîskar, di romana xwe de tevî gelek edet û kevneşopiyên çanda kurdî bi berfirehî cih daye bawerî û ayînên êzidiyan jî. Di romana *Hewarî* de hêmanên wêjeya devkî ya kurdî, îfadeyên qalibgirtî yên di nav gel de gelek hatine bikaranîn. Di vê xebatê de hêmanên folklorîk yên di romanê de hatine dahûrandin û di bin serenavan de hatine senifandin.

Xebata me ji bilî destpêkê ji du beşan pêk tê. Di destpêkê de pênaseya folklorê hatiye kirin û derbarê xebatên di warê wêje û çanda kurdî ya li Yekîtiya Sovyetan de agahî hatine dayîn. Di beşa yekem de jiyana kesayetîya wêjeyî û xebatên Heciyê Cindî hene. Di beşa duyem de lehengên romanê hatine danasandin, kurte û analîza wê hatiye kirin û herwiha hêmanên folklorîk yên di berhemê de hatine tesbît û tehlîl kirin.

Peyvên Sereke : Heciyê Cindî, Hewarî, Hêmanên Folklorîk, Wêjeya Kurdên Sovyetê.

Hejmara Rûpelan: 154+IX

Şêwirmendê Tezê : End. Hdk. Dr. Nesim Sönmez

Yüksek Lisans Tezi

Reşide DEĞİRMİ

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Temmuz, 2019

HECIYÊ CİNDÎ' NİN HEWARÎ ROMANINDAKİ FOLKLORİK UNSURLAR

ÖZET

Bu çalışmada, Heciyê Cindî'nin *Hewarî* romanındaki folklorik unsurlar incelenmiştir. Heciyê Cindî, Kürt folkloruna büyük emekler vermiş ve bu alanda bir çok eser bırakmıştır. Edebiyatın her türünde esreleri olan yazarın *Hewarî* adında bir tek romanı vardır. Heciyê Cindî romanında, Kürt kültürüne ait bir çok gelenek, örf ve adetler ile birlikte Ezidi halkının dini inanış ve ritüellerine geniş bir şekilde yer vermiştir. *Hewarî* romanında, Kürt sözlü edebiyatına ait unsurlar ve günlük yaşamda halk arasında çokça kullanılan kalıplaşmış ifadeler bulunmaktadır. Bu çalışmada, romanda geçen folklorik unsurlar incelenmiş ve başlıklar altında sınıflandırılmıştır.

Çalışmamız giriş kısmı dışında iki bölümden oluşmaktadır. Giriş kısmında folklorun tanımı yapılmış ve Sovyetler Birliği'nde Kürt kültür ve edebiyatı alanında yapılan çalışmalar hakkında bilgi verilmiştir. Birinci bölümde Heciyê Cindî'nin hayatı, edebi kişiliği ve çalışmaları bulunmaktadır. İkinci bölümde, romanın kahramanları tanıtılarak, romanın özeti ve analizi ile birlikte romanda yer alan folklorik unsurların tespit ve tahlili yapılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Heciyê Cindî, Hewarî, Folklorik Öğeler, Sovyet Kürt Edebiyatı.

Sayfa Sayısı : 154+IX

Tez Danışmanı :Dr. Öğr. Ü. Nesim SÖNMEZ

Master Thesis

Reşide DEĞİRMİ

**YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES**

July-2019

FOLKLORİK ELEMENTS İN HECİYÊ CINDÎ'S NOVEL HEWARÎ

ABSTRACT

In this study, the folkloric elements of Heciyê Cindî's *Hewarî* novel were examined. *Hewarî* is the only novel by Heciyê Cindî, who has worked hard on Kurdish folklore and contributed many works to the field. In his novel, Heciyê Cindî covers many traditions and customs of Kurdish culture as well as the religious beliefs and rituals of the Ezidi people. In *Hewarî*, there are elements of Kurdish oral literature and formulaic expressions that are widely used in everyday life by the public. In this study, the folkloric elements in the novel are examined and classified under the headings.

In addition to the introduction, the study consists of two sections. In the introduction, the definition of folklore is made and information is provided about the studies in the field of culture and literature in the Soviet Union. The first section consists of, Heciyê Cindî's life, literary personality and works. In the second section, the heroes of the novel, the summary and the analyze of the novel and the folkloric elements in the novel are identified and analyzed. .

Key words : Heciyê Cindî, Hewarî, Folkloric Elements, Soviet Kurdish Literature.

Quantity Of Page: 154+IX

Thesis Advisor : Dr. Nesim SÖNMEZ

NAVEROK

KURTE	III
ÖZET	III
ABSTRACT	IV
NAVEROK	V
PÊŞGOTÎN	VIII
KURTEBÊJE	IX
DESTPÊK	1
1. HECIYÊ CINDÎ	11
1.1. Jiyana Wî.....	11
1.2. Keseyatiya Wî ya Wêjeyî.....	16
1.3. Berhemên Wî.....	20
1.3.1. Folklornasî	20
1.3.2. Xebatê Wî yên li ser Zimanê	22
1.3.3. Wergerên Wî.....	24
1.3.4. Lêgerîn û Xebatên Wî yên Cûr bi Cûr.....	24
1.3.5. Gotarên Wî.....	25
2. ROMANA HEWARÎ	29
2.1. Analîza Romanê	30
2.2. Kurteya Romana Hewartî	31
2.3. Lehengên Romanê	34
2.4. Di Romanê de Hêmanên Folklorîk.....	35
2.4.1. Hindek Edet û Kevneşopiyên Kurdan	35
2.4.2. Di Dawe û Şeran de Jina Kurd	38
2.4.3. Di Dawe û Şeran de Mêrên Kurd	39
2.4.4. Dawet.....	40
2.4.4.1. Qelen	41
2.4.4.2. Mehirkirin	42
2.4.4.3. Cihêz	43
2.4.4.4. Govend	43
2.4.4.5. Gerdek.....	44
2.4.4.6. Keçrevandin	45
2.4.5. Xwarin û Vexwarin.....	46

2.4.6. Mêvandarî	47
2.4.7. Alavên di nav Mal de.....	48
2.4.8. Slavdayîn	49
2.4.8. Mizgînîdayîn.....	51
2.4.9. Lîstik	52
2.4.10. Jiyana di Gund de	53
2.4.11. Hiqûqa di nav Gel de	54
2.4.12. Wextên di nav Gel de	56
2.4.13. Hekîmtiya di nav Gel de	57
2.4.14. Xwedîkirina Hespan	58
2.4.15. Naskirina Giyayan	58
2.4.16. Remildanîn.....	59
2.4.17. Cil û Berg.....	60
2.4.17.1. Cil û Bergên Mêran.....	60
2.4.17.2. Cil û Bergên Jinan.....	60
2.4.18. Ol û Baweriyên Êzidiyan.....	61
2.4.18.1. Îbadetên Êzidiyan.....	63
2.4.18.2. Rojîgirtin û Eyd.....	64
2.4.18.3. Rêzgirtina Şêxan	66
2.4.18.4. Qewal	67
2.4.18.5. Qurban.....	68
2.4.18.6. Xêr Belavkirin.....	69
2.4.18.7. Mirî Veşartin û Serxweşî	70
2.4.18.8. Tiştên Hatine Qedexekirin	71
2.5. Wêjeya Gelêrî.....	73
2.5.1. Biwêj.....	73
2.5.2. Gotinên Pêşyan	115
2.5.3. Dengbêjî.....	120
2.5.3.1. Kilam.....	121
2.5.3.2. Stran	126
2.5.4. Dua.....	128
2.5.5. Nifir.....	133
2.5.6. Dijûn	137
2.5.7. Lavahîkirin.....	139

2.5.8. Sondxwarin	140
2.5.9. Zêmare	142
2.5.10. Zûgotinok.....	145
ENCAM.....	147
INDEKSA BIWÊJAN.....	148
ÇAVKANÎ.....	151



PÊŞGOTÎN

Folklorê kurdan xwedî dîrokeke kevnar e. Axa kurdan heta roja me jî mazûvaniya ol, bawerî û milletên cûda kiriye. Ji ber vê hindê li ser vê axê folkloreke rengîn û dewlemend derketiye holê. Ev folklor di romanên nivîskaran de bûye gencineyeke mezin. Nivîskarên kurd di berhemên xwe de cih dane kevneşopî, wêjeya devkî û keresteyên din yê folklorê kurdî. Heciyê Cindî yek ji wan nivîskaran e. Wî, piraniya emrê xwe daye ser xebatên folklorê kurdî û gelek berhem li lîteratûra kurdî zêde kirine. *Hewarî* yek ji wan berhema ne. Di her rûpeleke romanê de hêmanekê folklorîk û motîfêkê çandî xuya dike. Herwiha gotinên pêşiyên, dua, nîfir, biwêj û gelek gotinên ku di nav gel de tên bikaranîn di romanê de cih girtine. Me jî hewl da ku em wan hêmanên folklorîk tesbît bikin û tevna civakê ya di romanê de dahûrînin.

Romana *Hewarî* ji bo nasandina çanda kurdî wek deryayekê ye. Ev roman hem ji aliyê kelepûrên kurdan hem jî bi dewlemendiya wêjeya devkî ve ji xebateke akademîk re têr û tijî ye. Ji min re ev xebat bû fersendeke mezin kû ez li folklorê kurdî hûrbûm û li ser çand û folklorê xwe bi awayekê zanistî xebitîm.

Wekî her xebatê, ev xebat jî bi alîkariya hinek mirovan pêk hat. Ez dixwazim di serî de ji bo rêberî, rexne û pêşniyaziyên wî, spasîyê li şewêrmendê xwe Dr. Nesim Sönmez bikim. Ji bo sererastkirina rêzimanî ji Mahmut Degirmi re, ji bo bidestxistina hinek çavkaniyan ji Rabia Orak re û ji bo wergera kurteyê ya bo îngîlîzî ji Dr. Gülsüm Acar re gelekî spas dikim.

Reşide DEĞİRMİ

Wan, 2019

KURTEBÊJE

ç.	: çap
h.b.	: heman berhem
H..	: Hewarî
hwd.	: her wekî din
j.	: jimare
KGB.	: Hêzên Saloxgeriya Dewletê
r.	: rûpel
RŞS (RSS).	: Resbûlîka (Komara) Sovyeta Sosyalîst
wer.	: wergêr
weş.	: weşanxane

DESTPÊK

Folklor, zanistek e ku çanda madî û manewî ya miletekî li gorî rêbaz û pêşeriyên xwe yê taybet lêdikole, berhev dike, disenifîne, dahûrîne û dihelsengîne.¹ Folklor, edet, kevneşopî, ol û bawerî, xwarin û vexwarin, cil û berg, zewac, avahîsazî, zargotin û hwd. a miletekî lêdikole û ji rabirdûyê heta roja me guherîna wê dinirxîne.

Li gorî Propp, folklor dîsîplîneke îdeolojîk e. Armanc û rêbazên wê, li gorî nêrînên çaxê kifş dibin û folklor jî wan dîtinan diteyisîne.² Ji ber vê jî lêkolînên li ser folklorê li gorî dema wê tê nirxandin.

Xebatên li ser folklorê, bi awayekê zanistî sedsala 19an li Îngiltereyê destpê kir. Di sala 1878an de li Îngiltereyê komeleya folklorê hate saz kirin.³ Bi dewlet serê wê komeleyê, xebatên folklorê bi micîd hatin berhev kirin. Heman demê welatê Ewropayê yê din jî bala xwe dane ser xebatên folklorê. Folklor, bi hevkarîya zanistên wek dîrok, erdnîgarî, derûnînasî, civaknasî, antropolojî, pedagojî û wêjeyê pêk tê. Hindek zanyar, folklorê bi xebatên zargotinê ve sînordar dikin. Ji ber ku ragihandina herî zêde bi zimên tê kirin.

Beriya nivîsê mirovan, bawerî û fikrên xwe yê derbarê rabirdû û dehatûya dinyayê de, li gorî baweriyên wê çaxê, bi riya formên vegotinê dianîn ziman. Ew formên vegotinê, îro wekî mîtos, efsane, destan, çîrok, çîrokên gelêrî, pêkenok, mamik, stran, gotinên pêşyan, lawik, lorîk tên binav kirin.⁴ Ji bo nasandina miletekî, zargotin keresteya herî girîng e, ew di nav xwe de hişê miletekî diêwirîne. Bi saya zargotinê mirov dikare felsefe, bîr û baweriyên miletekî bidestbêxe. Dîroka miletekî çend qedîm be zargotina wî jî ew çend dewlemend e. Kurd, miletekî qedîm û xwedî zargotineke xurt e. Di zargotina kurdan de her cureyê edebiyata gelêrî heye. Dewlemendiya zargotina kurdî ne bi tenê ji kûrahiya dîroka wê tê; heya niha kurd nebûye xwedî dewlet lewma zimanê xwe bi awayekê fermî hîn nebûye û xwe bi zargotina xwe ve girtiye.

¹ Yıldırım K., Pertev R., Aslan M., (2013) *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weş. Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin, r. 11.

² Propp V., *Folklor Teori ve Tarih*, (1998), (wer. Tolga Tanyel, Necdet Hasgöl), Weş. Avesta, İstanbul, r. 9-10.

³ Baykurt Ş., "Folklor üzerine Çalışmalar", www.kulturelbellek.com. 10.09.2018, 10.50.

⁴ Yıldırım K., Pertev R., Aslan M., h.b., r.12.

Kurdan ji miletên din zêdetir baweriya xwe bi gotina devkî anine û bi vê edebiyat û folklorê ve girêdayî mane. Heger xebatek li ser edebiyata kurdî bê kirin, divê xwe bigihîne edebiyata devkî. Ev şêwe û awayê vegotinê ne bi tenê rojê bihurî bi bîr tîne herwiha pê ve girêdayî ye jî. Ew bi awayekî, tevî têkiliyên bi rojên bihurî re, modern e.⁵ Ew wêje, hem agahiyê dem û dewranên kevn dide hem jî rewşa civakî û şewaza gel tîne pêş çavên meriv.⁶ Di vê ragihandinê de rola dengbêjan gelekî mezin e. Ji bo berdewamiya zargotina kurdan, dengbêjan gelekî xizmet dane. Bi saya wan zargotina kurdan heta roja me hatiye.

Mijarên edebiyata gelêrî li gorî her civakê diguhere. Yên edebiyata kurdî jî bi senifandina wan mijaran pêk tê: Destan, menqibeyên dînî û tesawifi, dengbêjî, çîrokên gelêrî, xeberoşk, pêkenokên gelêrî, gotinên pêşyan û biwêj, kilam û stranên gelêrî, qewlerk, mamik, zûgotinok, zêmar, lorik, stranên zarokan, keresteyên ziman, nifir, niyaz, dua, listikên temaşeyî yên gelêrî, listikên şahî û werzîşe, şanoya gelêrî, listikên zarokan û hwd.⁷

Berhevkirina keresteyên zargotina kurdî hê ji sedsala 17an bi xebatên wek Duru'l Mecalîsa Mela Mûsayê Hekarî destpê dike ku wî, çîrokên gelêrî berhev kirine. Herwiha berya Mela Mûsayê Hekarî jî haya helbestvanên kurdan ji wêjeya gelêri hebûye. Wek mînak Melayê Batê *Zembilfiroş*, Feqiyê Teyran *Dimdim*, *Qewlê Hespê Reş*, *Bersîsê Abid* û Ehmedê Xanî *Mem û Zîn* wan çîrokê di nav gel de li gorî xwe şîrove kirine û nivîsandine. Di sedsala 18an de Mihemed Qutip ku bi navê Melayê Erwasî navdar e li ser bijîşkiya gelêrî berhemek amade kiriye. Pisporek û lêkolînerên biyanî jî bala xwe dane ser folklor û edebiyata kurdî, xebatên wan ji sedsala 18an heta roja me berdewam dike.⁸ Di nav wan lêkolîneran de yê herî navdar A. Jaba ye. A. Jaba li gel Mele Mehmûdê Bazidî li ser çanda kurdan xebatên berbiçav kirine. Mele Mehmûdê Bazidî, bi navê "*Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye*" xebatekê giranbiha bo folklorê kurdî hêlandiye.

Di sedsala 20î de em dibînin ku ji bo tomarkirina keresteyên folklorê kurdî gelek kes beşdarî wan xebatan dibin. Celadet Bedîrxan yek ji wan e. Ew pê hesayê ku bo miletekî, xebatên li ser folklorê çiqas girîng in ji ber vê di hejmarê yekem ya

⁵ Uzun M., *Destpêka Edebiyata Kurdî*, (2010), weş. Îthaki, İstanbul, r. 31.

⁶ Aras A., "Zargotina Kurdî Metodên Lêgerînê", Kovara *Zend*, j. 3, Payîz 1997, İstanbul, r.53.

⁷ Yıldırım K., Pertev R., Aslan M., h.b., r. 143, 144.

⁸ Pertev R., (2015), *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, weş. Avesta, Stenbûl, , r. 17.

kovara *Hawar* de ji bo zargotina kurdî bê berhevkerin bang li hemû kurdan kiriye û şêweya xebata xwe bi wî awayî senifandiye:

*"Sehitiya zarên kurdî li berhevdanîna wan.
Sehîti ser mirovatiya zimanê kurdî digel zimanên din ên arî.
Sehîti ser bingehên zimanê kurdî, ser dîrok, awayê rabûn û pêşveketina wî.
Berhevkerina çîrok, çîrçîrok û her texlît laje û stranên kurdî û birêve
belavkirina wan.
Sehîti ser reqs û qeydeyên stranên kurdî."*⁹

Xebatên *Hawarê* yên bi vî rengî dibe nimûneyeke baş, kovarên bi dû wê re têt ji bo tomarkirina zargotina kurdî dixebitin. Di vê xalê de mirov dikare hindêk mînakên kovaran bide: *Rojî kurd, Hetawî Kurd, Jîn, Zarî Kurmancî, Ronahî, Roja Nû, Stêrk, Tîrêj, Hêvî, Kurmancî, Sirwe, Xewence, Rewşen, Nûbihar, Zend, Çira, War Birnebûn, Nûdem, Gulîstan, Pelîn, Kowara W, Folklorê Kurdan, Folklorame û hwd.*¹⁰

Li Yekîtiya Sovyetê Xebatên li ser Folklor, Çand û Wêjeya Kurdî

Kurdên diçin Sovyetê bi gelemperî êzidî bûne. Êzidiyên di sinorên axa Osmaniyan de dijiyan ji ber bîr û baweriya xwe her dem hatine çewisandin. Dewleta Osmaniye ji bo êzidiyan bîne ser dîne îslamê zordarî li wan dike lê hindêk êlên êzidiyan vê yekê qebûl nakin. Li ser vê yekê Eskerê Boyîk sedemên çuyîna Rûsyayê wiha rave dike: "Welatê Rûsyayê, kesî ji bo bawerî û hebandinê, zordestî kesî nedikir, fermanên kuştin, talankirin û qelandinê tunebû, ew cih rastî jî êzidiyan re xilasbûyîn bû. Ji bo wê jî êzidiyan berê xwe dabûne wî welatî."¹¹ Êzidî piştî şerê cihanê yê yekem koç dikin û di nav axê Ermenîstan, Gurcîstan, Azerbeycan û Asya Navîn de cih dibin. Di nav wan miletan de dostên wan yê ermen gelekî xweditiya xwe li kurdên êzidî dikin.

Kurd li Sovyetê rastê muameleyeke baş têt. Li wê serdemê, Yekitiya Sovyetê ji şerê cihanê yê yekem nû derketiye û rejîmeke nû ava dike. Ji ber vê jî kêmetewên wekî kurdan bi aliyê xwe ve dikêşe. Ji wan re ocaxên perwerdehî û çandê saz dike. Li gundan dibistanan vedikin û zarokên kurdan hîne xwendin û nivîsandinê dikin. Kurd li vir li ser folklor, çand û zimanê xwe dixebitin. Lê di navbera salên 1930 û

⁹ Hawar, Armanc, "Awayê Xebatê û Nivîsandina Hawarê", Kovara *Hawar*, j. 1, Gulan 1932, Şam, r.3.

¹⁰ Pertev R. h.b., r.18.

¹¹ Boyik E., "Nihêrîna li Ser Edebiyata Kurdên Sovyetê", *Gotarên Konferansa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Hekariyê, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011.*, r. 93.

1940î de Stalîn, teroreke hovane bi ser gelên xwe û yên kêmetewe de dibarîne. Ew teror li ser kurdên êzidî dibe sedemê tirsê lewma ew nikarin li ser dîrok, bîr û baweriyên xwe hûr bibin.¹²

Eskerê Boyîk, jiyana kurdên Sovyetê yên li Ermenîstanê parî sê deman dike. Em ê jî hewl bidin ku di wan sê deman de xebatên edebî û çandî yên li Sovyetê nîşan bidin.

Serdema yekem ji sala 1920î destpê dike. Êzidî hingê ji welatê xwe nû derketine û derûniya wan xerab e. Her çiqas di bin siya Sovyetê de xwe ewle bibînin jî qirkirin, mirin û talan dîtine, hemû milk û warê xwe li pişt xwe hêlandine. Di nav axa Sovyetan de kêmeteweyên mîna kurdan gelek in. Hem ji bo perwerdehiya welatîyê xwe hem jî ji bo kêmetewan dibistan tên vekirin.

Bi biryara hikumeta Ermenîstanê ya 23ê adara sala 1921ê li dibistanan di dereca yekem û duyem de perwerdebûyîna xwendin-nivîsandinê pêwîstbû ku bi zimanê dê bihata dayîn. Di dibistanên gundên kurdan de jî ji bo ders bi zimanê dê bêne dayîn, sala 1921ê kitêba *ŞEMS* bi zimanê kurdî lê bi herfên ermenî hate weşandin. Xwedanê wê pirtûkê, Hakob Xazaryan bû. Navendên dersdar hazirkirinê vebûn, dersdar hatin hazirkirin ku bi vê pirtûkê zarokê kurd hîne xwendin û nivîsandinê bibin. Heta sala 1929an hem di dibistanên gundên kurdan de hem jî li nav kurdên bajarê Tilbîsê, zarokên kurdan bi vê kitêbê hîne xwendin- nivîsandina zimanê dê bûn.¹³

Di nav kurdan de kesên ku bi xwendin û nivîsandinê dizanîn pir kêmet bûn, ev jî ji bo perwerdehiyê pirsgerêkeke mezin bû. Zarokên di sêwîxanan de mezin bibûn, bi xwendin û nivîsandinê dizanîn lê ew jî li ser zimanê ermenî perwerde bibûn. Di vê qonaxê de ermeniyên ku bi kurdî dizanîn alikariya kurdan dikirin û diçûn gundê kurdan û zarok bi zimanê kurdî perwerde dikirin.

Dîsa di sala 1929an de Erebe Şemo û Îshak Mêrangûlov bi tîpên latînî *Xwe Bi Xwe Hîbûna Zimanê Kurmancî* pirtûkek derdixînin û bi şûn de êdî zarokên kurd bi tîpên latînî ve perwerde dibin.

¹² Alakom R., (2009), *Kars Kürtleri*, weş. Avesta, İstanbul, r.409,410.

¹³ Boyik E., h.b., r. 95.

Heta salên 30î jî xebatên çandî û edebî yên wisa berbiçav nehatine kirin. Lê di qada sînemayê de sala 1926an kurteçîroka Lazo *Zerê* tê kêşandin û aktoriya vê sîneyamayê jî ermenan kiriye.¹⁴ *Zerê* wek yekem sînemaya kurdan tê qebûl kirin.

Di nav salên 30î de gelek saziyên kurdan tîr vekirin. Di nav wan de ya hêja rojnameya *Riya Teze* bû, herçend armanca sereke ya rojnamê propogandaya komunizmê be jî bi saya vê rojnameyê li ser ziman û wêjeyê gelek xebat tîne kirin. Lê di warê rojnamegerî û zimanzaniya kurdî de kadroyekê tîkûz tûne bû. Di serî de rewşenbîrên kurd ên wekî Erebe Şemo, Heciyê Cindî û Emîne Evdal li dora rojnameyê kom dibin. Ermeniyên ku kurdî baş dizanin, di xebata vê rojnameyê de alîkariya kurdan dikin.¹⁵ Ji bo bi rêkûpêk weşandina rojnameyê, nivîskarê ermenî yên bi navûdeng Herûtiyûn Mikirtçiyân, Gevork Parîs alîkariya mezin didin xebatkarên rojnameyê. Herdu jî di nav kurdan de mezin bibûn, kurmancî baş dizanîbûn. Ew kes heta sala 1934an berpirsyariya rojnameyê dikin.¹⁶ Ji bo keresteyê nivîsandinê, nivîskarên kurd dikevin nav gundên kurdan li millet û dengbêjan guhdarî dikirin, kilam, stran, meselok, serpêhatî, çîrok, destan edet û kevneşopî û hwd. ên kurdan berhev dikirin di rojnamê de çap dikirin.

Rojnameya *Riya Teze*, di pêşveçûna zimanê kurdî de roleke mezin hilgirtiye. Ev rojname, di çapemeniya kurdî ya periyodîk de xwedî wesfa rojnameya herî zêde hatî weşandin e.¹⁷ *Riya Teze*, wek ekolekê zimanê bû ji ber ku gelekî girîngî dida ziman û rastnivîsînê. Gelek berhemên rûsî bi saya wê de tîne wergerandin û bingeha nivîsandinê ji serî de gelekî qewî tê danîn.

Di nav salên 30î de em rastê rojnameyeke din ya kurdan tîr. Rojnameya bi navê *Şûra Kurdistan* di sala 1932an de li Laçîna Azerbeycanê dest bi weşanê dike. Zimanê weşanê kurdî û azerî ye.¹⁸ *Şûra Kurdistan* jî wekî ocaxên kurdan yên din di sala 1937an de tê girtin.

Dîsa di sala 1930î de "Radyoya Erîvanê" vedibe û ji bo zargotina kurdan dibe arşîveke mezin. "Yêrîvan xeber dide. Guhdarên ezîz, bibihêzin xeberdana me bi zimanê kurmancî ye" ev hevok di sala 1930î de yekem car bi dengê Heciyê Cindî û

¹⁴ Boyik E., (2012), *Çanda Kurdên Sovyetê*, weş. Deng, Amed, , r.13.

¹⁵ Ulugana S., "Kurdolojiya Sovyetê û Kronolojiya Edebiyata Wê ya Kurdî (1922-1991)", Kovara *Wêje û Rexne*, j. 9/10, Weşana Demane (Du-demsalî) 2017, r. 43,44.

¹⁶ Boyik E., "Rojnameya Riya Teze", Kovara *Nûbihar*, j. 126, Zivistan 2014, r.10.

¹⁷ Rohat, *Kürdolojî Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, (1991), weş. Deng, İstanbul, Ağustos, r. 112.

¹⁸ Ulugana S., h. b., r. 45.

Zeyneva Îvo li Radyoya Êrîvanê olan dide. Di destpêkê de maweya weşanê 5 deqîqe ye bi dû re jî dibe 15 deqîqe. Di destpêkê de nûçeyên nû, xwendina berhemên biçûk û weşana helbestên şairên kurdan dide.¹⁹ Ji bo weşanên radyoyê, kilam û stranên kurdan têne berhevkerin, di vê demê de zargotina kurdan gelek pêşve diçe. Herwiha bi saya vê radyoyê gelek navê dengbêjan tên nasîn; Şêroyê Biro, Seyadê Şamedîn, Karapêtê Xaço, Reşîdê Baso, Mêmê Kurdo, Efoyê Esed, Egîdê Têcir, Memoyê Silo, Şibliya Çaçan, Egîdê Cimo, Aramê Tîkran, Silêmanê Mecid, Şêx Şamilê Beko, Xelîlê Evdillah, Ehmedê Mûsa, Xemoyê Hesên, Aslîka Qadir, Fatma Îsa, Mihemedê Mûsa, Şebabê Egît, Batalîkê Şîrîn, Şamilê Beko, Xelîlê Evdilê. Tevî wan kesan navê gelek dengbêjên din dikeve nav arşîva radyoyê.²⁰

Hingê weşanxana dewletê ya di Ermenîstanê de beşa Weşanên Kurdî tê vekirin. Di sala 1931ê de pirtûka edebî ya pêşin a Lazo hate weşandin.²¹ Xebatên kurdî yê çandî û wêjeyî her roj bi piştevaniya hikumeta Ermenîstanê zêde dibûn.

Sala 1932an Heciyê Cindî şanoya xwe ya bi navê *Qutya dû Dermana* çap dike. Sala 1935an bi pirtûkên cuda Ahmedê Mirazî şanoya *Zemanê Çûyî*, ya Wezîrê Nadîrî *Reva Jinê*, romana E. Şemo *Şivanê Kurmanca*, berhevoka helbesta ya E. Şero *Biriqandina Ewlîn*, berhevoka helbestan ya Wezîrê Nadîrî bi navê *Nûbar* tê weşandin. Sala 1936an romana E. Şemo *Kurdê Elegezê* û berhevoka zargotina kurdan ya bi navê *Folklor Kurmanca* ya Heciyê Cindî û Emînê Evdal tên weşandin.²²

Di sala 1934an de li Erîvanê Konferansa Kurdzaniyê ya Temamiya Yekîtiya Sovyetiyê destpê dike. Ji bilî zanyarên kurdan, bi giranî zimanzan û edebiyatzanê biyanî, mirovên ji serokati û rêveberiya Ermenîstanê jî beşdarî vê konferansê dibin.²³ Ev konferans li ser pirsgerêkên kurdan yê aborî, çandî, rêziman, alfabeya kurdî û hwd. tê kirin.

Dîsa di wê demê de ji bo xwendina zanîngehê xwendekarên kurd dişînin Lenîngardê. Qanadê Kurdo yek ji wan xwendekaran e.

¹⁹ Gultekîn N. "Qonaxa rewşenbîriya zimanê Kurdî: Radyoya Yêrîvanê", Kovara *Nûbihar*, j.126, Zivistan 2014, r.27.

²⁰ h. b., r. 30.

²¹ Boyîk E., "Nihêrîna Kurdên Sovyetê", h. b., r.96.

²² Boyîk E., h. b., r. 97.

²³ Eşo W., "Konferansa Kurdzaniyê ya Yekemin li Yêrîvanê", Kovara *Nûbihar*, j.126, Zivistan 2014, r.6,7.

Cudahiya dema yekem ji herdu demên din ew e ku hikumeta Sovyetê giringî dide xwendin û perwerdekirina kêmeteweyan. Derfet gelek in lê kadroyê zana kêmet in. Yên heyî jî ne hakimê zimanê dê ne. Agahiya wan derbarê çand û diroka wan de tune ye. Lewma berhemên wê demê ji aliyê ziman, naverok û estetîkê ve qels in. Lê belê ji bo xebatên dehatûyê bingeh hate danîn. Civaka kurd jî tama xwendin û pêşketinê hesabû.²⁴

Li gorî Eskerê Boyîk, dema duyem ji 1937an destpê dike û 1955an diqede. Di sala 1937an de Sovyet bi seranserî dikeve bin rejima dîktatorî ya Stalîn. Li gorî daneyên dîrokî li Sovyetê di navbera salên 1937-1938an de bi qasî 690.000 mirov tên kuştin.²⁵

Li vê serdemê sazî û dezgehên kurdan yê çandî tên girtin. Çapa pirtûkan tên rawestandî. Weşanên rojnameya *Riya Teze* û ya Radyoya Erîvanê tên sekinandin. Nivîskar û rewşenbîrên kurdan yê wek Heciyê Cindî, Cerdoyê Genco û Ahmedê Mîrazî tên binçavkirin, Erebe Şemo jî sirgûnê Sîbîrê dikin. Hemû jî bi dij-sosyalizmê ve tên tawanbarkirin.

Di vê serdemê de di warê çandî de kêmet xebat tên kirin, lê di sala 1937an de bi qirara hikumata Ermenîstanê, li gundê kurdên êzidî yê Elegezê Şanogeha Kurdan ya dewletê tê damezirandin.²⁶ Nivîskar û şanogerên ermen li gorî zargotin û jiyana kurdan gelek şanoyan bo vê şanogehê amade dikin. Hinek ji wan ew in: *Keça Mîrekê*, *Ker û Kulik* û *Heso* ya S. Gênosyan ê, *Xuliqandina Rojê* ya S. Kojoyan, *Kenerê Elegezê* ya V. Şoxêryan *Nêçîra Lalvarê* ya V. Manvêlyan û hinekên din.²⁷ Helbet di vê şanogehê de senaryoyê kurdan jî tên lîstin û ew şano bi salan di hişê mîletê kurd de dimîne. *Lur De Lur* ya serokê şanoya ewilîn Celatê Koto ye, *Mîraz* ya Heciyê Cindî, *Xuşka Doxdiryê* û *Bira* yê Cerdoyê Genco ye. Di salên şer de C. Genco serokatiya vê şanogehê dike.²⁸ Ev şanoya kurdan di sala 1947an de tê girtin.

Di salên şerê cihanê yê duyemîn de bi biryarekê ve hemû tîpên cuda wergerandine ser tîpên kirilî. Ev biryar, çapxaneyên kurdan dide sekinandin. Heciyê Cindî, di vî warê de ser elifbaya kurdî dixebite û li gorî tîpên kirilî elifbayeke nû

²⁴ Boyîk E. *Çanda Kurdên Sovyetê*, r.15.

²⁵ Aslanoglu M., "20. Yüzyılda Rusya'da Nasıl Bir Komünist Vahşet Yaşandı", mertaslanoglu.blogspot.com, 20/08/2018., 21.20.

²⁶ Boyîk E., (2004), *Nûra Elegezê*, weş. Dengê Êzdiyan, r. 102.

²⁷ h.b., r.106.

²⁸ Boyîk E. *Çanda Kurdên Sovyetê*, r.17.

çêdike. Alfabeya Heciyê Cindî di sala 1944an de ji aliyê Cîgirê Komîserê RŞS Ermenîstanê yê Ronîkirinê yê Gelêrî ve tê pejirandin û ev alfabe sala 1946an de tê çapkirin.²⁹

Di serdema duyem de kurd di warê çand û edebiyatê de nikarin xebatên berbiçav bikin, ji ber ku zanyarên wan têne girtin û sirgûnkirin, yên mayî jî li ber zulma Stalîn nekarîne tiştekî bikin. Ev rewş heta mirina Stalîn berdewam dike, piştî mirina Stalîn kurd cardî doza heqên xwe yên çandî dikin.

Para sêyem, ji sala 55an destpê dike û hê jî berdewam e. Kurd, piştî mirina Stalîn heqên xwe yên salê 30î cardî bi dest dixin. Jixwe kadroyekê amade hebû, kurdên ku xwendin û nivîsînê dizanîn jî zêde bibûn. Ji ber van sedeman, saziyên çandî di wextekê kurt de dest bi xebatê dikin.

Li gorî Temûrê Xelîl, hikûmeta Sovyetê ji ber du sedeman wan heqan dide kurdan. Sedema mezin ew e ku, kurd bi piştgiriya rejîma komunîzmê bikin, sedema din jî bi heqdayîna kurdan ve dixwazin bidin nîşandan ka komunîzm çendî rejîmeke demokratîk e. Temûrê Xelîl, piştî mirina Stalîn rewşa kurdan wiha rave dike:

Heta nîveka salên 50î di hemû waran de ba me valahîyek çê bû. Tenê çend antolojiyên berhemên nivîskarên me bi nivfermî çap bûn. Piştî mirina Stalîn (sala 1953an). hate biryarkirinê ku piştgiriya gelên kêmjimar bikin bona ew ziman, çand û edebiyeta xwe pêşda bibin. Dewletê, Heciyê Cindî peywîrdar kir ku elfabaya kurdî ser hîmê tîpên kirilî çê bike. Bi wê elfabayê carek din dest bi weşana rojnameya "Riya Teze", pirtûkên ziman û edebiyata kurdî bona dibistanan, bi dehan pirtûkên edebî û zargotinê çap bûn. Wê salê radyoya kurdî jî dest bi karê xwe kir. Ji bo pêşketina vî karî biryar hate qebûlkirinê ku li Akademiyayên Ermenîstanê, Rûsiyayê, di Înstîtûtên Rojhilatzanîyê de beşên kurdzanîyê vekin, li çend zanîngehan welêt dest bi amadekirina kadroyên kurdzan (zimanzan, edebiyatzan, dîrokzan, êtnograf). bikin. Ulmê kurdzanîyê ewqas pêşda çû ku hewcedariya çapkirina ferhengên kurdî pêşda hat.³⁰

Di salên 1970î û 1980î de Gurcistan jî girîngî dide heqê kurdan û Tiflîs jî dibe yek ji navendên çanda kurdan. Li dibistanan şano, pol, komên muzîkê tên ava kirin, weşanên pirtûk û radyoyê tên kirin û di Yekîtiya Nivîskaran a Gurcistanê de beşa kurdî vedibe.³¹

²⁹ Cewarî F. H., (2008), *Heciyê Cindî Jiyan û Kar*, weş. Lîs, Îstanbul, r.85.

³⁰ Xelîl T., *Rewşa Zimanê kurdî li Komarên Sovyeta Berê û Niha*, <https://rojevakurd.com>, 11.09.2018., 18.30.

³¹ Omerxalî X., "Li Dewletên Sovyeta Berê Kurd bi Perspektîfa Dîrokî û Çandî", *Wêje û Rexne*, r.23.

Kurdan li Yekitiya Sovyetê di warê ziman û zargotina kurdî de xebatên akademîk kirine û zimanê xwe di xaka Sovyetan de dane pejirandin. Hê jî li ser folklorê kurdî xebatên herî zêde ji aliyê kurdên Sovyetê ve hatine kirin.

Ev xebatên folklorê, bala folklorên biyanî kêşane, helbet di vir de bandora piştgiriya saziyên dewletê jî gelek e. Lêkolîneriya zargotina kurdan li Rûsyayê li ser bingeheke rast destpê kiribû. Rûsyayê ne tenê bo çapkirina mînakên zargotina kurdî rê vekir, herwiha bû sedem ku ew li dinyayê belav bibe. Bi vî awayî zargotina kurdî bi zimanê fransî, elmanî, rûsî û ermenî jî da nasandin.³²

Em îro dibînin ku li Yekîtiya Sovyetê wêjeyê kurdî ya resen derketiye holê; roman, çîrok, bîranîn, şano, ceribandîn, rexne, helbest û pejrên bi vî rengî bi kurdî hatine nivîsandin. Piraniya wan berhemên ji kurdî bo zimanê rûsî, ermenî, ezerîkî, gurciyî, zimanên Ewropî hatine wergerandin. Em dibînin ku; nivîskarên kurd yê xwedî berhem li dora Erîvan û Tiflîsê xebatên xwe dimeşînin, ji bo pêşxistina wêjeya kurdî gelekî hewl didin. Li Erîvanê, Departmaneke Nivîskarên Kurd yê ku bi Yekîtiya Nivîskarên Ermenan ve girêdayî ye heye. Her sal gelek berhemên nivîskarên kurdan, wek antolojî an jî danehev têne weşandin. Nivîskarên ku di tevahiya wêjeya kurdî de berhem dane ew in: Erebe Şemo, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Wezîrê Nadîrî, Ahmedê Mirazî, Çerdoyê Genco, Heciyê Cindî, Eliyê Evdilrehman, Usivê Beko, Seyîdê Îbo, Simoyê Şemo, Eskerê Boyîk, Mikayilê Reşîd, Karlanê Çaçan, Miroyê Esed, Sima Semend, Ordîxanê Celîl, Xelîl Muradov, Ferîkê Usiv, Aramê Çaçan, Nado Mahmudav, Egitê Xudo, Babayê Keleş, Priskê Mahoyî, Emerîkê Serdar, Çerkezê Reş, Tital Muradov, Tosinê Reşîd, Torinê Osman, Hinara Tacdîn, Tîmûrê Xelîl, Ahmedê Gogê, Elîxanê Memê, Ezîzê Gerdenzerî, Rizaliyê Reşîd. Divê di vê xalê de em behsê wan nivîskarên kurd yê li Tiflîsa Paytexta Gurcîstanê mayî Baxçoyê Îsko, Şikoyê Hesên, Taharê Biro, Ezîzê Îsko, Çerdoyê Esed jî bikin. Ji wan nivîskaran Mikayilê Reşîd, Çerkezê Reş, Babayê Keleş, Egidê Xudo, Emerîkê Serdar li ser wêjeya kurdî xebatên cuda weşandin e.³³

Nivîskarên kurd yê Sovyeta berê; Erebe Şemo, Wezîrê Eşo, Heciyê Cindî, Eskerê Boyîk hwd. di cureya romanê de berhem dane û ew roman bi çend zimanan hatine wergerandin. Cureyên wek roman, çîrok û helbest xurtbûyina zimanekî dide nîşandan. Bi saya van cureyan wêjeya miletekî di nav milletê din de tê nasîn.

³² Celîl O., Celîl C., (1978), *Zargotina Kurda*, weş. Naûka, Moskova, r.27.

³³ Rohat, h.b. r.121,122.

Romanûsên kurd yê li Sovyetê bi şêwaz û teşeya xwe ve dikevin bin bandora edebiyata wan. Herwiha mijarên romanên wan li ser komunîzmê û rewşa civaka wan e. Di naveroka romanên wan de peyamên balkêş hene. Zülküf Ergün li ser bingeha romanên kurdê Qefqasê ji bo teşe û vegêrana wan deh fonksiyonan nîşan dide. Wan deh fonksiyonan wiha rêz dike: "*Zordariya axa û began, zordestiya roma reş, rev, xêrxwazî û dostaniya ermeniyar, qenciya rûsan, rizgarkeriya Şoreşa Bolşevîk, astengiya edetên xirab ên berê û dijîtiya wan, bicihkirina bernameya damezirandinê ya sosyalîst, beşdariya Şerê Weteniyê û folklorhezî.*"³⁴

Di romanên wan de belavkirina fikrên sosyalîst û wekhevîtiyê cihekê girîng digire. Romanûs dixwaze îspat bike ku sosyalîzm ji kapîtalîzmê baştir e.³⁵ Ji ber ku kapîtalîzm tevê hêzên feodal, nehiştine civak bi pêş ve biçê. Ew nivîskar bi saya serê sosyalîzmê ji nîrê bindestiyê rizgar bûne û bi hêsanî karîbûne xebatên xwe bikin. Bi vî awayî bi ser lehengên di berhemên xwe de propagandaya rejîma sosyalîzmê kirine.

Di romanên wan de folklorhezîya wan derdikeve pêş. Kelepûra civaka xwe bi hosteyî di bûyerên romanên xwe de bicih dikan. Vegotina xwe bi çîrok, kilam, gotinên pêşiyar, biwêj û destanan ve xurt dikan.

Heciyê Cindî jî di romana xwe ya bi navê *Hewarî* de bi berfirehî cih daye hêmanên folklorê kurdî. Herwiha ol û baweriyên êzidiyan, koçkirina wan, rola axa û şêxan ya li ser civakê bi bûyerên balkêş ve di romanê de hûnandiye.

Me di vê xebatê de xwest ku di romana *Hewarî* de ew hêmanên folklorîk yê hatî bikaranîn tesbît bikin û li gorî rêbazên xebatên folklorîk bisenifnîn û derpêş bikin ka ev roman ji bo çand û zargotina kurdî çendî girîng e.

³⁴ Ergün Z., "Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê", mukaddime.artuklu.edu.tr. 20. 10. 2018., 19:50.

³⁵ Ahmadzadeh H., "Di Romana Kurdî de Guherînên Şêweyî û Babetî", *Gotarên Konferansa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Hekariyê*, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011., r. 53.

1. HECIYÊ CINDÎ

Di bin vê serenavê de jiyana Heciyê Cindî û keseyatiya wî ya wêjeyî hatiye vekolandin û rêzbenda berhemên wî hatiyê dayîn.

1.1. Jiyana Wî

Heciyê Cindî sala 1908an li Emençayîra gundê Dîgora Qersê tê dinê. Qers wê demê heta şerê cîhanê yê yekem di nav sinorê Rusya yê de bû. Malbata wî êzidî ye û ji êla Sîpkanê ye. Êla Sîpkanê yên li Serhedê, di çavkaniyên dîrokî de sedsala 18an di bin Xanedaniya Erîvanê de bûne, dûre dikevin bin hukmê dewleta Îranê. Êla Sîpkanê, roleke berbiçav di dîroka heremê ya leşkerî û civakî de lîstiyê.³⁶ Navê diya wî Zozan, navê bavê wî Cindî ye, xwediyê du xwîşk û birayekî ye. Malbata Heciyê Cindî malbateke xizan e. Bavê wî bi paletî û rênçberiyê debara mala xwe dikir.³⁷ Heciyê Cindî hê di çar saliya xwe de diçe ber berxikan û ji bo karê malê arî dê û bavê xwe dike. Zarokatiya wî li Emançayirê derbas dibe. Sala 1918an di navbera Împaratoriya Rûsya û Osmaniyê de şer destpê dike, gundê Heciyê Cindî û tevî gundê din yên êzidiyan koç dikin. Di vê koçkirinê de dê, bav û xwîşka wî ya biçûk diçin ser dilovaniya xwe. Ew di emrê biçûk de bê dê û bav dimîne.

Hecî dibihîze ku Emrîkayê li Qersê sêwîxane vekiriyê. Li gel birayê xwe diçe wê sêwîxanê. Piştî demeke din apê wî, wî ji sêwîxanê direvîne. Lê hişê wî dimîne ser birayê wî. Cardî dixwaze biçe sêwîxanê lê ap û bapîrê wî destûr nadinê. Heta ku qeziyek tê serî li ba wan dimîne, Heciyê Cindî wiha qala wê qeziyê dike:

"Rojekê jî ez beyî dilê xwe çûme ber dêwêr, bi wê texmînê, wekî ecêbek ê bê serê min. Min li çolê fîşekêk dît, pê re lîst, bi kêra cêban a biçûk ve xwest serê fîşekê derxînim. Bû teqîn. Ji destên min ê çepê xwin kêşiya. Min dewar hişt, ez ber bi malê ve reviyam. Mêrê Kida xaltiya min, Hemîdê Husoyê ez hilgirtibûm, biribûm Nexweşxaneya Qersê. Li wê derê, ez dam xeberdanê, got bibêje, 'Yek, dudu, sisê...' Nizanim min çi qas got paşî bi ser hişê xwe de hatim, êdî destê min ê çepê ji zendê de tunebû. Hema ji nexweşxaneyê min cardî şandin sêwîxaneyê."³⁸

Heciyê Cindî li sêwîxanê li birayê xwe digere lê bi qirara rêveberiyê zarokên emir biçûk şandibûne sêwîxaneyêke din. Êdî car din jî birayê xwe nabîne.

³⁶ Boyîk E., *Êzdiyatî Fermanên Reş Mîrzîkê Zaza*, weş. Dengê Êzdiyan, Oldenburg, r.199.

³⁷ Sağnıç F. H., (1992), *Dîroka Wêjeya Kurdî*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbûl, Stenbûl, r.571.

³⁸ Cewarî F. H., *Heciyê Cindî Jiyana û Kar*, h.b., r.32,33.

Perwerdehiya sewîxanê bi zimanê ermenî bû û hemû zarokên sewîxanê bi ermenî diaxivîn, bi vî awayî gelekî zehmetiyan dikêşe. Hecî bi alikariya hevalên xwe di demeke kurt de hînê vî zimanê dibe.

Piştî xilaskirina dibistana heftsale, di sala 1929an de Xwendinxaneyê Gumriyê ya pedagojiyê jî xilas dike.³⁹ Herçend li ser zimanê ermenî serkeftî be jî dixwaze li ser çand û zimanê xwe bixebite. Piştî qedandina perwerdehiya xwe ew fresend dikeve destê wî. Ji aliyê Wezaretê Ermenîstanê ya Ronîkirinê dersên bi kurdî tê amadekirin û Heciyê Cindî jî beşdarî wan qursan dibe. Dersdarên wan qursan kesên alfabeya kurdî ya latînî çêkirî Î. Maragûlovê Mexîn û Bedîrxanê Tibîlîsî bûn.⁴⁰

Piştî qedandina qursan, Heciyê Cindî wek dersdarê zimanê kurdî diçe dibistana gundê Qundaxsazê û Camûşvana Mezin dersên zimanê kurdî dide. Li wir dest bi xebatên folklorîk dike. Ew li gundê Qudaxsazê bala xwe dide ser erf û edet, rabûn û rûniştina gelê xwe. Di wî gundî de , cara yekemîn çîrok, kilam, gilî û gotinên gundiyan dinivîsîne.⁴¹

Heciyê Cindî di sala 1930î de ji Beşa Zanîngeha Erîvanê ya Fîlolojiyê re tê qebûlîkirin û dibe yekem xwendekarê Ermenîstanê yê kurd. Di sala 1933an de zanîngehê xilas dike.⁴²

Salên 30î bi biryara Moskovayê li Komara Ermenîstanê ocaxên Kurdan ên çandî û xwendinê vedibin.⁴³ Ji her aliyê ve rewş bo kurdan xweştir dibe, kurdên li Ermenîstanê bo çand û zimanê xwe di wan saziyan de dixebitin.

Di 25ê adara 1930î de rojnameya *Riya Teze* tê çapkirin û Heciyê Cindî redaktoriya rojnameya *Riya Teze* dike û di vê rojnameyê de berhemên xwe dide çap kirin. Di salên 1955 û 1956an de jî ew di vê rojnameyê de wek katibê berpirsiyar kar dike.⁴⁴

Dîsa di sala 1930î de Radyoya Erîvanê dest bi weşana xwe dike. Heciyê Cindî dibe redaktorê radyoyê, hevîna wî Zeyneva Îvo jî dibe yekem spîkera radyoyê. Herdu bi hev re ji sala 1930î heta sala 1937an di radyoyê de dixebitin.⁴⁵

³⁹ h.b., r.34.

⁴⁰ Dîzmar A. K., *Danasîna Heciyê Cindî*, Kovar Folklorê Kurdî, j.2, Nîsan Gulan Hizîran, 2015, r.79.

⁴¹ Cewarî F. h.b r.36.

⁴² h.b., r.37.

⁴³ h.b., r.37.

⁴⁴ h.b., r.86.

⁴⁵ h.b., r.41.

Salên 30î ji bo Heciyê Cindî gelek salên berhemdar in, gund bi gund digere zargotina kurdan berhev dike û ji bo dibistanên kurdan pirtûkên zimanê amade dike. Di wan salan de gelek saziyên çandî yên kurdan vedibin. Li Erîvanê sala 1931ê Xwendinxaneyê Kurdî ya Pedagojîyê vedibe û Heciyê Cindî ji wê salê heta sala 1938an di wir de dersên zimanê kurdî dide.⁴⁶

Xebatên Heciyê Cindî yên bi vî rengî heta sala 1938an berdewam dikin. Sala 1937an Stalîn gelek kesan bi sebeba dijsovyetiyê-dijşoreşvaniyê binçav dike, hindekî ji wan sirgûn dike, hindekan jî dikuje. Heciyê Cindî, bihara sala 1938an ji aliyê KGB ve tê bincavkirin. Ev jî mîna yên din bi dij-şoreşvaniyê ve tê tawanbarkirin.

Têkiliya wî ya li gel Celadet Bedîrxan wek sebeba bincavkirina wî tê nîşandan. Celadet Bedîrxan, li Sûriyê û Lubnanê seroketiya Xoybûnê dikir. Lê Yekitiya Sovyetê, Xoybûn li dijberê xwe didît û wisa qebûl dikir ku ew, li gel daşnak û îngilîzan li dijî wan hevkarîyê dikin.⁴⁷

Gava kovara *Hawarê* dest bi weşanê dike, çend hejmarên *Riya Teze* û hindek pirtûkên kurdî yên li Erîvanê derketî ji wan re têne şandin. Di hejmera kovarê ya 8an de Celadet Bedîrxan bi nasnavê Herekol Azîzan di nivîsarekê de wiha qala vê meselê dike:⁴⁸

*"Rojnameyeke qurdmanci, bi herfên nû bi qurdmancîyeqe xwerû, li Revanê, di şiqleqî spehî û çeleng de derdiqeve. Vê paşiyê çend hejmarên wê gehiştê destê me. Çavên me pê biruhin bûn, dilê me pê şa û geş bû. Qurdmancên Rewanê ji rûjnamê pêve çend qiteb jî derxistine. Me sê car rû mijûlahiya xwe bi wan qirin. Ji nav rûpelên wan ên taze û têr bihna qulilqên çiyayê Elegez, bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav resmên wan de şal û şapiqê qurdmancî, xencer û pişt-xencerê qal û qaliqên me dihatin dîtin."*⁴⁹

Heciyê Cindî di dadgehê de têkiliya xwe ya li gel Celadet Bedîrxan wiha îtiraf dike:

"Çend caran min û Bedirxan ji bajarê Şamê (Sûri). name ji hev re dişandin. Min carekê dîsa kovara "Hawar" stand, di wê de nameya ku Bedirxan ji min û Cerdoyê Genco re şandibû hebû. Di nameyê de, Bedirxan hevî dikir elam bikin ka Kurdên Yekîtiya Sovyetê çawa dijîn, çi dibistanan hatine sazîkirin ji bo zarokên

⁴⁶ Dîzmar A. K., h.b., r.79.

⁴⁷ Cewarî Firîda H., (2009), *Folklorê Kurda*, weş. Lîmûş, Yêrêvan, r.23.

⁴⁸ Xelîl T., (2014), *Antolojiya 35 Helbestvan û Nivîskarên kurd ên Sovyeta Berê*, weş. Na, Îzmîr, r.130.

⁴⁹ Ezîzan H., *Rêya Teze, Kovara Hawar*, j.8, Îlon, 1932, Şam, r.2.

*Kurdan û tiştên mayîn. Wergera nameyê şandin ji Kommerkeziyê re û li wê derê biryar girtin, wekî em bersiva nameyê nedin!*⁵⁰

Bi van sebebên Heciyê Cindî salekê girtî dimîne û 18ê adara 1939an tê berdan. Lê ew zulm û zordariya di salekê de lê hatî kirin heta mirinê di hişê wî de dimîne. 18ê adarê wek rojbûna xwe qebûl dike.⁵¹

Di wê demê de ocaxên kurdan; radyo, rojname, têxnîkûm, beşa nivîskarên kurd û dibistanên kurdî têne girtin. Êdî zarokên kurd diçin dibistanê ermenan û bi zimanê ermenî perwerde dibin.⁵² Hingê tîpên latînî jî tê qedexekirin.

Heciyê Cindî, piştî ji hepsê derdikeve sê salan nikare li tu deran karekî bi dest bixe. Heciyê Cindî bo Fadêyêv telgrafekê dişeyne. Nivîskarê rûsan Alakseandir Fadêyêv serokê temamiya nivîskarên Yekîtiya Sovyetîstanê bû.⁵³ Piştî çend rojan Fadêyêv bersiva telgirafa wî dide: "Min Harûtyûyan re xeber daye ku gava ew vegehiya, dê alikariya we bike." Harûtyûnyan Serokê Partiya Komûnîst a Ermenîstana Sovyetê yê pêşîn bû.⁵⁴

Heciyê Cindî, bi saya Fadêyêv cardî dikeve ser kar. Di sala 1940î de, Heciyê Cindî teza xwe ya bi navê "*Kerr û Kulikê Silêmanê Silîvî*" diparêze û bi yekdemî navê doktorê zanista filolojîyê distîne, dibe doktorê kurd ê pêşîn.⁵⁵

Teza Heciyê Cindî wek pirtûk amade bû, lê alfabeya latînî hatibû qedexekirin. Li ser vê yekê, Heciyê Cindî li gorî dengê kurdî alfabeyeke bi kirilî amade dike û teza xwe bi vê alfabeyê çap dike. Alfabeya Heciyê Cindî di sala 1946an de tê çapkirin. Bi saya vê alfabeyê, zarokên kurd yê li Ermenîstan, Gurcistan û Asya Navînê hînê xwendin û nivîsandina kurdî dibin. Herwiha weşanxanên kurdî jî bi vê lfabeya kirilî dest bi çapê dikin.

Heciyê Cindî li ser xebatên akademîk, rêzimanê kurdî, pirtûkên dersan û berhevkirina zargotina kurdî, bi gotina hevsera wî rojê 16 seetan dixebite.

Heciyê Cindî, ji ber xebatên xwe yê pedagojî û zanyariyê di sala 1966an de layîqê navê profesoriyê dibe.⁵⁶

⁵⁰ Cewarî F., *Heciyê Cindî Jiyan û Kar*, h.b., r.68.

⁵¹ Reşîd T., Cewarî N., "Mirina Heciyê Cindî", *Kovara Hêvî*, j.7, Îstîtit Kurdên Parisê, Payîz, 1990, r.8.

⁵² Cewarî F. H., (2010), *Bîranînên Min*, weş. Lîmûş, Yêrêvan, r.26.

⁵³ h.b., r.26.

⁵⁴ Cewarî F. H., *Heciyê Cindî Jiyan û Kar*, h.b., r. 77,78.

⁵⁵ h.b., r. 80.

⁵⁶ h.b., r. 91.

Heciyê Cindî li gel Zeyneva Îvo dizewice û pênc keçên wî çêdibin. Gelekî qîmetê dide perwerdehiya wan û her pênc jî bi xwendina xwe ve tîn cihên mezin. Keça wî ya mezin Frîce, dibe doktorê zanistê. Frîde, dibe mamosta matematîkê û piştî salan li ser rêya bavê xwe diçe û pirtûkên dersan yên li ser zimanê amade dike. Zîna, li ser kîmyayê, Nazê jî li ser matematîkê perwerdehî dibîne. Nûrê doktorê zanîna hunermediyê ye. Herwiha Nûrê dide ser rêya bavê xwe û kilamên di nav kurdên Ermenîstanê de dide hev û wek pirtûk çap dike.

Heciyê Cindî, 1ê gulana 1990î di emrê 82an de diçe ser dilovaniya xwe.

Heciyê Cindî, yek ji bo cimeat xwe û yek jî bo zarokên xwe du wesiyetan dinivîsîne. Wesiyeta ku bo cimeta xwe nivîsiye:

"Cimeta min e hizkirî, ez deyndarê zimanê te, afrandîn û zargotina te bûme û bi helaliya şîrê diya xwe ji te re xebitîme, wekî deynê te li ser min nemîne. Gelo min ew deyn çî qas vegerandiye, ew jî bila Xwedê bizanibe.

Zehf ji te razî me... Xebatên xwe û pê re jî navê xwe ji te re dihêlim, ew jî, gelo wê bi kêrî te bê?

Nizanim, wext ê ya xwe bibêje!

Bi xatirê we!

Heciyê Cindî

25ê Nisanê sala 1990î, Yêrêvan" 57

Heciyê Cindî, heta mirinê hesreta welat û malbata xwe dikêşîne û di wesiyeta bo zarokên xwe hêlandî de em wê bi awayekê aşkera dibînin:

"Qîzên min ên delal!

"Xatiya min Kidê, xalên min Hesên, Ûsiv, wisa jî çend gundiyan me (yên gundê Emançayîrê, F. H.) li gundê Pampê hatine defînkirin. Pamp nêzîkî Elegezê, Poştê, Evdîbegê ye, li kû Şera xwişk, dê, bavê min, Zozana Îvo û Cindiyê Esed defînkirî ne. Lewma jî, ez dixwazim li wî gundî bême defînkirin." 58

Qîzên wî wesiyeta bavê xwe tînin cih û wî di goristana kurdan a li gundê Pampa de defîn dikin. Li ser kêla wî ew nivîsa Fêrikê Ûsiv cih digre.

"Egle be, pismam, ber vî mexberî:

⁵⁷ h. b., r.111.

⁵⁸ h. b., r.112.

Vira definî ye maqûlê milet-

Dewrêşê ulmê me yî ezberî,

*Serê pêse kin, pêşewitîyê merd."*⁵⁹

1.2. Keseyatiya Wî ya Wêjeyî

Zarokatiya Heciyê Cindî li zozanê Emençayîrê derbas dibe. Piştî şerê 1918an cardî jî Emençayîrê nabîne. Gava ku qala zarokatiya xwe dike wan rojan bi hesret û evînî bi bîr tîne: "*Li ser topa dinyayê cîhê lapî cinetî ji bo min, gundê min e, gundê Yemençayirê. Ez vî gundî, gundê zarotiya xwe, pir hez dikim...Min zû ve Yemençayir nedîtîye...Ez gelekî mukuriya vî gundî dikim. Ji min re bûye hesret û ev hesret nayê rokirinê li ser kaxiz"*⁶⁰

Di zarokatiya xwe de mehên havînê li zozanan li ber berxik û karan derbas dike, zivisitane jî li gel bavê xwe diçe odayên gundan û li wir guhdariya dengbêj û çîrokbêjan dike. "*Û her carê, gava ku ez bi bavê xwe re diçûme odayê, min bi seatan bi heweskariyeke mezin guh dida ser wan kilam û çîrokan. Û wan nimûneyê zargotinê li ser min tesîreke mezin dihiştin."*⁶¹

Ev tesîra zargotina kurdî hê ji wê çaxê dikeve binhişê wî. Lê jiyana wî ya li gund zêde berdevam nake, di nav Rûs û Osmanîyan de şer derdikeve, Hecî tevî malbat û gundiyên xwe koçber dibe. Dîmenên koçkirinê yek bi yek di hişê wî de dimînin. Piştî salan ew dîmenên; mirin, qirkirin û sirgûniyê dibin mijara romana wî ya bi navê *Hewarî*.

Di vê koçê de ji bilî birayê wî, tevahiya endamên malbata wî dimirin. Ew û birayê xwe dikevin sêwîxanê. Piştî du- sê mehan, apê wî tê û wî ji sêwîxanê direvîne. Li gundê apê xwe diçe ber dewaran, rojekê fişkekê li erdê dibîne û pê re dileyîze, fişenk di dest de diteqe û destê wî yê çepê jê dibe. Piştî vê bûyerê cardî wî dibin sêwîxanê.

Heciyê Cindî di zarokatiya xwe de her cureyê travmayê dijî; şer, koçberî, mirina dê, bav û xwîşkê, sêwîbûn û wendakirina endamekê bedena xwe. Ew bûyerên nerênî li ser dêrûniya wî bandoreke mezin çêdike. Cindî, gava li gel kesekî diaxive

⁵⁹ h. b., r.112.

⁶⁰ Cewarî Firîda H., *Folklorî Kurda*, h.b., r.6.

⁶¹ Cewarî F. H., *Heciyê Cindî Jîyan û Kar*, h.b., r. 23.

an jî fotografekê dikişê, destê xwe yê cepê dêxe berîka xwe an jî li pişt xwe vedişêre. Ev tevgera wî ji aliyê hinek kesan ve wek bêsiyanetî tê şîrovekirin.

Piştî perwerdehiya xwe ya sêwîxanê diqedîne di sala 1929an de diçe qursên demkurt û bi herfên latînî zimanê xwe hîn dibe. Piştî wan qursan diçe gundê Qûdaxsazê dibe mamoste. Jiyana wî ya wêjeyî ya li ser zargotina kurdan li vir destpê dike. Li wî gundî cardî rastê millet, kelepûr, kevneşopî û zargotina xwe tê. Guhdarî li dengbêj û çîrokbêjan dike û bi micidî her tiştî dîcevîne, qeyd dike û dinivîsîne.

Xebatên wî ne bi tenê li ser zargotinê ne, herwiha ji bo ciwanên kurd haydarê wêje û zimanên biyanî bibin, helbest û şanoyan werdigerîne ser zimanê kurdî. Hindek ji wan şanoyan li gundên kurdan tên leyîstin.

Xebatên xwe yê akademîk jî berdevam dike û di sala 1930î de ji Beşa Fîlolojiyê ya Zanîngeha Erîvanê re tê qebûlîkirin û dibe yekem xwendekarê kurd.

Salên 30î li Erîvanê ji bo kurdan saziyên çandî vedibin, Heciyê Cindî di hemû saziyan de dixebite. Ev hizra "*ez borçdarê gelê xwe me*" her dem di hişê wî de ye. Carinan bi tena serê xwe û carinan jî li gel nivîskarên kurd bêrawestan dixebite. Ev çalakkûyîna wî ji aliyê dewletê jî tê zanîn. Di sala 1934an de wek nûner pêşin beşdarî xebata kongreya Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê dibe. Li vir ew wek endamê serwertiya Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê û nûnerê kongreya Nivîskarên Yekîtiya Sovyêtistanê tê hilbijartin. Di heman salê de bi Hurmetnama Komara Ermenîstanê ve tê rewakirin.⁶²

Ji bo ku zargotina kurdan wenda nebe xebatên xwe diweşîne. Pirtûka ku wî û ya Emînê Ewdal bi hev re berhevkirî di sala 1936an de bi navê *Folklor Kurmanca* tê çap kirin. Ev berhem ji zargotina kurdan re dibe çavkaniyeke mezin. Heman salê *Kilamedê Cimeta Kurmanca* çap dike. Heciyê Cindî cudahiyê nayêxe nav xebatên xwe û her cureyên zargotina kurdî berhev dike. Ev berhemdariya wî heta sala 1938an berdevam dike. Wê salê li gel nivîskar, şanoger û şairên din yê kurd tê bincavkirin. Salekê di hepsê de dimîne û her cûreya îşkence û zulmê dibîne.

Ji ber bi rûspî ji destê wan xelas dibe, gava ji hepsê derdikeve gelekî şa dibe.

⁶² Cewarî F. H., *Bîranînên Mîn*, h.b., r.18,19.

"Ez pir ji xwe razîme, wekî sivte heta kutasiyê min şer ne avît xwe, ne jî heval-hogira, ne zêrandin û ne jî buxdana û ne jî etavên ku danîn serê min- nikarbûn min mecbûrkin, qewata rihê min qelskin(...)." ⁶³

Rast e ruhê wî qels nebibû lê ji bo cardî dest bi xebatên xwe bike li tu deran kar nedidît. Her roj serî li ciyekî dida lê destvala dizivirî. Wan rojên xwe yên tarî wiha rave dike :

"Ez di azadiyê de bûm, lê di meydana Kurdzaniyê de kesek nemabû, xalî bûbû. Tu kes bi Kurdzaniyê ve mijûl nedibû, ocaxên çandî, zanyarî, ku salên 30'yî vebûbûn, hatibûne dadan. Vê yekê ez pîrê eşandim û xemgîn kirim, ew derba sisiyan bû di pey derbên sêwîtiyê û zêrandin û girtinê re, ku ghişte min" ⁶⁴

Tu deran hedarê wî nedihat, ji ber ku sebra wî bi tenê bi xebatê dihat. Ew rewş heta ku li gel Aleksandir Fadêyêv pêwendî datîne sê salan berdewam dike. Bi navbenkariya Fadêyêvê ew di Înstîtûta Edebiyat û Zimên de tê ser karê xwe.

Bi bawerî û hêzeke mezin dest bi karê xwe dike. Di sala 1940î de teza xwe ya bi navê "*Kerr û Kulikê Silêmanê Silîvî*" diparêze û nasnavê doktora zanistî û filolojiyê digre.

Heciyê Cindî, sala 1946an, di nav Partiya Komûnîst de tê qebûlkirin. Di heman salê de bi medalyaya "*Ji Bo Xebata Efat Di Şerê Weteniyê yê Mezin De*" tê rewakirin. ⁶⁵

Heciyê Cindî, piştî alfabeya kurdî derdixe, di gelek saziyan de dersên ziman û wêjeyê dide. Li ser fêrkirina zimên pirtûkên dersan çap dike. Di nav kurdan û ermenan de dibe kurdekê navdar. Herwiha ji ber xebatên xwe yên pedagojî û zanyariyê di sala 1966an de dibe profesor.

Bi saya Heciyê Cindî li Zanîngeha Erîvanê, di Para Rojhilataniyê de, Para Kurdzaniyê vedibe, ew di navbera 1968an û 1974an de mamostetiya ziman, edebiyat û zargotina kurdî dike. ⁶⁶

Bi biyara Sedirtiya Şêwra RŞS Ermenistanê ya bilind, di sala 1974'an de hêjayî navê "Karkirê Ermenîsatê yê Zanyariyê yê Kedkar" hatiye dîtin. ⁶⁷

Dîsa di sala 1979an de wekî endamê-meqaledarê Akademiya Îraqê ya Zanyarî tê hilbijartin. ⁶⁸

⁶³ h.b., r.24.

⁶⁴ Cewarî F. H., *Heciyê Cindî Jiyan û Kar*, h.b., r.76.

⁶⁵ h.b., r.83.

⁶⁶ h.b., r.92.

⁶⁷ h.b., r.92.

Ji bo kedên xwe yên bêhempa bi gelek medalya û nîşanan ve tê rewakirin. Wan medalya û nîşanan mirov dikare wiha rêz bike:

Sala 1955an *Ordêna(nîşana)*. *Hurmetê*.

Ji bo 70 saliya ji dayîkbûna wî, *Ordêna Dostaniya Gelan Hurmetnameya Akademiya RSŞ Ermenîstanê ya Zanyariyê*.

Salên 1975an û 1985an ji bo 30 û 40 saliyên altindariya Şerê Weteniyê yê mezin medalyaya *Hobêlyaniyê*.

Sala 1986an, xelata rojnameya *Riya Teze* ya taybet Ji Bo *Wergerandina Edebiyata Ermeniyên Bo Kurdî*.

Sala 1988an, Heciyê Cindî bi *Hurmetnameya Sedirtiya Şewra RSŞ Ermenîstanê ya Bilind*.

Sala 1985an bûye endamê- hîmdarê rûmetî yê Estîtûya Kurdî ya Parîsê.⁶⁹

Divê mirov bi tenê behsê xebatên Heciyê Cindî yên akademîk neke. Ew ji bilî wan xebatan, mirovekê gelekî xêrxwaz û mirovhez bû. Rêberî li ciwanên kurdan kiriye. Ji bo perwerdahiya xwe bidomînin alîkarî li kesên desteng kiriye. Dostê wî Aram Xanalanyan derheqê Cindî de wiha dibêje "*Heciyê Cindî weke quweta xwe hewl daye ku bi kêrî mirovan bê... Pareke filologên (û ne ku bi tenê filolog). Kurd ên silsileta navsere û xortên îroyîn, bi gotina cimaetê, bi saya serî wî bûne meriv*"⁷⁰

Heciyê Cindî ne bi tenê ji aliyê kurdan herwiha ji aliyê ermanan ve jî mirovekê hezkirî û qedirbilind bû. Sargîs Harûtyan di nivîsekê xwe de wî wek miletiyê xwe dibîne û sedema vê jî wiha rave dike:

*"Wî jî qedera biraderên xweye ermenî pareve kirye (cîhilbûn, mihacirî, Ermenistana Sovêtê, emrê sêwîtiya dijwer li Gumuryê), xwendina ermenkî standye ji zimanê wî yî dayîkêyî duda ermenkî bûye. Xwendin, perwerde, qalbûn û kamil bûna xweye zanyarî li ocaxên ermenîzaniyê da hildaye, bi xem-xiyal, dijweriyên ermenîzaniyê jîyaye, usane ermenî û ermenîbûn ji pey kurd û kurdîtiyê ra jêra bûyê hemêza dayîka duda, amin, dilovan, bi hizkim,. Ji ber wê jî tiştê ecêvmayîne nîne, ku wî gelek ji xebat û lêkolînên xweye zargotinê bi ermenkî nivîsîne û nimûnên zargotinêye berevkirî jî wergerandiye ermenkî û weşendiye."*⁷¹

Heciyê Cindî ji aliyê ermenan ve wekî bira û ewlad hatiye pejirandin. Hovhanês Şîraz ev helbest diyariyê Heciyê Cindî kirye:

⁶⁸ h.b., r.94.

⁶⁹ h. b., r. 94,95.

⁷⁰ h.b., r. 97.

⁷¹ Cewarî F. H., *Folkloro Kurda*, h.b., r. 20.

"Ruhê xalîse Heciyê Cindî,
Pira zêrîne nav me û wana,
Kurd Abovyane Heciyê Cindî,
Nûra nemire, zêndiyê zemana."⁷²

Bavê zargotina kurdî 82 salan emir dike. Maqale, roman, çîrok, werger, lêgerîn û berhemên cûr bi cûr nivîsiye, di jiyana xwe de gelek bûyerên nerînê hatiye serî û dîsa jî tu caran dev ji xebatên xwe bernedaye. Lê gulana 1990î de diçe ser dilovaniya xwe. Gotinên xwe yê dawiyê ji Nazêya keça xwe re dibêje " *Xewa min tê, ez ê razê... Qurbana te bim, min hişyar nekî*"⁷³

1.3. Berhemên Wî

Heciyê Cindî bi folklornasiya xwe ve tê nasîn. Lê wî di her cureyên wêjeyê de berhem dane. Helbestên wî di rojnameya *Riya Teze* de hatine çapkirin. Dîsa çîrokên wî bi navê *Siva Teze* wek berhevoka serpêhatiyên, di sala 1947an de li Erîvanê hatiye weşandin.⁷⁴

Şanoyên ku wî nivîsandî di şanogehan de hatine lîstin. Hê di sala 1932an de piyesa wî *Qutya Dû Dermana* hate weşandin, piyesa wî *Miraz* li şanogeha Elegezê ya kurdî ya dewletê de tê lîstin.⁷⁵

Me xebatên Heciyê Cindî yê din ji pirtûka "*Jiyan û Kar*" ya ku li ser jiyana wî hatiye nivîsandin wergirt û li jêr di bin serenavan de senifand.

1.3.1. Folklornasî

Xebatên Heciyê Cindî yê herî zêde li ser folklorê ne, nemaze li ser zargotina kurdan e. Gava ji bo mamostetiyê diçe gundê Qundaxsazê dest bi berhevkirina çîrok, kilam, serpêhatî, stran û tiştên bi vî rengî dike. Piştî salan wan xebatên xwe çap dike. Ew berhem ji bo lîteratûra zargotina kurdan dibin çavkaniyên mezin.

Di nav wan berheman de yê navdar *Folklor Kurmanca* ne. Ev xebat ji aliyê zanyar û folklornasan ve hatiye pesinandin, gava vê berhemê didin Qazî Muhemed

⁷² h.b., r.22.

⁷³ Cewarî F. H., *Heciyê Cindî Jiyan û Kar*, h.b, r.109.

⁷⁴ h.b., r.216.

⁷⁵ Eşo W. "Heciyê Cindî 100 Salî ye", *diyarname.com.*, 20/09/2018 ., 21.30.

ew jî vê radike jor û dibê *'Aha ev e Qurana me.*⁷⁶ Ev berhem di sala 1936an de li bajarê Erîvanê hatiye weşandin. Heciyê Cindî vê xebatê li gel Emînê Evdal amade dike. Ev berhevok 650 rûpel e, 570 rûpelên wê yên Heciyê Cindî ne, 80 rûpelê wê jî yên Emînê Evdal in.⁷⁷

Di vê berhevokê da 30 şaxên destana Kerr û Kulik, 37 şaxên destanên Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Memê û Eysê, Zembîlfiroş, Leyl û Meclûm, Dewrêşê Evdî, Dimdim û yên mayî, 172 kilamên evîniyê, 66 afirandinên gelêrî yên ji bo zarokan, 41 kilamên govendê, 25 çîrokên di nav gel de, kilamên Evdalê Zeynikê, afirandinên Feqiyê Teyran ku bi zarkî di nav gel de hatine gotin, berhevkirine û weşandine.⁷⁸

Yek ji berhemên wî yên girîng jî *Hikayetêd Cimeata Kurda* ne. Wekî yên din ev berhem jî di nav miletê de hatiye berhevkin. Di navbera 1961ê û 1990î de 6 bergên vê berhemê derdikevin. Her şeş berg li ser hev nêzîkê du hezar rûpelan in. Di her şeş bergan de nêzîkê 240 çîrok û serpêhatiyan hene.

Xebatên wî yên li ser zargotina kurdan ên din jî ew in:

1. *Kilamêd Cimeta Kurmanca* (tekstnivîsîn Heciyê Cindî, deng nivîsandin û pêşgotin yên Karo Zakaryan), Yêrêvan, 936.

2. *Weten*, 10 kilam bi zimanê Kurmancî (tevî S. Gasparyan), rotoprînt, sala 1947an Ewledêt Weten, berhevoka kilamên Kurdan ên Sovyetê (tevî S. Gasparyan), rotoprînt, Yêrêvan, 1943.

3. *Folklora Kurdî*, pêşgotin, tekst, nivîsnasî (bi zimanê Ermenî), Yêrêvan, 1947.

4. *Çîrokên Cimeta Kurdan* (bi zimanê Ermenî), Yêrêvan, 1952.

5. *Şaxêd Êposa "Koroxlî" ye Kurdî*, pêşgotin, tekst, nivîsnasî pêşgotin, nivîsnasî bi zimanê Ermenî), Yêrêvan, 1953.

6. *Memê û Zînê*, beyt û serhatiya civaka Kurd, pêşxeber, tekst, nivîsnasî (bi zimanê Ermenî), Yêrêvan, 1956.

7. *Folklora Kurmanciyê*, Yêrêvan, 1957.

8. *Hikayetêd Cimeta Kurda*, Yêrêvan, 1959.

⁷⁶ Sağnıç F. h.b., r. 572.

⁷⁷ Cindî H., Evdal Emîne., (2008), *Folklora Kurmanca*, weş. Avesta, Stenbûl, r.32.

⁷⁸ h.b., r.32.

9. *Beyt û Serhatiyên Civaka Kurd* (bi zimanê Ermenî), Yêrêvan, 1960.
10. *Beyt- Serhatyê Kurdan ye Êpîkyê*, pêşgotin, tekst, nivîsnasî (pêşgotin, nivîsnasî bi zimanê Êrisî, tekst bi zimanê Êrisî-Kurdî), Moskova, 1962.
11. *Kilamêd Cimeta Kurda ye Lîrîkyê*, pêşgotin, tekst, nivîsnasî, (pêşgotin bi zimanê Kurdî- Ermenî), Yêrêvan, 1972.
12. *Şaxêd Êposa "Rostemê Zal" e Kurdî*, pêşgotin, tekst, nivîsnasî (pêşgotin bi zimanê Êrisî), Yêrêvan, 1977.
13. *Hikayetên Cimaete Kurdan* (bi zimanê Êrisî), Yêrêvan, 1985.
14. *Meselok û Xeberokêd Cimeta Kurda*, pêşgotin, tekst û nivîsnasî, Yêrêvan, 1985.
15. *Bahar*, berhevoka zargotinê, Yêrêvan, 1988.
16. *Hikayetên Gelê Kurd*, Swêd, 1998.
17. *Ûsiv û Zelîxe*, beyt-serhatî, pêşgotin, nivîsnasî û bernivîsên tekstan (bi 10 varyantan-şaxan), Yêrêvan, 2003.
18. *Dimdim*, beyt-serhatî, pêşgotin, nivîsnasî û bernivîsên tekstan (bi 13 varyantan-şaxan), Yêrêvan, 2005.
19. *Şaxên Destana "Rustemê Zal" e bi Kurdî*, bernivîsa 19 şaxên nû, pêşgotin, nivîsnasî, Duhok, 2006.
20. *Kilamêd Cimeta Kurda*, Yêrêvan, 2008.
21. *Karxezal* (Hikayetên Cimaeta Kurdan, veçêkîrî bi zimanê Ermenî), Yêrêvan, 1982.

1.3.2. Xebatê Wî yê li ser Zimanê

Rejîma Stalîn gava tîpên miletîyên din qedexê dike, Heciyê Cindî alfabeya latînî li gorî dengsaziya kurdî werdigerîne ser tîpên kirîlî. Herwiha weşanxanên kurdan jî piştî vê alfabeyê dest bi çapên xwe dikin. Heciyê Cindî, di saziyên kurdan û zanîngehan de dersên filolojiyê dide. Ew hem li ser fêrkirina dersan hem jî li ser rêzimanê kurdî pirtûkan çap dike.

Pirtûk û xebatên wî yê li ser zimanê:

1. *Metoda Zimanê Kurmancî*, ji bo xwendxaneyên dereceya ewilîn, Yêrêvan, 1932. *Xebernameya Fileyî- Kurmancî* (Tevî hevalan), Yêrêvan, 1933.

2. *Rêzimana Kurmancî*, ji bo dibistanên navînî (Tevî Prof. A. Xaçatiryan), Yêrêvan, 1935.
3. *Xebernameya Termînolojiyê*, Ermekî- Kurmancî (Tevî Prof. A. Xaçartiyân), Yêrêvan, 1936.
4. *Programa Zimanê Kurmancî*, ji bo dersxaneyên 1-4 (Tevî Emînê Evdal), Yêrêvan, 1936.
5. *Programa Zimanê Kurmancî*, ji bo dibistanên navînî (Tevî Emînê Evdal), Yêrêvan, 1936.
6. *Programa Zimanê Kurmancî*, ji bo dersxaneyên 5-7 (Tevî Emînê Evdal), Yêrêvan, 1953.
7. *Programa Zimanê Kurmancî*, ji bo dersxaneyên 2-4 (Tevî Emînê Evdal), Yêrêvan, 1953.
8. *Beyreqa Sor*, ji bo koma ewilîn, Yêrêvan, 1932.
9. *Dinyaya Teze*, pirtûka zimanê Kurmancî ji bo koma 5-6-7, Yêrêvan, 1932.
10. *Emrê Teze*, ji bo koma II, Yêrêvan, 1932.
11. *Beyraqa Sor*, elifba ji bo koma ewilîn, Yêrêvan, 1933.
12. *Kolxoznikê Derbdar*, elifba ji bo mezinan, Yêrêvan, 1933.
13. *Kitêba Zimanê Kurmancî*, elifba, Yêrêvan, 1934.
14. *Elifba Ji bo Koma Ewilîn*, Yêrêvan, 1935.
15. *Kitêba Zimanê Kurmancî Ji Bo Mezinan*, Yêrêvan, 1934.
16. *Kitêba Zimanê Kurmancî Ji Bo Sala 2an*, Yêrêvan, 1934.
17. *Kitêba Zimanê Kurmancî Ji Bo Dersxaneya 6an* (tevî hevalan), Yêrêvan, 1935.
18. *Elifba Ji Bo Mezinan*, Yêrêvan, 1936.
19. *Kitêba Zimanê Kurmancî*, Yêrêvan, 1937.
20. *Kitêba Zimanê Kurmancî Ji Bo Dersxaneya 7an*, Yêrêvan, 1937.
21. *Elifba û Kitêba Xwendinê Bona Sala Pêşîn*, Yêrêvan, 1937.
22. *Elifba*, Yêrêvan, 1946, veçêkirin çap bûye salên 1951, 1954an.
23. *Elifba*, tevî Firîda Cewariyê, Yêrêvan, veçêkirin çap bûne salên 1957, 1961, 1966, 1974, 1982an.
24. *Kitêba Zimanê Kurmancî*, ji bo koma 3an, Yêrêvan, 1933.
25. *Berhevoka Efrandina Ewlîn*, Yêrêvan, 1932 .

26. *Zimanê Dê*, ji bo dersxaneyê 3an, Yêrêvan, veçêkirî çap bûne salên 1948, 1952, 1955, 1958, 1961, 1970, 1976, 1987an.

1.3.3. Wergerên Wî

Heciyê Cindî ji bilî kurdiyê bi zimanê rûsî, ermenî û ezerî jî baş dizaniya. Ji bo geşedana zimanê kurdî çî ji destê wî hatiye xwe jê nekêşaye, ji bo xwendakarên kurd; berhemên mîna çîrok, piyes, pirtûkên li ser tendurîstî, matematîk û teşeyên cûr bi cûr ji zimanên din wergerandine. Bi piranî berhemên zimanê ermenî wergerandine.

1. *Çîroka Casîmê Kurd*, Lazo (Hakop Gazaryan), (tevî Emînê Evdal), Yêrêvan, 1931.
2. *Gîkor*, H. Tûmanyân, çîrok, 1933.
3. *Girr*, A. Xazaryan, Yêrêvan, 1933.
4. *Traxoma*, A. Navasardiyân, Yêrêvan, 1933.
5. *Matematîka*, ji bo koma sala ewilîn, A. Şavarşyan, Yêrêvan, 1933.
6. *Silemetiya Jina*, P. Margaryan, Yêrêvan, 1934.
7. *Riya Teze*, piyes (şano), H. Şalciyan, Yêrêvan, 1934.
8. *Memê û Eyşê*, H. Sîras, Yêrêvan, 1935.
9. *Ser Riya Dewlemendiyê*, piyes, H. Şalciyan, Yêrêvan, 1935.
10. *Xecê*, Hiraçya Koçar, çîrok, Yêrêvan, 1935.
11. *Nivîskarê Ermeniya ye Sovyetiyê*, anyolojî, Yêrêvan, 1936.
12. *Emoyê Kurd*, Avetîk Îshakyan, berhevoka çîrokan, Yêrêvan, 1955.
13. *Destegul*, nivîskarên Ermeniyân der heqa Kurdan de, Yêrêvan, 1963.
14. *Sayat- Nova*, berhevoka wergeran, tevî Fêrîk Ûsiv, Yêrêvan, 1963.
15. *Bahara Dila*, ji berhemên nivîskarê cuda cuda, Yêrêvan, 1978.

Heciyê Cindî di salên 1940î de ji bo Şanogeha Kurdan a gundê Elegezê 15 piyesên nivîskarên ermenan wergerandiye ser zimanê kurdî.

1.3.4. Lêgerîn û Xebatên Wî yên Cûr bi Cûr

Wî lêgerînên xwe bi piranî bi ermenî nivîsandiye.

1. *Edebiyata Kurdî ya Ermenîstana Sovyetê*, lêgerîn (bi zimanê Ermenî), Yêrêvan, 1954 (215).
2. *Diyarbûna Dostaniya Kurdan û Ermeniyayê Di Nava Zargotinê De*, lêgerîn (bi zimanê Ermenî), Yêrêvan, 1965.
3. *Gotara Edebiyata Kurdan a Ermenîstana Sovyetê*, lêgerîn bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 1970.
4. *Di almanaxên Nivîskarê Kurd ên Sovyetê û Bahara Teze de*, Yêrêvan, 1982, 1983, 1984, 1985, 1986, 1987, 1988.
5. *Di antolojiya Nivîskarên Kurd ên Sovyetê de*, Yêrêvan, 1936.
6. *Di berhevoka Şairên Kurd ên Sovyetê de*, werger bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 1953.
6. *Di berhevoka Şairên Kurd ên Sovyetiyê de*, werger bi zimanê Îrisî, Yêrêvan, 1956.

1.3.5. Gotarên Wî

Gelek gotarên Heciyê Cindî di kovar û rojnameyan de tene çapkirin. Rêzbenda gotarên wî yên herî zêde tene zanîn ew in:

1. *Guhdariya Mezin Li Ser Xebatên Kûltûrê û Xwendinê*, rojnameya *Xorhirdayîn Hayastan*, Ermenîstana Sovyetê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 27. 03. 1932.
2. *Edebiyata Kurdan a Sovyetê*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya Edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 20. 10. 1933.
3. *Pionêrê (Pêşengê, t. Ed.). Sazbendiya Kurdan a Sovyetê, der heqa S. Gasparyan de*, kovara *Sovêtekan Arvêst* (Hunermendiya Sovyetê), bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 3, 1935.
4. *Stranên Kurdan ên Mektebiyê*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 1. 11. 1936.
5. *Der Heqa Aşiqên Kurdan De*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 18. 2. 1937.
6. *Dawûdê Sasûnê (Der Heqa Mêrxasê Eposa Ermeniyayê De)*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 30. 8. 1939.

7. *Motîvên Mêrxasiyê û Welathêziyê Di Nava Zargotina Kurdan De*, kovara *Têxekagîr a Armfanê*, daxûyaniya Akademiya Zanyariyê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 5, 1942.
8. *N. Marr û Kurdzanî*, kovara *Xebatê Qursiya Li Ser Navê Marr a Zankoya Yêrêvanê ya Dewletê*, Yêrêvan, hejmar 3, 1948.
9. *Abovyan û Cimaeta Kurdan*, kovara *Sovêtekan Grakanûtyûn Yêv Arvêst* (Edebiyat û Hunermendiya Sovyetê), bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 9, 1948.
10. *Abovyan Der Heqa Zargotina Kurdan De*, rojnameya *Sovêt Ermenîstanî* (Ermenîstana Sovyetê), bi zimanê Ezerî, Yêrêvan, 23. 7. 1948.
11. *Pûşkîn Di Nava Edebiyata Kurdî De*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 31. 5. 1949.
12. *Komîtas û Sazbendiya Kurdan*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 2. 10. 1949.
13. *Cimaeta Hişyarbûyî*, rojnameya *Izvéstiya*, nûçe, bi zimanê Êrisî, Moskova, 5. 12. 1950.
14. *Bipêşdeçûyîna Kurdan Li Ermenîstana Sovyetê*, rojnameya *Sovêtekan Hayastan* (Ermenîstana Sovyetê), bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 7. 12. 1950.
15. *Edebiyata Kurdan a Sovyetê*, kovara *Sovêtekan Girakanûtyûn Yêv Arvêst* (Edebiyat û Hunermendiya Sovyetê), bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 12, 1950.
16. *Tûmanyane Me (Der Heqa Nivîzkarê Ermeniyên ê Navdar Hovhannês Tûmanyane De)*, rojnameya *Sovêt Ermenîstanî* (Ermenîstana Sovyetê), bi zimanê Ezerî, Yêrêvan, 11. 4. 1953.
17. *Edebiyata Kurdan a Wergerandina Sovyetê*, kovara *Sovêtekan Grakanûtyûn* (Edebiyata Sovyetê), bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 11, 1951.
18. *Folklor a Kurdan a Sovyetê*, kovara *Lirabêr*, Zanistiyên Civakî ya Akademiya Ermenîstanê ya Zanyariyê, nûçe, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 10, 1951.

19. *L. N. Tolstoy Der Heqa Kurdan De û Di Nava Edebiyata Kurdî De*, kovara *Têxêkagîr a Akademiya Ermenîstanê ya Zanyariyê*, daxuyanî, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 10, 1953.
20. *Ji Dîroka Dibistanên Kurdî*, kovara *Sovêtekan Mankavarj* (Mamosteyê Sovyetê), bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 3, 1953.
21. *Der Heqa Edebiyata Kurdî De*, kovara *Lîtêratûryana Armaniya* (Ermenîstana Edebiyatê), bi zimanê Êrisî, Yêrêvan, hejmar 6, 1960.
22. *Kurdzanî Li Ermenîstana Sovyetê*, kovara *Patmabanasîrakan Handês a Akademiya Ermenîstanê ya Zanyariyê*, kovara *Dîrok û Fîlolojiyê*, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 2, 1960.
23. *Tûmanyayn Der Heqa Kurdan De û Di Nava Edebiyata Kurdî De*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 31. 4. 1961.
24. *Herfên Mêsropî û Kûltûra Gelê Kurd*, kovara *Têxêkagîr a Akademiya Ermenîstanê ya Zanyariyê*, daxuyanî, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 5, 1962.
25. *Berhemên Sayat- Nova Bi Zimanê Kurdî*, kovara *Sovêtakan Grakanûtyûn* (Edebiyata Sovyetê), bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, hejmar 10, 1963.
26. *Yêrêvan; Navenda Çanda Kurdî*, rojnameya *Yêrêkoyan Yêrêvan* (Yêrêvana Êvarê), bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 22. 4. 1970.
27. *Temiyên Gorkî, Axaftina Delegeyê Kongreya Yekîtiya Nivîskarên Sovyetê ya Sala 1934an*, rojnameya *Komûnîst*, bi zimanê Êrisî, Yêrêvan, 28. 8. 1974.
28. *Der Heqa Şaxê "Rustemê Zal" ên bi Kurdî de*, berhevoka *Kurdzanî ya akademiya Ermenîstanê ya Zanyariyê*, Yêrêvan, 1975.
29. *Shakespeare û Kurdayetî*, berhevoka *Şêkspîrakan a Akademiya Ermenîstanê ya Zanyariyê* (Şekspîrî), bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, cild 5, 1975.
30. *Dostê Çanda Kurdan (Sedsaliya Bûyîna Nivîskarê Ermeniyayn ê Navdar, Avetîk Îshakyan)*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 28. 2. 1975.

31. *Jiyana Mezin (Heftê Saliya Bûyîna Emînê Evdal)*, rojnameya *Komûnîst*, bi zimanê Êrisî, Yêrêvan, 16. 10. 1976.
32. *Kedkarê Mezin (Heştê Saliya Bûyîna Ereb Şemo)*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya Edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 28. 3. 1980.
33. *Riya Bipêşdehatinê (Heftê Saliya Baxçoyê Îsko)*, rojnameya *Lîtêratûralî Sakartvêlo* (Edebiyata Gurcan), bi zimanê Gurcîkî, Tîblîsî, 4. 3. 1983.
34. *Rûpelek Ji Jiyana Zaryan (Nivîskarê Ermenîyan)*, rojnameya *Girakan Têrt*, rojnameya Edebiyatê, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 26. 8. 1983.
35. *Şaxên Eposa Kurdan a "Dimdim" ê, berhevoka Kurdzaniyê ya 2'an a Akademiya Ermenîstanê ya Zanyariyê*, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan, 1985.

Gelek gotarên wî jî di rojname û kovarên bi kurdî, ermenî û rûsî de hatine weşandin.

2. ROMANA HEWARÎ

Hewarî di sala 1967an de yekem car li Erîvanê hate weşandin. Gelek berhemên Heciyê Cindî bo zimanên milletên Yekitiya Sovyetê hatine wergerandin, bi taybetî jî bo rûsî û ermenî. *Hewarî* bi navê *Û Bahar Hat* bi zimanê rûsî û ermenî li Moskova û Erîvanê hatiye çapkirin.⁷⁹ Berhem, sala 1999an ji aliyê Weşanên Roja Nû ve hatiye latînîzekirin.

Ev romana di destê me de, li gel ferhengoka wê 418 rupel in û ji aliyê weşanxana Lîs ve hatiye çapkirin. Mijar û bûyerên romanê bi nêrîneke realist ve hatiye hûnandin. Mijara *Hewarî*, li ser serpêhatiya kurdên êzidiyan e. Roman behsê dike ka êzidî çawa ji destên Osmaniyan revine û li Rusyayê bicih bûne.

Cihên ku me ji romanê wergirtiye em ê *Hewarî* (H) rupel jî li rex wek (H/R). bidin nîşandan

Hewarî bi leheng û bûyerên xwe ve romaneke dîrokî ye. Wek romanên kurdî yên li Yekitiya Sovyetê hatî nivîsandin, pesnê şoreşa Oktibir û rejîma komûnizmê dide.

"Belê li vî gundî kesek di par re nanihêre, bi pey roja bihûrî nakeve, giş bi pêş de dinihêrin, li roja sibehê û bi sibeha teze re teze dibin, emrê xwe xweş dikin, bi serecem, dewlemend û bextewar dikin, berbirrî sibeha xwe ya teze dibin, sibeha Komûnîzmê." (H/36).

Kurdên ku şer û qirkirin dîtine Lenîn wek xelaskarekî bi bîr tînin.

"Erê lawo, ya ku me dîtiye, bila here, venegere. Û em ê li rûyê dinyayê winda bûna, heke wan salan Lenîn hewara xwe bi me re negihanda. Wan çaxan ji me re gotin, ku دنیا êdî ya me ye, ya pale, û gundiyan, welat êdî ji destê kedxuran azad bû. Ruh bi ber me de hat û herçî qudûm de ber çongê me de hebû, em jî rabûn, me berî dijminê welêt da." (H/41).

Di romanê de qala dostaniya ermanan jî tê kirin, em şahid dibin ku di rojên teng de wan çawa alîkarî li kurdan kirine. Ermenên ku navê wan derbas dibin bi gelemperî mirovên zanyar in. Heciyê Cindî wiha qala wan dike:

"Li Yêrêvanê, serwerê min ê aspirantiyê, Profêsor Xaçatiriyân, di pey ew qas salên mirina dê û bavê min re, cara pêşîn wî ji min re got: "Kurê min." Dilê min ji heybetan hilşiya, giriyam û min jê hez kir weke lêzimên xwe, weke kalên xwe." (H/190).

⁷⁹ Eşo W., "Heciyê Cindî 100 Salî ye", h.b., 20.09.2018, 21.30

"Li Yêrêvanê, li Mêvanxaneyê Sêvanê gelek salan berê rastî Alêksandir Fadêvyêv hatim. Roj teng bû ji min re; de heta hevalên min ên nêzîk jî derî li min venedikirin. Wî, Alêksandir Fadêyev, ji Moskovayê têlêgram ji min re şand, piştî ew qas wextan selama pêşîn ji min re şand û ji wê selamê bi şûn de her rê û dergeh ji min re vebûn." (H/190-191).

Ji bo nasandina romanê em ê pêşiyê analîza romanê bikin paşê jî kurteya wê bidin û lehengên wê bidin nasîn.

2.1. Analîza Romanê

Di bin vê sernavê de; vegotin ,dem û cihên ku bûyerên romanê lê derbas dibin yek bi yek hatine senifandin.

Vegotin

Di romanê de du beş hene. Em beşa yekem bi vegotina lehengê romanê yê bi navê Kamil ve dixwînin. Em dizanin ku Kamil, Heciyê Cindî bixwe ye. Ev beş bi zimanê kesî yekem ve hatiye nivîsandin. Kamil, pirsan ji Apê Moskov û Şewêşê Kal dike ew jî wek serpêhatiyekê qala reva êla Sîpkanê dikan. Dîsa em bi vegotina Xezalê ve çîroka reva wê û ya Şewêşê hîn dibin. Beşa duyem bi şexsê sêyemîn ve hatiye vegotin.

Heciyê Cindî di romana xwe de bi berfirehî cih dide edebiyata gelêrî. Herwiha di her hevokekê de em li rastî gotineke qalibgirtî tîn. Roman bi şewaza çîrokbêjîyê hatiye nivîsandin.

Giraniya devoka serhedê li ser vegotina romanê heye. Gotinên wek: "ji çi re", "gotina gotiyan e", "malavayo", "ez di dilê xwe de sewirîm", "erê, bi serê te kim", "gidî ha bajo ha bajo", "eynî çakûçê bavê lê ye", "ew xeysetê wî nîn e", "gava ku sibeh çavkilkirî dibe" hwd. mînakên bi vî rengî gelek in. Dîsa di vegotina wî de em cih bi cih peyvên rûsî dibînin: Respûblîk (komar), revolyûsîner (şoreşger). Kolxoz (Sovyetî), Komsomol (Rêxistina Xortên Sovyetê), çêrvonês (zêrên rûsî yên berê), naçalnîk (serok) hwd. Hindek peyvên tirkî jî tê de hene: "kapi aç", "sene de qalmaz", "îçeriye", "îtoxlî", "nemertoxlî" û hwd.⁸⁰

⁸⁰ Zêdo Ç., "Ji Hewarî'ya Heciyê Cindî", cetoyezedo.blogspot.com., 24/09/2018, 18.42.

Dem

Heciyê Cindî di romana xwe de bi flashbackê dest pê dike, wekî romanê kurdên Sovyetê yê din dest pê nake (H/17). Ev teknîk bi gelemperî di romanê dîrokî de tê bikaranîn. Nivîskar bi vê teknîkê xwîneran di navbera rojên bihurî û ya îro de dibe û tîne. Heciyê Cindî jî bi nameyekê romanê dide destpêkirin û diçe rojên berê. Dawiya romanê jî dîsa tê roja îro. Heciyê Cindî gava qala wextê bûyeran dike bi gelemperî tevgerên xwezayê bikartîne. Di romanê de têgeha demê "tariyê erd hilçinî", "gava kewa sibehê hê nexwendî", "êdî sî bibû wekî lingekî" û hwd. bi şibandinên bi wî rengî ve hatiye dayîn.

Cih

Serê romanê li gundê Kûrekendê li nehiyeya Ecmiyokzînê destpê dike. Ji aliyê pêşketina aborî ve di navbera serdema sîstemên pêşî û piştî şoreşê de tê berawird kirin. Heciyê Cindî, Kûrekendê pêşiya şoreşê wekî gundekê kavil, lê piştî hatina hikumeta Sovyetê wek gundekê şênkirî û avakirî, rave dike.⁸¹ Bûyerên romanê bi piranî li gundên Aştarak, Emençayîr, Dîgor, Quzilqûnê derbas dibin. Herwiha bûyer carina li bajarên Tiflîs, Erîvan, Qers û welatê Sîbîrê jî derbas dibin. Gava bihar tê gundî diçin zozanên Çilkaniyê. Di *Hewarî* de bûyer bi piranî li dervê malê ne, mekanên sergirtî bi piranî odeyên gundan û xaniyên gundiyan in, lê şayesandina wan zêde nehatiye kirin.

2.2. Kurtiya Romana Hewarî

Roman bi nameyekê destpê dike. Ev name ya Fêrîkê Polatbêgove, gava şerê şoreşê çêdibe, ew diçe tevlê şoreşê dibe û dûre tu xeber ji aliyê wî ve nayê. Nûrê xwîşka Fêrîk e, bi salan li benda xeberekî ji aliyê birayê ve ye û gava dibêjin Fêrîk nameyek şandiyê, Nûrê diçe birayê xwe tîne gund. Lê em di dawiya romanê de hîn dibin kesî ku Nûrê aniye gund ne Fêrîk bû. Piştî vê beşê em dikevin di nav gundên êzidiyan û şahidê koça wan dibin.

Piştî şerê Rûs û Osmaniyê ya di salên 1877-1878an de, bajarê Qersê dikeve bin hukmê Rûsan û xet dikeve navbera êlên li wir. Osmanî, zorî li milletê dike ku ew bêne ser dînê islamê. Di nav êzidiyan de hindek êl diçin ser dînê islamê. Lê qismek ji

⁸¹Ergün Z., "Ducemseriya Realîzma Sosyalîst di Romanên Erebe Şemo û Heciyê Cindî de", *dergipark.org.tr*. 30.10.2018, 23.15.

êla Sîpkanê û hinek êlên din dînê islamê qebûl nakin. Êlên êzidî dibîhîsin ku miletên di bin hukmê rûsan de azad dijîn, li hev dicivin û qîrara çûyîna Rûsyayê didin. Ji bo alikarî û piştgiriye sê ciwanan bi xefê Osmaniyan dişeynin Tiflîsê. Ew ciwan, rewşa xwe ji wan re rave dikin û soza piştgiriye ji wan distînin. Bi xeberê mizginiye ve tên gundê xwe, lê dewlet bi çûyîna wan dihesê û giregirên gund biçav dike. Wê heyamê di gund de bûyerek din diqewime û ev bûyer wan girtî û revandeyan ji mirinê xilas dike. Dilê Xezala keça Cangoyê Heso di Şewêşê de ye û herdu ciwan soza evîntiye didin hev. Lê dê û bavê Xezalê wê didin Eliyê kurê Emrîkî Axayê. Xezal bi vê qîrarê qayîl nayê û bi dilê xwe diçe û li mala Şewêş rûdine. Her çî qas diya Şewêş xwe nerazî jî dike êdî tu tişt ji destan nayê. Ew kesên ku çûne Tiflîsê yek ji wan jî Elî ye destgiriye Xezal e. Dewlet jî li her cihê wan revandeyan digere. Gava Elî tê gund ligel du hevalên xwe Şewêş birîndar dikin. Şewêş li gel diya xwe û Xezalê giliya wan ji dadgehê re dikin. Diya Şewêş di ifadeya xwe de dibêje, bûka min bi dile xwe hatiye û li mala me rûniştiye, Elî li gel hevalê xwe, xwe veşartine ku tola xwe ji kurê min hildin. Li ser vê giliyê, dewlet wan girtiyan azad dike, têkilê wan revandeyan nabe lê dîsa jî qayîliya xwe bi wan nayîne. Ji bo dewlet êlê bîne ser dînê îslamê Hesên Axayê dişeyîne gundê wan. Gundî ji vê qîrarê xwe nerazî dikin, lê nikarin dengê xwe jî bikin. Hesên Axa bixwe jî ji berê êzidî bûye, paşê çûye ser dînê îslamê lewma gava êl ji bo çûyîna Rûsyayê dikeve rê alîkariya wan dike. Şeva çûyîne, eskerên Osmanî bi wan dihesin û êrîşî gundiyan dike, gundî li berxwe didin. Lê piştî demekî nikarin têbikoşin û biryara teslîmbûnê didin. Heman demê eskerên Rûsyayê tevî êla Heseniyan têne alîkariya wan. Êla Heseniyan ji zû ve ye xwe bi Dewleta Rûsyayê ve girtibûn, gava dibihîsin dê êla Sîpkanê koç bike, Hesên Axa bi siwarên xwe û eskerên Rûsyayê re têne hewara wan. Êla Sîpkanê bi saya wan sînore derbas dibin û di gundên kurdan de têne bicihkirin.

Gava êla Sîpkanê dikeve bin hukmê Rusyayê, dewlet berdevkekî ji wan dixwaze. Eliyê kurê Emrîkî tê bijartin. Elî Axa, bi tevgerên xwe yê erînî ve hem ji aliyê êzidî û hem jî ji aliyê surmenan⁸² ve tê hezkirin. Rojekî hindê kes ji êla Heseniyan tên gundê wan û Gulîzera keça Êso ji kurê Cezwo Begê Mustafa Axayê re dixwazin. Elî Axa li gel birayê xwe Egîd Axa diçe wê keçxwestinê. Gava qîrara keçdayinê û qelenbirinê tê dayîn, Gulîzerê tînin nav dîwanê. Egîd Axa gava Gulîzerê

⁸² "Misliman", Cindî H., (2008), *Hewarî*, weş. Lîs, Amed, r. 415.

dibîne ji ser hişê xwe de diçe û dilborî dibe. Dixtor û hekîman bi ser de tînin lê aqilê wan ji nexweşiya Egîd Axa nabire. Dawiyê gazî Koçek Gulê dikin. Koçek Gulê, dikeve bin aqilê Egîd Axa, wî dide xebardan û eşqa Egîd ya li ser Gulîzer aşkera dike. Koçek diçe cem Gulîzer ji bo carekê bi Egîd Axa re biaxive wê razî dike. Gava Gulîzer li gel xwişka xwe Gevez diçin pincar çinînê, Egîd axa bi tevî du mirovên xwe ve Gulîzerê direvînin. Gevez ji bo xelaskirina xwişkê, xwe dide pêşiya wan, mirovên Egîd Axa wê pal didin, ew dikeve ser keviran û dimire. Ev bûyer di navbera êla Sîpkan û Hesenîyan de dibe daweya namûsê. Piştî demekê din eskerê rûsê, Egîd û piştevanên wî digirin. Ji bo Gulîzer di îfadeye xwe de Egîd Axa sûçdar neke, Emrîkî û Elî Axa xelatan didin axayê Hesenîyan û bavê Gulîzerê. Lê Gulîzer îfadeya xwe naguherîni, dadgeh jî Egîd Axa û mirovên wî sûçdar dibîne û wan bo deh salan sirgunê Sîbîrê dike.

Di wan deh salan de tu xeber ji Egîd Axa nayê. Rojekê mirovek tê û nameyekê dide Elî Axa. Name ji aliyê Egîd Axa ve hatiye nivîsandin û wî navnişana xwe jî di namê de eyan kiriye. Elî Axa, kurxalê xwe û mirovekî ku bi rûsî dikare biaxive û bixwîne dide gel xwe û diçe Sîbîrê. Egîd li wir bi jineke xaçperest Anna Kartaşova re zewiciye û ji vê jinê zarokên wî çêbûne. Anna jinebiyek e. Egîd Axa, gava di madenê zêran de dixebite nexweş dikeve, Anna jî heya ku ew baş dibe wî xweyî dike, piştî ku Egîd tê ser xwe pê re dizewice. Elî Axa, gava dibîne ku birayê wî bi jinekê şîlet⁸³ re zewiciye xwe nerazî dike. Demeke kurt dimîne ba birayê xwe li paşê vedigere gundê xwe. Li piştî salan Egîd Axa tevî jin û zarokên xwe têne gund. Şêniya gund, ji ber Anna xaçperest e wê hîlnadine nav xwe û herdem mala axayê rexne dikin. Malbata axê qirar dide ku Egîd Axa bi jinekê êzîdî re bizewicîne. Piştî vê qirarê Anna tevî zarokên xwe vedigere Sîbîrê. Roja daweta Egîd Axa nameya kurê wî Fêrîk tê. Fêrîk, di nameya xwe de dinivîsîne ku diya wî miriye û xwişk û birayên wî jî bêxwedî mane. Fêrîk bixwe jî xwendekar e û debara xwe bi dersdayîna zarokan ve dike. Egîd Axa, gava vê rastiyê hîn dibe, diçe zarokên xwe tîne ba xwe. Fêrîk jî mehê havînan li ba wan dimîne.

Fêrîk Polatbêgov, ciwanekê serwext û çalak e. Ciwanên gund li dora xwe dicivîne, propogandaya sosyalîzmê dike. Ew xebatên wî dikeve guhê eskerê

⁸³ "Kesên ku di ola xwe de ne kurd in." Cindî H., h.b., r.416.

împaratorê, ji bo girtina wî esker têne gund, lê Fêrîk bi alîkariya gundiyan direve û tevlê şerê şoreşê dibe.

Şerê cihanê yê yekem destpê kiriye, Osmanî û Rûsya li hev dixin. Êzîdî di navbera wan de dimînin. Eskerê Osmaniyan xwe di gundê wan de bicih dikan. Esker, soz didin Egîd Axa û dibên em xwe tevlê we nakin. Li ser vê sozê Egîd Axa û yên ji wî bawerin xwe nalebitînin, lê yên din qayîliya xwe bi eskerê Osmaniyan naynin û li gel êlên din koç dikan. Hê esker nehatî gund, Elî Axa birayê xwe Egîd Axa û keça wî Nûrê ji bo koçkirinê dişeyine. Bi vî awayî ew xelas dibin. Eskerê Osmaniyan li ser soza xwe nasekinin û pêşî mala axayê qir dikan, paşê jî mêrên gundiyan di tev de dikujin. Bi tenê jin û zar dimînin, ew jî bi tirs û xof li benda kuştina xwe ne.

Dema gundiyan qir dikan, li ser kuştîyekê nameya Fêrîk Polatbêgovê tê dîtin. Em bi vê nameyê serwext dibin ku şoreşgerên Lênîn li nêzîkê gund in. Dawiyê jî ew şoreşger tên û gundiyan xelas dikan.

2.3. Lehengên Romanê

Nûrê: Keça Egîd Axa û Annayê ye. Di nav cimeata kurdên êzidiyan de keçeke xwenda ye. Serweriya sêwîxaneyê Aştarakê kiriye û demeke dirêj li vir xebitiye û li zarokên kurd ên sêwî xwedî derketiye.

Fêrîk Polatbêgov: Kurê Egîd Axa û Annayê ye. Bi zanatî û rêberiya xwe ve di nav civakê de xwe cih kiriye. Di kovar û rojnameyan de nivîs û helbestên wî hatine çapkirin. Di refên Bolşevîkan de şoreşgerekê mezin e.

Moskovê Selîm: Yek ji du çîrokbêjên romanê ye. Em bi vegotina wî çawaniya şerê di navbera Rûs û Osmaniyan de hîn dibin.

Şewêşê Kal: Yek ji du çîrokbêjên romanê ye. Em bi vegotina wî hîn dibin ka êla Sîpkanî çawa ji Osmaniyan revîne û li Rûsyayê bicih bûne.

Xezal: Jina Şewêşê Kal e. Em bi devê wê hîn dibin ka ew çawa ji mal reviyê û xwe spartîye mala Şewêşê Kal.

Emrîkê Axa: Bavê Elî û Egîd Axayê ye. Mirovekê qedirbilind e û yek ji giregirên êla xwe ye.

Elî Axa: Kurê mezin yê Emrîkî Axayê ye. Di êla xwe de mirovekê rêzdar e. Mirovekê jêhatî ye. Bûyerên nêrinî bi wêrekî çareser dike.

Egîd Axa: Kurê Emrîkî Axayê ye. Her dem biryarên xelet dide û ji ber vê gelek bûyerên nerinî tîn serê wî.

Anna Kartaşova: Jina Egîd Axayê ye. Jineke xwenda û serwest e. Ji ber şîlet e di nav êl de nayê qebûl kirin.

Gulîzer: Keça Êsoyê Adil e. Keçeke jinxas û xwedî namûs e.

Gevez: Xwîşka Gulîzer, keça Êso ye.

Êso: Eslê xwe ji eşîreta Heseniyan e, piştî bûyereke nerinî tîn serî, tevlê eşîreta Sîpkanê dibe.

Kubar: Jineke jinxas û serwest e. Li pêşberî eskerê Osmaniyan li ber xwe dide, hem namûsa xwe û hem jî ya jinên din diparêze. Em di bîranînên Heciyê Cindî de pê dizanin ku Kubar, diya Heciyê Cindî bixwe ye.

Mamê Okiz: Kurxalê Elî û Egîd Axayê ye. Mirovekê serwest û jîrek e.

2.4. Di Romanê de Hêmanên Folklorîk

Di bin vê sernavê de edet û kevneşopiyên kurdan, ol û baweriyên êzidiyan û keresteyên wêjeya gelêrî yên di romana *Hewarî* de hatine senifandin û dahûrandin.

2.4.1. Hindek Edet û Kevneşopiyên Kurdan

Ji wan rêzikên ku bi piranî ji mezinan derbasî zarokan bûne, rast û nerast, qenc û neqenca gel didin kifşkirin û ji mêj ve ye hatine nerîtandin re edet tîn gotin.⁸⁴

Heciyê Cindî di romana xwe de bi berfirehî cih dayê edet û kevneşopiyên kurdan. Helbet ev edet li gorî zemanê guherine û şiklekê din girtine. Hindek edet jî di roja me de hatine ji bîrkin.

Gava mezinek tîn nav cimeatê, yên emir biçûk bo hurmetgirtinê li ber radibin û cihê xwe didin wî kesî.

"-Me silavek şêrîn da hev du û pê re pê re em çûn hundir. Ên teglîfîkirî êdî rûniştibûn. Wexta ku çavên wan bi me ket, herçî cahil bûn, bi destê xwe re re rabûn ser piyan lê herçî ên sere, neyse ciyên xwe lebitîn û bû ' kerem kin, kerem kin' a wan." (H/68).

Gava mêvanek tîn malê, zarokên biçûk li pişt derî rudinin û heger sifre rasxistî be nayên li gel mêvanan xwarin naxwin.

⁸⁴ Yanardağ A., "Örf ve adetler Sosyolojisi", ifder.igdir.edu.tr., 18.10.2018, 15.24.

"-Wê demê, min ku serê xwe hilbirî, dêhna xwe dayê çawa ye, lawikekî sivik î bi min nenas wê di sivderê de kerrekerr rûniştiye, pelên kitêbekê waldigerîne. 'Dibe cahil ji tevî mezin û mêvanan nan naxwin.' Ez wiha fikirîm û fikir di dilê min de, min li çavên kalê nihêrî." (H/185).

Gava di malakê de mirî hebe, alekê li serbanê xaniyê xwe daçikînin ji bo ku xelq bizanibe di wê malê de şîn heye û xwe bigehînin hewara wan.

"Behsa mirina Annîşkayê mîna gulleyekê li nava her çend gundên Êzdîxaneyê belav bû. Mala axê aleke biçûk li ser xaniyê xwe daçikandin, wekî xelqê ku tê hewariyê xwe li bigere bê." (H/357).

Di roja me de êdî qîmeta hindêk edetên ku di romanê de derbas dibin nemaye. Yek ji wan jî şewaza təkiliya jin û mêran e.

Di edetê kurdan de jin û mêr navê hevserê xwe nabêjin, li ba wan ev qusûr û eybek e.

"-Ê erê, emrê te dirêj be, hemîn wisa ye, neha ew ê bê, wext e, ez ê şivê daynim.

-Çawa ye, -ez ecêbmayî mam,- hûn ew qas mezin bûne, hela navê mêrê xwe hilnadin.

-Naxêr, - û hizing da xwe, kir ku here, lê herçî li ber dêrî rûniştî nehiştin- " Nebûye ku nabe, bibêje, paşê tu dizanî " (H/103).

Bûka malê li gel xwezûr û tiyên xwe xwarinê naxwin. Sifra wan cuda ye. Bûka malê li gel xwezûr û tiyên xwe naaxivin.

"-Dêmek ew bûka min e, wekî li ber min xeber dide. Hey gidî dinyaya derewîn! Lê binihêr em ghiştine kê derê..." (H/323).

"-Anna Kartaşova, bibexşîne, li cem me edet nîn e, wekî kulfet li cem mêran nên bixwe." (H/324).

Divê jin li gel mêrên xerîb neaxivin, nerabin û nerûnin. Jin divê servekirî nebe. Ev tişt di civakê de wek şerm û bênamûsî tê dîtin.

"Cimaeta li ber derî çî qas çû, ew qas zehf bû, çî qas çû, hatin bi ser hev du de top bûn. Êzdîxane hilşiyabû hatibû wê derê, xelqê Cemaldînan û Dilxêran jî hatibûn, hemîn Dîgora Ermenîyan dîsa wisa. Rûreşiyê mezin bû. Qîza Kurmanc anîbûne ba silêskar, wekî caba xwe bide, dizanî eybekê çawa bû ji navê eşîretê re? Hinekan xwe bi xwe re digot, " Erdo, biqelişe, em tê de herin. Egîdê axê, te male xerab bibe, te çawa nav û namûsa me li erdê xist, li ber şiletê em bênamûs kirin." (H/258).

"-Lê cem me Annîşkê, delala min, şerm hesab dibe, gava ku mêr porê jinan dibînin, got, yekî wê salê hema ji bo wê pirsê rabû jina xwe kuştibû, got, gotibû, ev çi tiştê teze, tu serqot xuya bikî." (H/339).

"-Lê lê, porkurê, dûrî bira, - yekê ji ya din re digot,- te qe bihîstiyê jin here nava mêran û bi mêrê xerîb re, bi zimanê me re ne famdar, xeber bide. Vê jina axê xwe wînda kiriye, şerma rûyê wê tune, çawa ye? Lê axê, axê xwe daye ber dukanê, tu dengê xwe jê re nake. Qe tiştê wiha dibe? Ji navê me re şerm e, heyran, ne axir em yek in, li ser kuçikekî." (H/348).

Heger jinebiyek xwedî ewladê kur be zewaca wê ji aliyê civakê ve nayê pejirandin.

"-Heyran, Nenê duhala ye, hela bila aza be, heke qîz bû, hemîn bidene mêr, lê ku, kur bû, hûn ê çawa destê xwe ji Xwedê bikin, warê mêrik warwînda bikin, dûyê wî biqelînin?" (H/133).

Di edetên kurdan de biryara zewaca keçan dê û bav didin. Malbat kî minasib bibîne keça xwe dide wê malê. "Û keç û jinêd Ekradan bi xwe bi nefsa xwe muxtar nînin(ne di destê xwe de ne). Belkû bab û birayê keçê wekû ew dayîne mirovekî keç qadirê men'ê nabî (nikare qebûl neke). Elbette xwah û naxwah (yanî bixwaze nexwaze) keç ê wî mirovî bistîne."⁸⁵ Di vê biryardayîne de fikra keçikê nayê pirskirin.

"-Belengazê da û neda, min tu soz nedayê û paşê zorezor, beyî razîbûna min gustilk bi tiliya min ve kirin, qelenê xwe birrîn û piştî xwe dane min û çûn. Hema tu were, xwazgîniyên min jî dizanîbûn, wekî dilê min di kurê wan de tune, dê û bavê min jî dizanîbûn, wekî beyî dilê min ez dame mêr. De roja qîzê reş be, hal jî wisa bû, lawo." (H/104).

"-Lê ez çi bikim, koçek, çi ji destê min tê, ez ê çi bibêjim? Mêr bû, bila bihata bi bavên min re xeber bida, ez jî ji xwe re bibirama. Niha êdî ez çi dikarim bikim?! Roja qîzê reş be, ka kî ji wê dipirse, wekî ji min jî pirs bikin? Edî dereng e." (H/234).

"-A, behs e ji xeberê, -wî digot,-halê jina kurd çi ye? Ji mirinê xerabtir, -wî bersiva xwe da,- dikarî wê bidine her merivekî, bibe xort, bibe kal, bibe mêrebî, bibe xweyê çedn jinan. Li vir pere lazim e, perê kî hebe, dikare wê bistîne. Îzna jinê tune bigazîne, şikyat bike. Em bibêjin wê şikyatê xwe kî bike jî? Lewma jî, wê ew qas kilamên bi derd û kul li hev anîne, xwestina xwe, derdên xwe di nava wan de rêtiye, wekî çawa nedane xortekî çardeh salî yê mal di gund de, wekî biçûktiyê de dilê wê tê hebûye, lê dane kalê hizhizî, şindokê mêran, arkolê li ber tenûrê... Û dike gazîn û dilûbîne, nîfiran li dê û bavê xwe dike, lê kî guh didê, kî?" (H/364).

Laçika jinê, sembola namûsê ye. Heger di navbera mêran de şer derkeve û jin laçika xwe biavêje erdê, ji bo hurmetgirtinê divê ew şer biqede.

⁸⁵ Dost J., (2012), Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê Mele Mehmûdê Beyazîdî, weş.Nûbihar, ç.2, İstanbul, r.55.

"-Çûn, çûn gihiştin esker û li ser deh gavan ji xwe re laçikên xwe li ber lingên hespên wan raxistin. Ew eskerê giran ji nişkê ve, çawa kevirek, di ciyê xwe de sekini. Got, diya min gotibû: "Mistefa Beg, eşîr bavê eşîrê ye, te wiha xêr e? Bidi xatirê navê Xwedê, heke kêmasiyeke lawikên me jî heye, bibexşîne, ez tême lingên te, lingên hespê te, lawo!" (H/153).

2.4.2. Di Dawe û Şeran de Jina Kurd

Jinên kurd di rewşên giran de zîrektî û serwextbûyîna xwe dide nîşan, li pêşberî dijminên xwe bêtirs dikarin şer bikin û ji bo namûsa xwe dikarin xwe bikujin. Mele Mehmûdê Bazidî jî balê dikêşe ser şervaniya jinên kurd: "*Û jinêd wan malan jî her yek kon istûnekî (stûnê kon) digirîn destêd xwe û hazir dibin, guhê jinan jî li şerî ye. (Eger) dîkin ko şer kete nêzûka (nêzîkî) malan, ew jin jî bi wan istûnkonan diçîne şerî û yariya (alîkariya) mêran dîkin.*"⁸⁶

Heciyê Cindî jinxasiya jinên kurd, bi mînakên balkêş ve nîşan daye ka jin çawa xwedîtî li namûsa xwe dîkin.

"-Eskerê Romê çil qîzên bejne takrihan î xama dîkin ku hêsîr hildin, bişihurînin nav û namûsê, ecêbên giran binin serê wan, ji mirinê xirabtir. Qîzên bikur xwe nadine destên wehşan, hey direvin, hey bi kevir û kuçikan şer dîkin. Got pê re jî digotin:

Welleh nabe, bileh nabe

Qîza Êzdî tu car tu car

Hêsîr nabe...

Çi qas diçe halê wan giran dibe, ji hal dikevin, tîbûn û biçîbûn, xew û westan serî hildidin: Di par re Roma Reş, li pêşiyê Çemê Ferat, av, ne hewar û ne gazî... Dengbêj wan çend xeberan diwekilîne û bi dilekî tijî ne bi xwestina xwe, lêbelê bi gotina beytê bi dengê bi girî şîrove dike çî ka çawa sereka wan kewên spî, Şêrîne, wekî bi bedewiya xwe bi Zîna Cizîra Botan re xeber daye, xwe davêje nava pêlên Ferêt ên lihevketî yî bihêrs, li pey wê jî, sî û nehên din, wekî nekevîne destê eskerê Romê, navê xwe xerab nekin, nebin robot di nava vê dinyaya ha hatî, ha çûyî de." (H/71).

"-Got hema wê çaxê Reşê rabû, dewsa dergîstiyê xwe yê Ozman girt, çek û sîleh girêda, wekî xwe bi saxî nede destê eskerê Romê. Nedihîşt tu esker lingê xwe bavêje nava gund, destê xwe bavêje erzê xelqê, bi xwe jî debançe, şûr û mertal girêdayî tevî zilaman miqatî li gund dîkir. Ê lê yekê çawa bû jî? Bejne bilind î takrihan, navike zirav, sifetî sor î gulgulî, enî kever î mezin, çave weke tas, pozî pîjin, devî biçûk, lêve zirav î kaxitî, porî reş mîna şevê, guliyên qalîn û dirêj. Mala qîzê şewitî wekî şewitî. Got paşayê Romê ji bo wê dîn dibû, di xwe de dişewitî, dîkir û nedikir nikarîbû bianiya rayê, ji xwe re bibira." (H/83).

⁸⁶ h.b.,r.46.

"-Xanima mezin, Sasûn Xanim, wê tena kirasê şevê li pêşiya wan sekiniye, got: " Bidîn xatirê navê Xwedê, destê xwe medin torina Mala Sêlxûn, korayî bi min de bê seba eşîretê, neviyê min xapiyane, Xwedê jê standine, Roma Reş me berî hev dide! Gidî, wan kirye, hun mekin! Lê heke ew dîsa kerr bin, ez bi wî kim ruhan dide, ruhan distîne, ez ê bi xwe bi we re derêm, nahêlim Rom pozê kara we xwîn bike, nahêlim navê eşîreta Sîpkan li rûhewatê dinê xerab bibe! Bidîn xatirê Xwedê, paşê jî ê min, bi şûn de vekîşin û li hêviya min bisekin!" (H/84).

"Lê Kubar bi tenê ji bo qîza xwe nîn bû, wekî li ber xwe dida, wê mîna şêrekê çing da, xwe avête ser tivinga eskerê hinekî bi wê de sekîn û çî qas tûka wê hebû, tûyî rûyê eskerê eyb windakirî kir. Esker veciniqî. Ew tûka kulfetê, ji hêsir û giriyê wê tevîhev bû û bi milê wê girt, kir ku bi newalê de gilori bike, hûr û xaş bike, lê pê nikarîbû, jinikê destê wî gest, lê wî dest avête xencera li ber xwe û tiliya wê birrî. Bû qûjîniya Kubarê û ev eskerên Romê mîna kêzikên rûyê erdê bi şûn de vekîşyan, lê Kubar hê li ser hêsûyê çêrî wan, dê û bavê wan, dîn û mesebê wan dikir." (H/387).

Di nav miletin din de jî serwextiya jina kurd tê zanîn, gava dikeve zorê di şûna mêrê xwe dikare heqê xwe biparêze.

"-Diya min digot, digot, herçî li wê derê kerr bûbûn, mêşê bikira tizînî, wê bihata bihîstîn. Mala jinê, culheta wê û xeberdana wê şewitî. Bi xwe jin nîn bû eshabe bû. Û bînbaşî jî xebera wê nedida birrîn, bi tenê li destê dinihêrî." (H/142).

"-Ana, min bihîstibû der heqa zorbûna jina Kurd de, lê min nedîtibû, niha min li ber çavên xwe dît. Êdî rabe here, Dîwana Îslamê li wan girtiyan hatiye rehmê, şeva îşev te ew ji mirinê dane xelaskirin. De rabe. Ana min da xatirê te..." (H/142).

2.4.3. Di Dawe û Şeran de Mêrên Kurd

Mêrên kurd, di şeran de li gel dijminê xwe bi wêrekî şer dikin. Ji bo eşîr, malbat û namûsa mala xwe ji mirinê natirsin. "Di xeberdanê (de) xweyî cesaret in. Eger bibene kuştinê jî dîsanî jî xemê nînin. Yanî bi rastî ji kuştinê wekû milelêd (milletên, gelên) mayî ji kuştinê natirsin û dilêr in."⁸⁷ Wêrekiya mêrên kurd di çîrok û destanan de bûye mijarekê balkêş.

Em vê xusûsiyeta mêrên kurd di romanê de jî dibînin.

"Wan rojan, got, navê Şêx Miçê Îsa li her deran belav bû, gava ku dijmin navê wî dibihîst, xwîn dimîst, jê direviyan. Lê got, qewimî, wekî ew mêrê mêrxas ji gulleya nemamekî hate xwarê... Herçî li dora wî bûn, tevîhev bûn, kirin bihêlin û birevin, lê got, yekî qemer î pozberan nehişt, got, " Kî tirsonek e, bila laçika jina xwe li serê xwe girêde û here!" û bixwe jî çû ber bi cinyazeyê wî mêrî. Ê Şêx Miço, wekî sîleha li destê wî bê xweyî nehile. Herçî din, ku ew dîtîn, ji xwe şerm kirin, sêkin bûn û êdî kesek ji ciyê xwe nelebitî." (H/72).

⁸⁷ h.b.,r.63.

"Ev Silêman merîvekê gelekî xurt bû, tirsî wî xên jî Xwedê Teala jî kesekî tunebû, de berê xwe jî gulleyê nediguhest, wexta şêr her du lingên xwe kelemçe dikir, dikete tebyayê, cixareya xwe qulap qulap dikişand, qehweya xwe datanî kêleka xwe, dest bi kilama xwe dikir û hêja mînanî gurekî çîle diket nava şêr, hêja şer xweş dikir, berê dijmin dida revê." (H/76).

"Got di nava şêr de bi tenê tiliyekê Silêman firiyabû, paşê ew tilî zêr kişand. Deh nefer jî birîndar bûn. Lê zilamek, Koroxliyê kurê pîrê, hatibû kuştin. Ca çawa xort bû! Cinyazeyê wî bi xwe re anîbûn. De got, li dewsa şînê kotel girêdan, dinivjandin, kilama pesnê wî û mîrxasiya wî wê şevê didan." (H/78).

2.4.4. Dawet

Keç û xurtê kurdan, li gorî edet û baweriyên civakî dawet dikin. Di nav kurdan de gava keç û kur têne emrê kemaliyê, dê û bav êdî tevdîra daweta wan dibînin. Dawet, di şahediya mirovan de tê kirin. Ji bo dawetê hemû nas, exrebe, mirov û cîran tînan gazîkirin.

Dawetên kurdan, gelekî rengîn in. Kesên têne dawetê, tevlê kêf û şahiya bûk û zavayê dibin. Şahî bi gotina stran û birîteyan, lêdana saz û pêk tê.

Xwediyên dawetê, tevdîra mazûvantiya mêvanên xwe dikin û bi xwarin û îkraman wan diezimînin. Cîran û nasên wan jî alîkariya xwediyê dawetê dikin.

"-Diya min jî lawekê sivik re got, wekî here her du beranên me yê kol, mîstewra sor û hogeçê qerqaş î kurîkel jî nava pêz veqetîne bîne. Bi xwe jî dest bi hevîr kir, şikev bûn, wekî danî ortê: Gelek hevîr kirin, têra sed du sed merivî gotî nanê sêlê lê xistana, qolayî nîn bû, dawet bû! Paşê zilamekê din şande gundê Dêrîkê, pêy sazbandan, defçî û zurneçiya. Bi giliyekê, me bi malê ve, bi der û cînanan ve tevdîra dawetê kir." (H/151).

Gava bûkê tînan ber deriyê zavê, ji bo xêr û bereketa dawetê, fêkî û çerezan bi ser bûkê de direşînin. Mêvanên dawetê pêşiya xwarinê saçû⁸⁸ diavêjin. Serî jî aliyê nasên nêzîk; bira, xwîşk, mam, xal, pismam, xalet, met û hwd. ve paşê jî cîran û mirovên din wê perê diavêjin.

Di romanê de, em lî rastî daweta mêrebiyekî dibin. Gava zava mêrebî be, ev rê û resmên dawetê piçekî diguherin. Dawet piçekî din bêdeng tê kirin.

"Zûtirê wê xwestiya Egîdê axê bianiyana. Helbet vê carê pirsî rûvî dikete ortê, wekî bişandana mala bavê bûkê çî ka çî çaxê wê bîn bibin, ne pirsî topayî hebû, wekî di nava gund de û di nava Kurmanciya nehiyeyê de bilav bikirana, ku bihatana ser nanê mala bavê zavê saçû bavêtana, ne dara zavê li ortê hebû, wekî bi fêkiyan bixemilandana, bidana destê zavê, ku li ser xênî bisekiyana, bi ser bûkê de

⁸⁸ "Wexta dawetê, mêvan pere didine mala zavê", Cindî H., h.b., r.415.

bihok, sêv, hurmî, qeysî bireşanda, ne pirsâ balgiyê bûkê bû, wekî siwarê vexwendî zû bianiya bigihanda cî, pêkeşa xwe bistanda, ne jî li def û zurneyê dan, ne govend, ne Kosegeldî. Sebeb ew bû, wekî Egîdê axê mêrebî bû, bavê çar zarokan, dest nedida di wî emrî de li defê bixista, dawet bikira. Lewma jî, her tişt kerr û kerr hate kirin. Ew ku bûk qîz bû, terr û can, fîno hê serî de." (H/352).

2.4.4.1. Qelen

Di zewacê de yek ji edetên kurdan jî qelenbirîn e. Dema kesek keça xwe dide mêr ji bo mesrefên dawetê qelen û xelatan ji mala zavê dixwazin. Ev qelen û xelat li gorî hal û wextê malbata zavê diguherin. Li hinek herêman li gel qelen ji bo bay, bira, ap û xizmên dîn jî wek xelat, hesp, kinc û sîleh jî tên xwestin.⁸⁹

Carina qelen, ji bo hindê kesan giran tê, mezinan dixin navberê da ku qelenê bûkê piçekî bê sivik kirin. Heke keç û kur ji hevdu hez kiribin û qelen ji bo daweta wan bibe astengek, meselên mîna keçrevandinê çêdibin.

"-Axa, hezdikî niha jî min derxe, -Ato dibêje, -hez dikî min bikuje, -û qemeya xwe dide destê wî, pê re jî topek caw, -an min bikuje, an min ji vî halî xelas bike. Çawa bikim, ev çend sal e, rûreşî tê, dilê min di wê de hebû, dilê wê jî di min de. De Xwedê xerab bike desttengiya dinyayê, qelenê min tunebû, bavê wê jî "îla bila" neda, wê îro sibehê bida gedeyekî Bazarcuxêi De em jî pev ketin û me got, Elî Axa bavê êlê ye, em herin xwe bavêjinê, belkî me star dike, heta ku ez bixebitim qelenê wê bidim." (H/217).

Axayê êlê kî be, divê ew biryara qelenbirînê bide. Di qelenbirînê de, bavê qîzê xelatan bo axayê xwe jî dixwaze. Qelen, çi qas zêde be qîmeta keçikê jî ew qas zêde tê zanîn.

"-Heyran, Xwedê li hev aniye, -Çend kalemêran got, -qelenê xwe bibirr, -Û paşê Elî Axa nihêrî.- Elî Axa texmîn kir, wekî giş hêviya wî ne, li wî dinihêrin, giliyên pîr anî bîra xwe, li birayê pirçikîrî yê nîvmîrî nihêrî, ancax got:

-Belê, qelenê xwe bibirrin!

-Dê bila Xwedê te rûspî bike, Elî Axa. -Cezwo Begê gotê- Bila mal û halê min qurbana te be. Ez birayê te me, wekî îro te em qedir nekirin, însallah ez wê qencyê nahêlim li ser xwe. Ûso lawo, de qelenê xwe bibêje!

-Qelenê qîza min, ez çi bibêjim, bila gundî bibêjin.

-Heyran, bibêje, wê jî em bizanin çi ka qîza te yeke çawa ye. -Serdawetî gotê. -Lewma jî, em hatine, hema tu kêr, beg penêr, çi qas ji te tê, bibirre!

⁸⁹ Celalî M., (2016), *Mela Mehmûdê Bazidî û ' Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiyê*, weş. Nûbihar, Stenbûl, r.179.

-Qelenê qîza min du sed mî, hespeke kihêl, pênc xelat, dudu ji Elî Axa û Egîd Axa re, ên din jî, ji diya wê, birayê wê, bavê wê re. Ev e gelî cimeat." (H/224).

Qelen ne bi tenê li ser hesp, mih, pez û hwd. herwiha li ser pere û zêran jî tê birîn.

"Lê bûkê, wekî qelenê wê sê sed manat bû, hespek, cotek ga, pênc xelat." (H/353).

2.4.4.2. Mehirkirin

Zewaca bûk û zava, bi pejirandina rêzik, ol û endamên civakê meşrû tê hesibandin. Li gor zagonan; bi tenê mehrên di hizûra memûrên hatî rayedarkirin de û li gor ûsilê hatî birîn, meşrû ne. Herçend li gor zagonan nemeşrûbe jî "mehra dîni" ya ku jê re "mehra mele" jî tê gotin di nav gel de berbelav e.⁹⁰

Li gorî baweriya kurdan, kesên ku mehra xwe ya dîni çênekiribe nikarin bizewicin, ji ber vê pêşiya dawetê, mehra keç û kuran tê çêkirin.

Di romanê de, bi tenê seremoniya mehra dîni cih girtiye.

"-Şêx Hoko, wekî li wê derê bû, gote dê û bavê bûk û zavê:

"-De kerem bikin em nehkê bibirrin"

Û evên te ji ciyên xwe rabûn, hatin ortê, kerrekerr tiliyên xwe yên mezin dane hev, kefa destê xwe sipartine hev, li pêşberî hev qerefîskan rûniştin û li hêviya Şêx Hoko man.

Şêx di ser wav re sekîni, got:

-Cewzo Begê Emer Axayê Hemîd Axa, qîza Ûsoyê Adilê Keloyê Şeroyê Misto, Gulîzer ji nava dilê Zeyna Emer Axayê Hemîd Axa, kurê te Feyzo Axa, ji nava dilê Perîşanê, bi te qebûl e?

Got:

-Bi min qebûl e!

Sê caran Ûso pirs dayê, sê caran jî wisa cab da. Paşê gote bavê qîzê:

-Usoyê kurê Adilê Keloyê Şeroyê Misto, te qîza xwe Gulîzer ji nava dilê Zeyna Emer Axayê Hemîd Axa, te bi helaliya Xwedê, bi rizadiliya xwe da kurê Cewzo Begê Emer Axayê Hemîd Axayê Feyzo Axa, ji nava dilê Perîşan Xanima qîza Mîroyê Selîm Axa?

⁹⁰ Örnek. S.V., (2000), Türk Halkbilimi, weş.Kültür Bakanlığı, ç.2., Ankara, r.197.

Got:

-Min da!

Sê caran wisa pira dayê, sê caran jî wisa caba xwe da.

Di pêy wê yekê re, cimaeta berhevbûyî temaman got:

-Bimbarek û pîroz be, hezar caran bimbarek be!" (H/225-226).

Piştî mehir tê birîn, gustîlekê têxin tiliya bûkê, bi vî awayî seremoniya mehirkirinê temam dibe.

"Serdawetî nîşaniya wê pê ve kir, gustîlk kire tiliyê, çû serê wê, ew jî hate milê wî û dîsa çaralî gişan ji xwe re ji xwe re gotin" (H/226).

2.4.4.3. Cihêz

Ji bo keç an jî kur mala xwe ava bikin, malbatên wan hindêk alavên malê û diyariyan didin wan. Di nav kurdan de bi pîranî behsê cihêza keçan tê kirin. Esas qelen jî ji bo pêkanîna cihêza keçê tê xwestin. Cihêzdayîn li gorî aboriya her malekê diguhere. Ji bo mala bûkê li ba malxizmê xwe şermezar nebe, çî ji destê wan tê ji keça xwe re datînin. Di dîrokê de malên dewlemend ji bo cihêza keçên xwe erd, hesp, keriyê pezan û hwd. kirine diyarî. Cihêza keçê bi çî qasî zehf be qedrê wê bi wî qasî bilind e.

"Cihêzekî bi gotina te bi xwe re anîbû; lihêf, doşek, nazbalgî, kulavên xurêsanî, xalîçeyeke zîlî, xurceke binexş, kemberek, bîst dêre, sê kyrtik, du êlek, sê şalik, berdevk, berkafk, benê piştê, pişt, gelek temeziyên bexdadî, heftreng, gevez, mirîşk, laçik, kofikitan, qotik, bercênîk, guhar, gustîl, torê, moriyan, wisa jî ên ku dikin lingên xwe, bazin, qerefil, pênc qol zêr, çend çot sol, kondere, de heta tîl û derzî, koç, aşûn û bijûn, pezben, şeh jî bi xwe re anîbû. Paşê çawa pêşkêş ji bo malxwezûr û merivên malxwezûrê wê weke heftê û pênc cot goreyên bi nexş û nîgar, lepikên tîftîk, destmal, sabûna reqê pê re danîbûn. Lê ji bo xemla hespan keşî, wekî hespan tewle dikin, terkebaxî, qaşkember, hîvhêkel, rexterîşmeyên wan anîbû." (H/353).

2.4.4.4. Govend

Reqa kurdan govend e. Kurd hem di dawetên xwe û hem jî şahiyên xwe de digrine govendê. Taybetmendiya govendên kurdan ev e ku jin û mêr bi hev re dilîzin. Helbet govendên ku bi tenê ji mêr an jî jinan pêk tên hene, lê ew gelek kêr in. Bi giştî çîrok û navekê her govendekê heye. Govend li ber stran, bîrîte û sazên tê girtin.

"Girmegirma def û zurneyan ew der û doran hildabû. Di gund d, govendeke wisa giran girtîbûn li ber mala Şikoyê Axê, her Xwedê bizanibe. Meriv heyr û hijmekar dima, şerm dikir li bûk û zavayan, bedew û rindan binihêre. Temaman dilîst; kalan, pîran, cahilan." (H/58).

"Li derve bû şalixî, qirme bû, ku li hewa agir dikirin, hela hinek jî derketibûn cirîdê. Distran û dilistin. Xanim û Fêrik jî, ketin nava govendê, de êdî şabaş bû, wekî di ser serên wan re didan. De ez serê bavê xwe kim, hema yêk ez, kurê Selîm Dirbazê Kalo, min pênc çêrvonês da şabaş ji bo xwişk û birê. Nûrê kete serê govendê, govend edilî." (H/59).

"Ji çiyekî tê dengê def û zurneyê, kilamên govendan. Xortên zomeyê, wekî du payî kurap û qîzap in, xal û xwarzî, ap û birazî, berhev bûne li dora kuçikekî, govend girtine û dengê wan wê şeva li serê çiyê tu hew dizanî dengê horî û periyan e, xemla şeva reş." (H/269).

"Temamiya zomeyê berhevî ser hev du dibe. Sergovendî carinan xort in, carinan qîz, carinan ahil, carinan cahil. Tev dilîzin, heta pîra heftê heştê salî jî xwe şeşpence dihejîne. Can, hey can, hol hol, şabaş, ken û reqs..." (H/270).

"De gidî, di bextê te de me, êdî şahî kete nava gund. Herçî xêrxwaz nizanîbûn çî bigotana, çî bikirana. Bi destê xwe re di hewşa mala axê de bû ringeringa defa Tajdîn, dengê zurneyê erd û esman hilanî, xort û qîzan mîna kulîlkên derbiharê bi destên hev girtin, govend giran kirin. Bû " Şabaş, şabaş!" a Tajdînê defyan, lê li rasta gund siwar ketin cirîdê. Te digot dawet e, dawetekê biheytehol. Zurneyê bi Qeydayê Siwaran lê xist, xort germ bûn, xwîné di çongê kalan de list." (H/332).

2.4.4.5. Gerdek

Bûk û zava piştê dawetê dikevin gerdekê, ev jî rê û resmekê dawetê ye. Gerdek di nav kurdan de hem ji bo namûsa bûkê û hem jî bo mêrbûyîna zavayê pîverek e.

Heger zava nikaribe bikeve gerdekê ji vê rewşê re girêdan tê gotin. Wî zavayî dibin têxin nav ava sar. Dûre wî tînin û dibin ba bûkgerdekê. Heger wê şevê gerdek pêk neyê, şermeke mezin e. Ji ber ku millet şikê lê dibe ku bûk ne keç e. Heger bûk ne bakîre be, ji bo bûk û malbata wê rûreşîyeke mezin e. Wê bûkê dişeynin mala bavê û qelenê hatî dayîn jê distînin. Ew bûk ji aliyê malbatê ve tê kuştin. Di navbera malbatan de dibe sebebê neyartiyê.⁹¹

Em di romanê de carekî li rastî şeva gerdekê tên.

"-Bûkê xwe hinekî egle kir, lê paşê Egîd bi xwe rabû çira vêsand û bi destikên wê yên biricaf girt, kaşî nava cî û nivînan kir. Çû rûyê wê, paşê elbele ji nava nivînan derket û tişteki sar anî danî orta xwe û wê. Ew şûr bû. Bûk, wekî heta

⁹¹Celalî. M., h.b., r. 181.

wê çaxê bi tehrekî din bû, gava ku destê wê bi kalanê şûr ket, veciniqî û sar bû, paşê hêdika bû îskeîske wê. " Ev çi ecêb?" Ew xew bi xwe fikirî û êdî xwe zeft nekir, bi dengê ricafî û kelogirî got:

-Egîd Axa, Xwedê xêr bike, te çi qusûr di min de dît, wekî vê ecêbê tîni serê min?

-Tu qusûr jî min nedîtiye. - Wî bi sar bersiva wê da-

-Lê helbet?

-Ezî ehdkarî me!

-Ehda çi? Ne niha xelq li heviya te ne, niha sibehê kulfet ê li namûsa min binihêrin. Axir tu dizanî çi dikî li serê min? Tu mêrebî yî, talaşa te nîn e, lê xelq ê çi bibêje ji min re? Ne axir gune me, ez ê bibim benîşt devê xelqê.

-Ez ehdkarî me,- Egîd dîsa got,- xelq çi dibêje bila bibêje. Ez mêrê te me, kuta bû çû, xwe ez destê xwe li ser te hîlnadim, kuta bû çu. Nikarim, tu vê gavê li dewsa diya min, xwîşka min î, kuta bû çû. Te niha derz kir." (H/354).

2.4.4.6. Keçrevandin

Ji berî ve ye keçrevandin di civaka kurdan de heye. Heger keç û kur hevdu hezkiribin, dê û bav keçikê nedin an jî astengiyan derxînin kur, keçikê direvîne.⁹² Heger dilê kurikî di keçik de hebe lê yê keçikê di kurik de tunebe, kurik wê keçikê bi zorê direvîne, ev jî celebê din yê keçrevandinê ye. Ev herdu celeb jî di nav malbatan de dibe sebebê neyartiyê.

Gava keç an jî bûka yekî tê revandin hemû malbat û eşîr ji bo namûsa wê radibe ser piyan, doza kuştin û xwinrêtinê dikin da ku namûsa wan binpê nebe.

"-Pirîstavê dewletê,- Wî digot,- îro em eşîr in, nav û namûsa me Emerîkê û kuran daye binê piyên xwe, qîzekê me kuştine, bûk jî bê berate revandine. Em heylo ji Sînekê hatine, wekî wan daye zora xwe, hesab bi me re nekirine, em jî kurên bavê xwe ne, an emê bêne kuştin, an jî em ê heyfa xwe hildin, herin. Ev e qerara me. An tu yê serê min lê xî, an ez ê heyfê hildim. Ev temamiya kekê min e, ez heta ku li vir xwinê nerêjim, tu vegerandina kurê Ferhan axa tune. Xelq ji min re çi bibêje?" (H/253).

"-Hem bûka min birevînin, hem kinêza min bikujin, hem jî bibêjin, kerr be. Ecêba wiha kê dîtiye, kê bînaye? Qe tiştê wiha dibe? Naxêr, bila pirîstavê dewletê, pak dibe tevî şuxulê me nebe. Em Kurmanc in, an na em jî xweyî namûs in, pakiyê û xerabiyê ji hev dibijêrin." (H/254).

⁹² Dost j., h.b., r.35.

2.4.5. Xwarin û Vexwarin

Xwarin û vexwarin yek ji hêmanên folklorîk yê mezînan in. Xwarin, aborî û şeklê debara civakê nîşan dide. Herwiha, sifre, tertîba alavên li ser sifrê, dora danîna xwarinan, şêwaz û tertîba rûniştinê, şeklê ragihandinê, yekser çanda gel nîşan dide.

Xwarin û vexwarin ji bo hemû jîndaran pêwîst e. Ji bo ku jiyan bidome hewceye ku mirov bixwe û vexwe. Xwarin pêjî karekê pir kevnar e. Karê xwarin û vexwarinê ji mirovê yekem destpê kirye û heya dawiyê jî dê bidome.⁹³

Qismeke kurdan bi koçerkî jiyane, ji ber vê pisporê xwedîkirina pez in, herwiha giya û pincarên li zozan, çiya û baniyan baş nas dikin. Qismek jî di cih de jiyane, ew jî gelekî baş ji çandiniyê û xwedîkirina ajalan fam dikin. Ji ber vê mutfeqa kurdan ji aliyê xwarinên bi goşt, pincar û zerzewatê ve gelekî dewlemend e.

Heciyê Cindî bi her awayê xwarinên kurdan li me dide nasîn. Li sertêstê û têtêstê çî tê xwarin, gava mêvan hebe sifreyeke çawa tê danîn, li ser sifra şivanekî çî heye, em di romanê de dibînin.

"-Me ku şûst, hêja xwarin anîn, savarê bigoşt bû, texte tijî kirin, êdî çî bibêjî tunebû?! Araq, şerav, konyak, to û tomast, penêr û rûnê nivîşk, hingiv....Kebaniyê tu tişt nehêvişandibû." (H/68).

"-Bi mehdeyekî bi gotina te em pê ketin, tomast, şîr, penêr û rûnê nivîşk hûft xwe kirin. De xwarina çolê başqe ye, filankes, li merivan rûdinê, digivire." (H/99).

"-Qeysî, goşt, hewle, xoşav, rûn, penêr, hêk, de çî ku di gund de hebû, çî ku kevaniyê ji bo wê rojê di nava salê de xweyî kiribû, giş anîbû ortê." (H/160).

"Êvarê, Annayê textekî bi gotina te amade kir, êdî çî bibêjî li ser tunebû: Goşt, kalbas, penêr û rûnê nivîşk, totikên şêrîn, kanfêtên rengrengî, devê te li çî bigere. Vexwarin jî anîbû, araq, şerav..." (H/323).

"-Li ser sivreyan çî bibêjî tunebû: Qelîsêl, kibab xaşleme...Çî bibêjî, devê te li çî bigeraya hebû, bi ser de jî şerbet, çeçilmast, lê beriya êvarê çay û qehwe...Lê birinc û goşt, hemîn, bi stîlan anîn." (H/334).

"-Û wexta ku sibeh safî bû, rêwiyan serçavên xwe can kirin, rûniştin ser taştîya xwe, birinc û goşt, to, qatix û penêr, rûnê nivîşk û hingiv xwarin." (H/335).

"-Carekê jinan tirşîn derxist, anîn wekî bixwin, pêqask, silmsak, qenzîl." (H/338).

⁹³ Aktekîn O., "Çend Xwarinê Mûşê", candname.com., 14/06/2018, 14.15.

2.4.6. Mêvandarî

Mêvandariya kurdan, di nav gelê din de gelek tê pesinandin. Heger mêvanek bê mala kurdekî, ji bo razîkirina wî mêvanî her tişt tê kirin. Tew neyarek jî bê malê, derî lê nayê girtin û bi hurmetî tê ezimandin.

Ji bo wan mêvan, dayina Xwedê ye. Loma gava kesek bibe mêvanê wan gelekî hurmeta wî digirin, îzet û îkramê jê re dikin. Seba rehetî û xweşiya mêvan çî ji destê wan bê teksîr nakin û herdem deriyê wan ji mêvanan re vekirî ye.⁹⁴

Em di romanê de lê şahed dibin ku mêvandariya kurdan çawa ye.

Ji bo mêvan dest û rûyê xwe bişû; keç an jî bûka malê, sabûn û teştiyekê tîne. Bi ser de heke mêvan qebûl bike ew keç an jî bûk piyên mêvanê xwe jî dişûn. Bo rehetiya mêvan, cihên xweş tînan. Li gorî aboriya malê, sifreke dewlemend ji mêvan re tê raxistin

"-Paşê bi lez çû, teyştê av anî, di dêst de jî pêjgîr û sabûna reqî. Bûktî dikir. Îcar bi hejandîna destan û lebitandîna lêvan ez dame serwextkirin, wekî midasê min bêxe, lingên min bişo. Mîn helbet nehişt. Wê çaxê kir ku vekişe, lê ne, xwe egle kir û bi tehrekî liberxweketî îcar ez dame famkirin, wekî dest û rûyê xwe bişom. Mîn qayîliya xwe da û ser û çavên xwe aveke sar can kir, razibûna xwe gotê û wê bi bengezêkî xweş paşê teyştê avê hilda û bir danî ber malxwiyê malê." (H/46).

"-Wê wextê, kiçekeke rextê morî û mircanan di pêsirê de, misîna avê û sabûn di destê de, pêjgîr li ser milan, teyştê hilda û anî, wekî em tilî û pêçiyên xwe bişon." (H/68).

"-Bûkên malê doşek raxistin ser kulavê sekûyê, balgî anîn û cî nîşanî me dan, wekî em rûnên. Paşê av anîn, me dest û rûyên xwe şûşt, şîv anîn, xwar û hêja tezedan bû pîrs û hewalê me." (H/111).

"-Edet e, her tişt gotî di ciyê xwe de be. Mêvan ku heye, mêvanê Xwedê ye, mal mala wî hesab dibe, biçûk be, mezin be, yek e." (H/185).

Heger mêvan neyar bin jî bo rehetkirina wan xizmetekê bêqusûr tê kirin. Dîsa xwarin û vexwarina herî baş bo wan tê danîn.

"-Wexta ku em hê li Xezeliyê bûn, zivistanekê bînbaşiyê Romê tevî du eskerên xwe daxalife tê gundê me. Ber û bager bûye. Evên te mala mezinê gund dipirsin û diçin mala wî bi mêvanî. Rojekê, du rojan wisa li mala wî dimînin û mezinê gund, ez dibê'm Qeroyê rehetî bûye, ji çarneçara xwe, gava ku lê dinihêre mêvan ji malê dernayên, radibe tîrsê li wan difirîne. Eveên te jî, li ser vê xeberê dikin rabin herin, wê çaxê, rehet li yên we be jî, kalikê min ê Polat be jî, dibêje: " Ji navê me Kurmanciyê re şerm e, wekî wiha van bê rûmet verê bikin". Radibe diçe

⁹⁴ Celalî M., h.b., r.168.

cem wan, dikeve pêşiya her siyan, tîne mala xwe. Tevî hev du heft pezên wî hebûne, rojê pezekê ji wan re serjêdike û serên pêz yeko yeko li rex hev datîne. Emrê Xwedê, gava ke hre heft pezên xwe serjêdike, dixwin, rozgar jî xweş dibe, evên te jî- Bînbaşî û eskerên wî- tivdarekên xwe dikin, xatirê xwe ji kalikê min dixwazin û hêja pirs dikin:

-Tu çi şuxulî dikî?

Dibêje:

-Weleh çobanim!

Dibêjin:

-Hey mala te ava be! Çoban ew qas merîfet?

Dibêje:

-Çi bibêjim, axam! Edetê me yê Kurmanciyê wisa ye, Mêvan mêvanê Xwedê ne, heq e hurmeta xwe jê re bikin." (H/198).

Zivistanekê, meleyekê û du feqî jî gundê Şêxêrê radibin diçine gundê Bîrkan, dibêjin. " Me çi qas li van Êzdiyan kir, ew walnegeriyan ser dîne me, belkî bi xatircemî em wan bînine rayê, ser dîne xwe." Diçin rojekê duduyan di gund de dimînin û paşê ku lê dînihêrin tişt jê dernayê, ji hêrsan radibin li teniştê xwe dixin, nan û xweya wan pêpes dikin. Gava ku nenerên wisa dikin, gund di ser hev de re diçe, dikin ku ecêbekê bînin serê wî meleyê meriz, lê Qoto dibêje, mêvan in, tiştê wisa nebûye ku nabe." (H/272).

2.4.7. Alavên di nav Mal de

Di romanê de bûyer bi piranî li dervê malê derbas dibin. Ji ber vê em gelek li rastî alavên di nav malê de nayên. Heciyê Cindî şayesandina nav malê zêde nekiryê.

"Sivika malê wê saetê kulavê Xoresanê raxist, balgiyên xastûkî anî sparte dîwaran, wekî em bidine ber pala xwe." (H/45).

"Xêr e, - min xebera wî zûtirê birrî, - ciyê min pak e, du doşek di binê min de, lihêfa xastûkî li ser min, balgiyê bin bûl li ber serê min." (H/63).

"Okiz Anna ji bîr nekîrbû, ji wê re otaxa kurapê xwe vala kiribû, kulav û doşek, balgiyên xastûkî, xalî û xalîçe tijî wê derê kiribû, raxistibû, xemilandibû." (H/334).

"Kulav, lihêf, doşek, hildan û cara ewilîn di emrê xwe de stêrên gund stêrê xwe hilda, xalîçe li ser raxist û bi şuxulên din ve mijûl bû." (H/338).

2.4.8. Slavdayîn

"Slavdayîn ji demên berê yên dîroka mirovatîyê heya niha wek şêwazeke ragihandin û tevgera nişaniya aşîtiyê hatiye qebûlkirin û li ser vê kokê şîn bûye û dewam kiriye."⁹⁵

Silavdayîn yek ji qeydeyên rêzgirtinê yên di civakê de ye. Ragihandina di nav mirovan de bi silavdayînê destpê dike. Newergêrandina silavê wek şerm tê hesêbandin. Hindek silav wek dua an jî hêviyan in.

Di romanê de em silavdayînên cûr bi cûr dibînin.

"-Lezand, gihişti mê û hê ji dûr ve dey lê kir:

-Bereket be, şivano!

-Li ser çavan, li ser seran, -wî silava min giran vegirt, pak dêhna xwe da min, zêde kir,- oxir be, wiha bi kû de?" (H/38).

"-Wey tu di ser çavan, ser seran re hatî, mêvanê ezîz! De kerem bike, kerem bike!

-Çavê te li dinê be, - min pê re pê re silava wî vegirt û da pey Moskovê rispî." (H/45).

"-Şeva te bimîne xweş.

Got û walgeriya ser kêlekê, wekî razê.

Min razîbûna xwe jê re got, caba wî da:

-Herî ser xweşiyê." (H/65).

"-Wey Xalê Şewêş, wey mêvanê ezîz, hûn di ser çavê min re hatine, ew çi qewimî, hûn di vir de bîter bûn?! De kerem bikin.

Got û silava me şêrîn şêrîn vegirt. Me jî silaveke şêrîn lê kir û em çûne dest û rûyên hev dû." (H/110).

"-Wey hûn di ser serê min, ser her du çavên min re hatine, dostîno, dostên min, dostên kal û bavan, de kerem bikin." (H/111).

"-Wey hûn di ser çavên kurapê xwe re hatine, wey hûn di ser serê min re hatine, xerîbê min, xerîbîstanê min." (H/116).

"-Erê, lawo, got, - wî şivanê kal got,- hûn di ser çavên xalê xwe re hatine, eferim ji we û şîrê we re." (H/99).

⁹⁵Keskin A., "Türk Kültüründe "Selamlaşma" ve "Vedalaşma" Hakkında Genel Bir Değerlendirme", Türk Dünyası Dil ve Edebiyat Dergisi, j.43, Bihar 2017, Ankara, r.128.

"-Êvarxêra we, gelî cimaet!

-Bi xêr û silametî! - Herçî li odeyê gotinê.- Kerem bike, bi pêş de were!" (H/202).

"-Sibeha te bi xêr bi, Elî Axa!

Ê din nenas bû, got:

-Brêv.

Elî Axa bi dest xwe re silava wan a şêrîn şêrîn vergirt, hişê xwe berhevî ser hev kir, di pey wan re got" (H/210).

"-Ev jî, ji qewmê min re. Li axê jî silav bikî û bibêjî, deynê min bû... Wekî din, Xwedê jê razî be." (H/214).

"-Wey tu di ser çavan re hatî, tu di ser seran re hatî, destbirakê min. Kerem bike bi pêş de were." (H/217).

"Paşê bi dorê silaveke dirêj dane hev du, hela yekî bi pakî silavvegirtina xwe tamam nekirî, ê din digot " Elî Axa, Egîd Axa, hû her du di ser çavan re hatine, di ser seran re hatine." Wan jî, kin digotin, "Çavê we li dinê be, qe hal û kêfên we çi ne?" Û wisa bi dorê derbasî ên din dibûn.

Serdawetî Koroyê Keleş wê çaxê ji ciyê xwe rabû, got:

-Gelî cimaeta berhevbûyî, hûn berê ewil di ser çavan, di ser seran re hatine!" (H/223).

"-Axa, -ûso dest pê kir,- hûn ji wê derê heta vir di ser çavên min û bavê min re hatine!

-Xwedê çavên te xweyî bike. - Xwazgîniyan lê vergerand." (H/223).

"Hema wê demê Ûsoyê xwe li sêrî ketî hate hundir û silava şev nivê şevê da cimaeta rûniştî.

-Wey bi xêr hatî, Ûsoyê min." (H/274).

"-Egîd jî hate hundir û sibexêrî dayê. Elî bi serê poz silava wî vergirt û dîsa di pencereyê re li derve nihêrî." (H/327).

"-Belê,- wî got,- qewalê me, helbet hûn di ser çavan, di ser seran re hatine.

-Çavê te li dinê be, Okizê min! -Qewal Dodo bi kulzikî got." (H/344).

Di silav şandin an jî anînê de gotinên wek "li ser seran, yê ku aniye, yê ku şandiye" tên gotin.

"-Şukir sax silamet e, -min bi zarekî xwe gotê,- wê jî hûn silav û kilav dikirin.

-Li ser çavan li ser seran, ê ku aniye jî, ya ku şandiye jî.- Meyaneyê silava min şêrîn şêrîn vergirt." (H/46).

"-Silav li axê kir, li ber temene bû, paşê li binpiya odayê rûnişt û ji aliyê axayê silav lê kir.

-Li ser çavan û li ser seran.- Elî Axa gotê.- Ê ku şandiye jî, ê ku aniye jî." (H/212).

2.4.8. Mizgînîdayîn

Mizgînî, xeberê xêr û xweşiyê ne. Gava yek mizgîniyê dide, dibê "Mizgîniya min li te" yê ku mizgîniyê hildigre dibê "Mizgîniya te li serseran û serçavan."

Di romanê de hêmana mizgînîdayînê gelek hatiye bikaranîn.

"-Nûrê mizgîniya min..."

Nûrê, wekî jinekê xwendî, navsere ye, mîna carên din dibe pîrçîniya wê, dike ku xweşiyên xwe li min bike, lê gava ku li min dinihêre, kerrbûna min, xwêdana ser rûyê min, şaş û mat dimîne, bi paş de vidikêşe.

-Mizgîniya te... mizgîniya te... li ser seran, her du çavan... lê çi mizgînî? - Tevîhev dibe, nikare xwe li ser lingan bigire- Mizgînî? Ka kiyê min heye?" (H/26).

"-Mizgîniya te li ser seran, li ser her du çavan,- gotina xwe diwekilîne- lê ka li kê derê ye birayê min?" (H/27).

"-Nûrê, çavê te ronî!"

-Nûrê, mizgîniya min ji te re!

Nûrê, şukir ji vê gavê re, birayê te hat!" (H/58).

"-Û demxatirê xwestin ji cimaeta xwe xwe li serî ketî, berê xwe dane aliyê çasta Qersê, wekî bi gawekê zûtir mizgîniya xêrê bigihînin axayê êla Sîpkan." (H/276).

"-Mizgîniya min, Elî Axa, - wî dîsa got,- şukir Egîd Axayî sax î silamet e!" (H/306).

"-Mizgîniya te, mizgîniya te li ser çavê min, - Elî Axê destê xwe da ser çavê çepê,- li ser serê min, lawo." (H/306).

"-Elî Axa mizgîniya Şebabê Balo caniyêke tor dayê, desteyek kinc, cotek sapok, gelek ezet û qulix jê re kir di nava wan çend rojan de û bi xwe heta Newala Dirbo ew verê kir." (H/311).

"-Kurap, mizgîniya min!"

-Mizgîniya te li ser çavan û li ser seran.- Egîd gotê- Ka çi bûye?" (H/353).

"Geli Dîgoriyan, Elî Axa, mizgîniya min ji we re! Egîd Axa tê, dusibehê wê li vir be! Egîd Axa tê..!" (H/332).

Yên ku jê re mizgînî hatî, xelatekê dide kesî ku mizgînî aniye.

"-Erê, erê, - wî bi awayekî miqîm caba wê da.- Sibehê van çaxan zûtir tu yê bibînî, lewma az hatime. Xalê Mihê mizgînî anîbû gund. Ew ku hema ji maşînê peya bû, min ji xwe avête ser piştta Leylokê, xwe bi te re gihand, wekî mizgîniyê bidime te.

"-Mizgîniya te li ser serê min, li ser van her du çavên min. - Wê lê vegerand û kilîteke biçûçik ji ber piştta xwe derxist, çû derê sandoqeke li binê stêrê vekir, gilover î zêr derxist, anî danî ber wî." (H/53-54).

"-Mizgîniya te jî, liser van her du çavan, li ser serê min. Li darê dinyayê, devê te li çî digere, bixwaze, gidiyo, ez bextê te, kur û qîzên te me, Şao, ez bi qurban Şao! " (H/150).

"-Elî Axa, mizgîniya min, Egîd Axa tê!

"-Mizgîniya te li ser her du çavan, li ser seran! - Axê got- Here nava hespan, kîjan dilê te xwest, wê jî ji xwe re bibe!" (H/332).

2.4.9. Lîstik

Lîstik, beşek ji merasimên kêf û şahiyê ne. Biçûk û mezin her kes li gorî emir û asta xwe listîkan dileyîzin. Bi van çalakî û pêşbazîyan civak şên dibe.⁹⁶ Perteve Nail Boratav jî pênaseya lîstikê wiha dike: "Mirov, bi piranî zarok di demên xwe yê vala de bêyî ku di hewldana hilberandin an jî xizmeteke pewîst de bin bi tenê ji bo kêfxweşî û şahiyê dema xwe bi hinek çalakîyan ve derbas dikin, ji wan re lîstik tê gotin."⁹⁷

Helbet lîstikên zarok û mezinan ji hev cuda ne. Lîstikên mezinan wekî yê zarokan ne çalak in. Ên zarokan bi piranî li dervê malê tî lêyîstin. Mezin zehfirîn lîstikên ser masê (tevlê, kişîk, dame hwd.) dilîzin.

Di romanê de em du caran li rastî listîkan tî.

"Egîd Axa hingê rabûbû, êdî ji ber dêrî nedihate hundir, carinan bi xortên hevalên xwe re tûr, mêrkuçik, an ji koşkepêlx dilîst, carinan bi rû ve dikeniya û beşerxweş dibû." (H/236).

Lîstik, di nav mirovan de tîkiliyên dilsoz pêk tîne. Zarok hevalên xwe yê lîstikê, zû bi zû ji bîr nake.

⁹⁶ Celalî M., h.b., r.185,186.

⁹⁷ Boratav P. N., (1994), *100 Soruda Türk Folkloro*, weş. Gerçek ç.3., İstanbul, r.232.

"-Têmuîr, qurban, tu min nas dikî?"

Min got:

"-Ew çî gilî? Ne min û te me bi hev re kap dilistin, birr û çavgirtokek, pêşkoguro." (H/299).

2.4.10. Jiyana di Gund de

Civaka di romanê de, jiyana xwe di gundan de derbas dike. Herwiha debara wan jî bi gelemperî bi ajalvanî û cotkariyê ye.

"Kûrekendiyan giş di kolxozê de ne û tevî kolxozvanên gundê Haytaxê yên cînar, dostên kal û bavan, pembû, tiriyan, bax û rezan, bostan û pincarê bêcer dikin, onceyê hiltînin datînin. Xweliya deşta Yêrêvanê ya tev de zêr bi xebatkarên xwe yên teze re gul vedide, dixemile, bi gûşiyên tiriyan şêrîn î cinetî, bi hezar turletehmî." (H/34).

"Wê navê, çendek jî kete ortê, herkes bi şuxulê xwe de ketibû, kî hay jî kê hebû? Yekî zeviya xwe çeqîl dikir, kevîr qûç dikir, yekî av dida mêrg û çayîra xwe, yekî avahiyê xwe teze dikir." (H/240).

"Vê carê jî bihar hat, xelqê êdî cot û cobarê xwe kiribû, cî ciyinan baweriya te hebe giha êdî rabûbû, wexta wî dirûnê bû." (H/303).

Gundî derfetên jiyane bixwe diafirînin, di her malekê de tenûr heye, nan, kade û xwarina xwe li ser wê dipêjînin.

"-Û wê gavê ku em wisa di xwe de dişewitîn, min dêhna xwe dayê, diya min a reben rabû çû dewar berda, ar kire şikevê, misîn jî tenûrê derxist, hevîr stra." (H/126).

"-Û diya min derê têra gênim jî vekir, dîsa ar anî, wekî kadeyan lê xe, haziriya min bibîne, ku ser bavê xwe yê girtî herim." (H/127).

Yên ku xwedî ajalin li gorî şertên xwe wan xwedî dikin. Di romanê de em zêdetir li rastî xwedîkirina dewaran tên.

"Xwe bi xwe çû çêlek berdan, xwe bi xwe jî bir tevî garanê kir." (H/134).

"Wextê dotina çêlekan, diya Gulîzerê û xwişka wê Gevez çûne tewleyê, wekî çêlekan bidoşin." (H/233).

"Ew ku êdî berbanga sibehê teze bû, wexta dewarberdanê, Ato û Hekşan gotî di wexta xwe de hişyar bibûna, wekî di wextê de çêlekên mala axê bihatana dotin, binê wan bihata paqijkirin û berdana bibirana nava garanê." (H/238).

"Tava biharê şêrîn bû, kelekel kete erdê, gul û gîhê serikên xwe bilind kirin. Cot û cobar derketine çolê, kewşên pê de pê de gul veda, ji derve dengê holtagan dihat, dengê maçgalan; horovêl, ho ho... Kalekala miyan, barebara berx û karan, hêlehêla şivan û gavanan, dengê berxvan û golikvanan dihate bihistin." (H/236).

"Roj, hefte û meh derbas bûn. Êdî sala 1907'an bû, derpayîza wê salê. Xelqê derengîketî sapên xwe ji çolê dianî, karê xwe û zimêrê zivistana dirêj dikir, ê ku diçû aşê xwe dikir, ê ku diçû Qersê nift, sabûn, piçkê, xwê, arê adêrsê, pirtî distand dianî, ê ku pez û dewar, gîha, rûn û penêr, toraq û hiriya xwe difiro, karê def û daweta kur û qîzên xwe dikir." (H/331).

Ji bilî jiyana di gund de demên biharê gundî diçin zozanan û li wir kon vedigirin.

"Êdî êlê tivdarekên xwe dît, em temam derketin dora Warê Çilkaniyan. De mala xweyiyê zozanê neşewite! Gul û gîha, xuşexuşa avên cobar û kaniyan, wîtewîta çivîkên li rûyê esmên, gidî em ji hiş dibirin. Lê te li bejn û bala xortên Sîpkani yên zirav î takrihan binihêriya, qîz û bûkên bedew, bedew weke horî periyên binihêriya, paqijiya malan, kon, çit û berçitan, wê çaxê te ye bigota, xêra xwezî qe mirin tunebûya, kalbûn, pîrbûn tunebûya." (H/166).

"Bi vî tehrî mil girtibûn zomeyan, obeyan. Li her deran kalîna miyan, barebara berxik û karan, uereura dêwêran, hîrehîra hespên tewilandî, ewteewta sayîlan dihat." (H/268).

"Xelqê li çolê êdî vegeyriyane gihiştine konên xwe. Hindek kuçikan dadidin, hinek şiv hazir dikin, hinek jî li derve rûniştine, an jî sekînîne bi dengê nizim û bilind bi hev re xeber didin." (H/269).

2.4.11. Hiqûqa di nav Gel de

Gel ji bo pirsgirêkên xwe çareser bike pergalek pêkaniye. Ji bo parastina wê pergale tevdirên hewce dîtine û rêzikên kevneşopî dane hev. Ji sîstema ku wan şewazên çareserkirinê û rêzikên kevneşopî lêkolîn û teftîş dike re, hiqûqa gel tê gotin.⁹⁸

Civaka kurdan ji mêj ve ye xwe bi jiyana eşîretiyê ve girtiye. Jiyana eşîrkî ji wan re ewle hatiye. Her eşîr xwediyê axayekî ye û gava ew axa dimire axatiya eşîrê derbasî kurê wî dibe. Heq û hiqûqa civakê jî axa diparêze. Di nav wan de axayên baş û nebaş jî hene. Em di romanê de ji çavê axayê ve civakê û ji çavê civakê ve jî axayê dibînin.

Heger li gel saziyên dewletê karek hebe axa muxatab dibe û berdevkiya êla xwe dike.

⁹⁸ Dursun A., (2016), *Türk Halk Hukuku*, weş.Ötüken, İstanbul, r.55.

"-Xalo, hema ew welat e gotina me, gidî, di riya Xwedê de be, ji me re riyekê bibîne, em êlê walgerînin, bînin, em li nava Romê ji destê xwe diçin.

-Rê ew e, wekî hûn herin cem Hesên Axa û Gulî Cewar Axa derdê dilê xwe ji wan re bibêjin, ew ê ji we re îlacekî bibînin. Lê ji bext re ew jî niha ne li vê derê ne." (H/100).

Gava di nav du eşîran de şer û daweyek çêbe, pêşiyê axayê herdu êlan berhev dibin û di nav xwe de meselê çareser dikin. Ji bo silhê an jî bo xelatkirina kesekî bi axa û began re bazarî tê kirin. Pêşî axa û beg paşê jî xwediyê daweyê bi xelatan tîn razîkirin.

"-Îcar wê çi be, Feko digot, ji axê re mehîneke kihêl anîne, weke semer pez anîne, çux û etlez anîne, çek û rihal anîne...Devê te li çi bigere, anîne.

-Ê erê, lê ji Cewzo Begê re?

-Hemîn ya wî jî başqe; dîsa hesp, dîsa pez, dîsa û dîsa...

Qîza min bê kuştin, qîza min, navê wê li her çar qulbeyên dinyayê belav bibe, nav û nûçikan lê bikin, lê ji ber xwîna wê ve, ji ber namûsa ya din ve xelq bike û bistînei xelq bi xwînê û namûsê ve hilde..." (H/279).

Di deverên gundewar de qanûnên dewletê zêde nayên pejirandin. Li wir axa li gorî kêf û menfeata xwe tevdigerin.

"-Te nemerivahî got û çû, - wî xebera xort lê vegerand,- tu qe ferz dikî çi hate serê me, çi nehat? Yekî îzna wî tunebû kinceke pak li xwe bikira, yekî îzna wî tunebû hesbeke rind xweyî bikira, an jî çekeke teze girêda. Heke xatir, hemîn xatir, hekena, axê bi zorê jê distand." (H/88).

"-Bo weleh wisa ye,- Etarê Şewêş, wekî yekî simbilqalîn î destpê bû, kete nava xeberdanê- Heyran,- wî wiha bi fesal got,- bo weleh min nedîtiye, lê bihistiye, got, axayên Mala Kok Axa reayetê tînin li kamên xwe girêdidin, dajon. Dibêjin, ew jî li dewsa silava me, yanê ew heqê me, ê ku gerek we ji para xwe bida me, çawa xerc. Lê got, mele, berê şêxan, ew berê pîran, koçek, feqîr, sofî, yeknavan... Çi tînin serê me, ew jî bila Xwedê bizanibe. Ew bûne xweyîyê pêz, lê gundî jî destê tunebûnê terkiserî gund û şeheran bûne. Ev e halê me." (H/366-367).

Cihên dadgeh hebin millet pirsgerêkên xwe li wir çareser dikin.

"-Paşê, axayê me her sal payîzê rûn, penêr û hirî ji me distand. Wextekê bi şûn de jî, gava ku me pîrr hindikî mal û avahî li erdê wî çêkirin, rabû xerc û xeracên me duqat, sêqat kir. Sala îsal jî, pênc hezar manat avête ser wî çil malên me. Me lavahî kir, em çûne eteka wî, lingên wî, me got: " Mûrad Axa, bidî xatirê Xwedê, em nikarin ji binê vê xercê derkevin." Dan û nedan, dilê wî necamêrê kurê necamêran rehim neketê. " Pak," me gotê, " em ê herin şikyatê te bikin!" Em çûn dîwanê, me şikyat kir." (H/174).

"-Di pey şikyat re, de êdî ez bextê te me, Mûrad Axa bû gurekî har, bi xwe de ket. " Çawa ye?" Got, "Ev çilût pilût herin bal Dîwanê, li ser min şikyat bikin?" Û rabû bi destê me hinekan, hema yek jî bi destê Avasê kurê Şeko, rabû şer avête me, got: " Deynê min li ser wî gundî ye, her malek pêncî manat. Kutil mitil pereyên min hahanga bidin!" Dîwanê jî, giliyên wî bi heq kir, kire kaxiz, jî pênc hezar manatî kire heft hezar, de hesabê xwe bigirin." (H/174).

2.4.12. Wextên di nav Gel de

Milletê kurd ji bajaran zêdetir di xwezayê de jiyane. Bo pîvandina demê, caran tevgerên rojê caran jî yên xwezayê bi kar anîne.

Heciyê Cindî, gava qala wextê bûyeran dike saet û teqwîmê bi kar nayîne, li gorî heyama rojê û salê, demê bi şibandinan kifş dike.

"-Ez û apê Moskov ku ghiştin bêndera kolxoza gundê Kûrekendê, tarî jî erd hilçinî." (H/45).

"-Rojtira din, - Apê Moskov duxebara xwe kir,- hela kew neketibû sibehê, ez, Nûrê, Elîxanê rehmetî, pênc şeş mêr û jin pev ketin, siwar bûn û dane serê rê, me got, Tilik, tu li kû yî, em hatine te." (H/56).

"-Şevê xwe êdî pê re digihand, tariyê erd hildiçinî û bere bere dengê tivingan kerr dibû." (H/72).

"-Got, cebirxane temam ji esker standin û dîsa bi wê qiçê siwarên Silêman bi kewketina sibehê re vegeriyan nava êla xwe." (H/78).

"-Ev her sêkên te giliyên cimaeta xwe ya li ber qirê yeko yeko kîrîne guhên xwe û hema şevtita din, gava ku hê kew neketibû sibehê, dane serê rê." (H/97).

"-Got, dîkê sibehê teze xulxulandibû, gava ku em rabûn, me demxatir xwe ji Manûkê Defçî, ji mala wî, ji Behriyê şivan xwest, em destgerdenî hev bûn, Ya Serê Sibehê, Ya Xwedê got û dane serê rê." (H/115).

"-Em ku ghiştin Dutaxê, êdî sî bû wekî lingekî, - xebera xwe ya birrî vî tehrî bi pêş de bir Şewêşê kal-" (H/137).

"-Ez Xalê Emerîkê, Xalê Miho, Xalê Memo, dê û bavê min û kevaniya min. Dîkê sibehê hê bang nedabû em ghiştine gund." (H/144).

"-Lê gava ku kew kete sibehê, me dêhna xwe dayê çî? Her çar jî, giran nexweş in, ber pesnan xeber didin, ji xewê ranabin û hey dest û lingên wan dihejin." (H/145).

"-Ro êdî bilind bûbû, weke bejna min. Û me hew dêhna xwe dayê, li çî binihêrin: ji Geliyê Pûrto birrek siwar derketin û bû qirçeçirça tivingên wan." (H/152).

"-Em ku hatin nava gund, êdî tariyê erd hilçinîbû, gişan derên xwe dadabûn, me derê kê kuta kesî derî li me venekir." (H/204).

"-Min zû zû dengê jinê û qîza hêsîr da birrîn, merkeb bar kir, de gidî, hela kew neketibû sibehê, em ji nava gund derketin..." (H/205).

"-Û hema wê êvarê, gava ku tariyê êdî erd hilçinî, her kes belav bû çû mala xwe, yekî kerreker xwe bi mala axê re gihang." (H/261).

"-Êdî berbang bû, dikê sibehê gazî kiribû û hema wan çaxan bû reperepa simên hespan, ji gund derketin." (H/267).

"-Ji çi re êdî wext e? -Wî bi cureyekî enenekirinê pirsî,- Dikê nîşev êdî bang daye." (H/389).

"-Sibeh êdî kartû bûbû, ro hatibû nîvro, pezê danan çûbû û bi tenê hêja her du birayan li çavên hev du nihêrîn û bi beşereke xweş hev du dane famkirin, wekî êdî rabin, dereng e." (H/368).

"-Êvar hêdî hêdî mîna teyrekî per vedide, erdê hilçîne, kembera tariyê girêdide." (H/269).

"-Sibehtirê, gava ku hê kew neketibû sibehê, Sêwî û zarokan êdî ji mereka Hûto derketin." (H/377).

Dîsa demsalan jî li gorî bûyerên xwezayê li me dide nasandin.

"Ma heta ku erd qul bû, kadeyên Serê Salê bi heft tehman lê xistin û serî ketê pêz. Pez za. Belekiyên berfê hêdî hêdî xwe dane serê çiya, gelî û gebozan." (H/165).

"Lê gava ku hel li berfê ket, bêhna bayê biharê hat, erd qul bû û belekiyan xwe da serê çiyayan, gund dane me." (H/175).

"Bihara sala 1918'an kerreker dihat, dipistand guhê mêriv, wekî karê cot û cobaran bike. Legleg êdî vegeyabû, reşeyan erd û esman dixemilandin." (H/372).

2.4.13. Hekîmtiya di nav Gel de

Miletên gundewar û yên dûrbajêr karên tendirustiyê li gorî zanebûna xwe pêk tînin. Boratav wiha pênasaya hekîmtiya gel kiriye: "Milet ji ber bêderfetiye an jî sedemên cuda ve bi ser bijîjkê de naçin an jî naxwazin biçin. Ji bo kişfkirin û başkirina nexweşiyê serî li pêşerê û hêvotinên cuda didin, em ji wan hemû pêşerê û hêvotinan re dibêjin hekîmtiya gel."⁹⁹

Hekîmên gel bi dermanên nexweşiyên yên xwezayî dizanin. Di warê hekîmtiyê de jin ji mêran pêşketîtir in.

Em di romanê de bi tenê carekê şahedî li hekîmtiya gel dikin.

⁹⁹ Boratav P.N., h.b., r,122.

"-Yên sax vegeriyan, yên ku mirin heq kirin, yên birîndar derman kirin, postên berxan dikişandin ser birînan, bez û qîr datanîn ser birînan, wekî bicebirînin, qenc bikin." (H86).

2.4.14. Xwedîkirina Hespan

Xwedîkirina hespan ji bo kurdan pêwîstiyek bû. Hespan karê ragihandinê pêk dianîn. Herwiha di şer de hesp dihatin bi kar anîn. Hema hema di her malekê de hespek hebû.

Axayan ji bo nîşandana dostiniyê, hesp diyariyê hev dikirin.

"-Bise, - Niho got,- erê, erê got, yek hatibû, Îbrahîm Axayê Silêman Axa mehîna xwe pêşkêşî wî kiribû, lê wî hîlnedabû, razîbûna xwe jê re gotibû, li dewsa wê, pêşkêşekê sivik hildabû." (H/112).

"-Belê,- evê te got,- axayê min digot, bila Elî Axa wê yekê bibexşîne, hema li dewsa wê ez mehîna li binê xwe ya kihêl jê re dişînim. Bila ji xwe re lê siwar be.

-Xwedê wî rûspî bike.

Elî axa got:

-Lawo çi cayîz bû?

Û zû zû pêlav avêtin ser lingên xwe, wekî bi çavê mişterî li hespê binihêrin.

Mala hespê şewitî, bi xwe hesp nîn bû, teyr bû. Çavê wê li bazdanê bû, xwe de dilîst, pêkolî dikir, li hêviya siwarê xwe bû, wekî bifire, xwe bide serên çiyayan, hilparkî esmanan bibe." (H/213).

Beriya seferan, hemû kêmasiyên hespan dihatin temam kirin. Em di romanê de dibînin ku kurd di xwedîkirina hespan de bi çi qasî pispor in.

"-Beriya razanê têr av dane hespan, alifê wan danê. Paşê destê berbangê dîsa çûne tewleyê, vê carê îcar xulam û xizmetkarên mala axê hesp rind mehes kirin, ji wê û biş şûn de şitav kirin. Pîneyekê zivir şil kirin û bi wan hem toza li ser hespan hildan, hem jî canên wan paqij kirin. Dêlên her sê hespan jî paqij şûştin, bi ava sar helbet, girêfûtê lê girêdan, ji wê û bi şûn de teze zîn û bûsatên wan lê kirin, lê hema wisa kirin, wekî tengê wan neşide." (H/317).

2.4.15. Naskirina Giyayan

Pêwîst e ku mirovên li gund an jî dûrbajêr dijîn, gelekî baş giya û pincaran nas bikin. Giya cûr bi cûr in, yên ji bo xwarinê û yên ji bo dermanê cuda ne. Giyayên bijehr yên divê neyên xwarin jî hene. Zanîna giya û pincaran hêmaneke çandî ye.

Di romanê de navê hindek giya û pincaran derbas dibin.

"Li aliyê milê rastê û jêra guhêrê, rastekê dûz bû, meskenê gul û gîha, pincarên tehmtehmî, bêhn bêhnî karîng û topizên biçûk, mezin. Warekî adan î şên î bi bêhn î bi bereket bû ew guhêr.

Got şev gelekî xweş bû, bayekî nerm hêdika dilîland û bêhna gul û sosinan, rihan û beybûnan, hezar kulîlkî li wan mêrg û beyaran belav dikir, xweş dikir." (H/91).

"Qîz û bûkên gund wan rojan gelekî diçûne pincarê, diçûn dianîn, wekî zivistanê bikin tirşîn, diçûne heylo Geliyê Kewokan, Gera Koço, Girê Pozbirr, Newala Hirçê, li kê derê hebûya pêqask, û qenzil, so û mendik, xîtik û sîrmî, qencelîsk û silmask, siping û tirşo, pûng û cetirî, xîlk.. Hinekan dianîn ji bo tirşînê, ên din ji bo hişkîrinê, wekî bavêjin nava xwarinê, hinekan jî dianîn ji bo toraqê, penêr." (H/241).

2.4.16. Remildanîn

Baweriyên wek remil, fal, nivîşt û nezeran di her miletê de hene. Mirov nikarin her tiştî bi rêyên tîn zanîn bi dest bixin, lewma hewl didin ku bi bikaranîna hêzên xef bi zorê tesîrê li xweza û zagonên xwezayê bikin, ji hemû hewldanên bi vê armancê tîn kirin re efsûn tê gotin.¹⁰⁰

Remildanîn ji aliyê dîne ve şaşiyek be jî di nav civakê de cihê xwe girtiye. Li ba falbêj û remildaran, nezer tê rakirin, dehatû tê aşkerakirin.

Mînakên bi vî rengî di romanê de jî hene. Gava Elî Axa ji ber nexweşiya Egîd Axa neçar dimîne, mirovên li rexdora wî pêşniyaza çûna ba koçekê lê dikin.

"-Got, -Weleh xalê min rast dibêje,- Yekoyê Bacelûyê got.- Kanê, Elî Axa, hela rehmet li kekê min be, ca bibêje, ka we gazî Koçek Gulê kiriye?"

-Ka ew çî dizane, wekî gazî bikinê?"

Kurapekê Elî Axa li dewsa axê cab da.

-Hey mala we ava be, ya ku Koçek Gulê dike, qet heftê fêlşêrên te nikarin bikin.

Çend kalên bi rîdan xebera wî di dêv de girtin.

-Dizanî çî,- Dîsa Yekoyê Bacelûyê kete nava xeberdanê,- - Ez nizanim Koçekiya Gulê çawa ye, lê ez dizanim ewe zehf baqil e, belkî ew riyekê ji hev derxe, an na bi zora me dihere, heyran." (H/228).

¹⁰⁰ Örnek S V., (1998), *100 Soruda İlkellerde Din, Büyü, Sanat, Efsane*, ç.2, İstanbul, r.135.

Li gorî baweriya di nav gel de koçek, mirtib, tiştên nepenî dibînin û dikarin ji xeybê jî xeber bidin. Gava tişteke nepenî tê serê yekî, ji bo penîkirina rewşê diçin ba wan.

"-Bi giliyekê Egîd Axayî sax bû, ew bêgumaniya berê hilat û êdî koçek, mirtib neman, wekî nedîçûn, nedipirsîn. Ji her deran, her kesî caba xêrê digot. Got, carekê Koçek Gul ketibû nihikê, gotîbû:

-Qe bila Elî Axa nefikire, şukir Egîdê bira sax î silamet e, wê qulixek dane, ji xwe re bi kêf bi kêf dixebite. Lê tu were, bi min re bi zimanê Ūrisî xeber dida, ne zimanê me." (H/300).

2.4.17. Cil û Berg

Hêmanekê din ya ku çanda miletê nîşan dide cil û berg e. Şiklê cilwergirtinê derheqê ol û bawerî, dewlemendî û xizanî û herwiha rojên şîn û şahiyê de agahiyan didin.¹⁰¹

Cil û bergên jin û mêrên kurdan ji yê miletên din cudatir in. Di dawet, cejn û şahiyên de cilên taybet tî wergirtin. Di romanê de em li rastî cilwergirtina jin û mêran tî.

2.4.17.1. Cil û Bergên Mêran

Cilên mêrên kurdan ên resen şal û şepik in, ev kinc ji desmala nokoyî, êlek, şot û şal pêk tî herwiha wek aksesûar alavên xemilandinê jî bi wan cilan ve dikin.¹⁰² Bihayê cil û bergan, li gorî aboriya mirovan diguhere.

"Mala Ūsoyê Adil tijî mêr bûn, gişan kincê paqij li xwe kiribûn, çek, rihal, kolozên wan ên devetûkî, rîşiyên şarên wan ên reş î qeytanî, çux û bêşmêrtên wan ên teze, şal û sol û çarixên teze pêkirî, goreyên nexşnexşî; êdî çi bibêjî wan li xwe nekiribû?! Di ber piştî hinekan de, qemeyên zîv î avzerkirî bûn, di ber piştî hinekan de kemerên zîv û zêr bûn, di destê gelean de tizbiyên karîbar hebûn, hinekan jî qelûnên xwe dikişandin û kişandina wan dû û dûxan tijî odayê bûbû." (H/222).

2.4.17.2. Cil û Bergên Jinan

Cilên jinên kurdan yê xas kiras û fîstan in, herwiha lêçek, temesî, destmal, kulav, çarşev, şal, şalwar, poşî gîfî, parzûn, çentên rîs, xurçik, buxçe, lewendî, kildan

¹⁰¹ Celalî M., h.b., r.175.

¹⁰² Ozkan H., "Kevneşopiya Kinc û Bergên Kurdan", www.yuksekovahaber.com.tr., 14.08.2018, 21.25

û têt, alavên sergirtin û xemilandina wan in.¹⁰³ Em dizanin ku li hindê herêman kofi jî didin serê xwe, li ber bûkityê zêran li wê kofiyê dikan.

"Bayekî tenik li kofîkitanê wê dixist û şara hamûdî ji ser sêrî geh bi vî aliyî, geh bi wî aliyî de difirand." (H/57).

"-Diya min çi kir? Vegeriya hat, qutiya li binê stêr kaş kir, anî nêzikî tenûrê, pê kilîtekê piçûk vekir, kofiya xwe ya bûkityê derxist û zêrên li ser yeko yeko jê kir." (H/129).

"-Qe na, - Egîd gotê,- qe na kincên me li xwe bike, kofi, kiras, hevalkiras, qe na... Yekê jî, tu hemîn dizanî kincan bidirûyî, ji bo wan zarokan jî ên Kurmancî bidirû." (H/339).

Keçên kurdan gelek girîngî didin cil û xemla xwe, dêreyên rengo rengo li xwe dikan, dema hemû têne ba hev, dîmenên rengin diderkevin holê.

"-Qîz û bûkên gund dêreyên qîçik, sor, kesk lê, temezyên reng-reng li serî, kofi kitan, fino û qotik girêdayî, di nav gul û gîhê de te digot her yek kulîlk e, bi tenê ferqî ew bû, wekî ev di ciyên xwe de dihejyan, diçûn." (H/236).

2.4.18. Ol û Baweriyên Êzidiyan

Lêkolîn didin nîşan ku peyva êzidî ji peyvên "ez dayî" an "ewê ez dame" tê.¹⁰⁴ Ola êzidiyatîyê, oleke qedîm e. Li gorî hindê miletan, êzidiyatî ji olên cihû, xiristiyanî, misliman hwd. derketiye. Çavkaniyên bi vî rengî dixwazin êzidiyatîyê bêsil an jî pûç bikin.

Êzidî, heta roja me jî ji ber hurmetgirtina Melekê Tawis bi giştî wek "Şeytanperest" hatine zanîn, lê di rastiyê de êzidî yek afîrênerê bawer dikan û navê wî jî "Xwedê" ye.¹⁰⁵ Di qewlê wan de baweriya Xwedê bi awayekê aşkera hatiye gotin.

"Xwedê Kî ye?"

Xwedê yeke,

Ewî bê şirîk û bê hevale

Ya Xwedê ne tû ji kesî,

Û ne kes jî te ye.

¹⁰³ h.b.

¹⁰⁴ Reşîd T., (2010), *Êzidiyatî Olekê Hê ji Nenaskirî*, we. Lîs, Stenbûl, r.38.

¹⁰⁵ Şengül B. A., "Êzîdîlik Dininde Melek Tavus İnancı ve İkonografisi", *Kovar Kürt Tarihi*, j.15, Ekim-Kasım-Aralık, 2104, r.11.

Xwedê yo!
Te ne tefal e,
Ne dê, ne bav û ne kal e,
Bêy te hemû tişt yî betal e.
Ya Xwedê tû Xwedanê şev û rojê yî,
Ya Xwedê her tû yî hayî,
Her tû yî layîqî medh û senayî"¹⁰⁶

Li gorî baweriya êzidiyan Xwedê bi sê dirûvên cuda ve xwe dide nîşan: Melekê Tawis, mirovê ciwan Sultan Êzî û mirovê kal Şêx Adî ye.¹⁰⁷

Li gor baweriyê, piştî afirandina heft milyaketan, Xwedê ji wan re dibêje: Ji min pêştir li ber tu kesî secde nekin. Lê gava bedena Adem hate afirandin , gote milyaketan: "werin, heta ku giyan bê ber, ber Adem secde bikin." Şeş milyaketan ji Adem re secde kirin, lê Ezazîl secde nekir. Xwedê jê re got: "Tu çima ji Adem re secde nakî?" Ezazîl got: "Rebê min, te şîret li me kiriye û min ew şîret ji bîr nekiriye, bi tenê bo te secdê dikim, Ezîzê min." Li ser vê Xwedê Ezazîl bixelat dike û Tûkê zêrîn ku Tûkê Êzî ye, bi sitûyê wî de dike û jê re dibêje: "Here, min tu kiriye serokê Milyaketan û navê te Tawisî-Melek e. Ji ber vê yekê heya niha jî gava Êzidiyek wê Tûkê li xwe bike, dibêje " Tûka Êzî" an jî carina Tûka Tawisî-Melek. Mebesta Xwedê, bi wê Tûkê xelatkirina Tawisî-Melek bû.¹⁰⁸

Melekê Tawis, ji nûra Xwedê hatiye çêkirin û bi tenê li ber Xwedê secde kiriye. Dîndarên ji dînen din ji bo rencîdekirinê, êzidî wek şeytanperest nîşan dane. Êzidî ji ber vê baweriyê ji dîroka xwe heta îro, bi sedan daran hatine qetil, qir û sirgûn kirin.

Li gorî baweriya êzidiyan, dirûvekê Xwedê yê din jî Şêx Adî ye. Şêx Adî li bajarê Baalbekaya Sûriyayê ji dayîk bûye. Hê di ciwaniya xwe de diçe Bexdayê, li ber destê Ehmed el-Xezalî perwerde dibe. Gava diçe Lalişê millet li dora wî zanyarî kom dibe û wî wek serokekî dipejirînin.

¹⁰⁶ Topal K.,(2006), *Nasandina Kevneşopên Êzdiyatîyê*, weş. Weşanên Perî, Stenbol, Çileyêpêşîn, r.22.

¹⁰⁷ Şengül B. A., h. b., r.11.

¹⁰⁸ Topal K., h.b., r.40,41.

Zanyarên ne êzidî, êzidîtiyê bi hatina Şêx Adî ya Lalişê ve didin destpêkirin. Lê êzidî bixwe vê angaşê red dikin, ji ber ku ola êzidîtiyê beriya Şêx Adî jî hebûye. Hinek zanyar jî Şêx Adî wek pêxemberê êzidiyan qebûl dikin.

Bêguman li ser baweriya êzidiyan gelekî nîqaş hene. Agahiyên ku divê bêne zelal kirin jî gelek in. Yek ji wan jî pêxembariya Şêx Adî ye. Lê em dizanin ku li gorî baweriya êzidiyan, Şêx Adî ji kirasê Tawis derketiye û tirba wî ya li Lalişê Nûranî jî peristgeha wan e. Û êzidiyên li her deverê dinyayê, her sal meha nîsanê tên û heca xwe li wir dikin.

Dirûvekê Xwedê ya din jî Sultan Êzî ye. Sultan Êzî piştî Melekê Tawisê girîngtirîn figûra duyemîn e, lê agahiyên derheqê Sultan Êzî de gelek kêman in. Sultan Êzî di panteona êzidiyan de carina Xwedê carina jî wek milyaketê tê pêşiya me.¹⁰⁹

Du kitêbên pîroz yên êzidiyan hene yek Mishefa Reş e ya din jî Kitêba Cilwe ye.

Helbet di vê xebatê de em nikarin hemû bîr û baweriyên êzidiyan binin zimên, ji bo vê yekê xebatên berfirehtir pêwîst in. Heciyê Cindî di *Hewarî* de qala kîjan ayîn an jî qismê baweriyê kiribe, em ê wan bidin nîşandan.

2.4.18.1. Îbadetên Êzidiyan

Li gorî baweriya êzidiyan divê êzidiyek rojê sê caran dua bike. Êzidî dua û hewara xwe digihînin Şêşims, ew jî banga xwe digihîne Xwedê.¹¹⁰

"-Got, êdî sibeh jî ha ha vedibû, royê pencên xwe yên zer î zeriqî sifte avête serê wî çiyayê ku pega me lê bû. Em bidestê xwe kundeyî erdê bûn, ma gazî Şemsê xwe kir û dîsa rabûn bi rê ketin." (H/98).

"-Me ku ji dûr ve ev yek تمام dît, şukiriya xwe li Xwedayê xwe, Ocaxa Sultan Êzîd, -Apê Şewêş xebera xwe bi pêşl de bir,- her yekî me ji kerrekerr çav da Okizê Mamo, hatne malên xwe." (H/154).

"-Ermeniyên cînarê me xaç avêtine avê. Bavê min wê sibehê zû bi xwe çû ava kaniyê anî, anî û bi ser me, cî û nivînên me de reşand, wekî wê salê tu keder bi me nekeve. Paşê jî, bir bi ser pêz, dêwêr, mirîşkan de reşand, wekî li hev du zêde bibin. Ji wê û bi şûn de hat ber Xwedanê Malê, ango Stêrê, dia û dirozgehên xwe kir, kunde bû li ber Şems, wekî Xwedê li heftê û du mîletan bê rehmê, li der û cînanan bê rehmê li wî û mala wî jî pê re, bi hewara feqîr û fiqareyan de bê, bê hewara

¹⁰⁹ Şengül B. A., h.b., r.17.

¹¹⁰ Reşîd T., h.b., r.56.

nexweşên salan, kulfeta di derê teng de û hêja hat tevî min taştiya xwe xwar." (H/159).

"-Em deverû kundeyê erdê bûn û me şukirbûna xwe anî ji Xwedayê xwe re, wekî em sax û silamet gihiştin vê roja dergehfireh." (H/170).

"Beriya roderketinê mêr, jin, zarok li ber Şems kundeyî erdê bûn, gazî her Heft Mêrên Şêx Adî kirin û xweliya vî welatî bi dilê tijî têr paç kirin, şukra xwe jî Xwedanê xwe anîn, wekî em sax silamet hatin, ketin binê bandûra mêrê Ūris, ji tirsê, ji kuştinê, ji talan û tajîn xelas bûn." (H/172).

2.4.18.2. Rojîgirtin û Eyd

Di nav êzidiyan de gelek rojî û eyd hene. Rojiya Êzî sê rojan tê girtin û roja îne eyd tê pîrozkirin û ew li ser hemû êzdiyan ferz e. Rojiya Xidirnebî ya ku jê re rojiya mirazbexşî jî tê gotin li ser her êzdiyekê ne ferz e, ew jî sê rojan tê girtin û roja îne eyd tê pîrozkirin.

Di romanê de rojîgirtin û pîrozkirina eydan wiha hatiye ravekirin:

"-De tu bi xwe jî gerek bizanibî, wekî di nava salê de, em herçî lolo Êzdî du caran rojiyan digirin: Yek ya Êzîd, yek ya Xidirnebî. Her yekê sê rojan. Roja çaran eyd e." (H/159).

"-Got, carekê şêxê me Êzdiyan û meleyê Surmanan diçin ba milyaket çî ka çend rojan rojiyan bigirin. Meleyî jî guhên xwe de kerr bûye, lê şêxî li ser xwe bûye. Milyaket jî melê re dibêje:

-Sê roj.

Meleyê mehrûm hew zanîbûye got, sî roj, li dewsa ku sê rojan bibêje, dibêje, sî roj. Lê şêxê me dibêje, sê roj. De ji wê çaxê heta niha, bi serê te, herçî Surmanî ye, di nava salê de sî rojî rojiyan digirin, lê herçî em Êzdî ne, em sê rojan digirin." (H/159).

"-Erê, lawo - wî xebera xwe wekiland,- de gundiyan sê rojên xwe rojî girtin. Her êvaran, diya min nanê miriyan derdixist, her carê dişande malekê." (H/161).

"-Vê carê jî, Elî Axa rojekê ji pêşiyê de ji ber birayê xwe ve rojî girt, Rojiyê Êzîd. Di pey wê re, ên Xidirnebî hatin. Dîsa rojî girtin ji bo xerîbê xwe, wekî bibe tesequta wî. Hatin rojên erf û edetê yê din." (H/300).

Di nav her miletekî de baweriyên pûç hene. Di nav kurdan de jî em li rastî wan baweriyên tîn. Her çend ji aliyê zanyaran ve ew bêne rexnekirin jî millet qîma xwe pê tîne. Ew bawerî di nav zemanê de bûne edet û millet şertê wan edetan tîne cih.

Di romanê de em dîdevaniya baweriyên bi vî rengî dikin. Wek mînak; berya şeva eyda Xidirnebiyê, keç û kur tiştên şor dixwin, lê avê venaxwin. Bi halê tî

radizên, li gorî baweriyê di xewnê de li ba kî av bê vexwarin, bi wî kesî re zewac pêk tê.

"-Hingê min xwe fam kiribû, her sal rojekê beriya eydê min êvaran totika şor dixwar, paşê dida binê serê xwe, kûzê avê jî datanî binê serê xwe çî ka bi şev, wexta tîbûnê, di xewnê de kîjan qîz ê av bida min, wekî ez û ew bigihiştana bext û mirazê xwe." (H/160-161).

Di nav êzidiyan de edetekî bi navê dolîdange jî heye, ew edet li eyda Xidirnebiyê tê pîrozkirin. Zarokên gund di vê eydê de bi navê dolîdange goreyêke rîs yê nexşîn bi têt an jî benekê dirêj ve girêdidin û di kulekê cîranan re wê berdidin xwarê û pê re jî strana dolîdangê dibêjin. Malî jî wê goreyê bi tiştên şêrîn; şekir, mişmiş, sêv û mewîj tije dikin û zarok dolîdangê hildidin û bi şahiyêke mezin diçin ser banekî din. Heger tiştê neyê dayîn ew wek guneh tê hesabê, lê herkes bi teqez tiştêkî diavêje dolîdangê.¹¹¹

"-Her eydê Xidirnebî, ez û hevalên bi çaxê xwe re li hev diciviyan, me gore bi bendekî ve girêdida, em diçûne ser her kulekeke malan, gore di kulekê re dadixist, digot:

Dolî dolî dolîdangê

Pîra malê qurbankê

Xortê malê zavankê

Cotê malê zêdekê

Tiştêkî bavên dolîdangê

Ew qas digotin, heta ku tiştêkî dikirine nava goreyê; şekir, qeysî, kanfêt, hêk. Paşê me goreya xwe hildikişand û em diçûne ser kuleka maleke din." (H/161).

Kêlandin jî baweriyêkê mîna edetan e. Li gorî vê baweriyê kesek, roja eydê li ser hêjîngî xwe bi çî qasî bikêlîne gunehên wê/î bi wî qasî dadiweşe.

"-Paşê, wekî ew bi xêr û silametî bê mala me, diya min rabû bi serê darekê dirêj ve pîne pêça, di êr de kir û temamiya arîka me kêran û stûn, wekî ji berê de şuştibû, bi êr nexşînexşî kir: Mîna lingê hespan, tevê, wekî hesp bi siwarê xwe ve nesilike, bê malê, wekî sal bi xêr û xweşî derbas bibe, riya malê vebe. Lê roja eydê, herçî merivê ku dilê wî bixwaze xwe bikilê, wekî xêr û gunehê xwe daweşîne. Şirîta di malê de, du payî di malên tirêqan de dardadikin, lingê xwe datînin ser, bi her du destan digirin û xwe ji aliyekî davêjin aliyekê din, xwe dikilên. Û kî çî qas xwe biwestîne, xwe bikilê, ew qas zêde xêr û gunehên xwe dadiweşîne." (H/162).

¹¹¹ Cindî H., Hewarî.,h.b., r.408.

Bûk û zavayên nû zewicandî wê salê rojiyan nagirin. Li gorî baweriya wan ev dibe sebeba xelayê.

"-Min û Xezalê jî, me bi lezet xwar, helbet başqe başqe. Lê çi feyde, îzna me tunebû em rojiyê bigirin. Gotina gotiyan, heke bûk û zavayê teze rojiyan bigirin, wê salê xelayî be." (H/160).

Hindek edet roja eydan ji bo kêfxweşî û şahiyê tên pîrozkirin.

"-Hat ew roj jî, gava ku kadeyên Serê Salê lê dixin. Diya Egîd, Xatê, wekî hê hebû, wê rojê bi xwe hevîr stra, bi heft tehman kadeyê xwe hazir kir, ar, xwe, av, şekir, rûn, kişmîş, qeysî, paşê moriyeye mezin kire navê û kadeyên terrikî li tenûrê xist. Lê sibehîrê, gava ku merivên malê giş hatine ser hev, Elî Axa bi xwe kêr hilda, ew kade kerkerî kir:

-Ev para malxwiyê malê, - wî got,- ev para inika min, ev para gayê cotan...

-Lê ya Egîdê min? - Dê kire qîrîn.-

-Rast e, -Elî got,- ev jî para Egîdê bira, ev jî para flankesê.

Û wisa parevekir, kire çardeh ciyan, da bûkan, kurikên malê, biçûk û mezinan, bi tenê para qîzan tê tunebû, ew ê biçûna malên xelqê, dikarîbûn dewleta malê bi xwe re bibirana, lewma nedidanê.Û her kesî dest bi xwarina keriyên kadeyên xwe kir, bi fesal kerî didirin çi ka morî ne di navê de ne, paşê dixwarin. Ax, her kesî çawa dixwest morî ji wî re bikeve. Xwarin, xwarin û di nava yekî de nedîtin. Ma para xerîbê malê û gayê cotan. Elî Axa her du jî hildan û ker kir û çi? Ji nişkê ve ew moriyan karîbar di kadeyê para Egîd de dîtin. Wey ew çi şahî bû, wekî li wê derê bi pêş de hat.

-Dewleta malê şukir li serê kurê min ê biçûk e." (H/301).

Di malekê de serxweşî hebe pêşî ew mal tê ziyaretkirin, serxweşî lê tê dayîn û eyda malê tê pîrozkirin, dûre eyda malên din tên pîrozkirin.

"-Wê roja eydê, bavê min,der û cîranên me pev ketin, berê çûne mala Xalê Akimê Siyabend. Wê salê, birayê wî li ber pêz birûskê lê dabû. Serxweşî danê wî û paşê teze gund bi gundîtî hev girtin, çûne malên hev, eyda hev du bimbarek û pîroz kirin, çûne dest û rûyê hev du." (H/162).

2.4.18.3. Rêzgirtina Şêxan

Di ola Êzidiyan de şêx gelek qedirbilind in. Şêx ji aliyê olî ve rêberiya êlê dikin. Bi gelemperî şêxekê her êlê heye û gelekî hurmet jê re tê girtin.¹¹² Gava biryarek bê dayîn teqez fikra şêxan tên pîrskirin.

¹¹² Dost J., h.b., r.178.

"-Apê min digot, de li wê derê ez bibêjim pêncî, tu bibêje sed mêr hatin berhev bûn. Di nava me de jî, ev jina Dirbazê rehmetî, diya Cewar, Hezarê û Şêx Baro, yekî rûdandirêj î gep î zep î bejnbilind î xeberxof î xwediyê hurmeta mezin.

Got, herçî ku em hatibûn wê derê, em giş, biçûk û mezin, giş yeko yeko çûne destê wî şêxî. Got, li pey wê yekê, wî got:

-Gelî mirîdên min, vê şeva dereng, li vî ciyê dûr em seba xizmetekê berhev bûne, wekî bi hev bişewirin. Lê beriya eşkerekirina wê pîrsê, werin bi nanê ocaxê min sond bixwin, wekî wê sirrê kesek belav neke, paşê em ê ji we re bibêjin çi ka çi hewal e.

Û xûz bû, nanê ku bi xwe re anîbû ji nava xurcekê derxist, girte destê xwe.

Got, wî ku wisa kir, em ji xwe re her yekî me rabû, çû bi eteka çuxê wî girt, nanê di destê de wekî teberekî jê kir, kire devê xwe û bi navê mêrê wê êvara kerr û lal, bi nanê ocaxa şêx sonda tam xwar, ku li wê ortê çi biqewime, ji tu qûl û bendeyî re nebêjin, ji tu kesî re, heta bira û pismaman re jî" (H/92).

2.4.18.4. Qewal

Ji wan kesên ku beyt, qewl û duayên sed û hedên êzidiyatîyê di nav civatê de jêberkî bi deng dixwînin û şîrove dikin re qewlbêj an jî qewal tê gotin.¹¹³

Her sal Mîrê Şêxan sembola Êzidiyatîyê Tawîsê didan refên qewalan û qewal li cih û gundên ku êzidî lê hebûn digeriyan. Gava qewal dihatine nava êzidiyan, li def û şibêban dixistin û qewl digotin. Êzidiyan jî fitoyên xwe didan wan.¹¹⁴

Heciyê Cindî wan seromîyan bi zelalî dide ber çavê xwîneran.

"-Û dîsa roj hatin derbas bûn, dîsa bihar û havîn. Rojekê jî, li nava Êzîdîxaneyê Qersê belav bû, got: " Wellah qewal ji Berriyê hatine gundan û va îro sibehê wê bêne Dîgora axê" Gilî di devê xelqê de, dêhna xwe danê pêşrevê qewalan, Qewal Huseyn va li hespekê boz siwar bûyî ajot hat, li dewsa ku li ber derê axê bisekine, çû li ber derê Ozamanê Hozo peya bû û kire elam, wekî ev e Tawîs ji Eylal Sinco tê, dîsa bi wê qiçê siwar bû, di pêşiya qewalan de çû. Gund biçûk û mezin, kal û pîr tamam hejîyan, kincê eydê li xwe kirin, ew jî bi pêşiya qewalan de çûn." (H/341).

"-Bila ew wisa di wî halî de bimîne, em ji qewalan xeber bidin. Ên ku her sal ji aliyê Şengalê, dêmelî ji Berriyê salê carekê dihatin, xêr û xêrat berhev dikirin û dîsa piştî xwe didanê diçûn." (H/342).

Qewal gava diçin gundekî xurcika ku Tawîs tê de ye didin axayê gund. Axa serkêşîya wê merasîmê dike, wê xurcîkê maç dike û diavêje ser milê xwe, paşê qewal û hemû gundî diçin mala axêyê, li wir ava li ber Tawîsê li xwe û zarokên xwe dikin.

¹¹³ Topal K., h.b., r.169.

¹¹⁴ H.b., r.169.

Ev merasîm di romanê de kit bi kit hatiye dayîn. Gava qewal têne gundê Elî Axa ji ber birayê wî bi jinêke xaçperest re zewicandiye naçin ba wî. Qewal ji bo serkêşiya merasîmê diçin ba mirovekê din.

"Gundî ku berjêr bûn, koma wan jî xuya kir, wan li def û şivîviyê dixist. Dengê wisa xwe bû, te digot horî û perî distêrin. Dengê defîkê, ringeringa wê, dengê şivîviyê wisa xweş dihat, her Xwedê bizanibe. Cimaeta gund pê de pê de kunde bû. Paşê rabû û her kesekî dicehdand, wekî bi gavekê ji pêş de bigihîje wan, wekî Tawisê hilde. Çawa hercar vê carê jî li pêşiya gişan Elî Axa bû. Li pey wî, Egîd Axa û koma pismamên wan. Bi vergirtina silavan qewalan re Elî Axa dest dirêjî xurcika ku Tawisê tê de bû kir, wekî hilde bavêje ser milê xwe, lê Qewal Reco destûr neda:

-Elî Axa, -wî got,- dûr, dûr! Me gunehkar neke! Heta ku ew kulfeta ne ji dîne me di mala te de be, weleh qesem, bileh qesem, Tawisê nayê mala Emerîkê...Dûr, dûr! Me gunehkar neke, Elî Axa...!

Cimaeta berhevbûyî di çiyê xwe de bû kevir sekinî û zûr bûn li çavên Qewal Reco nihêrîn çî ka wê çî bike, çî bibêje. Lê qewêl çî kir? Çavên xwe gerand, gerand û ji nişkê ve gazî yekî li pişt Egîd Axê sekinî kir:

-Kurê min,- wî got,- me ji bo te dia û dirozgeh kirine, lê binihêre tu ji çûyî welatê Sîbîrê, lê tu walnegeriyayî. Bi pêş de were Tawisê paç bike û xurcîkê bavêje ser milê xwe.

Ew Emirê Simo bû, ewê ku tevî Egîdê axê hatibû sirgûnkirin. Emir bi pêş de hat, pantê lê xist, paşê Tawisê maç kir, xurcîka wê avête ser milê xwe û berê xwe da gund. Temamiya gund bi def û şivîviyê dane dî wî û her dî qewalên li ber Tawisê. Paşê qewal komkomî bûn û çûne qonaxa xwe ya ji berê de amadekirî." (H/342).

"Bi wî tehrî, malxweyî her malekê hat, çû mala Emirê Simo, ava xadimê li ber Tawisê li rûyên xwe û zarokên xwe xistin, tiliya xwe tê de dikirin û pêşkeş heke bi peretî be, heke zêr be, heke zîv be, disparte her du qewalên li ber Tawisê, di dêrî re derdiket, dizivirî diçû mala xwe." (H/343).

2.4.18.5. Qurban

"Qurban perçekê mezin yê îbadetê ye. Ji bo mirov li gel hêzên derxwezayî baş biqedînin û ji wan tiştan bixwazin qurban tê pêşkêşkirin. Li gor armancên wê, em dikarin qurbanê di bin çar seranavan de bisenifînin; a). qurbanên ji bo tiştî tê xwestin tê pêşkêşkirin, b). ji bo spaskirina tiştî hatî bidestxistin, c). ji bo bergerana sûç û qusûrekê hatî kirin, d). qurbanên ji nêçîr û hasila ewilî yên ji Heyîna Mezin re tîn pêşkêşkirin."¹¹⁵

Di nav kurdan de qurban bi giştî bo qeza û belayên dinê, çavronî û mirazhasiliyê tîn serjêkirin.

¹¹⁵ Örnek S V., h.b., r. 87,88.

"-Edo Beg, weleh biraziyê min rast e, heyrano, xelq me berî hev dide, wekî sibehê bi destê me em koka hev bînin. Here, bavê min, tu nekuştin jî, qurbanê bide." (H/89).

"-Gava ku çavê min bi çavê wê ket, beşera wê xweş bû û lezelez gazî yekî kir, wekî çawa qurban berxa miya sor î beş şerjêbike. Û xwina berxê hilda hindê li eniya min xist, wekî danî aliyekî, paşê hat li kêleka min rûnişt." (H/135).

"-Şukir ji ve gavê re, dayê, gerek hûn qurbanan bidin, ebabetî Xwedê bin, wekî caran îcar jî ew hatin ser hêsîrên xwe, nava me bira û pismaman." (H/145).

"-Paşê me, wekî êvar de kon vegirtûn, dest bi qurbanan kir: Her kesî, her malekê, baweriya te pê hebe, qurban da; kavir, berdîr, mîstewr, beran, wekî em herçî Êzîdiyên mayî bi mal û zarokên xwe ve hatin ghiştin vê roja hanê." (H/172).

"-Gelek caran merivên mala axê diçûne Ziyareta Gulheyranê, dia û dirozgeh dikirin, dîk û mirîşk şerjêdikirin, berx û kar serjê dikirin ji bo saxî û veğerandina axê." (H/300).

2.4.18.6. Xêr Belavkirin

Di nav kurdan de ji bo tesedîq û belayên dinê an jî bo parastina nezrê xêr tê belavkirin. Ji bo xêr; xwarin, nanê germ û cil tên belavkirin.

Em di romanê de zêdetir li rastî belavkirina nanê germ tên.

"-De ez bextê te me, kevaniyên her sê malan dest tenûrdadanê kirin, hevîr kirin û heta ku sibeh vedibe, nanê germ derxistin, birin di kulukê malan re avêtine hundîr, wekî çawa Xwedê rehma xwe avêtiye dilê dîwanê, her çar kalamêr ji xezayê xilas bûn." (H/145).

"-Hûn jî, şeva îşev êdî ranezên, nê bipêjin û ji şev de nanê germ derxin, bila bibe firehiya Egîdê bira." (H/300).

"-Dîgoriyan jî, ev yek bihîst û her kes ji hinda xwe de hat cavronî da mala axê. Xata dê êdî sebîr nekîr, çû ji heft malan pars kir û para xwe anî da feqîrê gund. Nanê germ şande heft malan." (H/301).

Nanê miriyan yek ji cureyên xêr belavkirinê ye. Divê êzidiyek, piştê miriyê xwe heta heft salên wî tamam bibe, di her roja serê sersalê û di her êvara îne de nanê miriyan û di hemû rojên eyda qurbanê de jî xêra eyd û erefatên miriyên xwe li mirovên feqîr û belengaz belav dikin.¹¹⁶

"-Di gund de êdî tevdîra xêra Annayê didîtin, lê li hêviya Fetka bûn. Ew gotî wexta derskutakirinê bihata. Û ew roj jî hat, meha Hezîranê. Xêra Annayê da, gayek şerjêkirin, pênc mîstewr, barek birinc kirrîbûn, arê Odesê standibûn, ba baran şekir

¹¹⁶ Topal K., h. b., r. 223.

anîbûn û bi sîtilan şerbet amade kiribûn. Xêr hemîn xêr bû, ê kesîb wê rojê ji sibehê de xwe birçî hiştibûn û ketibûne ser goşt û birc." (H/358).

"-Bi tenê wê rojê Elî Axa, Egîdê axê û herçî mala wan xêr nexwarin. Qerar wisa bû; gotî xelqê xêra miriyan bixwara." (H/359).

2.4.18.7. Mirî Veşartin û Serxweşî

Li gorî baweriya êzidiyan mirin tune ye, kirasgühestin heye. Kesên dimirin dikevin di nav bedeneke din û cardî jîndar dibin. Ji ber vê baweriyê bi piranî navê miriyên xwe li zarokên xwe dikin. Seremoniya mirîveşartina êzidiyan jî balkêş e. Li hindê heremên êzidiyan gava mirî tê definkirin, koçek û qewal li defê dixin.

Em di romanê de jî gorkenan dibînin. Heya karê veşartina miriyê bê tamam kirin, gorken li ser mezêlê disekin û dikenin. Heciyê Cindî vê edetê mîna ji bo mirî bi ken û şa biçê ber Mîrê xwe, rave dike.

"-Heta nîvro, gorkenan mezêlê Geveza miraz di çav de mayî li dûrî mezelan kolan. Kenê wan dor û ber girtibû. Heke yekî xerîb li wê derê bûya, wê bigota qey ew dijmin in dilên xwe rihet dikin. Lê na, edet wisa ye, wekî mirî şa here ba Mîrê xwe, bi ken here. Gorken, rastiye bibêjî, ji bo wê qîzika bikur gelekî li ber xwe diketin. Heta ku wan mezêlê dikolan, Pîr Qudê jî bêmiraz şûşt, kefen kir û lehzeyekê bi şûn de çend lawikên Heseniyan û Ortiliyan, wekî êdî hatibûne wê derê, keçik bi çarbestê hildan û birin, wekî hqê bikin. Cimaeta pê re hindik bû, bav bû, dê, pîrik, Pîr Qudê û çar lawik. Paşê Pîr Qaso jî çû gihişte wan û birin, birin hildan ew qîzika duh sipesax î devliken î meşxezal.

Tevirkolan xwelî tijî ser kirin, xwelî bilind kirin, kirin forma qûçê, mezêlê û emekên xwe lê helal kirin." (H/249).

"Nanê gorkenan hate ortê. Her yekî pariyek xwar, paşê her yekî şelbikek şerbet vewar û rusqet ji malxwiyê malê xwestin, rabûn." (H/251).

Serxweşiya êzidiyan jî sê roj in. Nas û dostên wan tene serxweşiyê û sê rojan xwediyê miriyê tenê nahêlin.

"Sê roj, sê şevan Ūso şîva bêmirazê derxist, sê êvaran kuçik li ser mezêlê wê dada, sê roj, sê şevan ew texteyê ku canik li ser şûştibûn, ew sîtila avê, wekî av tê de germ kiribûn û lê kiribûn, di ciyê xwe de man, her êvarên çira vêdixistin datanîn fêza sîtil û textê, heta sibehê ji xwe re dişixulî. Sê roj û sê şevan, herçî jiqewmê wî bûn, ji gundan dihatin serxweşî didanê, heta êvara derebg ew mijûl dikirin, lê roja çaran teze êla Heseniyan xwe pê re gihand. Ez bibêjim sed siwar, tu bibêje pênc sed." (H/251).

2.4.18.8. Tiştên Hatine Qedexekirin

Ola êzidiyatîyê nayê parve û belav kirin. Êzîdî xwe qewmekê bijare hesab dikin. Yên ku êzîdî nehatibe dinyayê, dûre nikare bibe êzîdî. Ji ber vê qewmekê bergirtî ye. Di vê olê de gelek tiştên hatî qedexekirin hene. Em ê di bin vê serenavê de di ola êzidiyan de tiştên guneh tên hesabê yên ku di romanê de hatine nîşandan, dahûrînin.

Hindek baweriyên êzidiyan êdî di roja me de wek guneh nayên pejirandin. Xwendin û nivîsandin ji wan gunehan bû. Ji bilî malmezinên êzidiyan, tu kesî zarokên xwe nedidan xwendin. Civaka êzîdî ji derve re girtî mabû, têkiliya wan li gel milletên din çênedibû. Piştî çûne Ewropa, Qevqaz, Rûsyayê û cihên din bi hewcetiya xwendin û nivîsandinê hesan û ev guneh ji nav wan rabû.

Gava ku êzidiyan dest bi xwendin û nivîsandinê kirin, dinyaya wan jî bi her aliyê ve guherî. Têkilî bi milletên din re danîn. Di nav wan de mirovên zana rabûn. Haya wan baştir ji heq û hiqûqa wan çêbû

Di romanê de hindek caran gunehbûyîna xwendinê hatiye vegotin.

"Romiyê Heso bi xwe jî tê dernaxe çî ka çawa hînî zimanê Êzîdî bû û çawa hînî nivîsara û xwendinê bû -ew ku bi dîne Êzîdiyan xwendin guneh hesab dibû." (H/34).

"-Ew çûne Tibîlsiyê. - got,- çûne wekî ji me re mekteban bidibe vekirin.

-Xwendin - got, me got, - ne axir ji milletê me Êzidiyan re guneh e." (H/100).

"-Lê çawa, êdî herfan nas dikim.- Egîd bi kubarî caba wî da.- Oho, -Cidî gotê,- dêmek tu lap ji dîn û donê xwe derketî êdî." (H/326).

"Ev eskerê Romê wekî hay ji edetên Êzidiyan hebû, eceb ma. " Çawa, kaxiza nivîsî li cem van çî pêşe ye? Ew jî, wiha pêçayî?" (H/394).

Bi saya axayê xwe ew, baweriya gunehbûyîna xwendinê diterikînin. Ji bo ew hînê xwendin û nivîsandinê bibin, berî her kesî axa zarokên xwe dişîne dêrê. Ji bo millet jî zarokên xwe bidin xwendin, bang li wan dike.

"-Got, got, Hesên Axa tiştê wisa qebûl nake.Tirêq jî hemîn kesek nikare ji sozê wî derbas be. Got, ji niha de kurê xwe yê biçûk, Êsiv, dişîne dêrê, wekî li wê derê hîn bibe. Got, digot, ez va kurê xwe dişînim, hûn jî zarokên xwe bi şûn de nexin, bidine pey min, xwendin ne guneh e, got, em guneh in, wekî xwendinê nizanin." (H/101).

Di ola êzidiyan de şertên zewacê aşkere ne. Li ser zewicandinê hindek qedexeyên wan jî hene. Mirovên êzidî bi kesên (şêx, pîr, feqîr, mêrebî, û hwd.). û Xwedayê wan ne yek bin, bi mirovên ku bi dergîstî bin, bi jin û mêrên ne hatine berdan, bi bira, xwîşk, jinbir, ap, jinap, xal, jinxal, metik, xaltik, baltûz û tiyê xwe, bi xizmên kirîvên xwe yên xwîne û bi hemû mirovên ku ne ji dîne êzidî bin re zewicandin qedexe ye.¹¹⁷

Em di romanê de dibînin ka civaka êzidî çawa li bûkeke şilet tevdigere.

"Çawa ye, heta niha zewaca me mîrên Ezdî bi kesî tunebûye, çawa ye merivên Mala Polat wê bikin edet, çawa ye? Qe tiştê wiha dibe? Kê tiştê wiha di darê dinyayê de bihistiye, dîtiye? Birayê min walgeriyaye." (H/326).

"Axir te ji çi re wiha kir, ji çi re?. - Wî kelogirî digotê.- Ji çi re navê mala me li dinyayê xist? Lê xelq ê çi ji me re bibêje, Egîdê bira? Axir wê çi bibêjine me? Axir hezar dost û dijminê me hene, ne axir serê Ezdîxaneyê, binê Ezdîxaneyê me pê de pê de nas dike, wê çi bibêjin? Wê bibêjin, wekî birayê wî çû şilet stand, walgeriya. Ax bira, bira..." (H/327).

"Belê, ez ê bibêjim! - Evê te giliya xwe wekiland.- Bi qaydeyê me, herçî em bûn mîrê Êzîdî, em ji şiletê nazewicin." (H/335).

"Heta bi vir de, heta bi wê de, rojiyê Êzîdî û Xidirnebî jî hatin, lê tu were wexta eydan, tîrêqek çi ye, nehat piyê xwe nevet mala Elî Axa, xên ji mirîdan tu tîrêqî eyda wê malê bimbarek nekir. Ji çi re? Çimkî di mala wan de şilet hebû., Kesî di dewr û zemanan de nedîtîbû kurê bavê wan here ji yeke şilet, ne ji dîn û donê xwe, bizewice." (H/341).

"Heta şilet di mala we de hebe, nebûye ku nebûye, wekî şeyiyekî we bikeve nava malê ziyaretê, heram e, heram e wî, wî gidiyo! Dûr dûr..!" (H/343).

"Tu qe dizanî çi dibêji? Helbetim nabe, zewaca me mîrê êzîdî ji şiletê nabe, ji me re guneh e! Okizo, nabe, nebe..!" (H/346).

Di ola êzidiyan de xwarina kelem, marol, gulkelem, kundir, lobî, bamiya, masî û xinzîran guneh e.

"Ev yek bi Cindî xweş hat û dîsa nêzikî texte bû, kir ku goşt hilde bixwe. Gava ku çîtiyek hilda bixwe, destên wî ricifîn û dêhna xwe da Qanat, kerreker gotê:

-Kurap, ev çi goşt e, min goştê wiha li aliyê me nedîtiye.

Qanat jî lê mêze kir û qayîm zimanê xwe gest:

-Peyî, -wî di dilê xwe de got,- dibe ev goştê xinzîr be!

Û tevîhevbiyî pirs da bûkê:

¹¹⁷ Topal K., h.b., r.228.

-Anna Kartaşova, -wî got,- ev goştê çî ye? - Wî bi tiliya xwe ji dûr ve nîşan da.

-Qe, wê goştê çî be? - Jinika dilsax gotê.- Ê xinzîran e, kerem bikin bixwin, xweş e!

Wê ku wisa got, Qanat êdî reng da, reng stand. " Ev çî nener e?" Wî di dilê xwe de got û li Cindiyê ecêbmayî nihêrî.

-Goştê wan e.

Wî got û cî bi cî çîtî ji destê Cindî ket, rabû û ber bi destşoyê lezand. Niha qijikî çawa destên xwe bi sabûnê dişo, her Xwedê bizanebe." (H/324).

"-Dûr û nêzîk dîsa xeber hat ser wê yekê, wekî ji mêrê Êzîd re xwendin guneh e, zewaca şiletê guneh e, kelemxwarin guneh e, kincên şîn lixwekirin guneh e, hey guneh e, guneh e..." (H/344).

Mêrên êzidî cilên şîn li xwe nakin û di nav nivînên şîn de jî ranazên. Wergirtina cilên şîn wek guneh tê hesêbandin.

"-Elî Axa jî rabû nêzîkê ciyê xwe bû û adyaleke bi rengê şîn li ser doşekê dît. Êdî destê xwe nedayê, li çavên birê nihêrî, gotê:

-Xwedê mala te xerab bike, ocaxê de kor bike! Bes nîn e tu walgeriyayî, niha jî dixwazî me walgerîni? Ew çî ecêb e tîni serê me?

-Çî bûye, bira qurbana te be, çî dixwazî? - Birê zû zû pirs dayê-

-Lê ew qas eqilê te nebirre, wekî em mêrên Êzdî kincên şîn li xwe nakin, nivînên şîn navêjine ser xwe. Lê nanihêrî we çî avêtiye ser vî ciyê? Te em kirin şilet, malxerabo, dûrî bira û pismaman." (H/325).

2.5. Wêjeya Gelêrî

Di vê beşê de biwêj, gotinên pêşyan, kilam, stran, dua, nifir, dijûn, lavahîkirin, sondxwarin, zêmare û zûgotinokên di romanê de hatine tesbîtkirin. Her hêman li gorî wate û teşeya xwe hatine senifandin. Raveya gotinên pêşyan hatine kirin.

2.5.1. Biwêj

Biwêj, dewlemediya zimanekî dide nîşan. Bi naveroka biwêjan ve mirov dikare felsefe, bawerî û sincê civakekê bi taybetî jî zimanê wê nas bike. Çêj, huner û estetîka ziman bi biwêjan derdikevin holê. Zanebûn û erka li ser ziman bi taybetî

xwe di bikaranîna biwêjan de nîşan didin. Ji ber ku kêrahî û rihê zimanan di biwêjan de veşartiyê.¹¹⁸

Gava mirov pênaseyên li ser biwêjan hatî kirî berawird dike bi piranî pênaseyên mîna hev têne pêşiya me. Dilawer Zeraq pênaseya biwêjan wiha dike: "*Biwêj hêman û dînamîkên herî girîng û bi bandor ên zimanekî ne. Ji bo diyarkirin û têgihîştandina têgihan, bi mantiq û qalibên arizî yên wî zimanî hatine dîtin û afirandin. Ji aliyê wate, wesf û çawaniyê ve xweserî xwe ne, zêdetir ne di wateya ku rasteqîn tê fêmkirin, di wateyeke din de tîn bikaranîn.*"¹¹⁹

Helbet cudatiya biwêj, gotinên pêşiyên û gotinên qalibgirtî yên din hene lê taybetmendiya her yekî cuda ye û xweserê xwe ye. Şehmûs Aslan: "*Ji bona ku ristek bibe biwêj gere: peywên wê ristê xweş lihevhatî bin, wateyek wan ya hêsa hebe, sal û zeman ser de derbas bibin, di nav gel û giştî de belav bibin, ji aliyê gel ve hatibe pejirandin*"¹²⁰

Çîya Mazî, cudatiya wate û teşeyên biwêjan wiha tesbît dike: "*Bi kêmayî ji du peyvên pêk tê. Bi piranî wateya wan ya duyemîn e (mecaz in). Di nava zimanê gel de bûne qalib. Ne darazî ne, ne pendî ne. Netewî ne, malê gel in.*"¹²¹

Heciyê Cindî di romana xwe de gelek biwêjan bi kar tîne. Wan biwêjan di hevokekê an jî dialogekê de bi hostetî bicih dike. Di binê vê serenavê de biwêjên di romana *Hewarî* de derbasbûyî li gorî şêwaz û wateyên wan hatin senifandin û li gorî rêza alfabeyê hatine nivîsandin. Carinan du biwêj di hevokekê de derbas dibin, me herdu biwêj jî bi forma reş ve da nîşandan. Biwêjên di vê xebatê de bi tenê di binê vê serenavê de derbas nabin, herwiha di beşên din de jî heman bêwij henin. Yê ku li beşên din derbas dibin me li vir nenivîsand. Ji ber vê me indekseke biwêjan danî dawiya xebata xwe.

Taybetî û Cudatiya Biwêjan

Biwêj li gorî wate, rewş û teşeyê xwe cudatiyan nîşan dide. Em ê biwêjên di romanê de li gorî cudatiya wan bisenifnin.

1-). "*Berî her tiştî biwêj ji aliyê teşeyî ve xwediyê awayên cihêreng in an jî ya hê rasttir, biwêj teşeyeke hevpar zêde nadin xûyandin. Hinek tenê ji du gotinên kurt pêk ten*"¹²²

¹¹⁸ Borak M., (1992), *Ferhenga Biwêjan*, weş Enstîtuya Kurdî ya Stenbol, Stenbol, r.8.

¹¹⁹ Zeraq D., (2005), *Ferhenga Biwêjan*, weş Enstîtuya Kurdî ya Stenbol, Stenbol, r.7.

¹²⁰ Aslan Ş. "Taybetiyên Biwêjan", Kovara *Bîr*, j.4, Zivistan-Bihar, 2006, r.201.

¹²¹ Mazî Ç. "Biwêj, Gotinên Pêşiyên û Gotin", Kovara *Zend*, j.5, payîz, 1998, r. 80.

¹²² Borak M., h.b., r.16.

Agirdadayî kirin

"Gund û zozan tarmitax kirin, **agirdadayî kirin**, kirin dewsa bênderan, yêra bûmê kor, xwîn, xwîn, xwîn bû li her deran." (H/69).

"-Qîzê, te bihîstiye, wekî axê der heqa çûyîna lawikan de bihîstiye, dibêjin, wê ji destê Romê her çend malên me yên mayîn jî **agirdadayî bikin** herin." (H/123).

"-Erê weleh, wekî ew mêrik nîn bûya, belkî çiyê wî li nava cinetê be, hema wê sibehê wê em **agirdadayî bikirana** warê me ji nava waran hildana." (H/146).

"-Bila mêr qurbana we bin, Heq navê Xwedê ye, bi wî pêxemberî, me yê gundê we pê de pê de **agirdadayî bikira**, lê min da xatirê we." (H/154).

"-Wekî li dewsa Hesên Axa yekî di bûya û di mala Mamo da nîn bûya, me yê mala wî **agirdadayî bikira**." (165).

"-Reva çi? Wê mal û zarokê min **agirdadayî bikin**." (H/175).

"-Te û Koçek Gulo qîzîk walgerandiye, ez ê malê **agirdadayî bikim** û ji vir bicehimim herim." (H/237).

"-Şerîetê jî elam kir, wekî wan her sî û heşt gundên dest li ser xwe hildayî, zarok, jin, mêr, gişan **agirdadayî bikin**." (H/273).

"-Tu dikî me **agirdadayî bikî, koka me biqelînî?**" (H/277).

"-Tu dizanî, wekî hukimet pê bihise, wê çi bîne serê me? Wê me **agirdadayî bike!**" (H/360).

Bêhiş ketin

"-Westa duh, derengrazana şevê **ez bê hiş kiribûm**." (H/67).

Benîştê devan

"-De ez bûm **benîştê devên** gişan, pêkeniya temaman." (H/106).

Bê hemdê xwe

"-Erê, - min got, - lê ji kê re dihêle? Dibe... bistexula, - minê ji xwe şermkirî **di dilê xwe de got û bê hemdê xwe** tiliya xwe qayîm gest." (H/64-65).

"-Dereng, - min **bê hemdê xwe** wekiland û em hêdî hêdî bi rê ketin." (H/123).

"-Kalê **bê hemdê xwe** dihat, di mitalan de bû, te digot bi xwe ji xwe re xeber dide." (H/127).

"-Gava ku çiyekî de diçû, te digot derî xweber xweber li ber wî vedibûn û meriv **bê hemdî xwe** ji ber wî radibûn ser xwe." (H/179).

"-Axê fem kir, wekî bi wî re ye, lewma jî, heke **bi hemdê xwe**, heke **bê hemdê xwe**, ji ciyê xwe hêdîka rabû, li ber wî pante lê xist, beşereke qelp hate ser rûyê wî, serên simbêlên xwe bada, li jorê nihêrî û got." (H/200).

"-Ew êdî ghiştibûn gund û **bê hemdê wan** xeberdan hate birrîn." (H/221).

"-Bi kişandinê re gede jî lihêf girt û **bê hemdê xwe** veşerîya aliyê wê, ew dît, saw jê girt û kire qijîn." (H/230).

"-Hevalê wî gotê û **bê hemdê xwe** her du jî zûr bûn li aliyê derê dîwanxaneyê nihêrîn." (H/260).

"-Belê, axa, - wî **bê hemdê xwe** cab da,- gilî giliya te ye." (H/271).

"-Destê xwe kiribû kulm û **bê hemdê xwe** berê wan çend pezikan ber bi holmaçka xwe dikir." (H/277).

"Serdîwanî tevîhevbiyî pirs **bê hemdê xwe** wekiland." (H/285).

"Ehmê xew li serî ketî **bê hemdê xwe** parre veşerîya û bi dest xwe re bû tirqîniya wî kenîya." (H/289).

"Jinikê tê derxist û **bê hemdê wê** pariyê di dêst de ji dêst ket û pisîkê revand." (H/324).

"Elî Axa **bê hemdê xwe** ew girt û têr maç kir." (H/329).

"Annayê got û **bê hemdê xwe** ew hembêz kir, mirov digot wê fam kir, wekî jê bi dûr dixin." (H/350).

"Û **bê hemdê xwe** bi rê ket. Lê bi kû de?" (H/392).

Bêhin çikiyayî

"-Em hêdîka bi rê dikevin. Xwişk nikare bê, **bêhna wê diçike**. Xeber nade, hêsîran dibêrîne." (H/28).

Bi hemdê xwe

"Pêşiyê wê kir ku înkâr bike, lê nebû, soromorîbûyî li vî aliyê nihêrî, mirov digot bizanibe çi ka kî li wê derê hazir e, ji wê bi şûn de serê xwe bere bere bilind kir û **bi hemdê xwe** wisa bi şewat got, wekî gişan bi destê xwe re dengê xwe birrîn, guhên xwe dane ser." (H/47).

"Lê, got, **bi hemdê xwe** qelûn dikişand û hey li jorê, li heyva li fêza xwe dinihêrî û dengê xwe nedikir, lê gava ava keliyayî avête serî, got, got." (H/89).

"-Diya min bi destê tercumên caba wî gelekî **bi hemdê xwe** da". (H/141).

"-Min got dawet e! - Apê min kire qajinî û kir ku kulmekê bîne serî, paşê xwe girt, beşera xwe xweş kir û bi dengê **bi hemdê xwe** got." (H/148).

"-Mehdeyê min girtî ye, yekê jî ezî bê sebr im, ji kerena xwe were wê meseleyê jî ji min re bibêje, ji wê û bi şûn de êdî em ê **bi hemdê xwe** rûnên nanê we bixwin, ya têt jî bi ser de." (H/171).

"-Wexta ku we lawikên xwe şandin vî welatî, ez gelekî şa bûm û wexta ku ew girtin, wê çaxê, ez **bi hemdê xwe** hatim ketim orta êgir, wekî wan xilas bikim, xelqê we jî ji qirê xelas bikim." (H/181).

"-Biracan, -Egîd gotê,- ji te tirê ez **bi hemdê xwe** zewicîme." (H/328).

"-Wî **bi hemdê xwe** xebera xwe bi pêş de bir- Gotina min ê çi be, pîrê çil pîran?" (H/345).

"Maşîn bi rê ket û Annayê **bi hemdê xwe** kaxiza pêçayî bi fesal vekir, lê nihêrî." (H/351).

"-Wê çi hebe, -kur **bi hemdê xwe** gotê,- li Ûrisêtê niha Lenîn bi pêş de hatiye, dibêje, gotî dinyayeke wisa bê çêkirin, wekî axa tunebin." (H/360).

Bûbû pepûk

"-Xezala qijik jî **bûbû pepûkek**, qincilîbû ser hev, îskeîska wê bû, dilopên hesîran bi ser sûret de dihatine xwarê û tevî xweliya hevşê dibûn." (H/125).

"-Diya qijik li ber serê qîza xwe ya bêmiraz **bûbû pepûk** û bi dilovanî digot, digot, li ser çavên xwe dixist û diçû ling, por, û serê cegera xwe." (H/245).

"-Sinco **mîna pepûkekî** di çiyê xwe de tevizîbû, wê gavê te bikuşt, çilkek xwîn çî ye, wê jê nehat." (H/274).

"-Ew şêrê lehzeyekê berê bû pisîk, çilmisî, **bû pepûkekî** wê derê." (H/277).

"Zeynê sar bûbû sekinîbû, qincilîbû ser hev, te digot Ya Rebî, **pepûkek e** û çeçeçeqa dev û diranên wê bû." (H/280).

Çav têr bûn

"-De gidî pê re bigihîne, wekî **çav lê têr be**, ji nişkê ve yekî din çavên wî negire, ber bi xwe nekişîne." (H/196).

"-Emerîk Axayî sax be, êla Sîpkan sax be, em tu tiştî nahêvişînin, em ê **çavên wan têr bikin**." (H/266).

Deynê stûyê

"-Çi ku dimîne min, **deynê stûyê** min bi, min li vir çî tişyê rind dît, ez ê elamî hemwelatîyên xwe bikim, bila dinya alem bizanibe, wekî cimeata Kurdan a kevin bi merîfet û kemal e, mêrxas û mêvanhez, bi tenê ji we re lazim e azadî, mecal û mekan." (H/113).

Dil baristan bûn

"Egîd jî, Anna jî bi wê xeberê **dilê wan baristan bû.**" (H/325).

"Evên te jî, **bi dilekî baristan** xatirê xwe ji Mehmed Paşa xwestin û li hespên xwe siwar bûn, berê xwe dane Camûşvanê." (H/380).

Dil dax bûn

"-Wexta ku wî wisa **dilê me dax dikir**, agir û şewat pê vedida, lawikekî qemer î bedensûr ji nişkê ve ji ciyê xwe rabû li ber cimeatê û axê temene bû." (H/182).

Dil kirîn

"-Paşê berê xwe bi beranan de kir, ji wan re jî, dîsa bi her yekî re xeberek got, te digot **dilê wan dikirî**, wekî ara wext ew " ji bîr kirine" û bi min re rûniştîye misilhetê." (H/39).

"-Temamiya qebûlan jî ketin xîretê, hazir bûn bi her cureyî alî rûspiyên xwe bikin, wekî **dilê Dîwanê bikirîn**, mirovên taxima wan bike axayê êlê, lewma jî, li ber tu tiştêkî nedisekinîn." (H/196).

"-Axa, - Dawîdê liberxweketî kir ku **dilê wî bikirre**, - tu ji çî re bawer nakî?" (H/220).

"Dîsa giregirên Êzdîxaneyê berhev bûn, hatin, wekî **dilê axê bikirîn**; ê ku şekir dianî, ê ku pere, wekî axê re bişînin." (H/295).

Dil xwendin

"-Min texmîn kir, wekî Reşîd **dilê min xwend**, fam kir riyêke zehf dirêj qedandiye ji Tekmaliyê hete kolxozê." (H/36).

"-Lê Şewêşê kal **dilê min xwendibû.**" (H/144).

"Elî Axa û Eliyê Walo, ku axayê Surmanên wê nehiyeyê bû, li çavên hev nihêrîn, te digot **dilên hev de tiştêk xwendin**, rabûn dîsa li ber naçalnîk temene bûn, gotin." (H/211).

"-Wan dîsa bi çavan bi hev re xeber da, te digot **dilên hev xwendin** û li hespên xwe siwar bûn, yekî berê xwe da Dîgora Xerabe, ê din ajot ber bi gundê Bêzkan, Qezbînê." (H/211).

"-Egîdê axê lihêf ji ser çavên xwe bi şûn de da û her duyan li hev du nihêrîn, nihêrîn û te digot **dilê hev du xwendin**, **dilê hev du kîrîn**, beşerxweş bûn û hêja dest bi serê giliyan bû." (H/231).

"Çavên xwe kuta çavên wî û kir ku bi çavan **dilê wî bixwîne** û zar û zimanê wî **bide girêdan.**" (H/232).

"-Rast e, dilê xwe ji hev re venedikirin, lê **dilê hev du dixwendin**, fikra wan yek bû." (H/281).

Gehîştina mirazê

"-Ew bextewar e wekî dinyayekê, ne axir ew qe na di kalbûna xwe de **gihîşte mirazê xwe**, ne kû tenê hîn bû, lê niha jî wê cimeata xwe hîn dike." (H/35).

"-Bila herin **bigihîjin mirazê** xwe, hemîn şivanê malê jî bi me lazim e, koxekî bidê, bike şivan, paşê heqê wî bidê, bila bike qelenê xwe, kuta bû çû." (H/217).

"Şukirandin ew gav, wekî di pey wan çend rojan re neferên malê sax û silamet rastî hev du hatin û dizanibûn **gihîştine mirazê xwe**." (H/378).

Ji dest çûyîn

"-Lazim e em riyekê ji xwe re bibînin, wekî ji nava vî agirî û alavî derên. An na halê êlê tune, **êl ji dest xwe diçe**." (H/93).

Ji hal ketin

"Çi qas diçe halê wan giran dibe, **ji hal dikevin**, tîbûn û birçîbûn, xwe û westan serî hildidin." (H/71).

Kamço kirin

"-Ez jî li wê dinihêrim, di halê wê de dikewgirim, li Babayan dinihêrim, ji nihêrîna wî veciniqim, di dilê xwe de li wî hêrs dibim, wî mîna zarokên **em kamço kirin**." (H/30).

"Cimaeta li derve sekinî bê sebir dibû, mîna zarokê **dergûş kamço** dibû û wext giran derbas dibû û royê dereng riya xwe diqedand." (H/259).

"Mîna zarokên qewm û lêzimên wî **kamço dibûn**." (H/331).

"-Çi dibêjî, bibêje, Ato, bi tenê zû bibêje û min **kamço neke**." (H/238).

Kok qelandin

"-Û gava ku nêzîkiya li gundê Pampê kir, "Niha li vir jî **koka mêran qelandine**" (H/400).

Mîna gulleyekê

"Axir dibe tişt li wê ortê tunebû jî, ji çi re navê xwişka xwe xerab bike û wê kezelikê ji ciyê xwe baz da û **mîna gulleyekê** berê xwe da newalê." (H/242).

"Xebera Sîbîrê **mîna gulleyekê** dilê axê hingaft, bi her du destan sûretê xwe girt, bû kûrîniya wî." (H/94).

Mîna siyê

"Ez ê va herim û bême" got û ji dêrî ve **mîna siyê** derket û çû. (H/130).

Ro kirin

"-Paşê em rûniştin û me derdê dilê xwe temam jê re **ro kir**, me got ka ji çi re em hatine û heviya me çi ye." (H/117).

"-Me li vir jî der û kulên xwe û ên êlê xwe **ro kir**, got wekî paşayê Romê me dizêrîne, mele me dizêrîne, axa me dizêrîne, gidî, me xwe li Padîşahê Ūris girtiye." (H/118).

"-Dema min qelem hilda, bi fikir û xeyalên xwe re bigihîştama û li ser kaxizê li pey hev du **ro bikira**." (H/195).

Rûspî kirin

"-Hinekan wê çaxê pesnê Okiz dan, wekî ew **rûspî kirin**, mêrik di wî halî de nehişt, xweyîti pê kir." (H/180).

Qedir girtin

"-Li her deran, li kê derê Şanederan Îsedizan hebûn, ên qewmê mala axê. Hurmet bû, **qedrê mala axê digirtin**." (H/297).

Qerf Kirin

"-Bi kû de diçin, hûn **qerfan bi me dikin**, nav û nûçikan li me û li pêşiyên me û dîne me dikin." (H/165).

Qudûm şikestin

"-**Qudûmên wî şikestin**, reng lê çû û di ciyê xwe de mix bû sekinî, pak bû neket." (H/209).

"-Berê Ūso ev gilî bihîst, cî bi cî **qudumê wî şikestin**, wî heta wê çaxê texmîn dikir, wekî êdî her tişt xelas bûye û her sibeh dia li Xwedanê xwe dikir." (H/281).

"-**Qudûm lê şikestin** û li ber çavên wê roj bû şev." (H/351).

Ser êşandin

"-De êdî çi **serê te neêşnim**, **serê dijminê te biêşnim**, em hatin gihiştin êfîmxaneyê." (H/63).

Şer avêtin

"-We bigota, wekî qosî nemam, **şeran davêjine me**." (H/140).

"-Belê, belê, -Ûso bi fikrdarî got, - em bibêjin mehrûmê ew **şer avête xwe**, an jî çawa ku axê got, devê xwe guhest, got, ez bi xwe reviyame, lê kutina xwişkê wê çawa bike?" (H/275).

"-Dêmek **şer bavêje xwe**?"

"-Erê, **şer bavêje xwe**." (H/279).

"-Min **şêr avête xwe**. Gotina min a niha rast e." (H/285).

Wext Kafir e

"-Lê **wext kafir e**, wext mîna çemekî dikişe û em pê nahisin, wekî ji jiyana me roj bi roj ji xwe re hildide, qal û bal dike û paşê mîna dijminekî lê vedigere, dinikisîne û dike xwelî." (H/368).

Zeft kirin

"-Ew çi ecêb, ew çi sosretî, bûka mêrikan **zeft kirye**, çawa ye?" (H/64).

"Got, cimaeta hêrsbûyî xwe **zeft kir**, bere bere bi şûn de ve kişiya û bo xatirê vê hurmetê, tu bibejî xeberek çi ye, xebereke sar negot." (H/84)

"Gava ku em di çend gundên li aliyê Surmeliyê re derbas bûn, Elî êdî xwe **zeft nekir**, wiha got." (H/110).

"-Ji şerma me xwe **zeft dikir** û dixebitîn anegorî cimaeta maqûl caba her pîrsekê bidin." (H/115-116).

"Nado, ku bi merama me hisiya, êdî xwe **zeft nekir**:" (H/116).

"-Û êpêce wext kerr bûm. Paşê min xwe **zeft nekir**, lê zêde kir:" (H/133).

"-Ew qas miz da, heta ku ziman lê geriya. Bavê min êdî xwe **zeft nekir**:" (H/173).

"-Hesen Axa êdî xwe **zeft nekir**, ji ciyê xwe rabû, di nava cimaetê re hat gihişt wî zîlamî, qayîm himbêz kir, eniya wî ya kever ramûsa û gotê:" (H/182).

"-Yekî din êdî xwe **zeft nekir**, bi Kurmancî got:" (H/199).

"-Paşê min êdî xwe **zeft nekir**, gotê:" (H/204).

"-Û gava ez hatim gihiştim jin û qîza xwe, me bi rê ve bihîst, axayê we Elî Axa ye, êdî min xwe **zeft nekir**." (H/205).

"-Elî Axa hindik ma xwe şaş bike, lê xwe **zeft kir**, ji heybetan nêzîkî kihêlê bû, navê wê Hilda;" (H/213).

"-Elî Axa êdî xwe **zeft nekir**, li sîfetê wî yê qurmiçî nihêrî, gotê." (H/227).

"Te hew dizanîbû rê tamam li ber hatin windakirin û ji şermana, ji hêrsê sûretên wê sor bûn, lê **xwe zeft kir**." (H/229).

"Wexta ku hinekî jî bi pêş de hat, cimaeta li pêşiya xwe dît, êdî **xwe zeft nekir**, bû zarîna wê û li ser şêmîka dîwanxaneyê hêsiyê dirêj bû." (H/260).

"-Apê Ehmê, - gende **xwe zeft nekir**, - ev çi gilî bû te anî serê me?" (H/290).

"-Elî Axa, - wî êdî **xwe zeft nekir**, - min ew mêrik anî dizanî, mizginiya min jî heye!" (H/307).

"Elî Axa hindik dima **xwe biqelêşe**, lê **xwe zeft dikir**, nedixwest gilî belav bibin, navê mala wî xerab bibe." (H/309).

"Nanê li ser tenûra me qelandine, xweliya wî gundî **zeft kirine**, êdî çi bibêjim neanîne serê me." (H/314).

"Heta wê çaxê ew **li ber xwe diket**, ku bi **xwe bûye** sebebê wê rêwitiyê, destê mêrê **xwe jî çar birayan kiriye** û niha, gava ku êdî nêzikî gund bûn, gava ku di dengê mêrê **xwe de dengê têlên dil bihîst**, êdî **xwe zeft nekir**." (H/378).

"Herçî li çolê êdî **xwe zeft nedikirin**, kuştin li ber çavên wan, terr û tehlîbûyî, bi formeke arxayînkirî vegeyriyan malên **xwe**, wekî **xwe jî av û herriyê xwedî bikin**." (H/389).

"Û hê negihîştî **pirê**, jî **nişkê ve similayî kir**, veciniqî, paşê **xwe zeft kir**, bi destên **kurikê xwe qayîm girt** û di **pirê re li berjêr nihêrî li çi binihêre**: binê **pirê tijî, tijî cendek bûn**." (H/392).

"Paşê bi **xwe jî**, ev **yek texmîn kir** û **ancax xwe zeftkirî pirsî**." (H/395).

"Paşa, wekî êdî lê **zor kiribû**, devê **xwe weke devê kerekî vekir**, bawîşk hatê, lê **xwe zeft kir** û **ferman da carek din jî bixwîne**." (H/395).

2-). Ji ber ku di biwêjan de şayes, mînak, şibandin, şirove û destnîşankirina bûyer û rewşê heye, zehf zêde tîk bikaranîn. Wekî gotinên pêşiyên ku zêdetir di demên girîn de tîk gotin nîn in. Mezin û biçûk bigire hema her kes jî wan beşekê dizane û wan dixebitîne.¹²³

Aqil jê birrîn

"-Rojekê gazî min kir, bire îdareya **xwe**, "Filankes", wî got, "hal û hewal ev. Tu çawa dizanî, **aqilê te jî vê yekê çi dibirre**?" (H/25).

"-Erê, - Elî Axa bi çavên şabûyî giliyên wê qebûl kir, - erê a çi bibêjim, **aqilê min jî wî dibirre**, ez ê cab bişînim Sûsîzê, bila bê karê **xwe bike**, belkî em van pelan herin." (H/312).

Aqil ji serî çuyîn

"-Nûra **ji aqil serî çuyî** hiş û **aqilê me jî dizibû**." (H/57).

¹²³ h.b., r.22.

"-Xwîna min di min de miçiqî, te di got **aqil ji serê min de çû** û dinya li ber çavê min reşvehat." (H/153).

"-Ji şermê rûreşî tê, tu jî dewsa diya min î, ji kerba Gulîzera Êso ez wiha bûme, **hiş û aqilê min çûye**, axir ew li ber çavên min û birê dane yekî xerîb." (H/233).

Aqil û hiş birin

"Esmanê nitirî **aqil û hişê meriv ber bi xwe dibir**, xem û xereqên rojê dida paş." (H/91).

"-Min hew dizanîbû ez di xewnê de bûm, çima ku ew deng bi min nas bû, **ji eqil birim**." (H/105).

"-Qeydayê Siwaran xwe **em ji hiş birin**, lê me hesp zeft kirin, ne şanê camêran bû, wekî em biketina cirîdan, em xerîb bûn." (H/116).

"-Rast e, şev êdî çûbû nîveka şevê, lê xew ji zû de ji çavên min û Şewêşê kal reviyabû, xeberdana wî ez ji **aqil biribûm**." (H/164).

Aqilê xwe berhevî ser hev kir

"-Min caba wê da û hêja fam kir, ku çi ku di dilê xwe de fikirîme, min jê re negotiye. Min **aqilê xwe berhevî serhev kir** û gotê." (H/130).

Aqilê xwe winda kirin

"-*Qe tiştê wiha dibe? Peyketiyan **aqilê xwe winda kiririne**, çawa ye?*" (H/180).

"-Neçê û ên nolanî wî **aqilê xwe winda nekirine**, - Carekê apê min ê Şao gote me , - ew babax bûne kubar bûne". (H/180).

Ava wan bi riyekê de neçuyîn

"-Egîdê bavê Fêrîk êdî bi kurê xwe re kêm xeber dida, **ava wan di riyekê nediçû**,lê çawa hebe dîsa kur bû, ew jî kurekê çawa." (H/363).

"-Dibe ku wê şeva xayîn li ser wî jî hukim kiribe, her neyse, ne bi dil û fikra paşê re bû, **ava wan bi riyekê de nediçû**." (H/395).

Bala xwe dayîn

"-Min çirp baz da, ketim hundir, **bala xwe dayê** çawa ye; Nûrê mîna dînan dilîze, direqise, şa dibe, digirî û dikene, " şukir şukir" bûna wê ye." (H/53).

Ber çavan reş bûyîn

"-Wê ku wisa got, filankes, **ber çavên min reş bûn**, baweriya te hebe mirin jî wê halê çêtir bû." (H/107).

Bêhna wê/ wî bi ber da hat/ vedibû

"-**Bêhn bi ber me de hat**. Niha êdî bi tenê mala me nîn bû, temamiya gund di şînê de bû mîna me." (H/127).

"-Elî Axa, Emrîkî Axa, Egîdê Axê, **bêhna wan hate ber wan**, bi çavine razî li hev nihêrîn, li paşê her sê xortên wê şevê li jina Mihemed ni hêrîn." (H/208).

"-Annayê dixwend û bi wan **bêhna wê vedibû**, te hew dizanîbû di wî qulçê dinyayê de tevî mîletê Ûris e, qe jî xerîb nîn e." (H/340).

Bi halê xwe de ketin

"-Niha lavê min, ev baran bi ser wan de jî barîye, ew jî li pêşa Girîdaxê, niha ew jî **bi halê xwe de ketine**." (H/77).

Bin qenciya yekê/î derketin

"-Ez merivekî xerîb, tu xerîb, ka riyekê bibîne, wekî ez **binê qenciya wan derêm**." (H/237).

Bi ser hemdê/ hişê xwe de hatin

"-Û deverû dikeve ser dîwana li rex dîwêr, jî xwe ve diçe , reng lê spîçolkî dibe. Ez hêja **bi ser hemdê xwe de têm, li ber xwe dikevim**." (H/27).

"Nûrê bere bere **ser hişê xwe de tê, dêhna xwe dide** me dixwaze xwe bigire, negirî." (H/31).

"-Xanim, bidî xatirê Xwedê, **bi ser hemdê xwe de were**, ka bibêje çi ka çi li te qewimiye?" (H/53).

"-Diya min, ku heta wê çaxê di halekî nehiş de bû, **hate ser hemdê xwe û bilavakirin lûband**." (H/129).

"-Diya min jî ku **bi ser hemdê xwe de hat**, tiştê li paşila xwe derxist, wiha kerreker kire destê Serhing Begê." (H/140).

"-Diya min hê xeber dida, ji gotina wê ez êdî dageriyabûm, **bi ser hişê xwe de hatibûm**, meriv digot, qeweta min zêde bû, ruh bi ber min de hat û destê min xweber çû ser xencera min." (H/141).

"-Lawo, çi li we qewimî? **Bi ser hişê xwe de werin**, Xwedê mezin e." (H/141).

"-Got, Mistefa Beg kêfxweş bû û her tişt ji ê gono re şîrove kir û ew hêja **bi ser hişê xwe de hat.**" (H/156).

"-Ez **bi ser hemdê xwe de tîm** û **bi dilekî baristan** jê peya dibim, lingê xwe datînim ser xweliya wê û tê derdixim. Ku ez êdî li mala xwe me." (H/191).

"-Mihemedê qîşîk hêja **bi ser hemdê xwe de hat** û bi dest xwe re avêtê pêsîra wan." (H/208).

"-Lehzeyekê bi şûn de Egîdê axê bi rastî jî nolanî nexweşekî **bi ser hişê xwe de hat.**" (H/226).

"Koçek,- wî lavayî dikir,- bidî xatrê navê Xwedê, **bi ser hemdê xwe de were,** rabe, hişyar be, de rabe, rabe, binihêr çi bibêjî ez ê guhdariya te bikim, ji te re bibêjim, tek rabe, an na xelq ê çi bibêje, dîwan ê çi ji birayên min re bibêje?" (H/231).

"Wê demê, di nava gund de jî li her derê gotin, wekî pêparê Koçek Gulo bi xêr bû, Egîdê Emerîk Axa **bi ser xwe de hat,** ber bi xêr bû." (H/233).

"-Xema xew tê, cimaet dibêje û gava ku baran çiyê lê kir, hêja **bi ser hişê xwe de hat.**" (H/278).

"Çendek ji wê ortê derbas bû, Gulîzer êdî **bi ser hemdê xwe de dihat** û carcarinan ji malê derdiket." (H/281).

"Qîzîkê mirov digot **bi ser hişê xwe de hat** û pîrs kir." (H/285).

"Gava ku cimaet sêrek bû, çûne malên xwe, Emerîk Axa jî, **bi ser hişê xwe de hat,** hêja jî Ehmê pîrsî." (H/295).

"Ji nişkê ve dengê wî nizm bû. Hêjka cimaeta giro **bi ser hemdê xwe de hat.**" (H/307).

"Tişteke tune, cimaet jî hemîn di ser çavên min re hatiye, bila belav bibe, gava ku camêrî **bi ser xwe de hat,** çi bibêje, ez ê elam bikim." (H/307).

"-Lo li ser çavan, li ser seran,- wî got,- tek bila bi xêr û silametî ev xerîb **bi ser hişê xwe de bê,** wekî din zarê te jî çi bixwaze, ez nana nakim." (H/307).

"Wextekê bi şûn de ez **bi ser hişê xwe de hatim,** ji mirinê vegeriya." (H/328).

"Annaya feqîr dekinîbû, **bi ser hemdê xwe de hat** û paşê beşera xwe xweş kir, heke şerma xwe, heke ji nezaniya xwe, keniya, xelq jî pê re." (H/337).

"-Wî wexta ku **bi ser hemdê xwe de hat,** ji xwe re got û gava ku Xulî hate birê, dengê xwe kirt birrî, hêsîr **di xwe de qurçimandin,** reviya ber bi erebeya barkirî." (H/375).

"-Dibin û hêja qîjîn bi zarokan, bi kulfet dikeve, hêja ser û rûyên xwe vedirûn, li xwe dixin, hêja dibe zarezara Kubarê, ku teze **bi ser hişê xwe de hatibû.**" (H/391).

"Paşê li xwe xurcîlî, dest da ser mawîzêra li rex xwe, **bi ser hemdê xwe de hat.**" (H/397).

"**Bi ser hemdê xwe de hat.**" Şukir warê gundî şîn e." (H/399).

Çav ji çavan silbûyîn

"-Paşê wan destê hev du girtî li hev nihêrîn, nihêrîn, te digot **çav ji çavan sil bûn.**" (H/58).

Çavên xwe bawer nekirin

"Nûrê jî di wî halî de bû; kitêb vedikir, bi ser de dinihêrî û ji **çavên xwe bawer nedikir**, carinan li Apo dinihêrî, li xeberdana wî, carinan li kitêba destê xwe." (H/48).

"-Got, eskerên nîzamê ji **çavên xwe bawer nedikirin** û gava ku fîno, qotik, şar, şemaqiyên wan çil qîzan li ser ava şêlî ya malxerab dîtin." (H/71).

"-Gotina naçalnîk di bîrê de, Elî Axa gava ku ranêzikî li gundê xwe kir, **dêhna xwe dayê** wa ye birrek siwarên xerîb tên, bi **çavên xwe bawer nekir.**" (H/220).

Da bin lingê xwe

"-Bibêje, ne min her tişt **da binê lingên xwe**, bi te re hatim." (H/350).

Derd û kulan derman kirin

"-Hûn ê wî li Tibîlîsê bibînin, qe mefikirin, ew **ê derd û kulên we derman bike**, qedrê wî li cem dewletê pirr e." (H/114).

Destê wê/î ji dinyayê sar bûn

"-**Destê Elî Axê ji dinyayê sar bû**, fam kir, wekî ketiye tomikê, bi wî re jî **êla a am û tam**, **êla Sîpkan** û her çend gundên çasta Axrabanê." (H/383).

Dest ji erd û esman qetayî

"-Ne hewar bû, ne gazî. **Destê wan ji erd û esman qetiyabû.**" (H/386).

Dest ji hev du bûyîn

"-Em dibêjin, werin **destê me ji hev du nekin**, Ezdîxaneyê birrbirri nekin." (H/381).

Derzî biavêta nakete erdê

"-De odeya Silêman Axa **te derzî bavêta, derzî çi ye, nedikete erdê**, we qas cimaet topî ser hev bûbû." (H/112).

Dev ji devan revandin

"Hinekan digot, wekî mezinê hukimetê dîtiye, der heqa cimaeta me de bi wan re gilî kiriye, paşê hatiye, û hezar hezar xeberên wiha **ji devên hev du direvandin**." (H/59).

"Temamiya gundiyan Dîgorê der heqa Egîdê axê de digotin û gilî **ji devên hev du direvandin**, xeber zêde dikirin, hûkî dikirine mûkî." (H/227).

"Gilî mezin dikirin, **dev ji devan direvand** û ew bi xwe li hêviyê bûn çi ka çi çaxê ew xerîb ê bê nava qewm û pismamên xwe, çavên wan jî bi çavên wî bikeve." (H/331).

"Dîsa gilî ji giliyan derdiket, mirovan gilî **ji devên hev direvandin** û temamiya Êzîdîxaneyê çasta Qersê guhê wan li ser bû çi ka axiriyê wê çawa xelas bibe." (H/348).

"-Di malê xwe de digotin û gilî **ji devên hev du direvandin**." (H/237).

"Bi tenê xelqê gilî **ji devên hev direvandin**." (H/259).

Dêhna xwe da

"-Min **dêhna xwe dayê**, Êrêmyan hê di ciyê xwe de ye, mirov digot di heyra min de ye." (H/26).

"-Naxwaze bibêje...Xwîşk ji heybetan û ji bêsebrîyê nizane çawa bike, li wî dinihêre, paşê **dêhna xwe dide min**." (H/30).

"-Paşê Nûrê bere bere **bi ser hişê xwe de tê, dêhna xwe dide me**, dixwaze xwe bigire, negirî." (H/31).

"-Emanekî li Babayanê sekinî dinihêre, paşê vedigere **dêhna xwe dide min**." (H/31).

"-Wexta ku wî kalemêrî wisa xeber dida, min **dêhna xwe dayê**, nêriyekî çalbelek wekî gayekî ji nava beranan veqetîya, hate cem wî." (H/38).

"-Min **dêhna xwe da** kalê liberxweketî. Lê kalê çi? Wekî xortekî li ser xwe bû, dengî zîz, sifetî sor, gul û nûr jê dibarî." (H/39).

"Beran teriqîn, ji rê derketin, nêrî jî kir ku bide pey wan, **dêhna xwe da şivanê edilî**, di ciyê xwe de sekinî û dîsa bû zingezinga zengilê stuyê wî, di riya xwe de xingirî." (H/40).

"Moskov jî, êdî kerr bûbû, qelûna xwe vexist û bi qulapekê duduyan dû hecem kir, paşê zivirî **dêhna xwe da** beranan û êdî tu tişt negot." (H/42).

"Min **dêhna xwe dayê**, paşê li xwe mukur hatim, min gotê." (H/46).

"Temaman ji xwe re ji xwe re lê nihêrî, ketin nava herfên wê yên biçûk û mezin hew **dêhna xwe da**." (H/48).

"-Heta ku wî wisa digot, min **dêhna xwe da** Elîxanê rehetî, wa ye kitêb bi singê xwe ve guvaştiye û ji heybetan hêsîran dibarîne." (H/48).

"-Min êdî xeberdana xwe bi ser hev de anîbû, deqeyek kerr bûm û **dêhna xwe da** cimeata berhevbûyî." (H/49).

"-Firek ava sar xwest, **dêhna xwe da** cimeata rûniştî û gazî bûkê kir." (H/52).

"Çar û neçar tizbiya kalemêrekî li rex xwe ji dêst girt, kerrekerr **dêhna xwe dayê**, paşê cot û ferek kişand, hêdîka kuxiya, balgiyê berpala xwe hilparkî dîwêr kir û xebera xwe ya birrî bi vî tehrî dûmahî kir." (H/52).

"-Min **dêhna xwe dayê** çawa ye, hespe boz e, lê di xûdanê û tozê de rengê xwe guhestiye, reş bûye." (H/52).

"-Moskov navbirrî da xeberdana xwe, qelûna xwe ya vêsîyayî vêxist, ofînekê kûr rahişt û **dêhna xwe da** cimeata ku guhdar î fikir li ser riya Aştarakê." (H/62).

"-Gewriya xwe zelal kir, her du tiliyên xwe yên tilîlîsê qayîm kirine guhê xwe, di binê çavan re **dêhna xwe da** me û qîrand." (H/69).

" 'Sihet xweş, sihet xweş!' gotinê û **dêhna xwe dane** min çi ka çi bibêjim." (H/73).

"-Mal bi xweyî be,- Apê Moskov lê vegerand,- lê binihêr,- wî pencereyê re **dêhna xwe da** derve,- baraneke hûr dibare." (H/74).

"-Belê, -Şero serê simbêlên xwe yên reş î qer çend caran di ser re bada, destê xwe miz da, **dêhna xwe da** emên muhtac,- belê,- dîsa **di ber xwe de** ducar kir wiha got:" (H/75).

"-Xalê Şewêş zûr bû, **dêhna xwe da** min, ne cayîz bû, wekî bigota, here, fedî kir, bi cava qayîliya xwe da." (H/80).

"-Û got, ji xwe re kirin hilşin hundir, derî pace ji hev derxistin û hew **dêhna xwe danê** li çi binihêrin?" (H/84).

"-Lê gava ku wext çû ji wextan, cimeatê **dêhna xwe dayê**, mele û feqîr tijî nava êlê bûn." (H/87).

"-Di xêra diya xwe de, **dêhna xwe dayê**, çi bibîne?! Dît wekî yekî Surman nehatiye ser nanê wî." (H/87).

"-Û her sibeh teze me giliyên teze dibihîst, **dêhna xwe danê**, mezelên xwe ji başqe kirin." (H/87).

"-Şewêşê kal êdî tu xeber negot, **dêhna xwe bi tehrekî enekirinê da min çî ka ez çî dibêjim.**" (H/102).

"-Rojek derbas bû, dudu, **min dêhna xwe dayê**, xêr ji Seyrê tune û tune." (H/107).

"-Min **dêhna xwe dayê**, va ji mala xalê hat." (H/107).

"-Me ku xelas kir, Şewêşê kal tizbiya xwe ya karîbar ji cêba arxalix derxist, **kışand, paşê dêhna xwe da min û bi laqirdî pirsî.**" (H/110).

"-Lehzeyekê bi şûn de desteyek kaxiz di destê de veşerîya, da wî û bi çavên xwe yê leglegî **dêhna xwe da Niho.**" (H/119).

"-Dengê dîkê nîvê şevê li me êdî tesele bû û ji nişkê ve me **dêhna xwe dayê**, di nav xewê de bû piqepirqa diya min a rehmêtî." (H/124).

"-Min **dêhna xwe dayê**, ji aliyê riya Dutaxê de, ji hafa Geliyê Quto tozek wê radibe û ber bi gund tê." (H/129).

"-Me **dêhna xwe dayê**, li çî binihêrin, ev merivên Mala Emrîkê, Mala Niho, Memo ji xwe re ji malan derketin, bi çolê ketin." (H/133).

"-Min **dêhna xwe da** diya xwe, çawa ye, rengê wê bibû ya hêwayê, çawa dixwêniya bi şev xew neketibû çavên wê, **de xwe de kevgiriye û şewitiye.**" (H/134).

"-Ew bû min teze simla got û pariyê pêşîn bir ber bi devê xwe, **dêhna xwe dayê**, kurxalê min, Koço, devê xwe kire kulekê, bi dengê xizexiz dey li min kir." (H/135).

"-Wê çaxê, apê min ên rehmêtî ji me ve derket, **dêhna xwe da** kincên min ên xwînî, "Mala min şewitî." (H/137).

"-Zabitê Romê veşerîya, li me nihêrî, paşê **dêhna xwe da Serhing Begê.**" (H/141).

"-Evê te jî **dêhna xwe dayê**, walgerand, dîsa lê nihêrî, xwend û beşereke xweş got." (H/142).

"-Wî **dêhna xwe da** min û wiha bi maqûlî pirs kir." (H/144).

"-Te qe **dêhna xwe da** gund, got, bawerîya te pê hebe, tek û tûk mabin nemabin." (H/144).

"-Û ji nişkê ve ew jinik te digot êdî dîn bûye, sekinî, **dêhna xwe da** me, meriv digot **hişê xwe berhevî ser hev kir** û got." (H/149).

"-Û me hew **dêhna xwe dayê**, li çî binihêrin; ji Geliyê Pûrto birrek siwar derketin û bû qirçeçirça tivingên wan." (H/152).

"-Lê ji wan û bi wê de me **dêhna xwe dayê**, ev diya min bi çend jinên sere ve wê ji wan qetiyar, pêberjêrî gund bûn." (H/153).

"-Bi Xwedê, ji tevan eyan e, hema wê demê jî me **dêhna xwe dayê**, peyî, ev her sê lavikên me yên girtî jî; Elî, Niho û Bedo, wê birrek siwar li ser, bi lez dajon tên." (H/154).

"-Me **dêhna xwe dayê**, çi bidinê, bû bagereke wisa, her Xwedanê bizanibe." (H/162).

"-Herçî emên cahil derketin derve, me **dêhna xwe dayê**, wê li fêza keloşkê gund, wê sur û sermayê dengê yekî tê, hewar, hey hewar, hey hewar...!" (H/163).

"-Û em çûn, me **dêhna xwe dayê**, pîî, ev Cemalê kurê erêb e, gundiyê Hoxanê, wê êdî dengê wî tê birrîn, dest û lingên wî qefilî û cemidîne, hewar hewara wî ye." (H/163).

"-De filankes, roj bûn, ha hatin ha derbas bûn, me **dêhna xwe dayê**, li çî binihêrin, payîz jî hat, derî kuta, êdî bû wexta dagêrê." (H/167).

"-Bi Xwedê bi te ve eyan e, êvara Sêsemê dereng me **dêhna xwe dayê** wê birrek xortên zomeya jortir, di nava wan de Neçeyê Şenederî, xwe kişî, mala Hesên Axa kir, got, çûn, wekî bikujin." (H/167).

"-Rawestiyên li her çar qulbeyên dinyayê û me kir ku em bi rê bikevin, me **dêhna xwe dayê** li dû me bû qirçeqirçeke wisa, her Xwedê bizanibe." (H/169).

"-Em ku hatin, me lingê xwe avête sînorê Ûris, **dêhna xwe dayê**, êl jî wa ye ediliye, li hêviya me ye." (H/170).

"-Wî wiha bi beşerxweşî **dêhna xwe da** min û êdî dengê xwe nekir." (H/184).

"-Min **dêhna xwe da** rojnameya xwe û riya êla me dîsa hate ber çavên min." (H/195).

"Gavekê bi şûn de ew jî b faytonê û çend parêzkaran ve hat peya bû, di binê çavan re **dêhna xwe da** herçî berhevbûyî, paşê silav kir û çû kete hundir, ji wê şûn de gazî wan kir." (H/197).

"-Wî jî, **dêhna xwe da** herçî li wê derê û gava ku Elî Axayê li ser doşekê rûniştî dît, ancax got." (H/202).

"-Û wiha dageriya, **dêhna xwe da** cimeata rûniştî." (H/203).

"-Min **dêhna xwe dayê**, yekî wê şevreşê dey li min kir." (H/204).

"-Min li nêzîkî mala wî xwe teland, **dêhna xwe da** her aliyan." (H/205).

" Elî Axa wiha got û hê xeber li ser zarê wî, **dêhna xwe dayê** li ber derî bû ringeringa simên hespan." (H/217).

"Eliyê Walo bi ken got û **dêhna xwe da** ersewilên li hêviya emir sekinî." (H/218).

"-Sivika malê pê re pê re hat sapokên axê bêxe, kitek êxist, kir ku ya din bêxe, **dêhna xwe dayê** li ber derê wan bû xeberdan." (H/221).

"-Elî Axa xwe fikirî û **dêhna xwe da** pîrê tevîhevbiyî, meriv dibêje ji rûyê wî xwend û kerreker bûk da famkirin, wekî êdî sapokan din nekişîne, kita êxistî jî bide." (H/221).

"-Balgîyên xastûkî dane ber palên xwe û bi dest xwe re **dêhna xwe dane** cimaetê çî ka kî heye, kî tûne." (H/222).

"-Û li neynika xwe nihêrî, paşê **dêhna xwe da** kulekê, her du destên xwe dirêj kir, te digot bi yekî re xeber dide, dibêje û dilûbîne." (H/232).

"-Emirê Simo (Horê), wekî li ser xênî te digot qerewiliya tiştêkî dikir, carekê jî **dêhna xwe da** taxa jêrîn û bi dest xwe re peya bû, çû cem axê." (H/239).

"**Dêhna xwe dane** der û cîranên taxa jêrîn û li çavên hev nihêrîn, çavan xeber da." (H/240).

"-Her du kurap jî rabûne şipê, **dêhna xwe dane** bejn û bala hev du, te digot teze hev dibînin û ji xwe ber ji xwe ber hev hembêz kirin, çûne rûyê hev du." (H/240).

"-Ew li xeberdanê bûn, hew **dêhna xwe danê** birrek siwar di fêza çiyê re walgeriyan bûn, ber bi Newala Hirçê." (H/244).

"Xelqê rûniştî li dû wî nihêrî û dîsa **dêhna xwe dane** Okiz." (H/248).

"Xeber li ser zar û zimanan, **dêhna xwe danê** eskerê Ûris hat." (H/251).

"-Û vegeriya **dêhna xwe da** Kaxayê ersewil." (H/257).

"Ersewilekî kalemêr wiha di dilê xwe de fikirî, **dêhna xwe da** takara stûyê naçalnîk, paşê **dêhna xwe da** kilam bêj û kerrekerr hesp qamçî kir, çû gihişt komê." (H/258).

"Û gava ro êdî biçûya ava, **dêhna xwe danê**, Gulîzera qijik, wa ye derî re derxistin, rengê wê bûbû yê hewayê, sercavê xwe qelaştibû, kincên wê bi xwîn bûn, qudûm di ling de nemabû." (H/260).

"Gulîzera jihîşketî li erebeyê siwar kirin, **dêhna xwe danê** birrek strajnik wa ye di fêza gund re lezelez dajon." (H/261).

"Emerik Axa simbilên xwe neyse bada, paşê beşera xwe hinekî xweş kir, **dêhna xwe da** cimaeta rûniştî çî ka kî hazir e, kî na, got." (H/263).

"Û zûr bû, **dêhna xwe da** kuleka odeyê ya fireh." (H/268).

"Ger sibeh, êvar û nîvroyan, ew ku ji kon derdiketin, **dêhna xwe didan** riya jêrîn û hêja derbasî şuxul û emelên xwe yê rojê dibûn." (H/281).

"Yekê jî, **dêhna xwe dayê**, ji zomeya wan çend siwar derketin." (H/282).

"-Û Zeynê **dêhna xwe da** Newala Tirsê, ez bibêjim, sed siwar, tu bibêje, du sed, sê sed, wa ye pev ketine, rast wa ye di wê riyê de diçin, di kîjanê re lehzeyekê berê Ûso çû." (H/283).

"Sibehê zû, wan **dêhna xwe dayê** siwarên êla Heseniyan jî hatin li wê derê peya bûn, *Ûso Begî di nav van de.*" (H/283).

"Nivê şevê Gulîzerê ancax çavên xwe vekir, **dêhna xwe dayê**, bavê mehrûm bi tenê di ser re ye." (H/287).

"Emerîk Axê kir ku rabe, hew **dêhna xwe dayê** xortekî nenas qîzikeke biçûk di hembêz de hate hundirê dîwanê." (H/295).

"-Egîd, ji çi re wisa yî?" Min hew **dêhna xwe dayê**, êdî tune." (H/299).

"Paşê **dêhna xwe da** cimaeta zûrbûyî û **kamçobûyî** bi dengêkî kelogirî got." (H/306).

"Qanat carekê jî **dêhna xwe da** kaxizê û li vir ancax famîlek ji xwend û ji yekî duduyan pirsî." (H/320).

"Û zûr bû li gedeyê bi pêşa diya xwe girtî nihêrî, paşê **dêhna xwe da** rengê Elî Axê." (H/321).

"-Hema wê çaxê jî, Elî çavên xwe vekir, **dêhna xwe da** dor û berê xwe û her tişt hate bîrê." (H/327).

"Hema wan rojan, sibeheke bixêr Elî Axa gava ku ji malê derket, **dêhna xwe da** riya Dîgora cîran, dît wa ye siwarek wisa dajo, her Xwedê dizane." (H/331).

"-Û bi dest xwe de dûrbîna xwe xwest. Rabû ser xênî **dêhna xwe dayê.**" (H/331).

"-Hê ku wan sînorê Bacelûyê neqedandibû, **dêhna xwe danê** li çi binihêrin?!" (H/334).

"Pîr Qaso soromorobûyî, be dengêkî di zik de got û **dêhna xwe da** qewalên li kêleka xwe yên spîçolkî weke rengê miriyên goran." (H/346).

"Lê hê şukir di dêv de, **dêhna xwe dayê** sê eskerên nîzamê yên sîlehkirî di ser wan de sekinîn." (H/387).

"Û êvarekê, gava ku kurê Kubarê Reşo karikên xwe anî gund, **dêhna xwe dayê** sê mirov wa ye hêstir barkirî, ew jî hatin nava gund." (H/389).

"-Rojekê jî, li Stansiya Tîbilîsiyê, lawikên piştokêş **dêhna xwe didinê**, pîû, ev yekî di rengê Fêrîj de ji maşîna Moskavayê peya bû." (H/402).

Di ber dilê de hatin

"-Ez **di ber dilê wê de tîm**, jê hevî, lavahî dikim, wekî hêsa be bibêje." (H/27).

"-Cînarên Nûrê jî berhev dibin, herkes bi dilekî şa çavroniyê dide xwişkê û **di ber dilê wê de tîm**, wekî **hişê xwe berhev bike**, **xwe winda neke.**" (H/27).

"Dilê hevalê Babayan, niza'm ji çî re, xerab dibe, dixwaze **di ber dilê wê de bê.**" (H/29).

"Jina Babayan, Guhar, wekî kulfeteke nazik a bedew e, wê mijûl dike, **di ber dilê wê de tê,** lê em hê li ser lingan in, kerr in." (H/31).

"-Xem tune, - ez **di ber dilê wî de tem,**- lê binihêre, kurê te gihîştîye înstîtût kuta kirye, lê kurapê te, Keleş, li Lénîngardê bûye ilimdarekî berbiçav, gelek kitêbên wî yên ilmiyê hene, gelek xwendekar û aspirant li ber destê wî hîn bûne û hîn dibin, êdî çî dixwazî?" (H/35).

"-Diya min a belengaz, wexta ku tenê dibûm, ez şîret dikirim, **di ber dilê min de dihat,** lê çî feyde, bi kê re ye..." (H/108).

"-Ez jî di xwe de dişewitîm û dikewgirîm, ne ew bû li diya xwe hêrs bibûma, ne ew bû **di ber dilê wê belengazê bihatama.**" (H/125).

"-Ji bo ku **di ber dilê me de bê,** du giliyên nelirê ji min û bûkê re got û ji malê derket çû, bi kû de, me nizanibû." (H/126).

"-Ez ê jî tiştêkî bikim," apê min got, " niha here **di ber dilê wan cahilan de were.**" (H/130).

"-Dengê xwe nekir. Min hela çend xeberên xweş gotê, kir **di ber dilê wê de bê.**" (H/134).

"Lê çî gêzî, hişê wê ne li wê derê bû, ew li Sîbîrê bû, ew ku Egîd **di ber dilê wê de dihat,** digot der heqa edet de, rabûn û rûniştina mêr û jinan, terbiyekirina zarokan de." (H/337).

"Car hebû diçû gundan û bi şevan venedigeriya, hindik xeber dida, **di ber dilê Annayê de mîna berê nedihat,** te digot jê neban dibe, jê direve." (H/349).

"Û hate ber çawan eynî ew bi xwe Anna, dîsa bi hezkirin serê wî hembêz kir, **di ber dilê wî de hat...**" (H/357).

"-Ew **di ber dilê xwe de hat** û hinekî sêkin bû, kir ku li ber xwe bide, wekî **di ber dilên kur û bûk û neferên mala de bê,** çav li dêrî." (H/383).

Di ber xwe de gotin

"-'Niza'm' wê **di ber xwe de got** û serî di ber de, kerr bû." (H/55).

"-Dêmek wisa. -Min **di ber xwe de got.**" (H/73).

"Şewêşê kal, **di ber xwe de,** simila got û loqê pêşîn bire devê xwe, paşê vegeriya min ji min re got." (H/80).

"-Feqîrê, -xortekê **di ber xwe de got-** û hêsir tijî çavên wî bûn, - nemerivahiya wisa..." (H/88).

"-Pûî, min mehrûmê, pé wê çawa ebûr dibe?! -Got, jinikê **di ber xwe de got.**" (H/113).

"-Avdelê Nenê ye.- Şewêşê kal **di ber xwe de got.**-" (H/132).

"**Kalê di ber xwe de got**, dilê wî tijî bû, hat birêje." (H/133).

"**Wî di ber xwe de got**, li kalikê nihêrî û wexta ku di çavan re îzin xwest, hêdîka hate kêleka wî, li aliyê milê rûnişt." (H/185).

"**Hûn ê poşman bibin**, -**Keçikê di ber xwe de got**,- paşê mebêjin, wekî ez xerab im." (H/286).

"-Belê, belê,- ez **di ber xwe de dibêjim**, lehzeyekê kerr dibim, giliyên çûyî tînim bîra xwe û bi ser de zêde dikim,- belê, yekî wisa hebûye." (H/402).

Dil dida ber dilan

"-De gidî biliv", me **dil dida ber dilê hev** û lingekî zû pêş de davêt." (H/97).

Di dil de mayîn

"Hesretê ew dixwar, tirs kete dilê wê, wekî dikare li vir bimire, hesreta **Sîbîrê di dil de bimîne.**" (H/349).

Di dilê xwe de gotin

"**Wî di dilê xwe de got** û zû zû gem da destê xulêm, çû odayê." (H/212).

"**Wî di dilê xwe de got** û dîsa berberrî her du birayan bû." (H/222).

"**Wî di dilê xwe de got** û bi keremkirina hurmetê êdî çû hundir, otaxeke paqij î rind hilatî." (H/321).

" 'Xwedê xêr bike,' wî **di dilê xwe de got**, 'ev siwarê xêrê ye, an ê de'wê?' " (H/ 331).

"**Wê di dilê xwe kerreker digot** û bi ramûsaneke qîzîn î bişewat rûyê wî xemiland." (H/356).

"**Wî di dilê xwe de got** û kifirî roja xwe ya reş kir çî ka ji çî re hat dinyayê, ji çî re reviya, ji çî re destê wî ji êl û eşîrê bû, ji çî re, ji çî re..." (H/377).

" 'Nan û xwe?!' Kubarê **di dilê xwe de ev xeber wekilandin.**" (H/400).

Dil tijî bûn

"-Me ku ji dûr ve ew yek dît, ji heybetan **dilê me tijî bû.**" (H/153).

"Gelekan gava ku ev xeber dibihîstin, **dilê wan tijî dibû** û ji xwe ber hêsir ji çavên wan dibariyan, dihatine jêre." (H/331).

Di ser hev re çûyîn

"-Ne min hêja ji te re got, Xalê Mihê hat, got, şeherê Tibilîsiyê gava ku bi hatina wî hisiya, **di ser hev re çû**, çî qas lo lo Kurmanc hebû, hatin lê berhev bûn." (H/53).

"-Û gund teze **di ser hev re çû**." (H/152).

"-Gund **di ser hev re çû**, bû heydada." (H/163).

"Dîgorê **di ser hev re çû**, te digot şîn girêda û gişan gişan, mêr û jin, qîz û kur xwe li wî dengê girtin, reviyar." (H/243).

Di xwe de qurçimandin

"-Herçî em li wê derê bûn, me jî deng û his **di xwe de qurçimand**, êdî turîş nedikir ji wê bipirsîn." (H/65).

"-Me her tişt **di xwe de qurçimand**, dengê xwe nekir, lê baweriya te hebe, ew kerrbûn li ser me gelekî giran rûnişt." (H/178).

"Deqeyekê şikadêr kerr bûn, ew hêrsa çend rojan **di xwe de qurçimandin**, li çavên hev du nihêrîn, li pirîstêv, naçalnik û li Îsraêl nihêrîn, bi çavên hev du şewirîn û dikirin riyekê ji xwe re bibînin." (H/255).

"-Û her carek dilovaniyek ji ber xwe derdixist, davêt ser û hêsirên xwe **di xwe de diqurçimand**." (H/302).

"-Û por û poşman ji kewşên vegeriya, bi xwe keniya û her tişt **di xwe de qurçimand**, wekî kesek bi sirra wê nehise." (H/303).

"-Dêmek tu seba wê diçûyî wê derê? -Wê hêrs **di xwe de qurçimandî** pirsî-" (H/351).

"-Dilê bavê tijî bû hêsrînan ew xeniqand û wî kerrekerr her tişt **di xwe de qurçimand**." (H/377).

"Cî bi cî sawê bi wan girt, kirin ku jinika berzeq bikujin, lê ji dengê gulleyê tirsîyan û hêrs **di xwe de qurçimandî** bi dûrî qîzê ketin, vê carê bi qîzikeke din a feqîr de ketin, kaş kirin, nîvmirî bi xwe re birin." (H/388).

"-Û her tişt **di xwe de qurçimand**, bi paş de êxist, xwe zefî kir, got. (H/398).

Guman jê hatî birîn

"-Gumana min êdî hate birrîn, ez hatime ser wê nêtê, wekî caba heval, navê wî li ser zimanê min e, bise ez ê bibêjim." (H/29).

"-Birayê Îbrahîm, **gumana xwe nebirre**, Êrisê çavsût rehma wî pîrr e, rojek ê bê, gava ku zarokên we jî wê bi zimanê xwe bixwînin, ew wext erhede wê bê, lê niza'm wê çaxê em ê hebin, an na, ew jî Xwedê dizane." (H/113).

Gunehê kafiran lê hatin

"-**Gunehê kafiran bi wan zarokan dihat, agir bi dilê axê ket û ji xwe re bû îskeîska wî.**" (H/357).

Gunehê xwe pê anîn

"-Wî gelekî ji zarokan hez dikir, **gunehê xwe bi wan dianî, digot, " Ez hew dizanim zarokên min in.**" (H/43).

"Hinekan nifir li wan dikir, hinek **di ber dilê wan de dihatin, gunehê xwe bi wan dianîn.**" (H/259).

Gunehê wê/î li stûyê wê/î

"-An na bêtehmî dikare bikeve ortê, wê çaxê **gunehê wî li stûyê wî.**" (H/179).

"Ez nikarim **gunehê êlê bikime stûyê xwe.**" (H/379).

"-Niha hûn dizanin, va emê çûn, **gunehê we li stûyê we.**" (H/381).

Heyfa xwe hilandin/ rakirin

"-Rom ê dîsa tivdarekên xwe bike, bavêje ser me, wekî **heyfa eskerên xwe li ser me nehêle.**" (H/81).

"-Paşê, wê, gava ku bûk hat bi ser kurê min de rûnişt, ev Elî, kurxalê wî Niho û Bedo qaçax bûn, wekî kurê min, an jî mêrê min li çiyekê bigirin û **heyfa xwe jê hildin.**" (H/138).

"-Em dijminên hev in, gotina diya min rast e, ew gav bi gav û saetê li dora gund diçûn û dihatin wekî **heyfa xwe ji me hildin.**" (H/139).

"-Na, bi serê te, got- Emerîkê got- gur û gumanê me ji wê yekê tune, vê bukinga me rûyê xwe reş kiribû, reviyabû, ew jî, de cahil e, tevî hevalên xwe bi çolan ketibû, wekî kur **heyfa xwe hilde.**" (H/155).

"-Lê çawa! Min ku ker bar kir ji gund derxist, li ber kendalekî da sekinandin, ez bi şûn de çûm, wekî **heyfa xwe hildim.**" (H/205).

"-Na heyran, -kurê Kurdasî got,- tuyî westîyayî, keserî, pak dibe tu hindekî rihet bî, kurapê te here û bê, **heyfa keçikê li erdê nahêle.**" (H/207).

"-Wey Xwedê min û jinê, qîzê, mal û halê min qurbana we û xîreta we bike, gidîno! We çawa şeva îşevîn **heyfa wê hêsîrê bi destê xwe hilda.**" (H/208).

"-Mihemedê min, qîza min, Elî Axa **heyfa we hilda, êdî bila dilê we rihet be.**" (H/208).

"-Heta ku **heyfa xwe ji me hilnedin, rihet namînin.**" (H/290).

"De ev jina Xalitê Temo ye, her êvarê Xwedê û sibehan ji xwe re wiha dibêje û dilûbîne, li hêviya wê roja maye ka kê here **heyfa mêrê wê hilîne.**" (H/ 318,319).

"Paşê gotin, wekî Romê êdî xwe bi Poştê re gihandiyê, bila neseke, bar bike, bê bigihije me, an na Rom xayîn e, wê wisa bike kitek kar nemîne, dergûşek di nava me de nemîne, **heyfa kevin û teze wê hilde.**" (H/379).

Hişê xwe berhevî ser hev kirin

"Koçek Gulo bi ser hemdê de xwe hat, **hişê xwe berhevî ser hev kir**, rabû vê carê çû li ber serê Egîd rûnişt û xêlekê kerr ma." (H/321).

"Egîdê axê **hişê xwe berhevî ser hev kir**, te digot ji xwe şerm kir, serê xwe hilbirî, got." (H/239).

"Paşê paşê **hişê xwe berhevî ser hev kir** û bi dilekî birîndar ev giliya hanê da destê birê." (H/328-327).

Ji dergê teng xilasbûyîn

"Lê gişan jî ji xwe re ji xwe re tiştek dizanîbû, wekî alî axê bikin, belkî wî **ji dergê teng xelas bikin.**" (H/263).

Ji destê xwe kirin

"-Ez ji rîya xwe mam, qe na tu meydana ilm û zanîne **ji destê xwe neke**" (H/35).

Ji guhên xwe bawer nekirin

"Gişan li çavên hev du nihêrîn, mirov digot **ji guhên xwe bawer nedikirin.**" (H/48).

Ji merîviyê derxistin

"-Gava ku zorbeyan bi destê zorê erzên me direvandin, em ji ruh ve didane kuştin, **ji merîviyê derdixistin.**" (H/89).

Kela wê/wî rabû

"Xwişkê hê dike û dilûbîne, şîne û şahiyê hev du hembêz kirine, **kela wê rabûye.**" (H/32).

"Mirov digot ketiye meydana şêr; çav lê tijî bûbûn, dest lê dilerizî, **kela wî rabûbû.**" (H/86).

Kok birr/qir kirin/ koka hev anîn

"-Heke ez wê birevînim, gund bi gundî wê **qira hev bînin**, Emrîk ê neneran bîne serê me." (H/107).

"-De êdî herin, hukimet li we hate rehmê, tivdarekê xwe bikin, lê wisa bi fesal bikin, wekî tu kesk bi we nehise! An na, wê êla we **kobirr bikin**." (H/121).

"-Li aliyekê Rom bi me de ketibû, li aliyekî me yê hev du qir bikira, **koka hev du bianiya**." (H/127).

"-An na, rojêke mîna rojêke wiha, dîsa meleyekî mîna te, zabitekî mîna Îsmet, dîsa dikarin li me qesidin, esker bikişînin ser me, mehnayan ji me bigrin, **koka me bînin**." (H/155).

"-Wekî hûn niha neçin negihîjine wan, ew ê cî bi cî bixweniqin, Dewlata Romê jî, hemîn mehnayan li me digere, wê van çend malên me **kobirr bikin**, kitekê nahêlin." (H/163).

"-Wê bibe şer, wê mala Elî Axa **kobirr bikin**." (H/251).

"Her kesek li çiyê xwe mix bûbû, li hêviya xeberekê bûn, wekî hev bikevin, **qira hev bînin**, Dîgorê tarmitax bikin, bikine çiyê kulîk û bêderan." (H/253).

"-Romê bê, kitek mêr nahêle, wê gişan **kobirr bike**." (H/382).

"Dibe ku dîsa kevnek bi dest xistibe, bi ruhê feqîrê re dilîze, etabê giran tîne sêrî, an qirareke teze derdixe, wekî herçî bû kufet jî **kobirr bike** û hêja li dinyayê bikene û pesnê şûrê Romê bide." (H/395).

Kulmê naçîne dirrêşê

"-Siwarên ku ji duh ve hatibûn êdî gemên hespên xwe li dev xistin, bi paş de zivirîn. Gişan fam kir, wekî bi **kulmê naçîne dirrêşê**." (H/256).

Li ber xwe ketin

"**Li ber xwe dikeve**, wekî xwendina navînî û bilind bi dest neaniye." (H/35).

"-Nîşankirina min wî jî bihîst, **li ber xwe ket**, belengaz bû." (H/105).

"Diya min jî ev gilî bihîstin, bi min re şer kir, **li ber xwe ket**." (H/106).

"-Min xwe bi rast jî **zeft nedikir**, de cahil bûm, **li ber xwe diketim**, wekî min ji çî re bi eskeran re şer nekir, ji çî re bavê xwe wisa rihet da destên wan nemirivan." (H/125).

"-Lê ji bext re kes tunebû û beriya gişî ez û helala xwe **li ber xwe diketin**." (H/146).

"-Gunehe min pê hat, min texmîn kir, wekî **li ber xwe dikeve** ji bo rojên xortaniyê." (H/166).

"-Şerma wî tune bû, **li ber xwe nediket**." (H/180).

"-Aciz bûbûn. Hêrs bûbûn. **Li ber xwe diketin**." (H/260).

"**Li ber xwe diket.** Destê xwe kirîbû kulm û **bê hemdê xwe berê wan çend** pezikan ber bi holmaçka xwe dikir." (H/277).

"Paşê **li ber xwe ketibû**, li rûyê Zeynê nihêribû, ci bi ci kerr bûbû, kerrekerr derketîbû çûbû." (H/282).

"Di vê giliyê de, bûk, û zava jî gelekî **li ber xwe ketin.**" (H/297).

"Elî Axa aciz dibû, **li ber xwe diket**, êvaran kerrekerr ji odeyê derdiket û li heyvê, li stêrkan dinihêrî, bi wan re xeber dida" (H/298).

"Êvarê, gava ku Elîfa jina wî şîv anî, dît wekî Elî Axa gelekî mirîz î **liberxweketî** ye." (H/312).

"-De pak e te ji min re got, -Egîd gotê, - wekî wisa ye, mebêje, bila **li ber xwe nekeve.**" (H/327).

"Egîd xwest di **ber dilê wê de bê**, lê nebû tişteki, helbet Anna **li ber xwe diket.**" (H/338).

"-Evên te **li ber xwe ketin.** Lê çi riyekê ji xwe re bibînin, tu serederî jê nedikirin." (H/341).

"Egîd **li ber xwe ket**, demsala gulgulî ji berîka xwe derxist, çavên xwe paqij kir." (H/360).

"Keseke ji tirsê xwe nêzik nabe, lê giş, giş **li ber xwe dikevin.**" (H/373).

"Lê ji te tirê ji bo mala axê wisa **li ber xwe diketin?**" (H/86).

Ling ji erdê negirtin

"Wexta ku wî dilê xwe wisa vekir, **lingê Gulo êdî erd negirt**, ew êdî ghiştîbû merema xwe, li ber êl û eşîrê şermî nedima, hemîn Elî Axa yê jî wê rind xelat bikira." (H/233).

Mil da ber milan

"-Te ku di vê roja wiha de **mil da ber min** û kulfetê min û zarokê min, bila Xwedê jî me şermî nehêle." (H/336).

Miraz di çav de mayîn

"-Ûris ê **mirazê me di çavê me de nehêle** û roja îroyîn wê bimîne çawa wisa bîranîn." (H/182).

Mirazê xwe şabûyîn

"-Paşê çûne mala bavê Xezalê, li wê derê jî li hev hatin, qelenê wan dubare danê û hêja pîrsa min û bûkê ancax dev û diranên der û cîranan derket. Em hêja bi bext û **mirazê xwe şa bûn.**" (H/158).

Ne mirî ne, ne sax in

"-Weleh hema wisa ye.-Çend mêrên rûspî zêde kirin.- Ev çend roj e em **ne mirî ne, ne sax in.**" (H/264).

Xeber bi şêkir birîn

"-Belê, - ez **xebera wê bi şêkir dibirrim**, - sed korayî ji bo wî, - li aliyê Nûrê dinihêrim,- ev jî jina wî ye,- ez dibêjim,- Nûrê Polatova." (H/28).

"-Rast e, - **min xebera wî bi şêkir birrî**- wî li wê derê êtimxaneyekê vekiribû, ji wê bi şûn de bi xwe Olga Gazaryanê, wekî ji bo wê hurmet û qedirgirtina wê jê re digotin Dayê." (H/49).

"Manûkê kal beşerxweşbûyî **xebera wî bi şêkir birrî.**" (H/112).

"-Rast e, gotina we ye.- **Me xeberê wî maqûlî bi şêkir birrî.**" (H/120).

"-Belê, - xortê tezehatî **xebera wî bi şêkir birrî**- hema hûnê sax bin, saya Elah û Pêxember pak e, ew jî gelekî hurmeta te digire û îro ez şandim." (H/213).

Xwe bi xwe re gotin

" 'Ecêba ser ecêbê', min **xwe bi xwe ra got**, ev hikayet nîn bû, bû hikayet, lewma pêşiyên me gotine:" (H/ 66).

" '-Na,na,' -wî bi dengê bilind **xwe bi xwe re got**, -'ew yek nabe!' " (H/311).

" **Wî dîsa xwe bi xwe re got** û bi van fikran hate eywana xwe." (H/311).

"**Û hêja bi tenê giliya Şebabê Balo hate bîra axê**, di binê zimanê wî de tiştê hebû, wî negot, **axê xwe bi xwe re got** û vegeriya aliyê birê." (H/322).

" 'Mehîn,' wî **xwe bi xwe re got**, " weleh mîna mehîna kirîvê Hakob e." " (H/331).

Xwe eyan kirin

"-Eşkere **xwe eyan nekirin**, lê wekî din dest bi giliyên nelirê kirin, gotin, wekî Witî Surman in, xwe li ser Surmana dukijin." (H/181).

Xwe ji bîr kirin

"-Û ez bi hezkirin bi şevan bê xew mam, bi rojan **min xwe ji bîr kir, ro kir** û pîva, pirsî, nivîsara xwe rast kir, çêkir û afirand ev elîfbaya han ji bo we, ji bo rojekê wiha." (H/48).

"Apê Moskov wê lehzeyê bûbû dengbêj, xeber bûn **ro dikir**, Çaw dixuya wê êvarê tarixî li ser wî gelekî hukim kirbû, lewma wisa **xwe ji bîr kirbû**, digot û digot" (H/49).

Xweliya binê lingan

"-Pîî, qurbana wî be, **xweliya binê lingên Fêrik be!**" (H/53).

Xwe winda kirin

"-Bi wê êşê, bi wê birîna serê xwe, min xwe **bi xwe re got**, diyamin **xwe winda kirye**, wekî wisa şêrîn şêrîn bi dijimim re xeber dide, çawa ye?" (H/136).

"-Diya min li vê derê jî **xwe winda nekir**, çû bi destê bînbaşî girt, bû mirçemirça wê, maç kir." (H/142).

"-Diya min a rehetî gava ku ev gilî bihîstin, ne ew bû bigiriya, ne ew bû şa bibûya; **xwe winda kirîbû**, şerm dikir li rûyê bûkê binihêriya, ji apê min re tiştê bigota." (H/149).

"-Elî Axa hindik ma seba birê **xwe winda bike**, lê Pîr Qaso bi destê xwe re pê re ghişt, pê lingên xwe lingên wî guvaşt û av xwest." (H/226).

"-Belê min **xwe winda kir**, - Xort ji pirsê xwe silbûyî zû xebera xwe anî cî." (H/238).

"Û hêja mîna kulfeteke **xwe windakirî** hate nava çavên xwe, li singê xwe xist, dikira axîn." (H/279).

"-Soromoro bû, lê **xwe winda nekir**." (H/284).

"-Lingên wê kevir û kuçikên çem diketin, xwîna wê Ava Reş sor dikir, **lê wê xwe winda nedikir**, bi pêş de diçû de dest de çivîngokên wê, gede û keçik." (H/374).

"-**Xwe winda dikir**. Lê tu were ew bi tenê wisa nîn bû, gelek gelek mîna wî bûbûn wê şeva sawê." (H/375).

Xweziya xwe pê anîn

"-Lê tu were dilê min rihet bû. Ez di wî halî de hê **xweziya xwe bi wê tînim**." (H/31).

Xwîna reş ketî (hildişe) dili

"Wekî tevî kolozê terrikî hê di binê sterên hinek malan de dimîne, her cara gava ku çavê mirov pê dikeve, **xwîna reş hildişe nava dil û hinavê wî**, derd û kulên kevin tev radibin." (H/34).

"Çi bibêjim lawo, - wî bi ax wax li min vegeand- gava ku wan salan tînim bîra xwe, **xwîna reş hildişe nava dilê min**." (H/41).

"-Got, wê çaxê Îbrahîm Axa axîneke wisa kûr kişand, got, **xwîn hilşiya nava dilê wî.**" (H/113).

"Axîn hate cimeata runiştî û wê gavê te digot **xwîn hilşiya nava dilê wan,** çiya bi ser wan de walgeriya." (H/273).

"-Çû di tapê gund re qulibî û hêja bi tenê Elî Axa ew kaxiza ku Şebêb anîbû bi fesal ji bêrika xwe derxist, da ser eniya xwe, paşê bi çavên bihêsir nêzikî lêvên xwe kir û axîneke wisa hatê, te digot **xwîn hilşiya nava dilê wî.**" (H/311).

"Û kire axîn, kire waxîn, her carê kulmek **xwîn hildişiya nava dilê wî.**" (H/326).

"Got û hizingeke wisa hatê, te digot **xwîn hilşiya nava dilê wê.**" (H/356).

"-Kete hundir û gava ku dît kes di malê da tune, be her du destan hate nava çavên xwe, hêja di xwe de kewgirî. **Xwîn hilşiya nava dil.**" (H/371).

"-Rabû ser xwe, **dêhna xwe da** zarokan, qîzika biçûk hembêz kir û ofîneke wisa rahişt, te digot dil û hinavên wê qetiyar, **xwîn hilşiya nava dilê wê.**" (H/377).

Zar û ziman giranbuyîn

"-**Zimanê min giran bûbû** û min ancax gotê: -Bibexşîne, tiştêk nikarim bibêjim, her gilî zelal e...Carek din..." (H/26).

"-Min û Xezalê hêja li çavên hev nihêrîn, **lê zar û zimanê me giran bûbû,** nikarîbû qe na du gilî bi hev re bigota." (H/130).

"-Min kir ku **di ber dilê wê de bêm,** lê dilê min jî tijî bû, **ziman li min giran bû,** êdî min li ber xwe neda, bi lez derketim derve." (H/130).

"Digot û digot, lê ya **Ûso dil digiriya,** kerreker **xwîn hildişiya dilê wî** û hey ber bi esmên dinihêrî, te digot zarî tiştêkî dibe, te digot nîfiran li yekî dike." (H/270).

"**Zimanê Kubarê giran bû,** çavên wê reşvehatin û hêja fam kir, wekî wê şevê bû mêr di Camûşvanê de nemaye, Romê kiriye xelaya mêran." (H/392).

Zar /Ziman lê hate girêdan / girtin

"-Lê vê carê kesekî dengê xwe nekir, te digot **zar û zimanê wan hatiye girtin,** dilê wan sekini." (H/214).

"-Lê hekim kerr bû, te digot dia dike, te digot **zimanê wî jî hate girêdan.**" (H/227).

"-Zeynê li kêleka **Ûso rûniştîbû,** te digot **zar û ziman lê hatine girêdan,** destê xwe tewar kiribû, roja xwe reş dikir." (H/278).

"Egîd jî, dilê wî tijî bûbû, **zar û zimanê wî te digot hatiye girêdan** û li ber birê nikarîbû xeber bide." (H/327).

Zar û ziman nagere

"-Zar û zimanê min nagere, bi cureyekî navê xwe hiltînim û gava ku derî vedibe, xwe davêjime hundir, disekinim, bêhna xwe distînim û paşê bi dengê bilind dibêjim." (H/26).

"-Zar û zimanê wî nedigeraya, çavên wî bi kor de çûbûn, ew bû te digot wê can bide ew sivanê çiyê wê êvara dereng." (H/371).

Zimanê xwe gestin

"-Gava ku wî wisa got, min li vê derê zimanê xwe gest, êdî tu negotê û Xezalê nihêrî." (H/137).

"Qanat li vê derê zimanê xwe gest û ti tişt ji axê re negot." (H/321).

3-). Taybetiyeke biwêjan a din jî ev e ku şibandinên pir awarte û mecazî dihewînin. Ya ku tê ziman û ya ku tê destnîşankirin ji hev cuda ne. Şibandin û diyarkirinên ku tên gotin û peyama ku tê dayîn, ne wekî hev in.¹²⁴

Agir bi dilê ketî

"Ji halê wî mêrikî **agir dilê wan ket**, hinekan ji şermana berê xwe bi aliyê dîwêr de kirîbûn, mirov nizanibû digiriyan, an ji bejna xwe şerm dikirin." (H/205).

"-Û dilê cimaetê êşiya, **dilê cimaetê agir pê ket**, şewitî, kizirî, bû gola xwîne." (H/383).

Cab da dest

"-Na, - Xanimê **caba temam da dêst**, - dawet bila bimîne rojekê din." (H/55).

Dengê wê/wî ketibû zikê wê/wî

"-Mele Huseyn, **dengê wî ketibû zikê wî**, de wî jî nikaribû pê re xeber da, ma xelqê din." (H/112).

Di ciyê xwe de bûn kevir/ risas

"-Guhdar **di ciyê xwe de mix bûne**, bûne kevir, kulmên wan guvaştî ne, çavên wan tijî..." (H/70).

"-Em jî **di ciyê xwe de bûne risas**, li ser qursiyan runiştin û me nizanibû ji hev re çi bigota, çi rê ji xwe re bidîta." (H/128).

"-Tevirbir, her çend lawikên din ji dengê dayîka ewled windakirî **di ciyê xwe de bûbûn risas**, hey hêsir kerrekerr dibarandin û bi dest xwe re paqij dikirin." (H/250).

¹²⁴ H.b., r.19.

"-Belê axa, -Ûso bi dengekî de xeniqî **di ber xwe de got**, - helbet gotina te çi ye?" (H/274).

"Ew jî te digot di **ciyên xwe de bûne kevir, destê wan ji dinyayê sar bû** û ji tirsana zar û zimanê wan hate girtin **çi ka halê girtiyên bû** çi." (H/293).

"-Kubara dê jî, **wekî heya wê çaxê di ciyê xwe de bûbû kevir**, nizanibû bi kî aliyê de here." (H/399).

Dîn û har bûn

"-Êdî xortan wê çawa jê hez nekirina, çawa li ser **dîn û har nebûyana?**" (H/51).

Gilî di devê wê/î de girtin

"-Belê, em ji kavkazê tîn,- **Qanat gilî di devê wê de girt**, - em dixwazin Îvan Îvanoviç bibînin." (H/321).

Gotina wê/î bi erdê neêxistin

"-Bavê min **gotina wî bi erdê naxe**, wisa jî dike, dibêje, " **Xalê Emerîk, hema bila gotina te be, ji vê berbangê û pê de navê kurê min Moskov e.**" (H/38).

Ji dilê wê/î xebordan

"Cimaetê li aliyê Okiz nihêrî û mirov digot qewet dayê, **wekî ew ji dilê wan xeber bide.**" (H/201).

Ji xewa kibîr rakirin

"-Mizgîniya te jî dimîne mizgînî, te roja îro birayê min **rakir ji xewa kibîr.**" (H/32).

"Û çawa bû, her du kulfetan bi dest xwe re li par re nihêrîn, aliyê Yêrêvanê; tava sibehê nedîr dabû, zerahiyê dabû navsera Elegezê û ji te tirê digotê, **ku ji xewa kibîr hişyar bibe**, dipistandê guh û heçeyên wê, **wekî va ye rojtaveke teze li ser Ermenîstanê vedibe.**" (H/400).

Ketina orta du keviran

"-Nûrê jî nizane çi bike, **ketiye orta du keviran**; ne ew e destê xwe ji wî bike, ne jî ji dergîstiyê xwe bike." (H/64).

Lingên xwe li guhên xwe êxistin

"-Qoçax bin, şikayetê xwe berk bikin, **wekî carek din jî lingên xwe li guhên xwe nexin.**" (H/137).

Ling kire ji solekê teng

"-Kuro, lê em niha çawa bikin, te ji çi re ev yek kirye, ji çi re **lingên min kire soleke teng** niha bavê qîzikê, pismanmên wê wê ji min re çi bibêjin?" (H/216).

"-Elî Axa **ketibû solekê teng**, ne ew bû bigota, berde, ne ew bû bigota, bihêle, ne ew bû destê xwe ji birayê xwe bikişanda, ne ew bû bima li wir." (H/238).

Li ser tiliyan reqisandin

"-Bes e tu me **li ser tiliyan bidî reqasê**, gotina xwe bibêje, wekî em jî bizanibin çi ka em li bendî çi ne." (286).

Mirin çeka cindiyan e

"-Hêsîrî çetîn e, **mirin çeka cindiyan e**, xof, tirs zehf çetin in." (H/385).

Roj bûn sal

"-**Roj li min bûn sal**, şevan xwe ji çavên min direviya û wiha hedî hedî de xwe de dikeribîm." (H/105).

Şerma xwe da ber lingan

"-Çawa ye min, min got, min dûrî xweyîyan, porê xwe kur kir, **şerma xwe da ber lingê xwe**, min jê re got, were min birevîne, we jî niha naz û tûzan dike, ne wisa ye!" (H/107).

Şîrê zikmakiyê di devê wî/ê re hat

"-De got, Bavoyê te gihiştê, wisa lê dayê, wekî **şîrê zikmakiyê di devê wê de hat**." (H/88).

Xwelî serê xwe kirin

"-De niha bibêje, ez çi bikim, çi **xweliyê li serê xwe bikim**, nikarim tab bidim, ji derdê wê ne xew dikeve çavên min, ne nan tê bîra min, ne jî dikarim dilê xwe ji yekî re vekim." (H/233).

"-Ûsoyê qijik wê çi bikira, çi **xwelî li serê xwe bikira**, ji kê re çi bigota?" (H/282).

Xwîn lê keliyayî

"Her du axa li hev du nihêrîn, **xwîna wan keliya**, lê bi dest xwe re hate bîra wan, ku Semîdov Semîdov e, qulixdarê padişêh e, heke destê xwe li ser wî bilind bikî, tu destê xwe li ser padişêh bilind dikî." (H/219).

Xwîna yekî fir kirin

"-Niha bidin min, ez ê xwîna wî gedeyî fir bikim." (H/136).

4-). Hinek biwêj bi forma pirsê de ne. Lê di bin vê pirsê de rewş û ramanêke bakêş heye.¹²⁵

Çi hal e çi hewal e

"-Nûra min, lawo, Xwedê xêr bike, ev çi hal e, çi hewal e?" (H/54).

"-Şermê mala xwe bar kiriye, - min bi laqirdî gotê, - û ez jî jixweber jixweber hewaskar bûm, min jê hêvî û lavayî kir **çi ka çi hewal e**, - kesekî xerîb li vir tune, - min gotê, - ez jî kurê malê me." (H/103).

"-Lawo, - Wî ji mêrikê tezehatî re got, - ca kerem bike bi pêş de were **çi ka çi hal e, çi heval e, çi li te qewimiye.**" (H/203).

"Êla Cemaldînan, Cûmkan jû bihîstin û her yekî ji xwe re berê xwe dida mala Elî Axa, diçûne dîtina birayê wî, dipirsîn **çi ka çi hewal e.**" (H/227).

"-De wekî wisa ye, niha ew li kû ye? Min bibin cem wî **çi ka çi hal e çi heval e**, ez ê bêm ji we re bibêjim." (H/229).

5-). Hinek caran biwêj li gor bawerî û mantiqa gel, nifir an jî dia ne.¹²⁶

Xwe avêtina ber bextî

"Nûrê dike qîrîn û xwe davêje ser dest û piyên wî. -Gidî ez di **bextê te de me**, di bextê te, mala tê û vî tîfalê te yê berhembêz de me." (H/29).

"-Dibêje, " Selîmo, şeva îşev me xwe li Ūris girtiye, li Moskovayê, me **xwe avêtiye ber bextê wê**, hema heq e jî em navê vî tîfalî daynin, Moskov." (H/38).

"-Em çawa bikin? Dîsa em herin Dîwanê, xwe **bavêjine bextê wê.**" (H/90).

"-Min destê xwe ji ser xwe hildabû, gunehê min bi dayîka min a reben dihat û bi canîka xwe, wekî her tişt danîbû binê piyê xwe, **xwe avêtibû ber bextê min**, mala me." (H/134).

"-Lê, **min xwe avête ber bextê we**, sitara min tune, ezî dest teng im, bê îlac." (H/175).

"De gidî, **di bextê te de me**, êdî şahî kete nava gund." (H/332)

Xwe qurban kirin

"-Bibêje, ez **qurbana wî me**, şukir dewsa warê bavê wî şîn e." (H/60).

¹²⁵ h.b., r.17.

¹²⁶ h.b., r.20.

6-). *Pirî caran şibandin jî dikarin peywira biwêjan bi cih bînin.*¹²⁷ Di her zimanê de, ji bo xurt û xweş kirina vegotinê, ji hindêk bûyerên zimên û hunerên gotinê sûd tên vegirtin, yek ji wan jî şibandin e. Ji bo wesfa objeyekê çêtir bê vegotin, ji obje an jî bûyereke din, bi rêya bi bîr anînê sûd tê vegirtin, şibandin bi vî awayî tê pêkanîn. Her mirovek, bi heman awayê li gorî xwe dikare şibandinan bike. Lê belê, qismêke şibandinan dibin qalib û di her zimanê de cihê xwe digrin. Di şibandinên bêqusûr de, çar hêman hene. Ji bo ravekirina wê, em mînakê "kadeya wekî kevir hişk" bi kar bînin. 1). Heyîna ku bûye mijara şibandinê, yê jê tê şibandin(kade). 2). Tiştê lê tê şibandin (kevir). 3). Aliyê şibandinê (hişkati). 4). Daçeka şibandinê (wekî). Yek an jî duduyê van hêmanan tunebin jî, şibandin dikare bê kirin¹²⁸

Avekê sar bi ser de kirin

*"-Herçî em bûn, em jî tevîhevdu dîn, mîna **aveke sar bi ser me de bikî**, di ciyê xwe dekerr bûn, sekinîn."* (H/54).

*"-Ûsoyê hêsir te digot sîtilek **ava sar bi ser de kirin**."* (H/277).

Bû hîva binewr

*"-Lê Ferîk?! Ya wî êdî qe me bêje! **Bu hîva binewr**. Keskî ew nedidît, bi kesekî re xeber nedida."* (H/65).

*"-Egîd **bûbû hîva binewr**, îz û toza wî tunebû."* (H/303).

Çawa antêxeke tenûrê

*"-Belê, me ji hev du hez kir û ew **çawa antêxeke tenûrê** ma di nava dilê min de."* (H/122).

Çawa çirayeke bêdon

*"-Lê heyf, hê di xemla xwe de temirî û hesreta emir di nava çavan de, ji vir deh sal berê vêsiya **çawa çirayeke bêdon**."* (H/42).

Çawa ku miriyê goran

*"Ew spîçolkî bû, **çawa ku miriyên goran**: Çav vekirî, dest li ser mawîzêrê."* (H/399).

¹²⁷ h.b., r. 18.

¹²⁸ Aksan D., Anlambilim Konuları ve Türkçenin Anlambilimi., weş. Engin, Ankara., Mart 2006, r.61.

Çawa mirîşkekê silbûyî

"-Û her yek di qulçekî de, **çawa mirîşkekê silbûyî**, dimelise, diqincile hev du dengê xwe davêje zikê xwe, wekî eskerê Romê bi ciyê wan nehise, bi ser wan de neyê." (H/391).

Çawa tûleyek çav bi şêr bikeve

"Paşa ji kirê xwe silikî, **çawa tûleyek çav bi şêr bikeve**, di ciyê xwe de ket û dîsa ferman kir." (H/396).

Dinya bû tara bêjîngê

"**Dinya li ser bû tarebêjîng**, qira me hatibû, em li Redewanê bi destê eskerê Reşîd Paşa hatin **qirkirin**, niha jî me yê bi destê xwînavê xwe belaya xwe bîstanda." (H/153).

"-Kuştin li ber çavên me, me kir em ji tabiyeyan derên, rabin pêşiya wan, nehêlin pêşiya hêsir bigirin, melê nihêrî di piştta wan de bû hewar û gaziyeke wisa, wekî meriv **digot erd qelişî, hejiya, dinya bû tara bêjîngê**." (H/170).

Hêsirana mîna baranê barandin

"-De bibêje, zû, ez teqiyam, gidiyo!- Û dibe kûrekûra wê, hêsirana **mîna taviyê barana biharê dibarîne**." (H/29)

Hutê binê behran

"-Xwedê ji kê standibû biçûya pêşiya Ozmên? Lewendê şevê bû, **hutê binê behran**." (H/81).

Ji çavan belengaz bûn

"-Heval û hogirên nas me silav dikin, lê ew kesî nabîne, mirov dibêje **ji çavan belengaz bûye**, serê her gavekê navê birê hiltîne." (H/28).

Ketina xewa dêwan

"-Lo maşelaha **ketîbûyî xeweke dêwan**, me qemişî te nekir te hişyar bikin, got, bila xewa xwe hilde." (H/67).

Mîna bayê birûskê

"-Min dîsa nihêrî, lê nihêrî siwarek nebêjî, Melkemotê Kulê bibêjî, min geşirand. **Mîna bayê birûskê** dajot dihat, toz û xubar jî li ser xwe kirîbû telp." (H/129).

Mîna berfa li serê çiyê

"-Jinik *mîna berfa li serê çiyê* bi gav û saetê çilk û çilk diheliya, dikewgirî di xwe de, diçilmisî." (H/350).

Mîna çivîkekê

"-Min xatirê xwe nizanim çawa jî xwest, lingên xwe hilda û *mîna çivîkekê firiyam*, lezelez di pêpelingan re hilkişiyam qatê jorê, ketim hundir." (H/26).

Mîna ewrê reş

"-Eskerê Romê *mîna pîltek ewrê reş* î tarî hat û navbeyna Gera Çiyayê Elegez girt." (H/382).

"-Şeva guhdar *mîna ewrekî reş* î tarî vedikişiya, te digot Stêrka Sibehê derdiket." (H/268).

Mîna gur

"-Kê dizanîbû sibehê wê çi bê serê mêriv: Roma Reş *mîna gurê* har dabû pey cimaetê." (H/376).

"-Derî pê re pê re ji cî derdixin û bi deqeyê re eskerên reş *mîna pênc gurên* devbixîn hildişin hundir." (H/390).

Mîna keviran

"Ersewilên li ber dêrî, tiving di destên wan de, *mîna keviran* di ciyên xwe de sekinîbûn û nedihîştin, wekî pisîkek çi ye, pisîk jî di ber wan re neçe humdir." (H/258-259).

Mîna kihêleke

"Jinika qijik tewiya, pêlên avê daçivandin, qijîn ji zaroka dergûş hat û eva xewlisêrîketî te digot hêja bi xwe hisiya, qewta deh mêran hatê û bi dest xwe re xwe rast kir, her du zarok qayîm girtin û *mîna kihêlekê berrî* ava çêm qelaşt, bi pêş de liviya, xwe bi devê çêm re gihand, kete ser reşahiyê." (H/374).

Mîna mezelekê kerr

"Sibîr *mîna mezelekê kerr* bû; ne kes diçûnê, ne kes jê dihat." (H/301).

Mîna miriyan

"Got, em *mîna miriyan* ketin xewekê kibîr, li ber serê me qelem û herf." (H/114).

Mîna neçîrekî tirsîyayî

"Xêlî ji ser çavên bûkê hildabûn û te digot **mîna nêçîreke tirsîyayî**, şermonekî xwe dabû qulçekî, li hêviya wî bû çî ka çî hukim dike." (H/354).

Mîna pezeke devgirêdayî

"**Mîna pezeke devgirêdayî** em ê bi kû de herin, kê wê riya Sîbîrê ji min re bibêje?" (H/312).

Mîna pezê gur pê ketî

"Xelq direviya, rev pê ketibû, te digot **mîna wê pezê ye, wekî gur bi pey ketiye**." (H/373).

Mîna pisîkekê nêr

"Paşa **mîna pişikê nêr** serçavên wî pencerû dike, dike qajînî û hukim dike, wekî êgir dadin, sîtilek av daynin ser, dikelînin." (H/89).

"Eskerê Romê **mîna pisîkê nêr** baz da ser nêçîra xwe, dest bi şêlandina kincên wî kir û gava dikir ku arxalixê wî jî bêxe, bi dest xwe re xort bi diranên xwe bi milê wî qayîm kir." (H/394).

Mîna seyên ku xwina lingê xwe dialîsin

"Got eskerên nîzamê ji çavên xwe bawer nekirin û gava ku fino, qotik, şar û şemaqiyên wan çil qîzan li ser ava şêlî ya malxerab dîtin, hêja **mîna seyên ku xwina lingên xwe dialêsin**, por û poşman bi şûn de, di riya hatî de tes bûn, zivirîn." (H/71).

Mîna sîtlekê/dîzek li ser êgir /tenûr

"Êl di xwe de dişewitî, dikelijî, **çawa sîtleke avê li ser tenûra gurr**, lê bi kê re yî?" (H/82).

"-Erê, lê, - wî ji nişkê ve xebera nîvcî dûmahî kir, - min got, giva gund steqirî, lê bawer neke, ew **nolî dîzeke di nava tenûra gurr** de pê de pê de dikelijî." (H/158).

"-Cimaet **mîna sîtleke li ser êgir** di ser hev re diçû û çavê gişan li derê dîwanxaneyê bû çî ka çî dibêjin, çî ka mîrazreş çawa kirin." (H/258).

"Ûriset **mîna sîtlek li ser êgir** dikele, - Fêrik digot, - fûr dide, mîna behrekê pêlên wê li stûyên hev siwar dibin." (H/364).

"Êzîdîxane **mîna sîtila li ser tenûrê** dipiçpiçî: Êla Cangîr Axê û Ûsiv Begê li aliyê Dêrê mabûn." (H/379).

Mîna şevêkê reş

"Pîr qaso kir ku hilmeyî, wî be, lê Qewal Reco **mîna şevêke reş** çavên xwe kut çavên Okîz û nehişt pîr cabê bibe." (H/344).

"Pê re jî eskerên Romê **mîna şevêkê reş** qulaç qulaç erdê Ermenîstanê hildiçînîn." (H/379).

Mîna şêrekî birîndar

"Gundê bêmêr **mîna şêrekî birîndar** dinaliya, hê birîna wî germ bû, hê nizanibû çî ka çî ecêba giran hatiye sêrî." (H/393).

Porê serê bûn şûjin

"-Lê em hindik man dîn bibin, ruh di nava me de teyirî, hat serê pozê me, xwîn di nava me de miçiqî û tîlên spî di nava **porê diya min a reben de zêde bûn, te digot, her yek bû şûjinek** û kêranek." (H/140).

"-Gav ku me der heqa kirên wî nemerdi û hinekên din de dibihîst, **porê serê me dibû şûjîn**." (H/180).

Te digot berfa çile daye ser

"-Bêhna xweliya biharê dihat û xulexula cihokên belekiyan bû; ew ku wê demê dilê Sêwî bûbû zivistan, **te digot berfa çilê daye ser**, bayekî sar lê bûye xezeb." (H/378).

Te digot bi ava heft avan şûştine

"Li hewayê çiyê **te digot bi ava heft avan şûştine**, toz û xubarek di navê de tune, paqij e, îspîhî, weke ava sibehê zû, ava çiyayên Sînekê." (H/269).

Te digot bû av, nerijiya

"Xezalê serê xwe berjêr kir, wisa soromoro bû, **te digot bû av, nerijiya**." (H/139).

Te digot bû bêjîngêk

"Heykel qulqulî bû, **te digot bû bêjîngêk** û paşê paşê ev weş rabû û bi peşkên xwe ve nêzîkî 'dijminê xwe' bû, îcar bi kevîran heykel hûrhûrî kir, walgerande rex kevîrê hezarsale." (H/383).

Te digot bûbû pelewaneke

"Lê wê gavê, **te digot ew û jin her yek bûbûn pelewaneke**, av û herriya biharê diqelaştin û tu gazin, tu of û ax jî devên wan nedihate bihîstin." (H/377).

Te digot bûye ber

"Cimaet hêrs bûbû, **te digot bûye ber** dipiçpiçe, wekî paşê kel ê lê rabe." (H/260).

Te digot bûye topagirek

"Lê ew diçûn, ew jî bi rev û **te digot her yek bûye topagirek**, hirçeke li ser kudikan, tu tişt nikare li ber wan teyamîş bide." (H/153).

Te digot dil bûye kevir

"Egîdî kerr bû, **te digot ew dilê nazik bûye kevir**." (H/350).

Te digot dilê şerekî di qefesa wê/î de ye

"-**Te digot, êdî dilê şerekî di nava qefesa wî de ye**, te digot, bi her destekî dikare zinaran walgerîne." (H/215).

Te digot ewrekî reş danî/ hat

"-Û sifetê wî xeyîdî, **te digot ewrekî reş danî ser**." (H/40).

"**Te digot ewrekî reş û tarî hat**, hat li navbeyna neferên wê mala sivik danî." (H/379).

Te digot gul û nûr jê dibari

"-Beşer lê xweş bû, **te digot gul û nûr jê dibariyan**." (H/36).

Te digot kaniyeke teze bilqîn lê ketiye

"-Dîsa Şêrîné Xalit dest bi kilamên xwe kir, qîrîniya wî bû, **te digot kaniyeke teze bilqîn lê ketiye** û xuşexuşa wê ye dikişe, ne xelasbûna wê heye, ne westa wê." (H/61).

"-Rast e, şev êdî çûbû nîveka şevê, lê xew ji zû de ji çavên min û Şewêşê kal reviyabû, xeberdana wî hemîn ez **ji aqil birîbûm**, lê ya kalê jî, bîranînên xortaniyê rê nedidane hev du, **çawa ku kaniyek bilqînî bi wan ketîbû**, ro dibûn." (H/164).

Te digot kawûs li ser nefesa wî/ê runiştîye

"-**Te digot kawûs li ser nefesa wî runiştîye** û çavên wî zûrbûyî bi emê cixareyekê wisa li dêrî nihêrî, te digot ev e mirov ê bêne hundir, wî bigir." (H/397).

Te digot ketine mezelên xwe

"Te digot ketine mezelê xwe ê ev e li hêviyê ne, wekî marê ku ji qulikê de derê, bi wan vede." (H/384).

Te digot lehî rabû

*"Ê ku direviya, ê ku dikire bavo bavo, ê ku di ciyê xwe de ma. **Te digot lehî rabû.**" (H/259).*

Te digot ling bi erdê ve mix kirine

*"Û giş nolanî keviyekî bi dest xwe re nelebitîn, **te digot lingên gişan bi erdê ve mix kirin**, de xwe de ponijîn, li rûyên hev du nihêrîn, **dilên hev du xwendin**, zivirîn berê xwe bi aliyê gund de kirin." (H/244).*

Te digot mirin bû kêlendiyek

*"Û **te digot mirin bû kêlendiyek**, bi nava her çar gundan ket." (H/382).*

Te digot miriya îro nîn e, ya heft salan e

*"Lê ya Xezalê, êdî nebêje: Rebenê kerrekerr serçav li xwe peritandibû, reng jê çûbû, **te digot miriya îro nîn e, ya heft salan e.**" (H/126).*

*"Gîş veciniqîn, li aliyê denghatinê nihêrîn li çî binihêrîn; ecêbekê giran! Elî Axa dirêj bûbû ser kulêv, **miriyê îro nîn bû, ê heft salan berê bû.**" (H/226).*

*"Wê gavê heke yekî lê binihêriya, wê bi dest xwe re bigota, **ew miriyê îro nîn e, ê heft salan e.**" (H/353).*

Te digot pezkûviyek e

*"Nûrê **te digot pezkûviyek e**, wekî ketiye wê ortê û xwe çargoşe dihejîne." (H/59).*

Te digot rêça nêçîrê dît

*"Zêbit **te digot rêça nêçîrê dît**, got û giliyên diya min tamam nivîsî, paşê hubirdank danî pêşiyê, gotê, wekî tiliya xwe bike nava hubrê û li binê kaxizê dayne, li dewsa qolkişindinê." (H/139).*

Te digot ro ye, şemal dide

*"Got û gazî qîzekekê nekir, gazî cawahirekê kir, **te digot ro ye, şemal dide.**" (H/119).*

Te digot roj dihênijî

"-Te digot roj dihênijî, kerr bû çawa şev. Lê di nava şevê de çi diqewime, bila Xwedê bizanibe." (H/158).

Te digot şarûr î bilbil e

"Wisa xeber dida, te digot şarûr î bilbil e." (H/315).

Te digot şevê li ser per veda

"Wî xeberên paşîn bilind got û sifetê wî te digot şevê li ser per veda." (H/33).

"Şeva Sîbîrê per vedida, êdî erd hildiçînî. (H/322).

Te digot teyrêkî atmece ye

"-Te digot teyrêkî atmece ye û em giş di binê per û baskên wî de ne, rihet, bi dilê xwe." (H/92).

Te digot tûyî devê hev kirine

"Wî jî bi emrê Xwedê dîsa wisa got, çawa Zaxarov gotibû, te digot tûyî devên hev kirine, birayên bavê hev in." (H/256).

Te digot xerabe ye

"-Kes nedîçû, kes nedihat, te digot xerabe ye, tenê kuçikek li ber malê dizûriya û di nava wê de te digot hêsir nolanî baraneke hûr dibarand, digiriya." (H/247).

Te digot zengil e

"Dengekî wisa yî xweş heta wê çaxê min li tu erdan nebihîstibû, te digot zengil e, meriv jî aqil dibir, te digot, ew deng bi dilê te re xeber dide." (H/69).

Wekî agirê tenûrê

*"Û îro ew rojên qetlê, ku wextekê hebûnê, êdî derbas bûne, winda bûne û mane çawa xewnerojkên reş, wekî mirov tu caran naxwaze bîne bîra xwe, çima ku di xwe de hêrs dibe, dikewgire, dişewite mîna **wekî agirê tenûrê**." (H/34).*

Wekî eyarê kurmî

*"-Rûyê wî **weke eyarê kurmî** tirs bû û te digot çawa gunehkarek kap kete stû, wî dixeniqînî." (H/397).*

Wekî kewa gozel

"-Malaqîzê şewitî, bixwe qîz nîn bû, husulşemalek bû, **keweke gozel**, wekî hatibû dinyayê." (H/51).

Wekî tenûrekê zimzimî

"-Esman bû ronahî, kete xemla xwe, **çawa tenûreke zimzimî**." (H/45).

2.5.2. Gotinên Pêşiyên

Gotinên pêşiyên, piştî tecrûbeyan ji bo heman rewş carek din pêk neyê an jî bo kesên din bibin ders û şîret tên bi kar anîn. Ew, bi hevokên kurt ên bi aheng ve agahî didin.¹²⁹ Mustafa Öztürk wiha pênaseya gotinên pêşiyên kiriye: "*Gotinên pêşiyên, texlîdeke ji wêjeya gelêrî ye ku, serborî, tecrîbe û rabirdûya civakan bi awayekî zargotinî û bi bandor rave dike. Gotinên pêşiyên; raman û hestên rayagiştî, nexşerêya helwesta jiyana neteweyî, rengvedana zanist û çanda gel, paşxaneyê daneheva civakî û hilberînên binehişa kolektîfî ye.*"¹³⁰

Gotinên pêşiyên, gotinên qalibgirtî ne û peyaman bi awayekî mecazî didin. Bi gelemperî bo şîretdayînê tene bikaranîn. Mustafa Borak: "*Gotinên pêşiyên giyan û naverokeke gerdûnî jî di xwe de disêwirînin. Gelek ji wan jî bo hemû mirovahiyê û jî bo hemû deverên dinyayê rastiyeke gelemperî tînin ziman û ew biryar an jî nirxandin gelek caran ji bo her însanî û li her devera dinyayê rast in.*"¹³¹

Gotinên pêşiyên yên di romanê de li gorî rêza alfabeyê hatine nivîsandin û raveya wan hatine kirin.

Bertîl kevîran nerm dike: Pere, tiştî ku divê neyê kirin jî li mirovan dide kirin. Mirov dikare bi peran her karekî bide kirin.

"-Tu ji bertîlê xeber bide, **bertîl kevîran nerm dike**." (H/267).

Bila meriv mêr be, rojek li dinê be: Bila mirov qenc be, li ser soza xwe be û bo civaka xwe baş be, kêr jî bijî ne mesele ye, navê wî dê her dem baş bê bi bîr anîn.

"-Te nebihîstiye, dibêje, **'Bila meriv mêr be, rojekê li dinê be'** " (H/336).

¹²⁹ Celalî M., h.b., r.148.

¹³⁰ Öztürk M., "Vekolînek Derbarê Gotinên Pêşiyên Ên Kurmancî De", mukaddime.artuklu.edu.tr. 04.07.2019., 13.40.

¹³¹ Borak M., h.b., r. 14.

Bila rê be, bila dûr be : Bidestxistina hindêk tiştan zehmet e, lê ne bêderfet e, heger mirov dil bike bi awayekî dikare xwe bigihîne wî tiştî.

"-Axa, -*Qanat got,- hela bav û pîrê me gotine, bila rê be, bila dûr be.*" (H/319).

Bila şaristan be, ne goristan be : Kêm be jî hêviyek hebe ji bêhêvîtiyê çêtir û baştir e.

"-*Ne ev sî sal bû, wekî winda bûbû, serberateyê wî tunebû, êdî hate dîtini lewma gotine, bila şaristan be, ne goristan be.*" (H/26).

Derdê dil dil dizane : Mirovên xwediyê heman êş û derdê, çêtir ji hevdu serwext dibin.

"-*De bi derdê dil dil dizane. Bê min çi kir? Kulê tu di min de bêyî.*" (H/105).

Destê tenê deng jê nayê : Mirov bi tena serê xwe qels e, hewcedariya wî bi kesên din heye.

"-*Min ê jî çi bikira? Destê tenê deng jê nayê.*" (H/134).

Deve çi qas dûrî hev bin, hay ji kudikê xwe hene : Dê û bav ji zarokên xwe dûr bin jî herdem hay ji zarokên xwe hene.

"-*Lewma jî, ji dûr vê guhê wî li ser bû. Li vir gotine: " Deve çi qas dûrî hev bin, hay ji kudikên xwe hene"* (H/363).

Dil, dilan nas dike, çav çavan : Mirovên wekî hev difikirin an jî xwediyê heman tecrûbe û serboriyan in, baştir hevdu nas dikin.

"-*Wê dabû serê rê, wekî navê xwe, namûsa xwe, dergûşa li milê xwe xelas bike ji etabên giran, ji windabûnê. Dil, got, dilan nas dike, çav çavan.*" (H/400).

Eşîr bavê eşîr e : Eşîr li hev xwedî derdikevin. Di rojê zor û zehmet de piştgiriya hev dikin.

"-*Ne axir eşîr bavê eşîrê ye, ji çi re hûn ketine pişt jinên xwe dernayên, vî hêsîrî xweyî nakin.*" (H/84).

"-*Mistefa Beg, eşîr bavê eşîrê ye, te wiha xêr e?"* (H/153).

"-*Gelo şerm nîn e, wekî dutîretiyê dikin nava me. Zehf jî, Xwedê ji me standiye, em du dîn in, xwe du mîlet jî nîn in? Eşîr in û eşîr bavê eşîrê ye.*" (H/202).

"-Şerm e, lawo, - Elî Axa bi çavên rehmê got,- ev deynê me ye, **eşîr bavê eşîrê ye.**" (H/208).

"-Axayê min, - ewê tezehatî yê bi navê Xelîl, got,- ji hezkiri- na dinyaligê, ji bo te, hurmeta te, digot, weleh bi serê Pêxember kim, heke destebirakê min ji me bizewiciya, min qîzeke êlê qurbana wî bikira, jê re bişanda, lê dîsa ferqî tune, **eşîr ku heye, bavê eşîrê ye, bi rastî jî em yek in...**" (H/213).

"**Eşîr bavê eşîrê ye.** Ew xwe bi xwe re dibêje û bi destê sibehê re xwe davêje ber mala serê pêsekiniyan." (H/216).

Gava derd dibe, derman jî dibe : Dermanê her derdê heye, divê mirov bêhêvî nebe û li çareyê bigere.

"-Min çî bikira navê min derketibû, gişan hûhûyî min dikirin, meriv digot, min xerabîyeke wisa kiriye, wekî ji van deran dûr be, dêr be. Min çî kir? De dibêjje, **gava ku derd dibe, derman jî dibe.**" (H/106).

Hema tu kêr em penêr : Ji her qîrar û gotinên yê li hemberê xwe re amadebûyîn.

"-Ûsoyê min,- Cewzo Begê xebera wî birrî,- bibêje, lawo, **hema tu kêr em penêr,** devê te li çî digere, bibêje." (H/223).

"-Min ê çî bikira. Min gelekî guhdariya wî kir, got, **tu kêr, em penêr...**" (H/265).

"-Bi xêr û xweşî gava ku Egîdê axê xelas bû, **hema tu kêr, em penêr,** çî qas ji te tê, bibirre!" (H/276).

Ji dinyayê re edet e, ji min re bêdet e : Tiştên ku ji bo herkesî re heq tê dîtin lê ji hindek mirovan re qebehet tê qebûlkin.

"-Qe jî na,-Şewêşê kal xwe kişî ortê kir,- **ji çî re baranê re edete e, ji me re bêdet e,** hûn çawa min û dê û bavê min re hatine, mala min jî mala we ye, kesekî xerîb tune." (H/75).

"-Edetê dinyayê ye, te digot Semîdov wê gavê nêta wî dûmahî kir. Ez çawa bikim? **Ji dinyayê re edet e, ji min re bêdet e,** çawa ye?" (H/258).

Lingê gerê, nayê bin berê : Ew kesên ku hîne tişteki bibe zû bi zû nikare wî tiştî biterikîne.

"-Û ji bo wî ez di dilê xwe de sewirîm, eynî ên ku ji we re gotine, **lingê gerê, nayê bin berê.**" (H/39).

Malê dinyayê keviran nerm dike : Yên mal û milkê wan heyî dikarin her karê xwe bi hêsani pêk bînin.

"-Pîr Qaso rind caba gayê kaman da, **malê dinyayê keviran nerm dike.**" (H/268).

Malê dinyayê qirêja destan e : Divê mirov zêde qîmetê nede malê dinê.

"-Înşallah em te di şermiyê de nahêlin. **Malê dinyayê, bi serê te, qirêja destan e, bixwaze, bide, tek wan lawikan xelas bike ji tengasiyê, navê êlê neêxe.**" (H/264).

Mala me gora me : Divê mirov li mala xwe xwedî derbikeve. Li hemberê êrişan wê biparêze.

"-Çi dibêjî axa ji sola xwe re bibêje; **mala me gora me.**" (H/239).

Mala Xwedê bi sebrê ava bûye: Di rojên teng de divê mirov sebrê bikişê û hêviya xwe ji Xwedê nebire.

"-**Mala Xwedê bi sebrê ava bûye, hela em sebir bikin, dibe ku rojekê tu bi kêrî min bêyî.**" (H/239).

"-Ya Elah, Ya Xwedê, bi serê te înzallah xêr e, **Mala Xwedê bi sebrê ava bûye, sebir bikin.**" (H/298).

Mêr dimire, nav dimîne : Mirovên baş bimirin jî navê wan herdem li dinyayê dimîne.

"-Rehmet li bav be! Xweş mêr bûn, xweş hatin, bûn agir,şewêtîn, alav dan û nav hiştin.-**Mêr dimire nav dimîne.**" (H/190).

Mirin hemin bera sur bû, li ber derê herkesî bû : Her mirovek jî dê rojekê bimire. Tu kes nikare xwe ji mirinê xelas bike.

"-Hinek mirov têlên spî diketine rûyên wan, dadigerandin, hinek zarok dibûn, hinek dizewicandin, hinek jî hildidan dibirin heq dikirin. **Mirin hemin bera sur bû, li ber derê herkesê bû.**" (H/303).

Ne bi lezê, ne bi bezê, kes nagihîje tu mirazê : Ji bo mirov hasilê ji karê xwe hilde divê sebir bike û karê xwe bi lez û bez pêk neyîne.

"-Ez difikirim ji çî re wiha lez wiha lez ketim, gotina gotiyan e, " **Ne bi lezê, ne bi bezê kes nagihîje tu mirazê**" (H/28).

Ne şîş bişewite, ne jî kebab bişewite : Di qirardayînekê de zerarnedîtin û kêmbûnê jî xêrdîtinê her du aliyan.

"-Were tu bibêje, çi ka em çawa bikin, wekî **ne şîş bişewite, ne jî kebab bişewite.**" (H/168).

Pêl tê pêlan winda dike : Bûyerên nû yên berê didin ji bîr kirin an jî cihê wan digrin.

"Saeta ku Elî Axa bihîst, wekî bûkê ew qas tişt bi xwe re aniye, kêfa wî xweş bû û gelekî pesnê mala bavê wê da. Di dilê xwe de got: '**Pêl tê pêlan winda dike.**'" (H/353).

Roj derbas dibe, qedayê rojê derbas nabe : Bi ser hindê bûyeran de dem derbas dibin lê bandora wan berdewam dike.

"-Lê tu were **roj derbas dibe, qedaya rojê derbas nabe.** Kubar li vê derê bû agir û alav bi xwe de ket roj neda Sêwiyê feqîr." (H/376).

Rûviyekê geriyayî ji şêrekê negeriyayê çêtir e : Hal û wextê mirovekî çi qas xweş nebe jî lê li dinê geriya be, ji mirovên dewlemend yên negerayî zêdetir tiştan hîn dibe.

"-Bi serê te. -Okiz giran giran bersiva wî da,- de çi bibêjim, we dinya dîtiye. Bi serê te, dibêjin, **rûviyekê geriyayî ji şêrekê negeriyayî çêtir e.**" (H/344).

Saxo bi rê de, qelbo di zerê de : Divê mirov hay ji xwe û tendurustiya xwe hebe.

"-Ûso, bira, dilê xwe qayîm xweyî bike, Dibêjin, **Saxo bi rê de, qelbo di zerê de.**" (H/251).

Serê ku neêşe ne hewceyê benikan e : Berê, benikgirêdan dermanê serêşê bû. Kesî ku serê wî neêşe ne hewceyê benikan e.

"-Na heyran, **serê ku neêşe ne hewceyê benikan e,** heke ezî beledê we me, hema ji niha de gotî hûn bi gurra min bikin, em di wê riyê re naçin." (H/319).

Şêr şêr e, çi jin e çi mêt e : Mirov gava serwext û wêrek be çi jin be çi jî mêt be ferq nake.

"-Jinik,-wî got- te sihet xweş, li vir gotine, '**şêr şêr e, çi jine çi mêt e.**' Te tiştêkê aqilan got ,di serê min runişt." (H/313).

Wekî berra xwe lingê xwe dirêj bike : Divê mirov bi qasî qeweta xwe tevbigere.

"-Li ser vê xeberê qewal hat ku biteqe, lê xwe zêft kir û bi çavan Okiz da famkirin, **wekî berra xwe lingê xwe dirêj bike.**" (H/344).

Xortaniyê mala xwe bar kir, kalaniyê li min kar kir : Piştî temenekî qeweta mirov kêma dibe. Qeweta ciwaniyê namîne.

"-Lê niha,- wî ji nişkê ve bi dengê bilind got,- niha her tişt betilî çû. Xortaniyê mala xwe bar kir, kalaniyê li min kar kir." (H/161).

Zarokatî çû cahiliyê jî mala xwe bar kir : Mirov bi herikîna zemanê nahese, emir roj bi roj ber bi kal û pîrbûyîna ve diçe.

"-Erê,- wî te digot tiştê anî bîra xwe,- çû, zarokatî jî çû, cahiliyê jî mala xwe bar kir." (H/123).

2.5.3. Dengbêjî

Edebiyata kurdî ya devkî ji edebiyata kurdî ya nivîskî zêdetir bi pêş ve çûye. Sedema vê yekê jî ew e ku kurd heya niha nebûne xwedî zimanekê fermî. Em dikarin bêjin ku bîngeha edebiyata kurdî li ser zargotina wê ye. Yê zargotina wê pêşxistî û parastî jî dengbêj in. Dengbêjan; stran, kilam, serpêhatiyê nav gel, çîrok, meselok û hwd. gotine û ev hêmanên zargotina kurdî heta roja me anîna û ji bîrbûyîna xilas kirine. Mustafa Borak dengbêjiyê wiha pênasa dike: *"Dengbêj hem afîrîner, hem îcrakar, hem jî pispor û şopgerên çand û wêjeya devkî ne. Jixwe peyva 'dengbêj'ê ne tenê di wateya mûzîkê da ye. Peyveka hevedudanî ye û zêdetir hêmana "bêj"ê ango "gotin"ê derdixîne pêş. Peyva "gotinê, hêmanekê tam jî cih da ye, lewra di dengbêjiyê da ji newa û meqamê zêdetir gotin girîng e. Çimkî jî sewtê bêhtir naverok û peyam girîng in. Çimkî dengbêj tenê nastrên, ew di heman demê da ji me ra tiştêkî dibêjin, dîmenekî nîşanî me didin(...)." ¹³² Di nav kurdan de, dengbêjî xwedî dîrokeke kevnar e. Di serdema mîrekiyan de her mîr xwediyê dengbêjekê bi nav û deng bû.*

Di gundê kurdan de, civak di malan de an jî odeyan de berhev dibûn; serpêhatî, çîrok, kilam, sitran digotin, şevên xwe yê havîn û zivistanan bi hev re derbas dikirin. Dengbêj, gund bi gund digeriyan, distêrîn, ji aliyekî ve jî ragihandina di nav gundan de pêk dianîn. Êdî di roja me de qîmeta wê edetê nemaye. Ji ber ku rewşa jiyana kurdan, li gorî çaxê guheriyê, êdî kurd ji ber sedemên aborî û siyasî wekî berê di gundan de najîn, yê dijîn jî êdî bi televizyon, telefon û kompîtîrê sebra xwe tînin.

¹³² Borak M., "Dengbêjî û Rista Jina Kurd di nav Civaka Kurd da", Kovara *Folklornama*, j.1, Nisan-Gulan, 2019 r.107

Îro di bin navê hindek saziyên wek şaredarî û odeyan de çanda dengbêjiyê tê berdeyamkirin. Hindek dengbêj, ji bo ev çand neyê ji bîr kirin hewl didin.

Em di pirtûka Heciyê Cindî de li rastî kilambêjî û stranbêjiyê ten. Di bin vê serenavê de, kilam û stranên di pirtûkê de derbasbûne hatine nasandin.

2.5.3.1. Kilam

Civaka kurdan bê kilam û dîlan, mesele û metelok, laqirdî û henekan nabe. Di dema evîntî û dilxweşiyê de hogirê herî dilsoz kilam e, di dema bêhêvîtiyê de kilam hêvî ye. Kurdan di jiyana xwe de herdem cih dane kilaman. Dayîk bi kilaman, zarokan dilorînî û radizînî. Kurd bi kilaman bûkan siwar dikin, mêrxwasan dişînin şer, tew miriyên xwe pê vedişêrin. Şivan bi kilam û bilûrê keriyê xwe diçêrîne, cotkar xeta cotên xwe bi axê de dikişîne. Kilam ji xerîb re dilbînî ne, ew bi kilaman agirê hisreta dilê xwe ditefîne. Kurd bi kilaman laqirdiyan dikin, pê dikenin û digirîn.¹³³

Hêmanên ku herî zêde zargotina kurdî di nav xwe de diêwirîne, kilam e. Di kilaman de çîrok, serpehatî, bûyerên dîrokî û hwd. gelek in.

Di romanê de caran kilam bixwe caran jî bi tenê navê wê hatiye gotin.

Cihên ku navê kilaman lê derbas dibin

Di romanê de carina bi tenê navê kilamê derbas dibe, lê kilam bixwe derbas nabe. Carina jî navê kilamê jî tune ye lê em pê dizanin ku leheng kilamekê distêre an jî dibihîze.

"-Em êdî nêzîkê gund dibûn, êdî lampeyê Îlyîç veketîbûn û dengê radyoyê dihat, yekî Xecê û Siyabend distra." (H/44).

"-Xwîşkê, ew çi bûye, wekî te hazir kirye, ku heta niha di bîra Apê Moskov de ye?"

-Qet. Kilama Kotanê bû." (H/47).

"-Kêfa Nûrikê li cî bû, distra, meriv hew dizanîbû daweta yekê din betiliye, ne ya wê. Şêrîne kurê Xalitê Emançayîrê jî kilamên Evdalê Zeynikê ji me re digot." (H/56).

"-Ringerînga defa Memoyê rehmêtî bû, mêr û jinan dilîst, dengê kilama Hoy Narê derbasî wî berî çem dibû, Çemê Arpayê, ê li orta sînore me û Romê, şivan gavenên wan deran, wan jî ji xwe re dilîstin." (H/61).

¹³³ Cindî H., Evdal E., h.b., r.23,24.

"-Dîsa Şêrîne Xalit dest bi **kilamên** xwe kir, qîrîniya wî bû, te digot kaniyeke teze bilqîn lê ketiye û xuşexuşa wê ye dikişe, ne xelasbûna wê heye, ne westa wê." (H/61).

"-Wextekê bi şûn de, ji birangê xwe re bibêjim, ev **kilamên** min di nava gund de belav dibin, dev ji devan direvînin, dibin hezar dev." (H/106).

"-Giliya wî bi gişan xweş hat, Behrî jî koloz qot kir, kire qîrîn, dengê **kilama** wî gelîngê li pêşiya me hilda." (H/111).

"-Axir **kilameke** xweşîpêkirinê li ser wan gundan û rabûn rûniştina bineliyên wan heye. - min gote wî-

-Pîî, erê weleh, Rêza Gundan. Ew **kilam**, - kalê xebera xwe dûmahî kir,- beriya reva sala 18'an, dengbêjekî, navê wî Xudo, ji gundê Engûkê, wî ji ber xwe derxist û **kilam** bi destê xwe re belav bû." (H/176).

"-De bila ew êdî wê êvara hênik î xweş ji xwe re bistrê **Wey Kawê, Kubarê**, min jî, çavên xwe girtin û bi fikrên xwe ve heylo çûm derketim gundê me Emançayîrê, gundê zarokatiya xwe, gundê bîranîn û xewnê yê li wî berî sînor, nêzikî Qersê." (H/188).

"-Paşê bi xwe jî kilameke qîzikan, **Zerî Domamê** got û gava ku nêzikî gund bû, ajot bi pêşiyê ket, lê Dawid lingên hespê giran kir, li pey wî ajot, kumê xwe rast kir û bi dilekî xweziyê dêhna xwe da axayê." (H/212).

"-Ên rûniştî hal û kêf ji hev dipirsîn, laqirdî dikirin û carinan yekî ji binpiyan odayê dikire qîrîn, **Hey Xozanê, Wey Xozanê**, an **Dewrêşê Evdî** digot, herçî din jî, li wî zêde dikirin." (H/222).

"-Kaxa mîna kûçikan fam kir, wekî mezinê wî kêfa wî xweş e, papaxê xwe nikand, kilama **Sarî Gelîn** got." (H/258).

"-Her kesî baweriya te hebe, dikarîbû wiha bigota ji xwe re û gotina xwe bikira **kilam**, weke baqê gulan ê renfawazî. Kilam wekî mîna avek ji ava kaniyan a sar bilqîn lê diket û kutabûn tunebû. Çawa mirov ê nebûya dengbêjê çiyê wisa, wê çawa ji xwe û dilê xwe re nestra, **kilama** xwe tevî gul û gihayê çiyê, xuşexuşa avên çiyê nekira, ûmîş û saz nekira." (H/269).

"Şivanê xort distrê, **kilaman** davêje ser erd û esmên, gul û gîhê, av û kaniyê û bi wan gişan re dide girêdan dilê xwe yê wekî dinyayê." (H/270).

"-Cimaet, -ji nişkê ve Ferhan Axa got,- weleh seba xatirê mêvanan min ê bikira ser dengbêjan çend **kilam** bigotana, lê mala minê, Egîd Axayî di dergehê teng de ye, dest nade." (H/272).

"-Wan çaxan, te bi tenê dikarîbû **kilam**, hê rasttir, lawijok der heqa girtiyan de, Egîdê axê û hevalên wî yên sigunkirî de bibihîsta." (H/297).

"-De giî bajon ha bajon! Qurîniya dengbêjan bû: **Hêdî Bajo, Evdîle, Lawo, Borelanê**, êdî çi bibêjî wan nedistra." (H/333).

"-Sêwî meqamê **kilama** wî siwarê ku reviyabû anî bîra xwe, çend xeberên wî jî anî bîra xwe: "Ji dîne me Êzdiyan re dida xeberdan. Dîsa destê me ji hev du bû." (H/371).

Kilamên di nav romanê de

Em di romanê de li rastî gelek kilaman tên. Her kilamek xwedî çîrokekê ye.

*"Delan e bi kimkor e
Kelo bin miçoyê Îsa da norenor e
Keşîş Polo dike gazî, divê:
"Reşîd Paşa, paşayê xezevê,
Min duh va ji te kuştiye
Keskî, ser bi por e"
Divê Delan e wê bi gezgezk e
Miçoyê Îsa dike gazî, divê:
"Kelo, min ra mal derxîn, zînbûsat kin."
Keşîş Polo dike gazî, divê:
"Reşîd Paşa, paşayê xezevê,
Minê nîveka dîne te ha ha kiro..
Minê duh va ji te kuştiye
Pên sid eskerê ser bi kesk e"
Delanê xwîna sor girtiye
Şêrîn dike gazî, divê:
"Mîrze Axa, Keşîş Polo, Miçoyê Îsa,
De lê xîna birano, hev ra lê xîna,
Ev eskerî temamî xwînxwar î dîndijmin e" (H/70-71).*

Kilama li jor qala berxwedana kurdên Cizîr û Mûsilê ya li pêşberî Hafîz Paşa û Reşîd Paşa yê dike. Ev şer di navbera salên 1830 û 1834an hatiye kirin.

*"-Jinan qarî wan kilam derdixist. Erê, xanek va ye, bîra min tê, got, digot:
Dîdema wêran wê bi sî ye
Tilî pêçîngên Ozmanê Cezo
Ser serê rimê diçûrise
Ozmanê Cezo ça kuştine bê kes û kûs e
Kul ketiye torina Mala Sêrxûn
Ne deng e, ne tu behs e" (H/82).*

Ev kilam li ser lehengiya Ozmanê Cezo û kuştina wî ye.

"-Galegala şivên e, dengê wî pê de pê de gelî hildaye, hişyar kirye ji xewka şevê. Zerîdomamê distrê, got, digot:

*Lê, lê zerîdomamê
Ez ê navnîşanê zerîdomamê ji te re bêjim:
Çengê wan e kurr e degirmî ne
Pozî pîjîn e, deve dirane dikanî ne
Sîng û berê wan zozan e*

*Meriv ji xwe ra pezkûviya lê biçêrîne
Lê, lê zerîdomamê...
Got, got , me ku ev kilam bihîst beşera me xweş bû." (H/98).*

Ev kilam li ser evîniya dotmamê hatiye gotin û ji aliyê gelek kesan ve jî tê zanîn.

"-Lê paşê min destê xwe kire çembilên cêrê û da ser girika milê xwe, hêdî hêdî hatim ber bi malê, min ji xwe re ji xwe re ezber kir çend xeberên wê kilamê, got:

*Lo, lo dilo xwalî li te be
Tu tu kesekê bengî nebe
Bengî dibî, xwe bengî be
Axiriya paşîn-
Poşmanîka te tunebe..." (H/105).*

Ev kilam jî li ser evîniyê ye.

*"Heylo dilo, xwalî li te be
Ser qîzê xelkê bengî nebe
Bengî dibî
Bira kuştina te hebe
Poşmaniya te tunebe..." (H/106).*

Ev kilam ser dildariyê ye.

*"Min hefa deştê
Dengê du zerya xweş tê
Ax dikim xwîna reş tê*

...

*Kal bûm, sed car kal bûm
Ez nêzikî heftê sal bûm
Seba çavêd belek
Xirabmal bûm..." (H/114).*

Ev kilam li ser kalbûyînê ye.

*"Zerî dibê'n:
Em hemû zerî ne
Hinek hene, dew-dêrê wan spî ne
Sûrete sor e gulgulî ne
Pozî zirav î pîjî ne
Diranê wana sedefî ne
Zimanê wana sedefî ne
Zimanê wan sor e qelqmî ne
Îja miqat bin, cahilno, we nexapînin
Zerî du cûran in:
Hinek hene devê wana genî ne
Medeks reş e Mûsûlî ne
Porê sêrî sê Helebî ne
Tilî-pêçiyê wana meşkê Qangilî ne
Neynûkê lingên wana forma merê deştê Ecema ne
Ez dikim zerî domama xwe birevînim*

*Bavê'm Emançayîrê
Xwedê qebûl neke
Çiyê gewra, rinda, çîla, bedewa ne
Herçî nanê deştê tînin
Şêrînkuya nin
Herçî dêlê hespê wana gevez in
Ew jî her çar malê Mûsêsaniya
Şatirogliyan in
Herçî sirtûkê wan saldatî ne
Qereqeliya nin
Herçî qurre-kubar in
Sûsizya nin
Herçî sapokê wane xurom in
Qetê wane zîv e avzêrkirî
Şulfê wane darîn in
Taşnîka Çuxreşiya nin
Herçî qonaxê wane xweş in
Destek siyar dibe, yek peya dibe
Ew jî Quzilquliya
Her çar malê Çîliya nin..." (H/177).*

Di vê kilamê de hem pesnê qîzikan tê dayîn, hem jî derheqê qîzên gundên cuda de agahî hatiye dayîn.

*"Lê lê gewrê!
Dilê min li wê ma
Gul, sosin, rihan li eteka çiyê man
Xwezila sala îsal min bizanibûya
Kawa kubar, çavêd belek
Bejna ziravi dêmê zirav hîviya kê man...
Lê lê gewrê..." (H/270).*

Di vê kilamê de qala bedewbûyîna hezkiriyê tê kirin.

*"Wî got û bi dengêkî kewgirî serhatiya Eliyê Xwarzîya nivand:
Lo xalo, lo xalo, lo xalo!
Telî Temo dike qîrîn e
Wê derê Boke dişidîne
Divê, "Keko, ez çi bêjim Îboyê Çopiroxlî...
Dixwaze mêraniya min, kekê min destê me derîne."
Lo xalo, lo xalo!
Xwe siyarî bînbaşî ra digihîne
Şeş siyarê bînbaşî gullekê ra weldigerîne
Siyarekê kewşenê gund digerîne
Dike nake mîratê Bokê toza hespê wî naqedîne
Lo xalo, lo xalo!
Telî Hemze xwe bi Îboyê Çopiroxlî ra
Siyarî bînbaşî ra digehîne
Şûr şîn ber xwe dikişîne
Qeyd û çîdarê lingê bîst û çar girtiya difîrîne
Eliyê xwarziyê nava dest-pê siyarî bînbaşî derdixîne..." (H/291).*

Di vê kilamê de qala serpêhatiya ji destê dijmin xelaskirina Eliyê Xarzî tê kirin.

*"Dilê min sive ye
Kubara sivê ye
Birre siyarê canbêzara derketine yalê Teknelûyê ye
Xezalê kire gazî:
"Perîşanê merûmê
Were em ê xwe bavêne ber bextê Emerê Hingo
Bira nekuje Sinciyê Şemo;
Malxwe malê ye
Nekuje Xalitê Temo;
Dolewarê şanzdeh gundê Sîpkaniyê ye
Hewar e, bavo hewar e...
Xalit divê, Ozo, kurxal
Siyar be, êvare bê çax e
Hewar gazîkê li kavila Şatiroxliyê
Mala kurapê min Çaçan daxê
Bê li Pošta xirave
Canbêzara dorê kurapê te girtiye
Tivinga destê min patrona xwe dernaxe
Hewar e, bavo hewar e..." (H/318).*

Ev kilam derheqê bi destê qaçaxan ve şiklê kuştina Sinciyê Şemo û Xalitê Temo de ye.

2.5.3.2. Stran

Wekî kilaman stran jî, di nav kurdan de gelek tên gotin. Gotinên stranan li gorî rîstekê ye û tê de hevdengî û aheng heye. Stran jî wekî hêmanên din li gorî hereman cuda dibin.

Di romanê de em li rastî çend stranan tên.

*"-Min kir bînim bîra xwe xeberdana wê şevê, lê silikîm, destê xwe hejand,
Her Çar Malên Newalê anî bîra xwe û di ber xwe de got:*

Her çar malên newalê

Her pênc malên newalê,

Tajî berdan xezalê..." (H/67).

Ev stran hema hema li her heremekê kurdan hatiye gotin.

"Yêrêvana min a îroyîn, gelo çi qasî jê hez dikim," ez ji xwe re ji xwe re dibêjim, "çi qasî şa dibim, wekî ez bajarvanê wê me. Yêrêvan, dilê min Yêrêva..."

"-Yêrêvan bax û baxçe

Ya dilê min, emrê te...

An jî;

Yar Deşta Rewanê

Deştekekê xweş e..." (H/189).

Ev stran jî derbarê evîniya Erîvanê de ye.

"Elî Axa wê sibehê dereng hişyar bû. Gava ku çavên xwe vekir, kesek nedît. Bawîşkeke dirêj hatê û çî ku wê şevê qewimîbû mîna xewnwkê hate bîrê, kêfa wî xweş bû, dest bi stranê kir.

Lê lê dînê, te çavreşê, çavê van filîta

Dîna min evdalî Xwedê, bisk badane

Forma zerze, miftê van kilîta

Tu dîn î, tu dîn î, tu dîn î..." (H/209).

Ev stran jî li ser evîniyê ye. Tiştî balkêş ev e ku di gelek stranên kurdan de jî bo hezkiriyê leqaba "dînê" tê bikaranîn, ev jî yek ji wan e.

"Êla Heseniyan, an jî çawa digotin, êla Hesên Axa, êdî derketibû çiyayên Sînekê, her zomekê jî xwe re cî girtibû.

Zozan ber zozan

Zozanêd me ne

Wê da walgere

Reşkonêd me ne." (H/268).

Ev stran, li ser hezkirina jiyana û zozanan hatiye gotin. Di jiyana kurdan de zom û zozan gelekî girîng in, di helbest, kilam û stranên de gelek caran qala wan hatine kirin.

2.5.4. Dua

Dua, ji xwe an jî mirovên ji ola xwe re, ji xwedê alîkarî daxwazkirin e.¹³⁴ Şükrü Elçin jî pênasaya duayan wiha dike: *"Mirov ji bo saxî, silametî û qenciya xwe û ya civaka xwe bang li Xwedê dike û alîkarî jê dixwaze, ji vê re dua tê gotin."*¹³⁵ Ji bo mirov, xwe ji qeza û belayên dinyayê biparêze ji Xwedê re dua dike. Wan duayan hem ji bo xwe û hem jî bo hezkiriyên xwe dike. Eslê duayê; lavakirin, gazîkirin û alîkarî xwestin e. Gava mirovek ji aliyê madî, tendurustî û arişî dikeve zorê, ji bo xelasbûna ji wan tengasiyan dua dike. Dua, wekî diyalogekê di navbera mirov û Xwedê de ye.

Em di romanê de li rastî gelek duayan tên. Ew dua ji bo spasdarî, qencî xwestin, şukirdarî û xelasiya ji rewşên teng re hatine kirin. Em ê wan duayan li gorî cûreyên wan bisenifinin.

Em di romanê de gelek caran li rastî duayên spasdarî û şukirdariyê tên. Ev cureya duayan di nav xeberdana rojane de gelek tên bikaranîn. Bi gelemperî ji bo qenciya yekî bê bi lêv kirin û spasdariya xwe bide nîşandan, tên gotin.

"-Xwedê we rûspî ke, lawo. De niha ez ê bibêjim me şeva îşevîn helbet dikarîbû di maleke mîna mala kurê Polat de berhev bibûna, lê mal teng bû û hinekên nepak dikarîbûn bi me bihisiyana, em bidana destê dewletê. Heke dêr û meçîten me hebûna, em dikarîbûn li wan deran berhev bibûna, lê ew jî tune, lewma jî me tê re dît, wekî hema li vê guhêrê ya dilê xwe ji hev re bibêjin û bêne ser qerarekê."

-Xwedê me bê aqilê te neke, şêx! - Hinekan bi dengekî bilind got.-" (H/93).

"-Ê rehmet li bavê te be, - Şewêşê kal ji wê re got, - te lingên min ji sola teng derxist, wisa ye." (H/102-103).

"-Eh, got, şukir ji Xwedê re, dinihêrî, filankes, hebûne û hene merivên wisa, wekî der heqa me de jî difikirin, herçî çûyî, bila rehma Xwedê li hestiyên wan be, herçî hene jî, bila Xwedê wan rûspî bike, îmanê bide wan û şeva we bimîne xweş- got û bi dest xwe re çû.-" (H/114).

"-Hesen Axa çû serê bûka te, got, " Qîza min," apê min xebera xwe wekiland, got, " Xwedê bext bide te, mirazê me gişan bi def û daweta te bibe. Tu nîn bûyayî, herçî ev malên Êzdiyan giş ê desteşûr biçûna." (H/149).

"-Lê wekî Rom ecêbekê neyne serê malê, ez ê bi xwe dest û piyên gişan girêdim, paşê hûn werin dest û piyên min girêdin û herin, Xwedê bi oxira we re be." (H/168).

¹³⁴ Boratav P. N., (1969), *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, weş.Gerçek Yayınevi, İstanbul, r.140,141.

¹³⁵ Elçin Ş., (2004), *Halk Edebiyatın Giriş*, weş.Akçağ, Ankara, r.662.

"-Her ji we re emrê xweş dixwazim û başqe razîbûna xwe didime Okizê destbirakê xwe. Malî ava Okizo, bi qewet û sihet bî, bi nav û namûs bî." (H/181).

"-Xweyî mal bî, xalo. - Ez hêja bi ser ketim û min gelekî bi dilovanî gotê.- Tu qedrê min digirî, Xwedê jî qedrê te bigire." (H/185).

"-Dewleta Xwedê li serê te, -min lê vegerand,- em bi xwe ne xerîb in, wekî şerm bikim. Em dixwin." (H/186).

"-Par,mala minê nevînga wî çû rehmêtê.

-Rehmet li ên we be jî." (H/186-187).

"-Cimaet, Xwedê ji we razî be! Îro namûs namûsa me gişan e, lê wiha nabe!" (H/206).

"-Xwedê we rûspî bike, birano! - Mihemet dîsa got.- Lê hûn mala wî Durziyê şaş nakin?" (H/207).

"-Wey Xwedê min û jinê, qîzê, mal û halê min qurbana we û xîreta we bike, gidîno!" (H/208).

" -Eferim lawo, Xwedê bext bide we. We nehişt namûs û xîret ji destê me here." (H/209).

"-Xwedê şên bike, -wî got,- tu dizanî ezî bi lez im, îzna te hebe ez çend giliyan bibêjim hê kes pê nehesiyaye." (H/261).

"-Wey mal û halê min qurbana wî be." (H/262).

"-Lawo, weleh şukir, xewna te şukir xewna xêrê ye." (H/ 299).

"-Xwedê te rûspî bike, axa!

Xelqê li dorê gotinê." (H/307).

"-Axa, Xwedê te rûspî bike, erê wisa ye, de bila Xwedê mala pêşiyên me xerab bike, wekî ev yek kirin orta me, tiştêk nake." (H/308).

"-Xwedê bext bide te, lawo.- Elî gotê û destmal girt danî ser eniya xwe, bêhn kir." (H/308).

"-Cimaet, li ciyê şînê şahî jî heye, bila rehmet li miriyê we be!" (H/306).

"-Cimaet, Xwedê we rûspî bike, wekî hûn wisa li heyra Egîdê bira ne. Niha min qerar kiriye, wekî ez herim pey, seriyekî lê bidim.

-Ê Xwedê îmanê bide, Elî Axa.- Kalenêran gotê.-" (H/313).

"-Belê,- wî got,- lê bidî xatirê Xwedê, bibêje şev nivê şevê ev kî ye wiha dinivije, çi qewimiye?

"-A rehmet li bavê te be, hema der heqa wê de ye." (H/318).

"-Xwedê ava bike, - wî got,- dewleta Xwedê li serê te, li ê kurapê te, çi bibêjî di dukana min de heye." (H/327).

"-Elî Axa, Egîd, Fêtkî, filankes, bêvankes, Xwedê xêra wê qebûl bike, Xwedê ber ruhê wê bigihîne rehma Xwedê lê be.

-Rehmet li dê û bavê we be jî.- Wan digot.-" (H/359).

"-Xwedê te rûspî bike, lawo." (H/335).

"-Xwedê te rûsipî bike,- Egîd gotê,- zarokê min, bûk destê te ramûsin. Ez jî, ew qas kurxalê xwe razî me, her bila Xwedê biznibe." (H/336).

"-Wey te sihet xweş.- Egîd jî şabûyî got." (H/339).

Em li rastî duayên wek rexneyan jî tên. Ev cûre carina ji bo nîşandana kêmasiya kesekî carina jî bo sîtemkirinê tên bikaranîn.

"-Hey mala te ava be, lê tu nas nakî,- Apê Moskov kubar kubar xebera min birrî,- ewê ku herfên me teze derxistibûn, êdî..." (H/46).

"-Hey malika te ava be! Aştarak pê de pê hisiyaye, dibe te nebihîstibe, çawa ye?" (H/64).

"-Hey Xwedê mala te ava bike, -Behrî caba wî wiha bi xeyd da,- ew jî bû gotin tu dibêjî." (H/111).

"-Hey Xwedê malik ava kiro, ji çi re tu nizanî nîşaniya kurê Cewzo Beg e." (H/220).

"-Okizo, de rehmet li bavê te be, giliyan tevî hev du neke!" (H/267).

"-Hey malik avayo, Emerîk Axa îro nemiriye, ev salek e miriye, ji kerban, kurê wî li Sibîrê ye." (H/305).

"-Kuro, - got,- Xwedê mala we ava bike, ne êdî sibeh e, em ê êdî çi çaxê riya xwe biqedînin?" (H/319).

"-Ê Xwedê malik ava kiro, li dewsa ku tu serê xwe wisa diêşînî, bila serê pereyê te biêşe. Şukir ji Xwedê re, dewleta Xwedê li serê te, li serê Xalit û Mehmûdê bira." (H/321).

"-Hey mala te ava be, ji çi re te nebihîstiya şerê li ser Qereqolê, li rex Pošta xerabe?" (H/318).

Di romanê de gelek duayên qencîxwestinê jî hene.

"-Xwedê şukrê bide te û lawê te jî, Dayîka Şewê." (H/54).

"-Bila Xwedê mala we jî ava bike, ya Mirazê Erebbî." (H/57).

"-Rojekê, - got,- wiha bû, Sivikê Bedoyê şivan, bila rehma Xwedê lê be.

-Rehmet li ên te be jî, - me gotê.-" (H/87).

"-Em ji malê derneketin. Lê rehma Xwedê li ên te be jî, li Okizê Mamo be jî.

-Li ên te be jî.- Min gotê.-" (H/145).

"-Hema xût rehma Xwedê Emer ew kilam ji min re gotiye.

-Rehmet li miriyê te be jî.- Kalê bi ser de anî.- Ca hela bixwîne." (H/176).

"-Xwedê wî rûspî bike, Xelîlê min." (H/213).

"-Bila bimbarek î pîroz be! Bila Xwedê li hev bîne!" (H/223).

"-De ji wê û bi şûn de, gava ku min dilê wan wisa kirrî, hêja rengê wan xweş bû, de rehma Xwedê li dê û bavên cimaetê be, li ê kurapê min be jî.

"-Li ê te be jî. - Gişan gotê.-" (H/224).

"-Xwedê hurmeta te zêde bike, lawo." (H/225).

"-Xwedê bext bide te, lawo. -Okiz lê vegerand.-" (H/248).

"-Xwedê te rûspî bike, Elî Axa." (H/248).

"-Xwedê we rûspî bike, lawo! De niha kerem bikin, hûn herin çî ka em ê çî bikin." (H/249).

"-Te çawa em rûspî kirin, Xwedê jî te rûspî bike, Okizo!" (H/249).

"-Çî bibêjim lawo, Xwedê we rûspî bike, bila ez bimrim, rojekê beyî we, beyî êla Sîpkan nebim." (H/264).

"-Xwedê we rûspî bike,-Emerîkê got.-" (H/266).

"-Xwedê we rûspî bike,- pîrê mala axê got,- hindik nîn e." (H/266).

"-Bavo,- kur ji heybeta gotê,- de bila Xwedê min qurbana te û wî sirafetê te bike.

-Xwedê neke, kurê min,- bavê diltijî xeber di dêv de girt,- bila meytê min li ser milên we be, lawo." (H/268).

"-Ferhan Axa, Cewzo Beg, cimaeta Heseniyan, Ortiliyan, Xwedê we rûspî bike, we çawa hurmeta mala Elî Axa û hatina me girt, Xwedê jî ya we bigre." (H/271).

"-Xwedê te rûspî bike,axa. - Pîr Qaso got.-" (H/272).

"-De wekî wisa ye, Xwedê te rûspî bike, Êsoyê min." (H/275).

"-Xwedê hurmeta te zêde bike, axa.- Pîr Qaso got.-" (H/275).

"-Emrê te dirêj be, lawo.- Ehmê got û mehîn zengû kir.-"(H/291).

"-Xwedê wê rûspî bike, lawo,- Axê got,- bextikê wê reş bû." (H/296).

"-Ya Elah, Ya Xwedê, bi serê te însalah xêr e, Mala Xwedê bi sebrê ava bûye, sebir bikin, Elî Axa." (H/298).

"-Xewna te însalah xewna xêrê ye, lawo." (H/299).

"-Elî Axa,- Ebasê ku Şêx Şemo şandibû got,- Xwedê ji we razî be, weleh wisa nîn e, bila wisa be." (H/381).

Di romanê de gelek duayên bi cûreya ji Xwedê û pêxember alîkarî xwestin an jî ji wan re şukirkirinê hene.

"-Çawa ye, gundî hela hê di ciyê xwe de ye?

Got, me got:

-Şukir, em ji qeziya giran xelas bûn, li heyra we û hatina we bûn.

-Şukir Xwedêyo!" (H/154).

"-Hema wan çaxan, gava ku min di dilê xwe de digot, " Ya Pêxember, wê çawa be, tu ilacekê ji me re biki?" (H/204).

"-Ya Rebî, tu qewet û sihetê bidî min," wê bixwe ji xwe re digot, " min li cem van giregirên Êzdiyan û Surmaniyê nekî şermiyê." (H/229).

"-Xwedê, tu bidî xatirê navê xwe, dûr dûr, - wê digot û kef bi dêv ket,- însalah nivîna te nivîna xêrê ye, însalah, însalah, Xwedê ez dêlik im û tu bidî xatirê navê xwe, li hewara vî feqîrî, li vî zilamê tûzî bêtî, Ya Rebî...Însalah, dûr dûr, wey wey!" (H/231).

"-Xwedê bila rojekê, rojxwînek çî ye min bêtî te neke." (H/240).

"-Xwedê ah û zarê wê nehêle ser neheqan, heyfa wê însalah namîne li ser erdê." (H/251).

Di romanê de duayên li ser Êzîd tên kirin jî hene. Gava dikevin nav rewşên giran, duaya "Holehola Êzîd sor e"¹³⁶ dikin.

"-Eferim, lawo, - got, Şêx hahanga got,- tu lela min kiribî, te rast got, holehola Êzîd sor e, lawo." (H/94).

"-Em hewceyê malê dinyayê nîn in, em nikarin malê heram bikine nava malê helal, Holhola Êzîdê Sor e, serê min qurban be." (H/343).

¹³⁶ "Dua û dîrozgeha kurdên êzdî." Cindî H., Hewarî, h.b., r.410

2.5.5. Nifir

Nifir, bi gotinên hişk ji kesek an jî kesên din re xwestina rewşên nerênî; lanet, bela, xezeb û yên bi vî rengî ne.¹³⁷ Gava zerar û neheqî li yekî bê kirin, ew kes ji kerban nifiran dike, jê re xezeb û belayê dixwaze. Her çend nifir, gotinên nerênî bin jî di nav miletê de gelek tînan bikaranîn.

Di romanê de nifirên tînan zanînan gelek in. Ew nifir carina ji hêrsan, carina jî bo rexnê hatine kirin. Di romanê de nifirên xwe bixwe hatî kirin jî hene.

Di rewşê xirab de nifirên ji kesekî re hatî kirin.

"-Kî dizane malmêrên wê şikyat kirine, lewma hatin feqîrî girtin. Pêparê bûkê nibixêr bû, hela gelek tişt ê bê serê me! Roja wê reş be, serê wê kur be, wekî em kirin vî halî." (H/125).

"-Hey Xwedê mala we xira bike Êzdîno!- Beg got.- Çawa ye, hûn hela hay ji giliyan, an xwe tatî davêjin." (H/140).

"-Vê bextreşê çawa navê mala me xerab kir, çawa di nava dinyayê de em kirin sosret! Wey Xwedê, erdo, ezmano..!" (H/147).

"-Min mizgîni anî

-Mizgîniya te bi serê te de reş be! Te bûka min vê şevê bir... Niha jî "mizgîni" ya wê ji min re tîni, erê? De ji çi re bi erdê de naçî, êdî ji çi re dimîni..." (H/147).

"-Emerîk, Xwedê mala te xerab bike, ocxê te kor bike, lê tu nabêjî torina Mala Sêrxûn va ye, wê bê bavêje ser we. Hema gavekê berê, rûreşî tê dikeve, bûka te hate nava pêz, got, filankes, te malî xerab be, ocaxî kor be, êdî nesekine, torina Mala Sêrxûn pê ketiye, cahil cûhilan berhev dike, wekî bavêje ser wan çend gundê Êzdiyan, berê ewil, ser Sêvikê kaf û kûn bikin." (H/152).

"-Xwedê mala nemaman xirab bike! Ew hew dizanin tu yê bibî axayê me, lewma wisa kirine, nav da wan lawikandane." (H/167).

"-Lê di pey wê yekê re, belkî Xwedê mala nemaman xerab bike, îşev hûn bînan ser mala min, erzên min." (H/168).

"-Gelî birayên min, qewmê min! Ew çi ku min berê ji we re gotiye, ez ê niha dîsa dibêjim: " Belkî Xwedê mala wan xerab bike, kê ku em ji hew qetandin." (H/181).

"-Xwedê mala we û dîne we yê teze xerab bike, hûn bûne sebebên me û vî roja me! Ji çi re hûn ê îro bi me re nînan bûna, ji çi re êla Sîpkan wê wiha ji hev du du birr bibûya?" (H/182).

¹³⁷ h.b., r.662.

"-Wey Xwedê...Bi xêra xwezî, bi Heft Mîrên Mezin bila ev jî di rex xwîşka xwe de kuştî bûya, tek em wiha neketana nava dev û diranan!" (H/280).

"-Kubara jina Sêwiyê şivan jî ev yek bihist, nifir li Elî Axê kir, li mala wî û li roja xwe ya reş, wekî çawa ji Romê bawer kir, mala xwe şewitand." (H/383). .

Hindek gotin bi teşeyên xwe ve dişibin nifiran. Ev cûre nifir bi piranî ji bo rexnekirinê tên kirin.

"-Pîî, xwîşk qurbana wî be, xweliya binê lingên Fêrik be!- Nûrê got û dîsa reqîsî, dîsa dora gede geriya." (H/53).

"-Hey Xwedê malik ava kiro, ka mêr di gund de mane? Ji şew re giş siwar bûn, bi pêşiya Fêrik de çûn." (H/57).

"-Hey Xwedê mala te xirabnekiro, - cînarekî wî gotê,- lê tu nizanî, wekî Surman nanê Êzîdiyan naxwin? Mele Ewdilrehîm ji wan re gotiye, wekî nanê me heram e, kî bixwe, ji dîne Mihemediyê dertê" (H/87).

"-Mala te xerab nebe, Idrîso! - Emerîkê çavên xwe kuta çavên wî." (H/90).

"-Mala te xerab nebe, weleh bi Xwedê were em herin xwe bispêrine Ūris, helbet ji Roma dîndijminê me wê çêtir be." (H/99).

"-Mala we xerab be, ocaxê we kor be, lê nabêjin Xezal revandin?" (H/107).

"-Mala we xerab be, ocaxê we kor be! Ne qîzika reben va ye razaye, we jê xêr e? De êdî dengê xwe nekin, xelq ê bi me bikene." (H/108).

"-Mala we xerab nebe, we xêr e li wan zilaman? Qe nabêjin kesirîne, rêwî ne, çi hewal e? Hû qe tê dernaxin şev çûye nivê şevê, çawa ye?" (H/116).

"-Malxerab, tu yê bi kê re herî..?" (H/127).

"-Kuro, Xwedê mala te xerab bike, tu li vê derê, vê wextê çi pêşe yî, çi qewimiye?

-Wê çi biqewime, Xwedê mala we jî, ya me jî bi ser de xerab bike! Va ne pênc zabitên Romê, yek jî Hesen Axa bi xulam û xizmetkarên xwe ve Rasta Çeko jîqudûmşikestî, nikarin bilivîn bîn, ez beledê wan bûm." (H/163).

"-Gelî xalan! Xwedê mala we xerab bike! Hûn dizanin ez hatime axatîyê li we bikim, axatîyê ji destên hinekan bistînim?" (H/167).

"-Xatê Xanim, mala bavê şewitiyê, lê tu qe nabêjî Egîdê minî tî ye, birçî ye!" (H/233).

"-Wey mala bavê te kavila kulê be! Jinik, Koçek Gulo ji destê min çû!" (H/235). .

"-Inê, mala bavê şewitiyê, lê tu nabêjî Egîdê axê bi du siwaran ve ji nava gund derketin, ajotin çûn." (H/241).

"-Mala we xerab be, ev e pikêtên Romê Qaqizman hildan!" (H/372). .

"-Mala te xirab bibe, wekî xerab bû! - Wê digote wî- Te em anîne serê vî çiyayî, nava xerîban, dûrî keçika min, qe tiştê wiha dibe?" (H/376).

"-Elî Axa, te ocaxî kor be, male xerab, te çi anî serê xwe û me? Te çawa ji Romê bawer kir, mala xwe xerab kir, ya me jî bi ser de..!" (H/392).

Gava mirov neçar dimîne ji xwe re neqencî, mirin an jî belayê dixwaze.

"-Min xwîşka wî, çavên min kor bin seba Seyrê, êvarekê xewle kir û gotê." (H/106).

"-Qe nebêje -Wê got- Min ê çi ji te re bigota, ez kor bim seba te û navê te." (H/107).

"-Weylê te mala min xerabkîro, ocaxên min korkîro! Ev çi ecêb e?" (H/128).

"-Roja min reş be. -Wê got.- Ev nener hema niha wê bibûna? Qey bextê min e." (H/130).

"-Peyî, min porkurê, dûrî her sê birayan, çawa ye, hela hûn ranezane?!" (H/131).

"-Wey gidî! Belkî Xwedê roja min reş bike, ruhê min bistîne, belkî ji vê sosretiyê xelas bibim.." Û digiriya, derê kox bi sr xwe dadabû, porê xwe vedirût, li xwe dixisit, dîn dibû mehrûmê." (H/146).

"-De rabin, rabin! Bi xêra xwezî ezî îro mirî bûma, bi tenê min ev yêk nedîta. Evê Tirk rabe giliyên nelirê ji kulfetê me re bibêje?!" (H/154).

"-Kesirî bûm, xewê zor li min kir û min ocaxê xwe kor kir, mala xwe şewitand, di xew re çûm." (H/204).

"-Wê êdî çi biqewime?! Mala te xerab bibe, hezar carî bimirî, ji vê karê çêtir e: Eza kurkem di xew re çûbûm, êdî niza'm, niza'm, mala te bişewite, kirivê te hatiye û giliyên nenere anîne serê vê rebenê..! Tu bimirî, bimirî, Mihemedo! Ez bimirim seba vê hêsîrê." (H/205). .

"-Qurbana we me, qurbana xîret, xweliya binê lingên we me, lawo, lawo..!" (H/208).

"-Mala min şewitî, ocaxê min kor bû," wê xwe bi xwe re got, " sebir kete ortê, êdî her tişt çû,nabêje." (H/232).

"-Wey ez qurbana wî zarê te yê şêrîn, wey çavê diya te kor be lawo! Çawa bibêjî, ez wisa me." (H/232).

"-Lê axê xwîşka min kuşt, a din jî bi xwe re bir, wey Gevez, bila Bedo kor be seba te, kor be ji her du çavan, wey wey!" (H/243).

"-Wêrana wêran, her der yek e. - Wî kire irînî.- Ax li min bavo, çawa bi min dikenin. Ev roj reş be, wekî ez ji diya xwe bûm. De niha tu bibêje çi ka ez çawa

bikim. - *Û bi her du destan mîna jinekê hate nava çavên xwe, kelogirî bû, hêsir xulxulandin. - Lê ez bimrim gelo ji vî halî çêtir nîn e?" (H/277).*

"-Pîû, mala bavê min xerab bibe, dûrî birayan! Ev çi li te qewimiye?" (H/278).

"-Bibêje, bavê te pez li dewsa xwîna xwîşka te, li dewsa nav û namûsa te standiye, bibêje, bavê te kor be, şil û şeht be... bibêje, roja min û wê reş û hiş be." (H/280).

"-Wî erdo, erdo, tu biqelişî, ez tê de herim, bimirim, sed carî bimirim, ji xwe xelas bibim, ji dinyayê xelas bibim! Xwedê, Xwedê, tu ruhê min bistînî..! Wey dayê, ez bimirim..!" (H/282).

"-Wey ez bimrim, Egîdo, çavê diya te bila birije. De te zû bigota lawo, çi tiştê şermê hebû, xort û qîz, edetê dinyayê ye, niha ya te ye, kurê min ê şêrîn, çareya min..." (H/233).

"-Ax xwezî eze mirî bûma, bavo...Ji vî halî çêtir bû, bavo..." (H/287).

"-Zeynê ew qas gotibû, xeber dabû, wekî êdî zar û ziman lê nedigeriya. " Diya te gura çiyê be, lawo, lawo!" Wê bi xwe ji halan re digot û ranêzikî ji konan re kir." (H/282).

"-Axa em kor bin!

-Çi bûye kuro, gulle derketiye, çi ye?" (H/293)..

"-Wî ez qurbana wî devê te me, zar û zimanê te me, lawo. - Wê got.- Bêhna Egîdê min jê tê. Wî birayê min, çavê diya te kor be, ne şukir Egîdê minî sax e, çi dike, ê wê çi çaxê bê, ne ev deh salên wî tamam bûne? Niha te Egîdê min ditiye. Wey lawo, dayîk gura çiyê be, de bibêje, bav û birê, gidiyo..." (H/306).

"-Mala min şewitî, heta berbangê xew nekete çavên wî jî." (H/327).

"-Yekê jî, çi dibe bila bibe," -wî ji xwe re got,- " bila agir bi ser me de bibare, ew hindik e, ya ku min îro dît, na, nayê gotin..." (H/371).

"-Her tişt bû jehr, ji nişkê ve bû qirçeqirça tivingan, got, " Weleh Xwedê mala me xerab bike, lê nabêjî eskerê Romê bi ser me de girt!" (H/373).

"-Xêra xwezî, ez hezar carî bimirama, tek min ev yeka nebînayî û nebihîstî li ber çavên xwe nedîta." (H/385-386).

Di romanê de nifirên ji bo ecibandin û pesinandinê hatî kirin jî hene.

"-Sê xortên bi gotina te jî bi me re danîn, wekî ji sekinga Hemamliyê hespan bi paş de vegeirînin. Kul bi mala hespan keto, bi xwe hesp nîn bûn, difiriyân." (H/116).

"-Mala xweyiyê bajêr neşewite! Serî hebû binî tunebû. Avahiyên wisa mezin î çend qatî tê hebûn, wekî meriv zende jê digirt." (H/117).

"-Mala Sewto şewitî! Xwe mêr nîn bû, pelexan bû, her destekî wî te digot pola ye ro kirine, şivdara wî li serê kê biketa, rabûna wan tunebû." (H/363). .

2.5.6. Dijûn

Ji aliyên mûhataban ve endamên wek; fizikî û zêhnî an jî nirxên civakî dibin sedemên dijûn û heqeretên. Dijûn û heqeretên bi şexsî li ser nexweşî û taybetiyên zêhnî ne, ên civakî jî li ser etnîsîte, dîn û îdeolojiyê ne.¹³⁸ Ferît Develioğlu rêzbenêde wiha bo dijûnan çêkirye: "1). Ji Xwedê û tiştên Xwedê bawer nekirin û xwe wek şîrîkê Xwedê dîtin, 2). Bêdînî û bêimanî, 3). Bawerkirina tiştên ne rewayê dîne îslamê, 4). Nankorî, 5). Çêrî, dijûn, xeberê sar, 6). Nixumandin û veşartin." ¹³⁹

Dijûn her çend ji aliyê cimaetan ve neyên pejirandin jî gelekî tînan bikaranîn. Cimaet, siyanetê ji mirovên dijûnker re nagirin. Di navbera şexsan yan jî koman de, gava şer derdikeve heqaret û dijûnan li hevdu dikin. Ew heqaret mirovê li pêşberî xwe rencîde û şermezar dike, jixwe armanc jî ew e.

Dijûn carina li gorî hereman cuda dibin. Di dîrokê de, di navbera du miletan de şer çêbibe, em di dijûnên li wê heremê de li rastî hêmanên etnîkî tînan, heger ola wan cuda be dîsa em li rastî dijûnên olî tînan. Gava mirov hêrs be û nekare bi axaftinê ve ya bi dilê xwe der bike, hingê dijûnan dide û dixwaze yê li pêşberî xwe bişkîne û şermezar bike. Di nav civakan de bi giştî mêr dijûnan didin.

Heciyê Cindî ji bilî kurdiyê, carina bi tirkî jî dijûnên wek "itoxlî, kopoxlî" "nemerdoxlî" bi kar aniye.

"-Ew ketîbû pey Cefer Xan, got, hindik mabû saxesax bigirta, lê got, wê demê bêxweyiya hespê nikisî û heta ku ew li xwe xurcîlî, dijmin, nemerde kurê nemerdan, lê vegeyabû, şûrek dabû navmîla wî şêrî û bi lingên hespê reviyabû, serê xwe xelas kiribû." (H/78).

"-Min ku ev gilî bihîst, lêva xwe gest, got, hebe tunebe, li vê ortê tişteke heye, ew kurê nemerivê nemeriv oyînekê wê bîne serê me" (H/124).

"-Çawa ye, - min ji diya xwe re got,- Temoyê kurapê wî seybisani, di pey van kiran re bûye merivê te, çawa ye? " (H/135).

"-Kurên nemerivan ji gund bi dûr nediketin." (H/138).

¹³⁸ Senel M., "Biliçaltına Dayalı Etnik Küfürler", *turkoloji.cu.edu.tr* 21. 09.2018., 21.35.

¹³⁹ Develioğlu F., (1980) *Türk Argosu*, weş. Aydın, Ankara, r.533.

"-Çi ças cahil hebûn sîlehên xwe hildan, ji gund derketin, xwe dane ser girê li fêza me, wekî nehêlin hêsîr bikeve destên wan kurên necamêran, bira û pismamên me yên duh, wekî terka dîne xwe dabûn û ji me re bûbûn dîndijmin." (H/152).

"-Got, wê çaxê zabitekî Romê jî di nava wan de bû, got, got: " Keftora heram çi dibêje? " (H/153).

"-Koru,- Ewdo kire qîjînnî,- qe hay ji devê xwe heyî çi dibêjî? Bavê te bila bimire, tûleyê seyan!" (H/203).

"-Min baz da ser xwe, ji heybetan li rex xwe nihêrî, dît ew pêzevengê kurê pêzevengan tune." (H/204).

"-Em ê Kurmaciya xwe bikin: Wî seybisani çawa nemerdi kiriye, em ê jî binin serê wî." (H/206).

"-Ruh bi wan de hat, giş sekinîn û dane pey wî, lê heta ku ew ê derî re derketana, her sêk êdî di hundir ketin û dema ku Hemzo fîno, kirasê wî îtoxlîyê îtoxlî yê bixwîn avête ber piyê Mihemed, Mihemedê qijik hêja bi ser hemdê xwe de hat û bi dest xwe re xwe avête pêsîra wan." (H/208).

"-Û ji heybetan kinc û fînoyê wî zinêkarî girt, ji hev du qelaşt, dîsa avête erdê û lingên xwe da ser.- Here nemerdoxli nemerdi!" (H/208).

"-Kuro lawo, Cewzo Begê çi, lê ez bendî çi me? Dibe tu xweşiyên xwe bi min dikî, erê, seybisane kurê seybisanan? " (H/220).

"-Vê saetê ji vê derê bicehime, pîra keftor, vê saetê." (H/230).

"-Kurê nemerivan, dûrî dê û bavê, çawa ye, tu hê nizanî ez Koçek Gul im, ez ên dîn tînime ser rê, ez miriyan qenc dikim, niha tu hatî dikî ku min ji odeyê derxî?" (H/230).

"-Hey kûçikê, dûrî dê û bavê! An tu fam nakî ji min dipirsî?" (H/234).

"-Kopoxlî,- wî bi dengêkî şêrîn gotê,- çi kerr bûyî? Ca yekê werîne heta ku em digihîjine merkezê." (H/258).

"-Nih ew nemerdoxliyê nemerdoxli kî ye, wekî em wî û giliyên wî bendî tiştêkî hesab bikin?" (H/268).

"-Xort, wekî lingên kelemçekirî, destgirêdayî, pişta wî bi yekî kal de bû, di ser re eskerê qerenîzamê, serbilind sekinî li ber celadê xwe yê di xwîna mirov de mewicî, kir ku bigihîjê bi derbekê re bike xurê sayilên gund, lê heyvax, dest lê ranebûbûn û singûya nemerde kurê nemredan diln û cegerê wî jî qul kir." (H/394).

"-Ê cewrikên seyan, xwe nemirine, wekî hûn serxweşiyê didine min? Bibêjin çi ka halê Egîdê min çi ye?"

"-Axa, weleh wê tolê devê xwe neguhest, girtin deh sal dane êgîdê axê, deh Emir, deh jî Ato." (H/293-294).

"-Û xelq talan kirin û di Ava Reş de hezaran meriv dane xeniqandin, pêçekên dergûşan li çolî û çolîstanan dane hiştin wan nemerivan, wan têrnebûyan." (H/375).

2.5.7. Lavahîkirin

Cûreyekê gotinên qalibgirtî jî lavahîkirin e. Çawa ku dua ji Xwedê re tên kirin, lavahî li mirovan tê kirin. Di lavahîkirinê de gotinên wek "ez bextê te me, bidî xatirê Xwedê, ez qurbana te bibim û hwd." tên bikaranîn. Lavahî, bi giştî ji aliyê jinan ve tên bilêvkirin.

Me lavahiyên di romanê de di bin serenavan de senifandin.

Ez ketime bextê te / ez di bextê te de me

Mirov gava dikeve zorê, tu çareyan ji xwe re nebîne, xwe diavêje ber rehma yekî din, alikariyê jê dixwaze. Di nav gel de lavahîkirina herî zehf tê bikaranîn ev e.

"Nûrê dike qîrîn û xwe davêje ser dest û piyên wî.-Gidî, **ez di bextê te de me, di bextê te, mala te û vî tîfalê te yê berhembêz de me**, - wê zaroka di destê dê de nişan da" (H/29).

"-De pismamo, **ez bextê te me**, hêja bila xêr û xweşî bi te de bibare, kevir û kuçikên dinyayê alemê bi ser diya min de û me de." (H/125).

"-Ev e, wekî din tu tişt di gumana min de tune, ev e. De niha **ez ketime bextê te û kurê te**, riyekê jî min re bibîne. Belkî di gumana te de tişteke hebe, tu bide, hemîn em ê jî binê qenciya te derên." (H/130).

"-Edî tuyî xweş bî, - diya min bi hemdê xwe gotê,- êdî tu tişt tune, min xelas kir, niha **min xwe avêtiye ber bextê te û kûrê te, hesp û zînê te**, min bi qurbana xwe bike, li wan feqîr û fiqereyan rehm bike, niha zirav qetî bûn, guneh in." (H/142).

"-Erê, ew dikeve hişê min, - keçika dilsax got,- lê koçek, **ez bextê te û kurê te me**, vê giliyê aşkera nekî!" (H/234).

Bide xatirê Xwedê/ pêxember

Di vê cureyê lavahîkirinê de, navê Xwedê, pêxember, an jî nirxên pîroz ji bo daxwazê tên bi kar anîn.

"-Lawo,- wê bi dengê girî got,- **bidî xatirê Xwedê û mêran**, paşê ê min, min kiriye, tu meke, di riya **xwe de here, karê te bi wî tunebe**." (H/136).

"-**Bidî xatirê navê Xwedê**, heke kêmasiyeke lawikên me jî heye, bibexşîne, ez têma lingên te, lingên hespê te, lawo!" (H/153).

Ez qurbana te bim

Ev lavahî ji bo pêkhatina daxwazê, xwe fedakirin e. Ev gotin caran ji bo lavahîkirin û caran jî bo evîntiyê tê bi kar anîn.

"-Egîd Axa, ez bi qurban, ca ji pîredêka xwe re bibêje çi ka ji kê dera xwe bi gazin î, kê dera te diêşe, lawo! Bila ez seba te kor bim, çavên min birijîn, ez bi qurban. Dê vegere, vegere, giliyekê ji xalojina xwe re bibêje, birayê min, bav û birayê min, xweyê min, de ez bi qurbana serê te bim, Egîdê min!" (H/229).

"-De bibêje, ez qurbana serê te me, xalojina te qurbana wan çavan be, de bibêje, malavayo, de bibêje, ez teqiyam." (H/232).

"-Lawo ez qurbana te bim, serî ez û bavê te ne, em ji çavê xwe re xerabiyê dixwazin, ji te re naxwazin, qe şaşiyên mekişîne." (H/282).

Ez tême dest û lingê te

"Biracan, min ev yek kir, niha jî tu çawa birayê min î mezin, ez tême destên te, lingên te, wekî bibexşînî, min kirye, tu neke, bira, bira..." (H/328).

2.5.8. Sondxwarin

Sond, li ser nîrxên pîroz ên wek; Xwedê, pêxember, kitêbên pîroz, mizgeftan û hwd. carina jî li ser nîrxên bo mirovekê taybet; bav, zarok, namûs, şeref û hwd. tê xwarin. Sond ji bo qayîldarkirinê tînan xwarin. Di civakê de sondxwarin tîngeheke giran e, gava li ser tiştê sond hate xwarin, divê ew tişt bê pêkanîn.

Helbet êzidî jî mina mîletên din, li ser pîroziyên xwe sond dixwin: Xwedê, şêx, pêxember, mizgeftên pîroz û hwd. Di romanê de, em sondên li ser nîrxên çandî û edetî tînan xwarin jî dibînin.

Di romanê de cureyên cuda yê sondxwarinê hene, me ew di bin serenavan de senifandin.

Sondxwarina li ser simbêlan

Ji bo mîrên kurd simbêl nîrxekê gelekî mezin e. Lewma mîr bi sondxwarina li ser simbilê xwe, mîranî û wêrekiya xwe îsbat dike.

"-Silêman wê gavê bi simbêlên xwe sond dixwe, wekî rojekê wê rastî wî bê û piştî xwe didê, di dêrî re dertê diçe. Seman Xan jî, esker li dora xwe dicivîne, wekî nekeve destê Silêman." (H/76).

"-Tu yê binihêrî, ez ê van simbêlan kur bikim, heke çendeke din ez di vê avahiyê de rûnenêm." (H/124).

"-Mihemedê min, qe li ber xwe mekeve! An ez ê van simbêlan jê kim û laçika jinan li serê xwe girêdim, an jî lawo, ez ê heyfa te û qîza te hildim!" (H/206).

"-Gotî bi tehrekî bidî razîkirin, wekî din ez dizanim, heke ez Egîdê axê aza nekîm, ez ê van simbêlan kur bikim, got, got û ez bi gelek tiştî dame famkirin" (H/265).

Sondxawrina li ser pîroziyan(Xwedê, pêxember hwd.).

Di vê cureya sondxwarinê de, kesên sond dixwin, pîroziyan ji xwe re dikin şahed. Bi vî awayî tê hewldan ku zêdetir bawerî bê dayîn.

"-Belê, -got,- li ciyê am û tam girtin, anîn vê Dîgorê. Got, gotinê te rûnê Şoxo diziye. Got, min, got, heyran zehf jî ezî kesîb im, zora we di min de diçe. **Weleh bi Îsa pêxamber, bi xaçê,** gur û gumana min nagihîjê. Got, min ku wiha got, de bile xêr û bêr bi ser we de bibare, kevir û kuçik bi ser min de, ez wisa kutam, her Xwedê bizanibe; wey tu dibêjî min nediziye?" (H/263).

"-Heyran, **Qurana Pêxember,** kaxiza Egîd Axa ye, yekî jê re nivîsî û bi lez da min, çû ser xebatê." (H/309).

"-Cimaet, - wî got,- ez gunehê kesekî nekîm stûyê xwe, li pey vê cabê, **weleh navê Xwedê ye, bileh navê Xwedê ye** Elî Axayê kurê Emerîk Axa ji ciyê xwe nalebite." (H/381).

Sondên ji bo tolhildanê tîn xwarin

Di demên hêrsbûn û zerardîtinê de, ev cûre sond tîn xwarin.

"Ew xortê ku ber bi cinyazeyê malşewitî çû, sîleha wî hilda, sê caran paç kir, **paşê sonda mêrê berê xwar,** wekî nehêle dîl, bispêre biçûkên wî." (H/72).

"-Wisa dixwên. -Diya min bi xweşxerberî got.- De rabe lawo, **ez ê bi destê hukimetê nenerên wisa bînim serê wan,** wekî ew heta kurên kuran ji bîr nekîn." (H/135).

"-Ewa bînamûs, te qe dît, wê û bûka xwe çî kirin? Çû cem bînbaşî, mêrê xwe xwe da berdan, xortên me jî li dewsa wî da girtin. Ew dizane wê ji wê re bimîne. **Hela bila sebir bike, de bila tişteke bi serê lawên me de bê, wê bibîne!"** (H/145).

"Elî Axa.-Naçalnîk xebera wî birrî, - **ez bi Quranê kim, tu yê wisa poşman bibî, her Elleh bizanibe.**" (H/218).

"-Ez **Semîdov bim,** ew wisa min li ser tiliyan bide reqisandin? Ez, ez ê wî post bikim." (H/257).

Ehdkirin

Ehdkirin jî cûreyekê sondxwarinê ye, lê tê de xwe bicezakirin heye. Ehd di demên tengasiyê de tîn kirin. Ehda hatî kirin, heta neyê pêkanîn xudan ehd bi rehetiyê nakeve.

"-Heke tu Zîn î, ez Memê me, heke tu Xec î, ez Siyabendim. An em ê bigihîjine mirazê xwe, an jî em ê li erdekî bimirin û bila dinya alem gilî bike der heqa me û vî halî de." Min jî gotê: " Lawiko, ez bimînim, jî te re me; bimirim, jî xweliyê re me." **Me di destên hev du de ehed kir, qerar û qesem kir û bi dilekî nerihet çûne malên xwe, lê wey li wê çûyîne.**" (H/104).

"-Na, - Wî miqîm got,- meriv gotî hinekî jî meriv be. Min jî, gava ku ev kaxiz stand, **ehed kir, qerar kir**, wekî heta ku neçim sêwiyên xwe neynim, nebînim, li min heram be cî û nivînên jinê." (H/356).

"-Diya min ez **dame sondê**, wekî tu caran nenivîsim. Ewe gelekî xeyîdîbû û zêriyayî." (H/360).

Ji ber mizgînî û xeberên xweş sondxwarin

Ji bo xelatdana ji kesî mizgînî anî re, ev cûre sond tê xwarin.

"**Paşê sond xwar**, wekî gava ku Egîd bi xêr û xweşî vegere bê, wê cotek ga bika qurban û ceniyekê bide Temûr." (H/300).

2.5.9. Zêmare

Zêmare, stranên dilşewat ên ku li ser miriyan tên gotin in. Zêmarbêj piştî miriyê, hest û ramanên xwe distêre. Ji aliyekî ve jî çîroka mirin an jî kuştina wî kesî bi kilaman vedibêje. Bi gelemperî di zêmarê de qala pesnên kesê mirî tê dayîn. Zêmarbêj bi piranî ji malbata miriyan e. Ew kes bi zêmareyan kula xwe û ya malbatê der dike.

Ji bilî mirinê, li ser qewimîna bûyerên neqenc jî zêmare tên gotin. Zêmareyên bi vî rengî di romanê de cih girtine.

Caran zêmarbêj, ji ber kul û êşa dil, heta ku jê xwîn tê ser û çavê xwe naperûç dikin. Bi piranî zêmarbêjên jin wisa dikin.

"*Ji nava wan tek jinekê ser rûyê xwe tev kir xwîn û bû qûjîniya wê, çû, lezand:*

"*Wey lawo, wey lawo, bêxweyîno, bêxwedano, wey lawo, wey, wey..!*" (H/244).

Carina zêmare ji aliyê du kesan ve tê gotin, gava yek gotina xwe xilas dike ya din berdewam dike. Ew kes nas, heval an jî exrebebayên miriyê ne.

"*Zeynê, Êso, diya Êso, Edilê, her sêkan heta sibehê çavên xwe nedane hev, heta sibehê giriyan û hêsir rêtin, " Wey lawo, wey lawo, xwezî bi kula Gulîzerê, ne bi ya te, xwezî ew roja reş bûya, wekî em ji êla xwe qetiyên hatin nava van xerîban! Reş be, hiş be ew roj, birayo, birayo, min bêxweyiyê, min bêkesê, dûrî Êso û vî tîfalî! Wey xwişkê, Gevez, lawo, çavê dayîka te birije, diya te qurbana te û nav û namûsa te*

be! Wey lawo, lawo, diya te gura serê çiyê be! Diya te hirça geliyan be! Weyê, weyê!
Ax bavo, ax Êso, te çi kir li serê min mehrûmê, belengazê!" Diya qijik li ber serê
qîza xwe ya bêmiraz bûbû pepûk û bi dilovanî digot, digot, li ser çavên xwe dixist û
diçû ling, por û serê cegera xwe. " Wey Gevez,lawo..!"

"Dengê pîrê hatibû birrîn, guliyên Gevezê yên reş î weke şev di dêst de, xwe
bi xwe re dinivijand... Lawo, pîrik gura har be.

Geveza min Gezezeke xas e
Xêra mala Xwedê ra
Wextê Egîdê axê, Emîrê Simo, Atoyê Sultan
dor li Gevezê girtin
Bira wir ra derketa Romingê bira, bavê Avas e
Elî bi min, Elî
Dengê şeşagira Egîdê axê
Emîrê Simo, kavila Dîgorê girtiye xêlî
Xêrê nevîne Egîdê axê, Emîrê Simo
Çawa nehiştin Geveza Êso
Bigihîje xwe û wî mirazî
Dîgora xirabe bi pelax e
Geveza Êso nav d waxewax e
Xêrê nevîne Egîdê axê, Emîrê Simo
Birîna Geveza Êso wê bi çomax e
Geveza mim Gezezeke xas e
Dengê Geveza Êso çiyê Dêra Paspas e
Wextê Egîdê axê, Emîrê Simo
Atoyê Sultan dor Geveza Êso girtin
Na wele, bavê Avas e
Weyê, weyê, min dêranê, min merûmê dûrî bira...
Geveza min Gezezeke gişt e
Mîna kihêla Erebaştanê rext e,
Rişme, stû nivîşt e
Xêrê wayê nevîne Egîdê Axa
Çawa nehişt bigihîje mirazê xwe û dil ê
Wey lawo, lawo, pîrik bimire
Îcar dê got:
Wayê, wayê, wayê Geveza min
Bejna delala dilê min, kulîlka ser kanînga
Moriya rav e bavê nav mircana
Duh van çaxa qîza mala bavê xwe bûyî
Îro jî pê ra çi ra bûyî çerezê van dirana
Tevna Geveza min kêmbere
Pîj kerkîte delala dilê min tûncê zer e
Bêje: -Gulîzer, xwişkê, bira lehzekê bê ser e.
Wey lawo, wey lawo, dayîk gura çiya be
Gevez lawo, dilê minî hêk e
Taviya baranê, kuliyê befrê êvar de lê ke
Gelo birîna delala min ya dil e
Kê bê serê wê ser balgiyê lêke
Wey lawo, wey lawo...
Pîrê got:
Birîndarê birîndara erebanê
Birîndara min bivin Dîgorê ber derê doxtorxanê

*Xwedê mala doxtora xirav bike
 Gelo dû-dermamê çawa danê?
 Zeynê rebenê
 Şevê me hatiya nîveka şevê
 Tê dengê bilbila malxirav, xwendina kewê
 Çavê belek da maye xubara xewê
 Wey dayê, wey dayê
 Îcar dê got:
 Dibê:
 Du xezalê derketine ji malekê
 Van xezala bejne bilind
 Çavbelekê karê xezalekê...
 Nemînim lawo, nemînim
 Gevez lawo, nemînim
 Gevez lawo, nemînim
 Gevez lawo, nemînim
 Gevez lawo, Gulîzer lawo
 Weyê, weyê, weyê, dayîk gurê çiya be..." (H/245-246-247).*

Heke zêmare li ser kuştinê be, gelek nifir li kujerê tê kirin.

*"Qûjîniya diya reben bû:
 -Gevez, Gevez lawo, heyfa te wisa namîne, Gevez!*

*Û diqûriya li ber serê wê, wisa dikir, te dizanîbû ev e dike mezel hişya bike,
 kevîr û xweliyê bide xeberdan, gul û gîhê bike halê mirinê. Qûrîniya dê bû, qîjîniya
 pîrê, birayê keçikê, bavê, Ûso:*

*-Weyê, weyê Egîdê axê, te bimire bira, te bimire xweyî û xwedan, te çawa,
 çawa Geveza min, ronahiya çavê min kire nava ax û berê sar!*

*Wax, Gevez lawo!
 Dîgora kavil bi neqeb e
 Tê da rûniştiye
 Şarûr, bilbil qiveqiv e
 Gerdana Geveza min
 Wisa spî ye, mîna şev e
 Axa Dîgorê axake şor e
 Bextê te me, nerizîne
 Pîîî, bedenê şaya, xemla por e
 Weyê, weyê, Egîd Axayo
 Te malî xirav be, ocaxî kor be
 Teyê çawa cote karê min dane der e...*

*-Gevez, Gevezê, kula Gulîzerê di dil de mayê, diya te kor be lawo, gura çiya
 be lawo, Gevez, Gevez, min mehrûmê, min bêkesê, min xerîbê! " (H/250).*

Zêmare, piştî qewimîna bûyerên xerab jî tîn gotin.

*"Wan ku ew xeber got, hêja zîwezîw kete nava muxulqet. Hêja bû şîn û girî.
 Te ku ji dûr ve lê binihêriya, te yê bigota weleh mirov mirine, kotel girêdane, hesp
 reş kirine, wa ye destkêş kirine tînin gund. Çend mêrê navser ghiştin Emerîk Axê,
 ketin ber milên wî, cimaeta din jî hemîn tevîhev bû, her kesî jî xwe re digot û*

diliband. Ji nava wê cimeata giran de lawijokên kulfet wiha zelal dihatin bihîstin, wekî cî bi cî dihatine afirandin:

*Kambaxa Dîgorê wê bi kils e
Êvara peya ji peyê dipirse
Ji Dîgora axê birine Dîgora Dêrê
Egîdê axê, Emîrê Simo, Atoyê Sultan
Dane serî şewqê Ūris e
Dî pey wê re dibû weyêweya kulfet:
Kela Qersê ser hêşîn e
Egîd Axa cavê ser Elî Axê de dişîne:
"Malxiravo, qeydê van gştiya giran e
Lingê min diêşîn"
Gava ku yekê xilas dikir, yekên din digot û li xwe dixist:
Qersê dinihêrim li dikina
Bejna Egîdê axê arxalixê dorê li qeytana
Ez ê nîfîrekê bikim Gulîzera Ūso:
"Tu bûka salê bî
Carekê dinê vejerî ba xaya, ba xudana..."
Weyê, weyê, dayê dêranê...
Renga kambaxa Dîgorêwê bi strî
Êvara peya ji peya buhurî
Birine kambaxa Qersê
Egîdê axê, Emîrê Simo, Atoyê Sultan
Şewqê Ūris dane serî
Weyê, weyê, dayê dêranê
Wêrana Qersê wê bi qapan e
Reqereqa firxûnçiyân e
Egîdê axê, Emîrê Simo
Kavila Qersê de bê xweyî, bê xudan e..." (H/294-295).*

2.5.10. Zûgotinok

Zûgotinok, bi gelemperî di nav lîstik û çîrokên zarokan de tînin gotin. Lê di nav stran û xebardana mezinan de jî zûgotinok hene. Zûgotinok bi aheng û hevdengiya peyvan pêk tînin. Tê de gotinên bêwate jî hene.

Di romanê de hindêk zûgotinok hene.

"Çolî çolistan

Berrî beristan

Hêja serê min

Ket nav xaxê giran" (H/66).

"-Min qayîliya xwe dayê, vebîşîrîm û wê deqeyê ji nişkê ve dengê zarokekê kete guhê min:

-Tavê tavê dê û bavê

Siyê siyê qutisiyê.." (H/73).

"Û bi ken lê zêde kir:

-Lê baranê, lê baranê

La şewitiyê, la wêranê

Îniyê barî, Şemiyê vekir

Xêyla bûkê bê feyde kir..." (H/74).

"Şero êdî kerr bû. Baran êdî nedibarî, keskesorê xwe avêtibû rûyê Elegezê, mirov hewas û hijmekarê wê bû. Giliya zarokatiyê hate bîra min:

-Keskesor mala me

Mişk û mar mala we " (H/78).

"Min texmîn kir, wekî der heqa pirsên min de êdî tiştek di barê Şewêşê kal de nema, aciz dibe û bi dest xwe re ev meseleya hanê hate bîra min:

-Salê were, sultan be

Mehê were, mêvan be

Herro neyê, bê tehm be..." (H/184).

ENCAM

Folklornas Heciyê Cindî di nav nivîskarên kurd yên Sovyetan de xwedî navekê mezin e. Wî emrê xwe daye ser xebatên folklor û zanyariya kurdan. Di xwendina xwe de heta asta profesoriyê hatiye û bi gelek medalyayan ve hatiye rewakirin. Herwiha ji ciwanên kurd re bûye rêberek.

Heciyê Cindî, di hemû dezgehên çandî yên çaxa xwe de xebitiye. Hem rojnameya di "*Riya Teze*" hem jî "*Radyoya Erîvanê*" de bi salan xizmet daye. Li ser folklorê kurdan gotar û pirtûk nivîsandine û ji bo geşedana zimanê kurdî jî berhem afirandine. Ji aliyê xebatên wêjeyê ve jî çîrok, helbest û şano nivîsandine, ji zimanên biyanî berhem wergerandine ser zimanê kurdî. Bi navê *Hewarî* yek romana wî heye.

Romana *Hewarî*, ji aliyê mijara xwe ve dîrokî ye, tê de tê behs kirin ka endamên êla Spîkanê çawa ji destê Osmaniyan revîne û li ser axa Sovyetê bicih bûne. Di vê romanê de me hem civaka kurdan hem jî çand û folklorê wê dît. Nivîskar, di vê civakê de serdestiya axayan, rewşa jinê, girîngiya şêxan û hwd. bi nêrîneke realîst dide ber çavên xwînerên xwe.

Herwiha ev berhem ji bo naskirina çanda kurdan jî berhemeke bijare ye. Ji bo lêkolînê gelek keresteyên folklorê di romanê de hene. Heciyê Cindî, ol û baweriya kurdên êzidî, edetên kurdan; seremoniyên zewac, mirin, serxweşî, dawet û şahiyên, bi mînakên cuda ve pêşkêşî me dike. Xwarin û vexwarin, cil û bergên jin û mêran, mêvandariya kurdan, jiyana wan ya li gundan, motifên çandî û tiştên bi vî rengî li me dide nasandin. Em di romanê de li rastî her cûreyên kevneşopiyên kurdan tên.

Ev roman ji aliyê wêjeya devkî ve jî gelekî dewlemend e, em di her gotinekê de li rastî biwêj, gotinên pêşiyên, şibandin, nifir û duayên di nav gel de yên herî zêde tên bikaranîn tên. Em caran bi sitrîna şivanekî caran jî bi ya dengbêjekî; kilam, stran û tiştên bi vî rengî dixwînin. Cindî, bi van meteryalên wêjeya devkî ve vegotina xwe xurt kiriye û dewlemendiya zimanê kurdî daye ber çavan.

Romana *Hewarî* hem ji aliyê nasandina kevneşopiyên kurdan û hem jî ji aliyê wêjeya devkî ve ji lêkolîneran re gencîneyeke mezin e. Em hêvî dikin ku ev xebat ji bo lêkolînan bibe çavkanî.

INDEKSA BIWĒJAN

A

Agir bi dilê kefi · 96, 103
Agirdadayî kirin · 75
Aqil jê birrîn · 82
Aqil ji seri çûyîn · 83, 84
Aqil û hiş birin · 83
Aqilê xwe berhevî ser hev kir · 83
Aqilê xwe winda kirin · 83,
Ava wan bi riyekê de neçuyîn · 83
Aveke sar bi ser de kirin · 107

B

Bala xwe dayîn · 83
Bê hemdê xwe · 75, 76, 99
Bêhin çikiyayî · 76
Bêhiş ketin · 45, 75
Bêhna wê/ wî bi ber da hat/ vedibû · 84
Benîştê devan · 45, 76
Ber çavan reş bûyîn · 84
Bi halê xwe de ketin · 84
Bi hemdê xwe · 76, 77, 139
Bi ser hemdê/ hişê xwe de hatin · 11, 84, 85, 86,
87, 97, 139
Bin qenciya yekê/î derketin · 84
Bu hîva binewr · 107
Bûbû pepûk · 77, 143

C

Cab da dest · 103

Ç

Çav ji çavan silbûyîn · 86
Çav têr bûn · 77
Çavên xwe bawer nekirin · 86, 110
Çawa antêxeke tenûrê · 107
Çawa çirayeke bêdon · 107
Çawa ku miriyên goran · 92, 107
Çawa mirîşkekê silbûyî · 108
Çawa tûleyek çav bi şêr bikeve · 108
Çi hal e çi hewal e · 106

D

Da bin lingê xwe · 86
Dengê wê/ wî ketibû zikê wê/ wî · 103

Derd û kulan derman kirin · 86
Derzî biavêta nakete erdê · 87
Dest ji erd û esman qetayî · 86
Dest ji hev du bûyîn · 86
Destê wê/î ji dinyayê sar bûyîn · 86, 104
Dev ji devan revandin · 87
Deynê stûyê · 77
Dêhna xwe dayîn · 36, 49, 53, 56, 67, 72, 84, 86,
87, 88, 89, 90, 91, 92, 102, 122
Di ber dilê de hatin · 92, 93, 96, 99, 102
Di ber xwe de gotin · 88, 93, 104, 126
Di çiyê xwe de bûn kevir/ risas · 103
Di dil de mayîn · 94, 144
Di dilê xwe de gotin · 72, 73, 75, 94, 119, 132
Di ser hev re çûyîn · 95, 110
Di xwe de qurmiçandin · 85, 95,
Dil baristan bûn · 78, 85
Dil dax bûn · 78
Dil dida ber dilan · 94
Dil tijî bûn · 94
Dil xwendin · 78
Dilê wê/ wî kirrîn · 78
Dinya bû tara bêjingê · 108
Dîn û harbuyîn · 104

G

Gehîştina mirazê · 79, 118
Gilî di devê wê/î de girtin · 104
Gotina wê/î bi erdê neêxistin · 104
Guman jê hatî birîn · 95
Gunehê kafiran lê hatin · 96
Gunehê wê/î li stûyê wê/î · 96
Gunehê xwe pê anîn · 96

H

Heyfa xwe hilandin/ rakirin · 45, 96
Hêsiran mîna barana dibarîne · 108
Hişê xwe berhevî ser hev kirin · 50, 89, 97
Hûtê binê behran · 108

J

Ji çavan belengaz bûn · 108
Ji dergehê teng xelas bûyîn · 97
Ji dest çûyîn · 79
Ji destê xwe kirin · 55, 97
Ji dilê wê/î xebedan · 104
Ji guhên xwe bawer nekirin · 97
Ji hal ketin · 38, 79

Ji merîviyê derxistin · 97
Ji xewa kibîr rakirin · 104

K

Kamço kirin · 79, 92
Kela wê/wî rabû · 97
Ketina orta du keviran · 104
Ketina xewa dêwan · 108
Kok birr/qir kirin/ koka hev du anîn · 97, 98,
108
Kok qelandin · 79
Kulmê naçine dirrêşê · 98

L

Li ber xwe ketin · 70, 82, 84, 98, 99, 141
Li ser tiliyan reqisandin · 105
Ling ji erdê negirtin · 99
Ling kirina ji solekê teng · 105
Lingên xwe li guhên xwe êxistin · 104

M

Mil da ber milan · 99
Mîna bayê birûskê · 108
Mîna berfa li serê çiyê · 109
Mîna çivîkekê · 109
Mîna ewrê reş · 109
Mîna gulleyekê · 36, 79
Mîna gur · 109
Mîna keviran · 109
Mîna kihêlekê · 109
Mîna mezelekê kerr · 109
Mîna miriyan · 109
Mîna nêçîreke tirsîyayî · 111
Mîna pezeke devgirêdayî · 1110
Mîna pezê gur pê ketî · 110
Mîna pisîkê nêr · 110
Mîna seyên ku xwîna lingên xwe dialêsin · 110
Mîna sitîlekê/dîzek li ser êgir /tenûr · 110
Mîna siyê · 80
Mîna şêrekî birîndar · 111
Mîna şeveke reş · 111
Miraz di çav de mayîn · 70, 99
Mirazê xwe şabûyîn · 99
Mirin çeka cindiyan e · 106

N

Ne mirî ne ne sax in · 100

P

Porê serê dibûn şûjin · 111

Q

Qedir girtin · 80, 100
Qerf Kirin · 80
Qudûm şikestin · 80, 134

R

Ro kirin · 80, 137
Roj bûn sal · 105
Rûspî kirin · 41, 58, 80, 128, 130, 131, 132

S

Ser êşandin · 80

Ş

Şer avêtin · 56, 80, 81
Şerma xwe da ber ligan · 105
Şîrê zîmkayîyê di devê wî/ê re hat · 105

T

Te digot berfa çilê daye ser · 111
Te digot bi ava heft avan şuştine · 111
Te digot bû av, nerijîya · 111
Te digot bû bêjîngê · 111
Te digot bûbû pelewane · 111
Te digot bûye ber · 112
Te digot bûye topagîrek, · 112
Te digot dil bûye kevîr · 112
Te digot, dilê şêrekî di nava qefesa wê/î de ye ·
112
Te digot ewrekî reş danî/ hat · 112
Te digot gul û nûr jê dibariyan · 112
te digot kaniyeke teze bilqîn lê ketiye · 112, 122
Te digot kawûs li ser nefesa wê/î runiştîye · 112
Te digot ketine mezêlê xwe · 113
Te digot lehî rabû · 113
Te digot ling bi erdê ve mix kirin · 113
Te digot mirin bû kêlendiyek · 113
Te digot miriya îro nîn e, ya heft salan e · 113
Te digot pezkûviyek e · 113
Te digot rêça nêçîrê dît · 113
Te digot ro ye, şemal dide · 113
Te digot roj dihênijî · 114
Te digot şarûr î bilbil e · 114

Te digot şevê li ser per veda · 114
Te digot teyrekî atmece ye · 114
Te digot tûyî devên hev kirine · 114
Te digot xerabe ye · 114
Te digot zengil e · 114

W

Wekî agirê tenûrê · 114
Wekî eyarê kurmî · 114
Wexet kafir e · 81
Wekî kewa gozel · 115
Wekî tenûrekê zimzimî 115

X

Xwe avêtina ber bexti · 106, 126, 139
Xeber bi şêkir birîn · 100

Xwe bi xwe re gotin · 36, 100, 101, 117, 135
Xwe eyan kirin · 100
Xwe ji bîr kirin · 100, 101
Xwe qurban kirin · 20, 41, 52, 73, 75, 96, 101, 117, 129, 131, 132, 134, 135, 136, 140, 142
Xwe winda kirin · 37, 92, 101
Xwelî serê xwe kirin · 105
Xweliya binê lingan · 101, 134, 135
Xweziya xwe pê anîn · 101
Xwîn lê keliyayî · 105
Xwîna reş ketî (hildişe) dili · 101, 102
Xwîna yekî fir kirin · 106

Z

Zar /Ziman lê hate girêdan / girtin · 102
Zar û ziman giranbuyîn · 102
Zar û ziman nagere · 102
Zeft kirin · 45, 81, 82, 83, 95, 98, 11
Zimanê xwe gest · 72, 103

ÇAVKANÎ

- Ahmadzadeh Haşim, "Di Romana Kurdî de Guherînên Şeweyî û Babetî", Gotarên Konferansa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Hekariyê, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011. (48-68)
- Aksan Doğan, (2006). *Anlambilim Konuları ve Türkçenin Anlambilimi*, Ankara: Engin Yayınevi.
- Aktekîn Ozan, "Çend Xwarinê Mûşê", <http://candname.com>, 14.06.2018
- Alakom Rohat, (2009). *Kars Kürtleri*. İstanbul: Weşanxana Avesta.
- Aras Ahmet, "Zargotina Kurdî Metodên Lêgerînê", *Kovara Zend*, j.3, İstanbul, Payîz 1997 (53-55).
- Aslan Şehmûs. "Taybetiyên Biwêjan", *Kovara Bîr*, j.4, Zivistan-Bihar, 2006, (201-206).
- Aslanoğlu Mert, "20. Yüzyılda Rusya'da Nasıl Bir Komünist Vahşet Yaşandı", <http://mertaslanoglu.blogspot.com>, 20.08.2018
- Baykurt Şeref, "Folklor üzerine Çalışmalar", <http://www.kulturelbellek.com>. 10.09.2018
- Borak M., "Dengbêjî û Rista Jina Kurd di nav Civaka Kurd da", *Kovara Folklorname*, j.1, Nisan-Gulan, 2019 (105-114).
- Borak Mustafa, (1992). *Ferhengê Biwêja*. Stenbol: Weşanxana Enstîtuya Kurdî ya Stenbol.
- Boratav Pertev Nail., (1984). *100 Soruda Türk Folkloru*, (çapa 3), İstanbul: Gerçek Yayınevi.
- Boratav Pertev Nail, (1969). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. İstanbul: Gerçek Yayınevi.
- Boyîk Eskerê, (2012). *Çanda Kurdên Sovyetê*. Amed: Weşanxana Deng.
- Boyîk Eskerê, *Êzdiyatî Fermanên Reş Mîrzikê Zaza*, Oldenburg: Weşanxana Dengê Êzdiyan.
- Boyik Eskerê, "Nihêrîna li Ser Edebiyata Kurdên Sovyetê", Gotarên Konferansa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Hekariyê, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011. (93-101)
- Boyîk Eskerê, " Rojnameya Riya Teze", *Kovara Nûbihar*. J.126. zivistan 2014. (9-15).

- Celalî Murad, (2016). *Mela Mehmûdê Bazidî û ' Adat û Rusûmatnameê Tewayifê Ekradiyê*. Stenbûl: Weşanxana Nûbihar.
- Celîl Ordixanê, Celîl Celîlê, (1978), *Zargotina Kurda*. Moskova: Weşanxana Naûka.
- Cewarî Firîda Hecî,(2010). *Bîranînên Min*. Yêrêvan: Weşanxana Lîmûş.
- Cewarî Firîda Hecî, (2009). *Folklor Kurda*, Yêrêvan: Weşanxana Lîmûş.
- Cindî Hecî, Evdal Emînê, (2008). *Folklor Kurmanca*. Stenbûl: Weşanxana Avesta.
- Cindî Hecî, (2008). *Hewarî*. Amed: Weşanxana Lîs.
- Develioğlu F., (1980). *Türk Argosu*, Ankara: Aydın Yayınevi
- Dîzmar A. K., "Danasîna Heciyê Cindî", Kovar *Folklor Kurda*, j.2, Nîsan Gulan Hizîran, 2015 (78-81).
- Dost Jan, (2012). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê Mele Mehmûd Beyazîdî*. (Çapa 2). İstanbul: Weşanxana Nûbihar.
- Dursun Aysun, (2016). *Türk Halk Hukuku*. İstanbul: Ötüken Yayınevi.
- Elçin Şükrü, (2004). *Halk Edebiyatın Giriş*, Ankara: Akçağ Yayınevi
- Ergün Zülküf, "Ducemseriya Realîzma Sosyalîst di Romanên Erebe Şemo û Heciyê Cindî de", www.esarkiyat.com, 30.10.2018
- Ergün Zülküf, "Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê", mukaddime.artuklu.edu.tr. 20. 10. 2018
- Eşo Wezîrê, "Heciyê Cindî 100 Salî ye", diyarname.com., 20.09.2018
- Ezîzan Herekol, Rêya Teze, Kovara *Hawar*, j.8, Şam, Îlon 1932. (1-3).
- Hawar, Armanc, "Awayê Xebatê Ê Nivîsandina Hawarê", Kovara *Hawar*, j.1, Şam, Gulan 1932.(2-4).
- Gultekîn Nîhat, "Qonaxa Rewşenbîriya Kurdî: Radyoya Yêrîvan", Kovara *Nûbihar*. J.126. Zivistan 2014. (27-35).
- Keskin Ahmet, "Türk Kültüründe 'Selamlaşma' ve 'Vedalaşma' Hakkında Genel Bir Değerlendirme", *Türk Dünyası Dil ve Edebiyat Dergisi*, j.43, İlkbahar 2017. (125-146).
- Mazî Çiya, "Biwêj, Gotinên Pêşyan û Gotin", Kovara *Zend*, j.5, Payîz1998 (80-83).
- Omerxalî, X., Li Dewletên Sovyeta Berê Kurd bi Perspektîfa Dîrokî û Çandî. Wêje û Rexne.(23-35)

- Ozkan Hamza, "Kevneşopiya kinc û Bergên Kurdan",
www.yuksekovahaber.com.tr.14.08.2018.
- Örnek Sedat Veyis, (1998), *100 Soruda İlkellerde Din, Büyü, Sanat, Efsane* (çapa 2),
İstanbul: Gerçek Yayınevi
- Örnek Sedat Veyis, (2000).*Türk Halkbilim*. (İkinci Basıkı). Ankara: Kültür Bakanlığı
Yayınları.
- Öztürk Mustafa, "Vekolînek Derbarê Gotinên Pêşyan Ên Kurmancî De",
mukaddime.artuklu.edu.tr. 04.07.2019
- Pertev Ramazan, (2015), *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, Stenbûl: Weşanxana Avesta.
- Propp Vladimir, (1998), *Folklor Teori ve Tarih* (wer.Necdet Hasgûl, Tolga Tanyel).
İstanbul: Weşanxana Avesta.
- Reşîd Tosinê, (2010), *Êzdiyatî Olekê Hê ji Nenaskirî*, Stenbûl: Weşanxana Lîs.
- Reşîd Tosinê, Cewarî Nûrê, Mirina Heciyê Cindî, Kovara *Hêvî*, j.7, Îstîtut Kurdên
Parîsê, Payîz 1990.
- Sağnıç Feqî Hüseyin, (1992), *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbûl: Weşanxan Enstîtuya
Kurdî ya Stenbûl.
- Şenel Mustafa, "Biliçaltına Dayalı Etnik Küfürler", turkoloji.cu.edu.tr., 21.09.2018
- Şengül Birgül Açıkyıldız, Êzîdilîk Dininde Melek Tavus İnancı ve İkonografisi,
Kovar Kürt Tarihi, j.15, Ekim-Kasım-Aralık, 2104 (10-17)
- Topal Kemal, (2006), *Nasandina Kevneşopên Êzdiyatîyê*, Stenbol : Weşanxana
Weşanên Perî.
- Ulugana Sedat, "Kurdolojiya Sovyetê û Kronolojiya Edebiyata Wê ya Kurdî
(1922-1991)", Kovara *Wêje û Rexne*, j. 9/10, Weşana Demane (Du-demsalî)
2017 (36-56)
- Uzun Mehmet, (2010), *Destpêka Edebiyata Kurdî*, İstanbul: Weşanxana İthaki.
- Xelîl, Temûrê, (2014), *Antologiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta
Berê*, İzmir: Weşanxana Na.
- Xelîl Temûrê, "Rewşa Zimanê Kurdî li Komarên Sovyeta Berê û Niha",
<https://rojvakurd.com>., 11. 09. 2018.
- Yanardağ Alaaddin, "Örf ve adetler Sosyolojisi", ifder.igdir.edu.tr., 18.10.2018.
- Yıldırım Kadri, Pertev Ramazan, Aslan Mustafa, (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha
Folkloru Kurdî*, Mardin: Weşanên Mardîn Artuklu Üniversitesi.

Zêdo Çetoyê, "Ji Hewarî'ya Heciyê Cindî", [cetoyezedo.blogspot.com.](http://cetoyezedo.blogspot.com), 24/09/2018.
18.42.

Zeraq Dilawer, (2005). *Ferhenga Biwêjan*, Stenbol: Weşanxana Enstîtuya Kurdî ya Stenbol.





VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



18/07/2019

Tez Başlığı / Konusu

HĒMANĒN FOLKLORĒK DI ROMANA HEWARĒ YA HECİYĒ CINDĒ DE

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 133 sayfalık kısmına ilişkin, 18/08/2019 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından %12 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 12 (Yüzde Yedi) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

19/08/2019

Reşide DEĞİRMİ
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Reşide DEĞİRMİ
Öğrenci No : 14950001010
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Programı : Örgün Eğitim
Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN
Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

19/08/2019

ENSTİTÜ ONAYI
U Y G U N D U R

19/08/2019

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ
Anabilim Dalı Başkanı